HÊVÎ

Kovara Çandiya Giştî

$ 12 HEJMAR 7 / PAYÎZ 1990 60 FF

ESPOIR

HÊVÎ

Revue culturelle kurde

N° 7 - Automne 1990

Directeur de la publication : Reşo Zîlan
Réalisation : Sacha Ilitch, Xanî Şerefkendî, Mohamad Hassan

SOMMAIRE

— La mort de l'ethnologue kurde soviétique Heciyê Cindî, T. *Reşîd- N. Cewarî* 7
— Certains Kurdes à ne pas oublier, *Nûredîn Zaza* 19
— Interviews avec les poètes Osman Sebrî, Şerko Bêkes et l'écrivain Ş. B. Soreklî .23
— Le Train (nouvelle), *Kurdo Husên* 49
— Henry Armstrong s'en va en guerre (nouvelle), *Ş. B. Soreklî* 53
— Le deuil (poème), *Riza Çolpan* 65
— Publications récentes 68

— Contes, fables et chansons en dialecte dumilî de la région de Çebexçûr, et de Palo, *Harûn* 81
— Fes Mustafa et Zeyneb Khanim (conte), *O. W. Kaymak* 96
— Deux chansons de Dêrsim, *Firat* 102
— Le destin de la fille du roi (conte), *Koyo Berz* 105
— Bibliographie dumilî (V), *Malmisanij* 111

— Les cinq numéros de la revue "Kurdistan" (1919-1920), *Ferhad Pîrbal* 202
— Archives britanniques sur le mouvement kurde 185
—Traditionalisme ou nationalisme : réponses kurdes au régime kémaliste, *H. Bozarslan* 170
— H.S. Nyberg au Kurdistan, *Sigrid Nyberg Kala* 153
— La retraite des Barzanis du Kurdistan iranien (II), *E.H.Tefrişyan* 141
— Les noms des mois en kurde, *Ahmedê Şerîfî* 134
— La création de l'Etat Syrien et la quetion kurde en Syrie, *Rênas*, traduit par *Xanî Şerefkendî* 129
— La chute d'eau (poème), *Şêrko Bêkes* 125
— Le glas du doute (poème), *Ferhad Şakelî* 121
— Nouvelles publications de l'Institut 120

La revue *Hêvî* (Espoir) est une publication bi-annuelle de l'Institut Kurde. Elle est ouverte à tous les courants de la vie culturelle kurde.

Les textes publiés n'engagent que la responsabilité de leur auteur.

Pour toute correspondance, écrire à :
Institut Kurde de Paris, 106, rue La Fayette, 75010-PARIS / FRANCE.
Tél. : (1) 48 24 64 64 — Fax : 47 70 99 04

HÊVÎ

KOVARA ÇANDIYA GIŞTÎ

HEJMAR 7 / PAYÎZ 1990

Imprimé en Italie
© INSTITUT KURDE PARIS — 1990 — ISSN 0761-1242

Kurmanc di dewleta dinê da
Aya bi çi wechî mane mehrûm ?
Bîlcimle ji bo çi bûne mehkûm ?

Ehmedê Xanî (sedsala XVII)

Xwendevanên hêja,

Piştî derengmayîneke dirêj kovara we *Hêvî* car din derdikeve. Em hêvîdar in ku ewê ji 1991 pêve salê du hejmar di dema xwe de bên weşandin û *Hêvî* bi arîkariya nivîskar û ronakbîrên kurd ên her aliyên Kurdistanê, di jiyana çandî û edebî ya kurdî de, roleke sereke bileyize.

SERECEM

Kurmancî

Mirina Heciyê Cindî, *Tosinê Reşîd - Nûra Cewarî* 7
Kurdên Nejibîrkirinê, *Nûredîn Zaza* 19
Hevpeyvînek bi Osman Sebrî re, *Firat Cewerî* 23
Şaîrê bergiriyê Şêrko Bêkes, *Hiner Salim* 33
Hevpeyvînek bi Şahînê B. Soreklî re, *Mehmed Uzun* 38
Trên, *Kurdo Husên* 49
Henrî Armstrong çû cengê, *Şahinê B. Soreklî* 53
Reş girêdan, *Riza Çolpan* 65
Bîranînên Nûrî Dêrsimî 68
Çend gilî li ser Bavê Nazê û pirtûka "Hêsir û baran", *Edoyê Îbo* 72
Dr. Abdullah Cevdet, *Mehmed Uzun* 75

Dumilî

Zazakî Çebexçur û Palî ra Sonîk, Fistonîk, Mesele û Deyîrî, *Harûn* 81
Rindan Hemînî Miyan di, *Heyran Xanima Dunbulî* 95
Fes Mistefa û Zeyneb Xanimî, *O. Wedat Kaymak* 96
Di Lawikê Dêrsimî, *Firat* 102
Qederê Keynerda Padîşay, *Koyo Berz* 105
Bîbliyografya dimilî (Zaza)-V, *Malmîsanij* 111

Kurmanciya xwarê

Pênc jimarî kovarî Kurdistan (1919-1920), *Ferhad Pîrbal* 202
Belgenamey arşivî brîtanî : bizûtnewey kurd,
wergeranî le îngilîziyewe, *Nezend Begî Xanî* 185
Nerîtgerî yan nasyonalîzm : welamî Kurdekan bo rejîmî kemalist, *H. Bozarslan* 170
H. S. Nyberg le Kurdistan, *Sigrid Nyberg Kalla* 153
Paşkêşey Berzaniyekan le Iran (II), *Ebû Hesenî Tefreşiyan* 141
Nawî manga kurdiyekan, *Ahmedê Şerîfî* 134
Damezrandinî Dewletî Sûrî û kêşey kurd le Sûriya, *Rênas*, wergerandin, *Xanî* 129
Tavgey zîndanî, *Şêrko Bêkes* 125
Zengî goman, *Ferhad Şakelî* 121
Çapemeniye tazekanî Enstîtu 120

Mirina Heciyê Cindî

Yek ji ronakbîrên sereke yên Kurdên Sovyetistanê, nivîskar û folklornas profesor Heciyê Cindî roja 1ê Gulana 1990 an, di 72 saliya xwe de, li Rewanê wefat kir. Heciyê Cindî yek ji hîmdarên Enstîtuya Kurdî bû. Em li jêrê nivîsandineke Tosinê Reşîd li ser jiyana wî û bendeke keça wî Nûra Cewarî li ser bibliyografya xebatên wî belav dikin.

Gelê kurd di dîroka xwe ya dûr û dirêj de eserên kulturê yên mezin dane, wekî yên Ehmedê Xanî û Şeref Xan Bîtlîsî, Melayê Cizîrî û Mestûre, Goran û Cigerxwîn û gelekên din, lê ji ber rewşa siyasî ya Kurdistanê, nexwendabûnê, bîr û baweriyê wan negihîştine ber payê hemû kesî.

Gelê kurd hetanî îro beşeke mezintir ya kultura xwe di nava folklora xwe de diyar kiriye. Loma jî folklora gelê me ewqas kûr e, ewqas fireh e, ewqas pircûre ye. Û ku îro pirsa kurd û Kurdistanê gav bi gav bilind dibe, ji bo ku em xwe bi dinyayê bidne nas kirinê, rêyek jê jî ew e ku em folklora xwe bi dinyayê bidin nasîn. Heciyê Cindî vî karî kiribû armanca sereke ya jiyana xwe ya û bê rawestan dimeşand.

Di nav van 60 salên xebatê de ewî gelek rojên reş û giran dîtin. Hate girtin û lêdanê jî xwar û bê kar jî ma, lê wî tu carî destê xwe ji folklora gelê xwe nekişand û temamiya jiyana xwe da bi vê folklorê re mijûl bû.

Heciyê Cindî tevî şagirtên xwe di sala 1980 de. Li piya : Tîtalê Efo, Eliyê Evdilrehman, Egîtê Abasî û Ahmedê Çogê. Rûniştî : H. Cindî, Zeyneva Îvo û Şawoyê Lêşo.

Heciyê Cindî di sala 1908 da li gundê Emençayîrê, qeza Qersê, ji diya xwe bûye. Di salên Şerê Cihanê Yekemîn da sêwî dimîne û sala 1919 da, pêşiyê wî didne sêwîxana Qersê, paşê jî, didin ya Gumriyê (niha Lênînakan). Ew di sala 1929 da Xwendegeha ermenî temem dike û dibe seyda û midûrê dibistana gundê kurdayî Qundaxsazê (niha Riya Teze). Lê mêla wî li ser xwendinê bû û di sala 1930 de ew dikeve Fakulta ziman û edebiyatê, ya Zanîngeha Rewanê ya dewletê û di sala 1933 de ew temam dike. Hema wê salê jî ew dikeve aspîrantûra Enstîtuya dîroka kultura Ermenîstana Sovyetî. Ew jî ji xezeba sala 1937 a nefilitî. Ewî ji kar dûr dixin û zûtirkê di adara sala 1938 de davêjne hebsê. Ew çawa "xayînê welat"hate gunekarkirinê û nava "îzbatyan" de bûn wisa jî nama ku Mîr Celadet Bedirxan bi navê kovara "Hawar" ji wî re şandibû, yek jî Kamil Bedirxan, ku hingê li Tiflisê li Zanîngeha Komûnistiyê ders dida, şevekê bûbû mêvanê wî. Rast pîştî salekê, 18 ê adarê sala 1939 a mehkema eskeriyê wî efû dike û ew ji hebsê derdikeve. Lê di nava salekê de ewî zulm û zêrandina wisa dîtibû, wekî temama jiyana wî da ji bîra wî neçû. Loma jî ew roja 1 ê adarê, roja ji hebsê derketinê, kire roja ji dayîkbûyîna xwe û her ciya paşê ew roj nivîsî.

Di sala 1940 de ew têza xwe ya bi navê *Ker û Kulikê Silêmanê Silîvî* pawan dike û dibe kandîdatê (doktorê) fîlolojiyê. Ew xebata wî ye, ku piştî salekê li Rewanê çap bû, bû hîmê folklornasiya kurdî li Yekîtiya Sovyetî. Lê hê di sala

1936 a de Heciyê Cindî (tevî Emînê Evdal) *Folklora kurmancî* çap dike. Eva kitêba giranbiha hetanî îro jî di dereca çapkirina folklora kurdî da ya baştir e.

Di sala 1959 de li sektora Rojhilatnasiyê (niha Enstîtuya Rojhelatnasiyê, ya Akademiya Ermenistanê ya Zanistiyê) para kurdnasiyê vedibe û ji destpêkê heta sala 1968 a Heciyê Cindî serokê wê parê bû.

Di sala 1964 de ji bona karê wî yî pirsale û hêja di dereca kurdnasiyê de navê doktorê fîlolojiyê didne wî, lê piştî du salan ew dibe profesor.

Heciyê Cindî şuxulvaniya xwe ya pedagojiyê ji dibistana gundê kurda yî Qundaxsazê dest pê dike, paşê salên 1930-1937 de li Xwendegeha Piştqefqasya ya kurdî ya pedagojiyê dersên zimanê kurdî dide, peyra di salên 1968-1975 de li para kurdî ya Fakulteya Rojhelatnasiya Zanîngeha Rewanê ya dewletê de dersên ziman, edebiyat û folklora kurdî dide.

Di roja derketina rojnama *Riya Teze* de, ji sala 1930 heta sala 1957, ew wisa jî di berpirsiyariya wê de kar dike.

Heciyê Cindî karekî mezin di dereca amadekirina kitêbên dersê de kiriye. Eva êdî çend silsiletê zarokên Kurdan li Yekîtiya Sovyetî bi *Elîfba* Heciyê cindî fêrî xwendina zimanê dê dibin. Helbet xên ji *Elîfba* Heciyê Cindî çend kitêbên dersan yên mayîn jî nivîsîne.

Heciyê Cindî ji wan nivîskarê me bû, ku bi navê wana edebiyeta Kurdên sovyetî dest pê dibe. Ji salên 30 î dest pê kirî gelek kitêbên wî yên şêran,

Heciyê Cindî û nivîskarê ermenî Avêtik Îsahakyan di sala 1958 de.

Heciyê Cindî û malbata wî. Li piya : Zazê, Zînê, Nûrê. Rûniştî : Frîde, H. Cindî, Z. Îvo û Frîce.

kurteçîrokan û dawiyê romana wî ya *Hewarî* çap bûne. Gelek afirandinên wî wisa jî bi zimanê ermenî û rûsî çap bûne. Ew ji sala 1932 a, ji roja teşkîlkirinê, hetanî sala 1967 a serokê Para nivîskarên kurd ya Yekîtiya nivîskarên Ermenistanê bûye.

Çawa nivîskar, ew tevî gelek komcivînên nivîskarên Ermenistanê, Yekîtiya Sovyetî û konferansên nivîskarên welatên Asyayê û Afrîkayê bûye.

Di salên 30 de Heciyê Cindî di Para Radyoya Rewanê ya kurdî de çawa dîktor kar kiriye.

Heciyê Cindî çawa ronakbîrekî gelê kurd (bi maniya ve peyvê ye lape fire) di hemû derecê kultura kurda de kar kiriye. Lê belê karê wî yî sereke berhevkrin, çapkirin û lêgerîna folklora kurdî bûye. Xên, ji herdu kitêbên jor-gotî ewî ev kitêb jî çap kirine *Folklora kurdî* bi zimanê ermenî, 1947 ; *Şaxêd eposa Koroxlîyê kurdî* bi zimanê ermenî, 1953 ; *Memê û Zînê* bi zimanê ermenî,1956 ; *Beyt-serhatiyê kurdî* bi zimanî rûsî 1962.. Bi zimanê kurdî ev kitêb derketine *Folklora kurdî*, 1957, *Kilamê cimaeta kurdaye lîrîkiyê*, 1975; *Şaxêd eposa Rostemî Zalê kurdî*, 1977; pênc cildên *Hikyatên cimaeta kurda*, 1961, 1962, 1969, 1980, 1988; *Metelok û meselokên cimaeta kurda*, 1985 ; *Bahar*, 1988 û gelekêd mayîn, ku tevayî 10 hezar rûpelî bêtir e.

Heciyê Cindî wisa jî bi pirsê edebiyatnasiyê va mijûl bûye du kitêbên

wî *Lîtêratûra Kurdên Ermenistana Sovyet* di sala 1954 û *Oçêrkê lîtêratûra Kurdên Ermenistana Sovyetî*, 1970 tevî gelek gotar, nivîsarên pêşîn bûn ku tê da cêribandina lêgerîna edebiyeta Kurdên Yekîtiya Sovyetî tê kirinê.

Rêke pêşdabirina edebiyatê jî, ew wergerandinê ji zimanê mayîn e. Di vê derecê da jî Heciyê Cindî karekî hêle kiriye. Bi wergerandina wî 12 kitêb hatine çapkirinê û 15 piyês di têyatra kurdî de hatine nîşandanê.

Seva karê xwe yî hêja di dereca pêşebirina kultura kurdî de Heciyê Cindî bi gelek xelatên Yekîtiya Sovyetî ve hatibû xelat kirin.

Di sala 1972 de Heciyê Cindî tê bijartinê çawa endam-miqaledarê Akademiya Kurda li Komara Iraqê, û di sala 1983 de bû hîmdarekî Enstîtuya Kurdî ya Parîsê.

Heciyê Cindî 1 ê gulanê, sala 1990 î li bajarê Rewanê wefat kir.

Xên ji wan kitêbê jorgotî di nava mîrata ewî hiştî de gelek destnivîsarên wî yen hêja hene, ku çapkirina wana wê xizna kultura Kurdan dewlemend bike.

Bîbliyografiya xebatên Heciyê Cindî

Di vê bîbliyografyayê de navên xebat, bend û pirtûkan ji eslên wan, bê guherandin û rastkirin, bi alfabeya latînî hatine nivivîn.

I— Xebatên pedagojiyê

1. Metodîka zimanê kurmancî, bona xwendinxanê dereca ewlîn, Erêvan, sala 1932.

2. Xebernema fleyî-kurmancî (tevî hevala), Erêvan sala 1933.

3. Ziman-nema kurmancî, bona mektebê orte (tevî prof. A. Xaçaturyan.), Erêvan, sala 1935.

4. Xebernema termînolojiyê, ermenî-kurmancî (tevî prof. A. Xaçaturyan.), Erêvan, sala 1936.

5. Programa zmanê kurmancî, bona dersxanêd I-IV (tevî E. Evdal), Erêvan, sala 1936.

6. Programa zmanê kurmancî, bona mektebên ortê (tevî E. Evdal), Erêvan, sala 1936.

7. Programa zmanê kurmancî, bona dersxanêd V-VI (tevî E. Evdal), Erêvan, s. 1953.

II— Pirtûkên ziman û edebiyata kurdî ya dersan (wisa jî yên çend cura veçêkirî û çapkirî)

1. Beyreqa sor, bona koma ewlîn, Erêvan, sala 1932
2. Emrê teze, bona koma duda, Erêvan, sala 1932.
3. Dinya teze, kitêba zmanê kurmancî, bona koma V, VI, VII, Erêvan, sala 1932.
4. Beyreqa sor, Elîfba, bona koma ewlîn, Erêvan, sala 1933.
5. Kolxoznîkê derbdar, Elîfba, bona mezina, Erêvan, sala 1933.
6. Ktêva zmanê kurmancî, Elîfba, Erêvan, sala 1934.
7. Elîfba bona koma ewlîn, Erêvan, sala 1935.
8. Elîfba bona mezina, Erêvan, sala 1936.
9. Elîfba û ktêva xwendinê, bona sala pêşîn, Erêvan, 1937.
10. Elîfba, Erêvan, sala 1946, veçêkirî çap bûne 1951, 1954.
11. Elîfba (tevî Frîda Cewarî), Erêvan, veçêkirî çap bûne, sala 1957, 1961, 1966, 1974, 1982.
12. Ktêva zmanê kurmancî bona koma sisiya, Erêvan, sala 1933. Ev ktêva veçêkirî hatiye çapkirinê wisa jî di salên 1935, 1937 de.
13. Zmanê dê, bona dersxana sisiya, Erêvan, veçêkirî, çap bûne salên 1948, 1952, 1955, 1958, 1961.
14. Zmanê kurdî, bona dersxana sisiya, Erêvan, veçêkirî çap bûne salên 1970, 1976, 1987. Ktêva paşîn hazir bûye tevî F. Cewarî.
15. Ktêva zmanê kurmancî, bona mezina, Erêvan, sala 1934.
16. Ktêva zmane kurmancî bona sala duda, Erêvan, sala 1934.
17. Ktêva zmanê kurmancî (tevî hevala), bona dersxana şeşa, Erêvan, sala 1935.
18. Ktêva zmanê kurmancî, bona dersxana duda, Erêvan, sala 1937.
19. Ktêva zmanê kurmancî (tevî C. Gênco), bona dersxana hefta, Erêvan, sala 1937.

III— Xebatên fîlolojiyê, berhevokên zargotinê

1. Klamê cimaeta Kurmanca (dengnivîsandin û peşxeber ya K. Zakaryan, tekst nivîsîn H. Cindî), Erêvan, sala 1936.

2. Folklora Kurmanca (tevî E. Evdal), Erêvan, sala 1936.

3. Ker û Kulikê Slêmanê Slîvî, eposa cimaeta kurda, lêgerîn û tekst (lêgerîn bi zmanê ermenî), Erêvan, sala 1941.

4. Weten, 10 kilam bi zmanê kurmancî (tevî S. Gasparyan), rotoprînt, Erêvan, sala 1962.

5. Ewledêt weten, berevoka klamê kurdaye sovêtyê (tevî S. Gasparyan), rotoprînt, Erêvan, sala 1943.

6. Folklora kurdî, pêşxeber, tekst, nivîsarnasî (bi zmanê ermenî), Erêvan, sala 1947.

7. Şaxêd eposa, "Kyor-ogliyê" kurdî, pêşxeber, tekst, nivîsarnasî (pêşxeber, nivîsarnasî bi zmanê ermenî), Erêvan, sala 1953.

8. Edebyata kurdîya Ermenistana Sovêtyê, lêgerîn (bi zmanê ermenî), Erêvan, sala 1954.

9. Memê û Zînê, beyt serhatya cimaeta Kurda, pêşxeber, tekst, nivîsarnasî (bi zmanê ermenî), Erêvan, sala 1956.

10. Folklora kurmanciyê, Erêvan sala 1957.

11. Hikayatêd cimeata kurda, pêşxeber, tekst, nivîsarnasî (pêşxeber, nivîsarnasî bi zmanê kurdî û ermenî)

cilda pêşin, Erêvan, sala 1961.

cilda duda, Erêvan, sala 1962.

cilda sisya, Erêvan, sala 1969.

cilda çara, Erêvan, sala 1980.

cilda pênca, Erêvan, sala 1988.

12. Beyt-serhatyê Kurdaye êpîkyê, pêşxeber, tekst, nivîsarnasî (pêşxeber, nivîsarnasî bi zmanê rûsî, tekst bi zmanê rûsî, kurdî), Moskva, sala 1962.

13. Nîşandaîna dostya Kurda û Ermenya di nava zargotinê da, lêgerîn (bi zmanê ermenî), Erêvan, sala 1965.

14. Klamêd cimaeta Kurdaye lîrîkyê, pêşxeber, tekst, nivîsarnasî (pêşxeber bi zmanê kurdî, ermenî), Erêvan, sala 1972.

15. Oçêrka edebiyeta kurdiya Ermenistana Sovêtyê, lêgerîn (bi zmanê ermenî), Erêvan, sala 1970.

16. Klamê cimaeta Kurda, Erêvan, sala 1975.

17. Şaxêd eposa "Rostemê Zalê kurdî", pêşxeber, tekst, nivîsarnasî (pêşxeber bi zmanê rûsî), Erêvan, sala 1977.

18. Hikyatêd cimaeta Kurda (bi zmanê rûsî), Erêvan, sala 1985.

19. Meselok û xeberokêd cimaeta Kurda, pêşxeber, tekst û nivîsarnasî, Erêvan, sala 1985.

20. Bahar, berevoka zargotinê, Erêvan, sala 1988.

IV — Pirtûkên edebiyatê û veçêkirin

1. "Dermanxanê", "Ha, yanê na", pîyêsê yekperdeyî, Erêvan, sala 1932.

2. Hikyatêd cimaeta Kurda (veçêkirin bi zmanê ermenî), Erêvan, sala 1940.

3. Siva teze (berevoka serhatya), Erêvan, sala 1947.

4. Hikyatêd cimaeta Kurda (veçêkirin, bi zmanê ermenî), Erêvan, sala 1952.

5. Hikyatêd cimaeta Kurda (veçêkirin, bi zmanê rûsî), Moskva, sala 1959.

6. Beyt-serhatyê cimaeta Kurda (veçêkirin, bi zmanê ermenî), Erêvan, sala 1960.

7. Hewarî, roman, Erêvan, sala 1960. Tercume bi zmanê rûsî bi semivîsara "Û bihar hat", Moskva, sala 1978. Tercume bi zmanê ermenî bi semivîsara "Û bihar hat", Erêvan, sala 1985.

8. Hikyatêd cimaeta Kurda (veçêkirin, bi zmanê ermenî), Erêvan, sala 1973.

9. Karexezal (hikyatêd cimaeta Kurda, veçêkirin, bi zmanê ermenî), Erêvan, sala 1982.

Xebatên edebiyatê wisa jî çap bûne

1. Ktêvêd wî yên dersa da

2. Berevokê "Efrandina ewlîn", Erêvan, sala 1932, "Nivîskarêd Kurmanca"da, Erêvan, sala 1934.

1- Pionêr-endamê teşkîlata mektebvanên sovyetî.

3. Almanaxê "Nivîskarê Kurdên Sovêtyê" û "Bhara teze"da, Erêvan, sala 1932-1983.

4. Antolojiya "Nivîskarê kurdê sovêtyê", Erêvan, sala 1936 û berevoka "Şaîrê kurdê sovêtyê" da, tercume bi zmanê ermenî, Erêvan, sala 1953.

5. Berevoka "Şaîrê kurdê sovêtyê" da, tercume bi zmanê rûsî, Erêvan, sala 1956.

6. Wîsa jî di rojnama Rya Teze da" û di gelek kovar û rojnamê rûsî û ermenî da.

V — Miqalên zanistî û nasandinê

1. Guhdarya mezin li ser xevatê kûltûryê û xwendinê, rojnama Xorhrdaîn Hayastan (Ermenistana Sovyetyê, bi zmanê ermenî), Erêvan 27.3.1932.

2. Edebyata kurdayê sovêtyê, rojnama, Grakan Test (Rojnama edebyetê, bi zmanê ermenî), Erêvan, 20.10.1933.

3. Pîonêrê[1] sazbendya Kurda ye sovêtyê (derheqa S. Gasparyan da), kovara Sovêtakan Arvêst (Hunermendya Sovêtyê" bi zmanê ermenî), Erêvan, N°3, 1935.

4. Stranê Kurdayê mektebyê, rojnama "Brakan têzî" (Rojnama edebiyatî, bi zmanê ermenî), Erêvan 1.11.1936.

5. Derheqa aşiqê Kurda da, rojnama Grakan Test (Rojnama edebiyatê, bi zmanê ermenî), Erêvan, 18.2.1937.

6. Daûdê Sasûnê (derheqa mêrxasê eposa ermeniyan de), rojnama Grakan Têst (Rojnama edebiyatê, bi zmanê ermenî), Erêvan, 30.8.1939.

7. Motîvê mêrxasiyê û wetenhizyê di nava zargotina Kurda da, kovara Têgêkagîz ya Armfakê (Elamnivîs, bi zmanê ermenî), Erêvan, N° 5, 1942.

8. N. Marr û kurdzanî, kovara Xevatêd kabînêta ser navê Marr ya Ûnîvêrsîtêta Erêvanêye dewletê, Erêvan N° 3 1948.

9. Abovyan û cimaeta Kurda, Sovêtakan grakanûtyûn û arvêst (Edebiyat û hunermendiya sovetyê bi zmanê ermenî), Erêvan, N° 9 1948.

10. Abovyan, derheqa zargotina Kurda da, rojnama Sovêt Ermenîstanî (Ermenistana Sovêtyê, bi zmanê azerî), Erêvan, 23.7.1948.

11. Pûşkîn di nava edebiyatta kurdî da, rojnama Grakan Têst (Rojnama edebiyatê, bi zmanê ermenî), Erêvan, 31.5.1949.

12. Komîtas û sazbendya Kurda, rojnama, Grakan Têst (Rojnema edebiyatê, bi zmanê ermenî), Erêvan, 2.10.1949.

13. Cimaeta hişyarbûyî, rojnama Izvêstîa, (bes, bi zmanê rûsî), Moskva, 5.12.1950.

14. Peşdaçûyîna Kurda li Ermenistana Sovêtyê, rojnama, Sovêtakan Hayastan (Ermenistana Sovêtyê, bi zmanê ermenî), Erêvan, 7.12.1950.

15. Edebyata Kurdaye Sovêtyê, kovara Sovêtkan grakanûyûn yên arvêst (Edebiyat û hunermendiya sovêtiyê, bi zmanê ermenî), Erêvan, N°12, 1950.

16. Tûmanyanê me (derheqa nivîskarê ermeniyayî navdar Hov. Tûmanyan da), rojnama "Sovêt Ermenîstanî (Ermenistana Sovêtiyê, bi zmanê azerî), Erêvan, 11.4.1953.

17. Tûmanyan derheqa Kurda û di nava edebiyeta kurdî da, rojnama Grakan Têst (Rojnama edebiyatê, bi zmanê ermenî), Erêvan, 31.4.1961.

18. Edebiyata Kurda ye teremakyêye Sovêtyê, kovara Sovêtkan Grakanûtyûn (Edebiyata Sovêtyê, bi zmanê ermenî), N° 11, Erêvan, 1951.

19. Folklora Kurdaye Sovyêtyê, kovara Zrabêr, ya Akadêmya Ermenistanêye ulma (bes bi zmanê ermenî), Erêvan, N° 10, 1951.

20. Z.N. Tolstoy derheqa Kurda û di nava edebiyata kurdî da, kovara Têxêkagîz, ya Akademiya Ermenistanêye ulma (Elamnivîs, bi zmanê ermenî), Erêvan, N° 10, 1953.

21. Ji tarîqa mektebê kurdî, kovara, Sovêtkan mankovarj (Mamostayê Sovêtiyê, bi zmanê ermenî), Erêvan, N° 3, 1953.

22. Derheqa edebiyata kurdî da, kovara Lîteratûrnaya Armêniya (Ermenistana edebiyatyê, bi zmanê rûsî), Erêvan, N° 6, 1960.

23. Kurdanî li Ermensitana Sovêtiyê da, Kovara Patmabanasîrakan handês, ya Akademya Ermensitanêye ulma" (dîrok-fîlolojî, bi zmanê ermenî), Erêvan, N°2, 1960.

24. Nivîsarê mêsropî û kûltûra gelê kurd, kovara Têxêkagîr, ya Akademiya Ermenistanêye ulma (Elamnivîs, bi zmanê ermenî), Erêvan, n°5, 1962.

25. Efrandinê Sayat-Nova bi zmanê kurdî, kovara Sovêtkan grakamêtyên (Edebiyata Sovêtiyê, bi zmanê ermenî), Erêvan, N°10, 1963.

26. Erêvan, merkeza kûltûra kurdî, rojnama, Erêkoyan Erêvan, (Erêvanê êvarê, bi zmanê ermenî), Erêvan, 22.4.1970.

27. Temîye Garkî (xebera dêlêgatê civîna Yekîtiya nivîskarê Sovêtiyê), Rojnama Kommûnîst (Komûnîst, bi zmanê rûsî), Erêvan, 28.8.1974.

28. Derheqa Şaxêd "Rostemê Zalê kurdî" da, berevoka, kurdzaniyê, ya Akadêmya Ermenistanê ya ulma, Erêvan, 1975.

29. Şekspîr û kurdayatî, berevoka, Şêkspîrakan, ya Akadêmiya Ermenistanê ya ulma (Şêkspîrî bi zmanê ermenî), Erêvan, cild 5-a, 1975.

30. Dostê kûltûra Kurda (100 saliya bûyina nivîskarê ermenyayî navdar Av. Isahakyan), rojnama Grakan têst (Rojnema edebiyatê, bi zmanê ermenî), Erêvan, 28.2.1975.

31. Emrê mezin (70 salya bûyina E. Evdal), rojnama Komûnîst (Kommûnîst, bi zmanê rûsî), Erêvan, 16.10.1976.

32. Emekdarê mezin (80 salya bûyina E. Şamîlov), rojnama Riya Teze, rojnama Grakan Test, (Rojnama edebiyatê, bi zmanê ermenî), Erêvan, 28.3.1980.

34. Riya pêşdahatinê (70 saliya nivîskar Baxçoê Îsko), rojnama Lîtêratûralî sakartvêlo (Edebiyata Gurca, bi zmanê gurcî), Tbîlîsî, 4.3.1983.

35. Perek ji emrê Zaryan (nivîskarê Ermenya), rojnama Grakan Test (Rojnama edebiyatê, bi zmanê ermenî), Erêvan, 26.8.1983.

36. Şaxêd eposa Kurda ya "Dim-dim", bi zmanê ermenî, berevoka Kurdzaniyê ya, 2-a ya Akadêmiya Ermenistanê ya ulma (bi zmanê ermênî), Erêvan, 1985.

Wisa jî gelek miqale di rojnama Riya Teze de, çap bûne.

VI — Afirandinên bi zimanê kurdî

1. Lazo (Hakob Kazaryan), Serhatya Casimê Kurd (tevî E. Evdal), Erêvan, sala 1931.

2. H. Şaleyan, Rya Teze, pîyês, Erêvan sala 1934.

3. H. Sîras, Memê û Eyşê, efsane, Erêvan, sala 1935.

4. H. Şaleyan, Ser rya rêwîtyê, pîyês, Erêvan, sala 1935.

5. H. Koçar, Xecê serhatî, Erêvan, sala 1935.

6. Nivîskarê Ermeniya yê sovêtyê, antolojî, Erêvan, sala 1936.

7. Av. Isahakyan Emoyê kurd (berevoka serhatiya), Erêvan, sala 1955.

8. Destegul (nivîskarê ermenya derheqa Kurda da), Erêvan, sala 1963.

9. Sayat-Nova (berevoka şêra, tevî F. Ûsiv), Erêvan, 1963.

10. Bihara dila (ji afirandinên nivîskarê welatê başqe), Erêvan, sala 1978.

11. H. Tûmanyan, Gîkoz (serhatî, tevî E. Evdal), Erêvan, sala 1982.

Wisa jî di salên 1930 de çend broşurên doxtiyrê, matematîkê, di salên 1940 de ji bona têatra gundê Elegezê (nehiya Axbaranê) 15 piyêsên nîvîskarê Ermeniya wergerandine.

Nûra Cewarî



Kurdên nejibîrkirinê

Nûredîn ZAZA

I. Cemîlê Seyda

Min ew li Şamê naskir. Hingê çil û pênc salî bû. Peyayekî kinik, gilover lê wek xortekî livok bû. Çavekî wi di şerên wî yên bê hejmar de hatibû pûç kirin.

Ji xelkê Licê bû û di şoreşa 1925 de fermandarekî Şêx Seîd bû. Ketibû lêxistinên dijwar, gelek cî ji destê Tirkan girtibûn û çember avêtibû dora Diyarbekirê. Çîrokên wî li ser serpêhatiyên wî bê dawî bûn.

Piştî şikestina Şoreşê, ew jî hat girtin. Lê reviyabû ; dîsa hatibû girtin, dîsa reviyabû. Cara pêşîn, ji zindana Mêrdînê bazdabû. Ev bazdana ha bi vî awayî çêbûbû *"Dinya zivistan û şev bû"* ewî digot , *"di menqelê de agir bûbû xwelî, xweliyeke germ. Min xwelî danî destmalê xwe de û li paş min avê veşart û min ban esker kir ku min bibe avrêjê. Gava em gihanê, min destmal tije bi xwelî germ xist ser çav û ruyê esker. Mêrik destên xwe anîn ser çavên xwe û dest bi barbarê kir "Çavên min çûn ez kwîr bûm, haware!" Min got neha barbara wî û xwe di ser diwêr re avêt xwar û bi hemî hêza xwe, xwe ji zindanê bi dûr xist. Min riya han bin xet girt û di ve şevê de xwe gihande Derbesiyê, li ser riyê."*

Piştî vê bazdanê, Cemîlê Seyda maliyên xwe bi timamî anîbû Sûriyê û li gundekî Qamişlo bi cî bûbû. Du, se kurên wî jî pêre bûn.

Di salên sîhî de, Şêx Evdirehîm, brayê Şêx Seîd jî hatibû Şamê. Li wê, ji xwe re xaniyekî paqij girtibû û jineke Şamî jî anîbû. Hin mirîdên wî ku pez tanîn Helebê xweş pere didanê. Ango, bi firehî dijî û berikên wî ne vala bûn.

Di sala 1937 an de, gava şerê Dêrsimê dest pê kir, Şêx Evdirehîm xiste serê xwe ku çend peya bide dora xwe derbasî Tirkiyê bibe û ji bo sivikkirina barê

Dêrsimiyan, li ciyekî din li Kurdistana Tirkiyê, eniyeke din veke. Cemîlê Seyda jî yek ji canbêzarên Şêx Evdirehîm bû.

Lê peyakî din, bi navê Huseyîn Sawirlî jî xwe gihandibû Şêx û bûbû yek ji pêşmerge û şîretdarên wî.

Huseyîn Sawirlî, du sê salên wî bûn ku hatibû Şamê. Xortekî bîst û çar, bîst û pênc salî xuya dikir. Li cem necarekî dixebitî. Nizanim bi çi awayî, ewî xwe gihandibû, Mîr Celadet Bedirxan û xwe pê wek Kurdekî dilpak û kambax dabû pejirandin. Her cara ku em diçûn cem Mîr, me ew li wê didît. Wek kurê malê bi karên malê radibû, qehwe tanî mêvanan û kursî û maseyên malê cîla dikirin. Destê Rûşen xanim digirtin, ew maçî dikir û jê re digo *Tu diya min î diya min a rastî!* Wê jî, bi ken digo *Herê herê, welê ye....*

Li gora gotinên Huseyîn, di dibistana eskeriya Tirkan da dixwend. Lê ji ber kurdîtiya wî, dixwestin wî bigirin. Ew pê hesiyabû û berê ku bête girtin, reviyabû û hatibû Sûriyê. Baweriya Mîr bi gotinên wî dihat û dilê wî pê dişewitî.

Di wan salan de, min li Şamê dixwend û caran diçûm Taxa Kurdan. Di nav xortan de kurdine hêja hebûn û hevalên baş bûn. Me bi hev re bangehek (klub) vekiribû ; em li wê diciviyan û me dersên kurdî didan spor jî hebû. Para Osman Sebrî di vê xebatê de mezin bû. Carna Huseyîn bi min re dihat û bi wan xortan re dida û distend û xwe geş dida zanîn. Lê, hêdî hêdî, li ser hin pirs gotin û tevgerên wî, em ji paqijiya wî ketin şikê.

Rojekê, Sofî Mihemed şika me hîn xurtir kir. Ewî dîbû ku Huseyîn ji sefareta Tirkan derdikeve. Çû ji Mîr re got. Lê Mir, bi Sofî re xeyidî, û rabû ew ji mala xwe der kir û nexwest ku edê bête wê derê.

Sofî Mihemed ji gundekî Diyarbekirê bû. Heft heşt salên wî bûn ku hatibû Şamê û li dibistana Ruşen Xanim dergevanî dikir. Kurdekî dilşewitî bû. (Di sala 1963 an de, gava hikûmeta sûrî li min digeriya ewî nêzîkî mehekê ez di mala xwe de veşartim.)

Sofî çû tiştên ku li ser Huseyîn dizanîn gotin Şêx Evdirehîm jî. Lê wî jî ew ji mala xwe bi dûr xist û guh neda gotinên wî. Bi vî awayî şeveke havînê, Şêx Evdirehîm, Cemîlê Seyda, Huseyîn Sawirlî û çarde panzde peyayên din, tevde bi çek, derbazî sînor bûn, ketin Tirkiyê û qederek tê re meşiyan. Rêberiya wan Huseyîn dikir. Berî ku roj derkeve xwe digehînin şikeftekê û roja xwe li wê derbaz dikin.

Şeva dîtir, dîsa bi rê dikevin û xwe digehînin bênderên gundekî. Tî û birçî ne. Huseyîn dibê ku ewê here ji wan re nan û avê bîne. Diçe û qederekê dimîne.

Gava vedigere destvala ye lê dibêje ku mixtarê gund wan nasê wî ye û ewê bi xwe ji wan re xwarin û vexwarinê bîne.

Saet derbaz dibin û mixtar xuya nake. Nêzîkî sibê, repe-repek tê. Hingê Huseyîn radibe ku bazde û xwe bigihîne eskeran. Cemîlê Seyda bi bêbextiya wî dihese, radibe fişekekê berdide serê wî û wî radixe erdê. Lê riya xilasiya wan nemaye. Esker dora wan digirin û teslîm bûna wan dixwazin. Kurd li ber xwe didin û şerekî dijwar çêdibe. Gelek esker têne kuştin. Li ser vê, esker êgir berdidin bênderan û nahêlin ku tu kes derkeve.

Bi vî awayî, welatparêz û şervanên me yên canfîda, hin bi gulan, hin bi êgir dibine qurbanên bêbextiya Huseyîn Sawirlî û yên dilsafî û bêtedbîriya mezin û berpirsiyarên me.

Ev ne cara pêşîn bû û bawer nakim ku cara paşîn be...

BSX. *Şêx Evdirehîm peyayekî pir mêr bû. Tirs bi xwe çi ye nedizanî, lê, sergerm, bêhiş û bêzanîn bû. Ewî buyerên Pîranê lezandibûn û kiribû ku be haya Şêx Saîd, berî wext şoreş biteqe.*

II. *Hemze Begê Miksê*

Min ew jî li Şamê nas kir. Ji Miksê bû, nêzîkî Wanê. Di medreseyan de û piştre, li Stembolê, di Ilahiyat de xwendibû. Têkilî tevgerên millî yên salên 1910 an bûbû. Di sala 1918 an de, li Stembolê, ji bo cara pêşîn li dewleta Osmaniyan, Mem û Zîn dabû çap kirin. Ji ber vê, berê ku Mistefa Kemal bikeve Stembolê, tevî gelek Kurdên din emrê kuştina Hemze Begî jî derxistibû. Da ku nekeve destê celadên xwe, di sala 1924 an de, Hemze Beg Stembol berdabû, çûbû Misrê û ji wê jî hatibû Sûriyê.

Herwekî xwendina wî medresî bû, Hemze Beg xweş bi kurdî, tirkî, farisî û erebî dizanî. Dikarî li Şamê, bi hêsanî, ji xwe re karekî mamostetiyê peyda bike. Lê, ewî jî wek brayê min, xwest ku here cem Kurdan. Li Eyindîwerê, bajarekî piçûk ê Cezîrê, nêzî sînorên Irak û Tirkiyê, dibistaneke nû ya destpêkî hatibû vekirin. Hemze Beg xwest ku here li wê mamostetiyê bike. Li wê, ew bi xwe midir û mamoste bû. Piştî wî bi salekê, brayê min Dr. Nafiz bi xwe li Eyindîwerê bû tebîbê hikûmetê.

Di sala 1925 an de Fransiz ketibûn van deran û heya sala 1930î di navbera wan û Tirkan de pevçûn dom kiribû. Eyindîwer bi destê Fransizan hatibû ava kirin, ango ewan rê da bû ko Kurd, Ermenî, Siryanî û Kildanî ji Tirkiyê bêne wê derê û Sûrî jî hikûmeta xwe li wê deynin.

Runiştiyên bajêr, tevî eskerên fransiz û cendermeyên sûrî nêzîkî hezar, hezar û du sed kes dibûn. Zaroyên kurd ku diçûne dibistanê, li bajêr bi xwe hindik bûn. Lê nêzîkî bajêr gundê Eyindîwerê bi xwe hebû û xelkê wî tevde kurd bûn. Lê, ji kurê mixtar pê ve tu kesî din nedixwest zaroyên xwe bişîne dibistanê. Hemze Begê reben diçû ber deriyê wan û, bi kurmanciya xwe ya miksî, hêvî û rica ji wan dikir ku zaroyên xwe, bi erebî jî be, bê xwendin nehêlin. Xelk guh nedidayê. Gava ewî dît ku welê, rojekê ewê zabitê cendermê bi xwe re bir û çûne gund û ji wan re got *"Binêrin, emir heye ku hun zaroyên xwe neşînin dibistanê, ev zabitê ku bi min re ewê navê we bistîne û cezayine mezin bide we !"*

Çend roj derbas dibin, zarok dîsa nayên. Îcar, bi rastî zabitê cendermê ji çend kesan re ceza dişîne. Li ser vê, zarok hêdî hêdî têne dibistanê. Du sê sal derbaz dibin, nemaze piştî hatina brayê min, li wê derê, dibistan tije zaroyên kurd bûn. Gelek ji wan piştre çûn li Qamişlo û li Hasiçê techîz (lîse) bi xwe timam kirin û hin bi şûnda zanîngeh bi xwe timam kirin. Niha ji şagirtên Hemze Begî doktor, dermançêker, avokat û mihendîs hene.

Di sala 1940 î de, Fransizan û hikûmeta sûrî xwe ji Eyindîwerê kişand û Dêrikê, Dêriya Eyindîwerê, an a rastir Dêrika Deşta Hesinan, Eyîndiwar hingî bû xirabe. Gundê Eyindiwerê bi xwe ji wê derê rakir û çû xwe danî ciyekî ser sînorê Iraqê. Hemze Beg jî kirin midirê techîza (lise) Hasîçê. Li wê jî merîk, bêtirî bist salan xortên kurd, ereb, siryanî, asûrî û ermenî gihandin. Ez dibêm, di sala 1965 an de çû dilovaniya Xwedê.

Jina Hemze Begî jî, wek ya Ihsan Nûrî jî tirk bû, û ji Stembolê bi xwe bû. Digel vê yekê mêrê xwe berneda û heya mirina wî pê re ma.

Lozan, 28. 11. 1987

Hevpeyvînek bi Osman Sebrî re

Firat CEWERÎ

Ruknedîn taxek ji taxên Şamê ya herî bilind e, di quntara çiyê de ye. Weke çiyayekî Kurdistanê asê ye, rût e, lê bi heybet e. Ku navê Şamê ne tenê bi wa, ji rûniştevanên wê mirov dê bigotiya Kurdistan e. Piraniya Kurdên Şamê li wir bi cih bûne, li wir mal ava kirine û li wir dijîn. Di dilê hemiyan de hêviya Kurdistaneke azad heye, û li wir kalek dijî; kalemêrekî bejinkurt, a wirtûj, mêrxas û weke çiyayên Kurdistanê bi heybet ... Kalemêrekî ku jibo azadiya welatê xwe bi qasî qirşekî tiştek ji hêviya xwe winda nekiriye... Ez êvareke biharê li mala vî kalemêrî bûme mêvan. Vî mêrxasê gotinxweş, nefsbiçûk, jêhatî û xwedîtecrube geh bi gazin, geh jî bi hêrsbûn ji min re behsa paşeroja xwe, dema borî û behsa pêşeroja me kir. Ji bo ku ez gotûbêj û sohbeta vî welathezê mezin tenê ji xwe re nehêlim û bigihînim hem welatiyên xwe jî, min jê pirsî û wî jî bersîv da

-Apê Osman, te li ku, çewan ji bo çi dest bi nivîsandinê kir?

-Nivîsandin, gava rehma Xwedê lê be, Celadet xwest Hawarê derxîne, min jî dest bi nivîsandinê kir. Hevalekî bi navê Qedrîcan di hejmara pêşî de ji min re tiştek nivîsandibû, di hejmara diduwan de min jî jê re nivîsand. Wilo me dest bi nivîsandinê kir. Lê nivîsa ku min di Hawarê de kir gelekî kêm bû, Hawara ku bi alfabeya kevn derdiket.... Hingî hebekî nexweşî ketibû navbera min û rehmetî Celadet. Wî bi hinek nivîsên min leyistibû. Ji ber vê yekê ez xeyidîm û min hew tê de nivîsî. Gava ku Hawara nû dest bi weşanê kir, wê çaxê hinek camêr hebûn em gihandin hev, xwest ku em dîsan bi hev re bixebitin û ez pê re xebitîm. Wê gavê min hebekî nivîsand.

-Welê dixuye ku te li Şamê, an jî li Sûrî dest bi nivîsandinê kiriye.

-Erê, min li Sûrî dest pê kir. Ma li welêt nivîsandina bi kurmancî hebû? Me nedizanî ku kurmancî tête nivîsîn û neketibû serê me.

- Tu di bin tesîra kê û çi de mayî?

- Gava ku Celadet rehmetî dest bi derxistina Hawarê kir, di dilê me gişkan de kerameta nivîsandinê çê bû. Lê paşê Celadet ji min re pirsek jî gotibû, ew xweş ketibû serê min. Got «*Ez dibînim çavên te li çîrokên şoreş e, lêxistin... Em ferz bikin ku tu bi tenê bikaribî Kurdistanekê çêbikî. Lê ew Kurdistana ku merivek çêbike, merivek dikare xerab jî bike. Lê nivîsandin tu çi bikê ew dê ji milet re bimîne*". «Ew gotinên rehmetî di serê min de cih girtibûn û ez bi zimên mijûl bûbûm. Lê, li pêşiya me tiştek tunebû, destên me vala bûn. Destên me de tiştên ku min berê bihîstibû, *Dîwana Melayê Cizîrî* û *Mem û Zîn* a Ehmedê Xanî bû. Ji van pêve ji kurmancî me tiştek nebihîstibû. Ev jî pirsên erebî ne, yanî ne kurmanciyeke xwerû ye. Zimanê kurmancî nehatiye şuxulandin, nehatiye xwendin.

Ev jî bextê me yê reş e. Bav û kalên me gunehkariyeke mezin kirine ku bi zimanê xwe mijûl nebûne. Di welatê me de Ermenî hebûn, Suryanî hebûn, hindik bûn, lê wan bi zimanê xwe dixwendin. Me diçû bi zimanê Tirkan û Ereban dixwend. Ev hemî sûcê bav û kalên me ne, em hîn nekiribûn. Heye ku rehmetî Celadet nebiwa, dibû ku me bi xwe jî guh nedabiwa vî karê ha. Ji ber ku em ne xwediyê vê fikirê bûn, ev fikir ji wî derket, mala wî hezar car ava... û yê ku berê min jî daye nivîsandinê dîsan ew bûye. Yanî ez tercih dikim, dil dida min û ez li pey dimeşiyam. Belê....

-Tiştê ku tête zanîn te hem helbest, hem jî nesir nivîsandiye; wek li ser Napolyon, hin çîrokên lawiran, li ser hin eşîran... Bêtir kîjanê tu têr dikir, helbestê an nesrê.

-Ez benî, biçûkî min gelekî ji şiîr hez dikir. Min sê-çar dîwanên helbestan ji ber kiribûn. *Mem û Zîn* a Ehmedê Xanî, *Dîwana Melayê Cizîrî*. Û ji tirkî jî min sê-çar dîwan ji ber kiribûn. Kêfa min jê re dihat. Îcar, ji ber vê yekê, gava ku min dest bi nivîsandinê kir bi min re şiîr derket. Tiştê pêşî ku min nivîsandiye şiîr e.

-Weke ku tu jî zanî, em nivşê nû hê jî li ser riya Hawarê diçin. Tu karî ji kerema xwe re bi kurtebirî behsa dema Hawarê ya hewa edebî bikî?

-Destpêk, yanî her wekî destpêk bû tiştekî hêja bû. Lê zimanê kurmancî *Hawar* bi tenê têr nake, divê em gelekî bixebitin. Îro ku Kurdistanek çêbe, komeke

zanistî bête danîn, divê ku ew kom her eşîrekê peyayekî xwe têxe nav, bi gundiyan re, bi jin û mêrên gundiyan re bide û bistîne û pirsên kurmancî ji wan hîn bibin. Yên berê zimanê me xerab kirine xwendayên Kurdan bûn, îro jî dîsan xwenda xerab dikin.

- Hewa edebî çewan bû, têkîlî û danûstandinên we nivîskarên Hawarê?

- Ezbenî pêşî bû. Ziman bi dewra mirovekî pêş de naçe, çend zik jê re dixwaze.

- Gava ku mirov dibêje «Hawar» çend nav têne bîra mirov. Wek Celadet Bedirxan, Osman Sebrî, Nûredîn Zaza, Cegerxwîn û Qedrîcan. Dan û standinên nav van kesan çawan bûn, we bi çi awayî alîkariya hevûdu dikir?

-Welehî danûstandinên me li gel hev ne evqas baş bûn, danûstandinên me ne xurt bûn.

- Sedem çi bûn?

- Sedem bêaqiliya me bû. Di warê siyasî de em her yek bi awayekî difikirîn. A niha tu hinek nivîsarên min bibînî, tu dê bizanibî ku ez bi gelekî ji wan dûr im. Yanî hinek ji me weke berê difikirîn, hinekan ji me jî nedixwestin ku weke berê bifikirin. Ev bû û zêdeyî vê jî ez bawer im ne durust e ku em tiştekî bipeyivin, ez naxwazim....

- Çap û belavkirina Hawarê çawan bû, we alîkarî ji ku digirt?

- *Hawar* pêşî bi alîkariya milet derket. Paşê şer dest pê kir. Gava şer dest pê kir, hingî alîkarî bi *Hawarê* re jî kirin. *Ronahî* jî derdiket, lê, *Ronahî* bêtir cih dida nûçeyên sîyasî. Mimkûn bû ku zêde pêş de biçiwa; lê pêyayên me tunebû, milet nedixwend. Kesên ku me ji wan re dişandin jî nedixwendin. Yanî mîna ku tu ji yekî re nivîştekî çêbikî û têxî stûyê wî, ma ew êdî wê nivîştê bixwîne? Yê me jî welê bû.

- Alîkariya aborî ji ku dihat?

- Alîkariya aborî hinek aboneyên me hebûn temîn dikirin. Xwendayên me di *Hawarê* de bi şûn da bûn. Miletê me negihîştibû, zimanê xwe hîn nedibûn. Ji ber vê yekî jî di warê aborî de me hebekî tengasî dikişand. Paşê kesên ku binivîsandina jî gelekî kêm bûn. A niha gava ku mirov *Hawarê* dixwîne, mirov dibîne ku nivîskarên wê gelekî kêm bûn.

-Ew nivîsanên ku ji Hawarê re dihatine şandin, berî ku bêtine weşandin, kesî ew di çav re derbas dikirin?

- Na.

- Kurdiya wan jî her weke xwe diman?

- Belê, herkesî gorî xwe dinivîsandin, bi nivîsên wan nedihate leyistin.

- Belavkirina Hawarê çawan dibû, ew bi tenê li Sûrî dima, an sînor gav dikirin û digihîşte pêrçeyên Kurdistanê yên din jî?

-Ez bawer im, ku çend nisxe digihîştine Iraqê, çend nisxe dişandin Bêrûdê û Qamîşloyê û dawiya maye jî li vir, li Şamê diman. Ne min got, milet yên ku digirtin jî nedixwendin. Ew hînî xwendina zarê xwe nebûbûn û nedixwestin hîn jî bibin. Îro! îro xwendayên me naxwazin hînî zimanî xwe bibin ! Li vir ez belaş dersê didime wan. Tenê nezan tên dixwînin, lê yên zana nayên, natine; gava dîtine ez ji jêr de dest pê dikim, çûne. Wan dixwestin du ez ji jor de dest pê bikim. Jor de nabe. Jêr de divê mirov dest pê bike. Ku mirov jêr de dest pê bike, mirov dê pêş de biçe. Zimanê me nehatiye xwendin, nehatiye nivîsandin, pir gotinên kurdî hene ku me nebihîstine. Ez, hê jî yên ku têne ba min dersê dibînin, ji wan hînî gotinên kurdî dibim. Ew çend zimanê me bi şûn de maye. Ev jî ne gunehê me tenê ye, gunehê bav û kalên me ne. Îro, xwendayên me yên ku xwe welatparêz dizanin, bi zimanê xwe naxwînin. A niha ez dizanim merivin hene li ser hin şaxan doktora kirine, çar-pênc zimanên ewrûpî dizanin, lê bi zimanê xwe nizanin. Ev ji bo me gelekî şerm e, lê camêran (!) dikin. Pir tiştên giran me Kurdan kirine, ji bo vê yekê em bi şûn de mane. Em negihane warê ku em karibin mafê yên ku mafê me dixwin Tirk in, Ereb in, Ecem in; lê xwendayên me berên xwe dane Amerîka , bi Amerîka re diewitin. Amerîka pîs e, dewleteke koledar e, lê pîsiya wan bi hindiktirî xelkê gişî digihîje me. Yên ku pîsîtiya wan digihîje me Ereb, Ecem û Tirk in. Çima em nikarin bêjin ew pîs in? Hinek ji me bûne pêyayên Ereban, hin bûne yên Tirkan, û hin jî yên Eceman. A ev e rewşa me ev e...îcar li ser vê min demekê tiştek nivîsî bû.

Ez dê ji te re bixwînim, belkî tu vî karê min xweş nas bikî, bê ev karê min çi bû ye.

- Baş e apo, em dîsa vegerin ser Hawarê. Gelo ronakbîrî di nava we nivîskarên Hawarê de çawan bû? Kesî ji we bi zimanên biyanî; mîna îngilîzî, fransizî û almanî dizanîbûn hebûn?

- Yanî ji bo îro gava ku em bixwazin bipeyivin, di warekî teng de bû. Yên ku dixwestin binivîsin gelekî kêm bûn. Nûredîn Zaza bû, Cegerxwîn bû, ez bûm,

Qedrîcan bû..... Yê min seriyekî dirêj min nenivîsî, ez û Celadet bi hev ketibûn. Paşê min dest pê kir û ez pê re meşiyam. Ronakbîr ne ronakbîr em ev kes bûn.

- Haya we nivîskarîn Hawarê ji edebîyata dinyayê hebû? Ji klasîkên rûs, fransiz, almanî, amerîkî....

- Ez benî, em di warê ziman de, gelekî bi şûn de ne. Ziman nû dest pê kiribû. Em nikarin idia bikin û bibêjin ku me tiştek ji edebiyatê fehm dikir, an me bi edebiyate dizanibû. Yanî me gişkan nû dest pê kiribû. Em hêvîdar in ku ji îro şûn de xortên me bi zimanê xwe mijûl bibin û edeba kurdî pêş de bibin.

-Yanê haya we zêde ji edebiyata dinyayê çênedibû û we nedixwend?

-Na, eger hebû jî me nedikarî bi kêrî zimanê xwe bianiya. Min bi xwe edeba Ereban xwendibû, ya Tirkan xwendibû. Min sê-çar dîwanên wan ji ber kiribûn. Lê vê ez têr nedikirim, diviyabû em hê zêde bixebitiyana. Bîrê ku em tê de dimeşîyan jî ji me re ne musahît bû. Em di bin destên xelkê de bûn. Gava ku merivek 52 salî be û 18 caran têkeve hepsê, dê çi tê de bimîne? Ez 18 cara ketime hepsê. Carekê hakimekî ereb ji min re got *«Ev cara çendan e ku tu dikevî hepsê»* Min got *"ev cara min ya 17 an e"*, hingê ez tenê 17 caran hatibûm girtin. Hakimê ereb got *«Xwedê mala te xerab bike.* «Min got, bila Xwedê mala we xerab bike lawo! Kengî min hatiye li deriyên hepsên we xistine, min gotiye mala min tune ye, cih bidine min? Hun tên min digirin û davêjin hepsê û di ser de jî mala min xerab bibe! Bila mala we xerab bibe! Gava ku min ev gotin kirin, mêrik keniya...

- Di dema Hawarê de rewşa we ya siyasî çawan bû?

- Dîsan welê, weke niho bû; em ne ji hevûdu re bûn.

- Ew ne ji hevûdu re bûyina we tesîr li jiyana we ya edebî dikir?

-Tabî dikir. Ezbenî, aqilê me ne bi hev re bû. Ên ku beg û axa bûn jî aqilên wan ne bi hev re bûn û yên ku pale û gundî bûn jî aqilên wan ne bi hev re bûn. Em dûrî hevûdu bûn.

- Sedem çi bû, ji bo çi hun dûrî hevûdu bûn?

- Sedema xwe ji bo ku em negihîştibûn. Çima miletê kurd bi şûn de maye? Ma em ji ku hatine? Em ji Ewropa hatine? Em jî ji nav miletê kurd derketine! Ez lawê axayekî bûm. Merhema axa (!) Ez di nava aqilê axan de rabûm. Paşê ku min

pîsiya wan dît, ez ji wan bi dûr ketim. Yên mane jî kurên axa û began bûn. Nedixwestin ku milet têkevin nava xebatê. Ji xwe li ser wê ez û ew ketine gewriya hev. Min got, divê milet têkevin nava xebatê; wan gotin, milet bi siyasetê nizanin. Min got, me jî nezanîbû, em hîn bûn. Nedixwestin, wan dixwestin ku milet kor bimîne. Dixwestin ku ew di pêşiyê de bin, milet li dû xwe bikişînin û keda wan bixwin.

Ji ber ku bav û kalên me jî holê kiribûn, dixwestin li ser riya bav û kalan bimeşin.

- Wek ku em dizanin di ser Hawarê re gelek sal derbas bûn. Ta bi niho jî tu nivîskarên Hawarê ji me re tu eserên edebî, ku em bikaribin wergerînin zimanên biyanî û pê serên xwe bilind bikin, nehiştine. Gelo ji bo çi?

- Na, tiştekî welê tune ye. Ez bi xwe jî tiştekî ku mirov bikaribe wergerîne zimanê biyanî û ê serên xwe bilind bikin, nabînim. Maalesef, em nikarin li ber xelkê serên xwe bilind bikin. Em nedixebitîn, em ne ji xwe re bûn. Bav û kalên me peyayên xelkê bûn... Me jî çavên xwe vekir, me dît ku her kes şerê yê din dike. Welehî me tiştek nekir. Hê em kurên peyayên ku xulamtiya xelkê dikirin. Em niha rabin, derewan bikin û bibêjin, ku me tiştek kiriye, na. Gava ku em nivşê nû û yê kevn bidine ber hev, bi a te çawan e; çi ji nivşê nû dikeve serê bikin.

-Di warê xebata edebî jî de welê ye?

-Ji xwe, xwe li zimanê xwe nakin xwedî.

-Kesên ku îro ku dinivîsin, dikarin çi bikin?

-Yên ku îro dinivîsin, hê nû dest pê kirine. Hê gelek wext ji wan re dixwaze ; meriv zû nikare ziman pêş de bibe. Ev pêncî sal in ku ez bi ziman re mijûl dibim, hê jî ez negihîştime tu deverê.

- Nifşê nû yê ku dinivîsin, dikarin çi bikin?

- Dikarin tiştên kevn bixwînin, nas bikin, jê fikrê bigirin û li ser zêde bikin.

-Weke me berê jî got, di her warî de xwenûkirin heye, civat tê guhertin û tiştên nû derdikevin. Di gel wê, rewş û jiyana mirov, awa û babetên edebiyatê jî têne guhertin. Bi a te divê ku edebiyata kurdî, an jî helbesta kurdî îro çawan bê nivîsîn? Bi awayê klasîkî, an bi awayekî nûjen?

-Divê her du alî jî hebin. Divê helbesta bi wezin û kafiye jî hebe û ya hur û serbest jî... Divê ku mirov herdu babetan jî binivîsîne. Gava ku mirov aqilê xwe bide ser nivîsandinê, nivîsandin rehet e. Ez ne bawer im ku her mirov bikaribe vê bike, hin kesên ku qabîliyeta wan hene dikarin. Û ew celeb kes divê ku texsîr nekin. Gava texsîr bikin, gunehkariyeke mezin dikin.

Îro divê ku em fedî bikin, ku em miletekî bê ziman in. A niha pir xortên me hene, xwenda ne, bi erebî jî xweş dizanin, dibêjin «*Em dê ji miletê xwe re xizmetê bikin*» lê naxwazin hînî zimanê xwe bibin. Û ez dê çawan ji wan bawer bikim? Zanayek dibêje «*Gava ku tu bixwazî dereca welatparêziya mirovekî hîn bibî, binihêre bê ew çikasî bi zimanê xwe ve girêdayî ye*». Kesekî ku ji me bi zimanê xwe ve girêdayî be, nîn e; kêm in, pir kêm in...

- *Çi ji xortên nû, yên ku dixwazin edebiyata kurdî nûjen bikin, dikeve serê te?*

- Baş e, bila bikin, ma kî li pêşiya wan sekinî ye? Ma kesek rê li wan digirin? Ziman zimanê me gişkan e? ne yê yekî an yê diduwan e. Gava ku ji bo zimanê xwe bixebitin qenciyê bi xwe dikin. Ku ji bo zimanê xwe nexebitin ji wan re kêmasiyek e. Lê heyf e, yên ku heya bi niha bi ziman mijûl dibin gelekî kêm in. Divê ku gelek mirov di vî warî de bixebitin, da ku çend hebên xurt û jêhatî ji nav wan derkevin. Ta bi niha mecal tune bû, niha li Ewropa hinek birayên me bi vî karî re mijûl dibin. Wekî din li ku heye? Li Iraqê nahêlin, li Iranê nahêlin, li Tirkiyê nahêlin, li vir nahêlin. Vêca em di vî warî de ne. Lê hê jî hin ji peyayên me dixwazin bi destên Ereban, Eceman û Tirkan welatê xwe azad bikin. Wey xwelî li serê me be!

- *Bi a te ji bo pêşdexistina zimanê kurdî çîrok û roman, an helbest...*

- Ezbeni, çîrok baştirin ji helbestan. Çîrok bi zimanê rastesere tê nivîsîn. Helbest ne welê ye. Vêga gelekan ji xortên me çavên xwe berdane nivîsandina helbestan, ev ne tiştekî hêja ye, divê nivîsên rastesere bêne nivîsîn. Belê, helbest tiştekî ji edebê ye, lê ne tevayiya edebê ye. Divê ku mirov bizanibe bi zimanê xwe binivîsîne, lê nizanin. Hemû ji min re helbestan çêdikin. A wê roja ha yekî bîst-sî helbestê xwe nîşanî min dan, lê ew jî kurdî ne. Aha Cegerxwîn heşt dîwanên wî hene, ew jî dixwazin mîna Cegerxwîn bibin. Cegerxwîn heşt dîwanînên wî hene ,lê Cegerxwîn qet nizanîbû rasterê binivîsanda. Tiştên ku rastesere nivîsandine jî, hemî şaş in. Paşê helbestên ku nivîsandine jî hemî ji hev dizîne. Pirsên ku ji Ehmedê Xanî an ji Melayê Cizîrî stendine jî hemî ew ne di cihê wan de bi kar anîne. Belê, wezin û kafiye di helbestên wî de temam in. Tinge-ring, bidine zimanê xwe. Ez

nivîsên we yên ku dikevin destên min, dixwînim, baş in, cewher di we de heye. Lê bê westan divê hun her bixebitin.

* * *

Wê şevê heta bi nîvê şevê em peyivîn. Di rabûnê de her çiqas min nehişt jî, dîsan apê Osman bi min re rabû heya devê derî. Li ber derî jî destên me di destên hevûdu de, em bîstekî li ser lingan peyivîn. Dû re, bi xatirxwestinê re ji min re got

- Bi hev re bixebitin, neyartî û dijminatiya hevûdu nekin û nebin peyayên xelkê. De, Xwedê bi te re be!

Şam, 1987

Niştimanê Min

Ev bûn hezar sal ku jana zirav
Wê jana kambax kirêt û bêbav
Bi kulekî reş sînga te hingaft
Ji te peritand wê cerg û hinav.

Tu bû pelîse di destên qirêj
Bûyî çar kerî parve bû ji mêj
Ji ber ku pîsan lîwana te girt
Heya bi îro hişyar nebûy hêj.

Tu bûye zergûn ji ber hejarî
Her roj li ser te stem dibarî
Axa te ya çak tev zîv û zêr e
Kurd mane bêtaw ji ber zîvarî.

Tu wek çivîka ketî devê mar
Kesên di nav te dikin zarezar
Cîhan dibîne vê rewşa dilsoj
Ji bo te nabît kesek bendewar.

Hinek kurên te ji dilekî pak
Dikin ji xortan pir hêviyên çak
Ew bawer dikin ku bi destên wan
Rojekê bighên sibeke ronak.

Lê heyf tên xapîn xortên xwendevan
Naxwazin bo te biborin di can
Bi raman ketin nav destên xelkê
Holê nikarin azad kin Kurdan.

Divên rêya ji xelkê hîn bin
Li ser rêya wan bi xelkê hînin
Di ber siya wan bê tirs bimeşin
Bê west û mirin xudan zemîn bin.

Ev celeb mirov gelek bêkêr in
Yekcarî qelsok her çav li jêr in
Nikarin tucar ew bibin piştmêr
Wek rovî wan çav li destê şêr in.

Şêr çi dikare ku tu nebî şêr
Zikê xwey birçî duqat nekî têr
Tenê şêr karin kesên qels bixwin
Direvin li pêş mêrxasên camêr.

Nizam çi gavê vê felsefa han
Têxin serê xwe xortên me Kurdan
Nebin pêlîsê di destên xurtan
Di nav te bibin bi rûmet û şan.

Ez her sond dixwim bi zinarên te
Tucar xwe nadim rex neyarên te
Heya ku xweş bim serbilind bijîm
Piştmêrî bikim bo zîvardîn te.

Bijî her bijî niştimanê min
Ji bo te gorî mal û canê min
Dê bibim pandî ji bo axa te
Piştî bimirim sê lawanê min.

Osman SEBRÎ
9. VII. 1958

Şaîrê bergiriyê Şêrko Bêkes

Hiner SALIM

Şêrko kurê şaîrê bi nav û deng Fayiq Bêkes e. Li bajarê Helebce, li 2 ê gulanê 1940 li dayika xwe bûye. Ew û bab û dayik û du xuşk, li maleka tenya menzel û heywanek dijiyan. Wê malê ji bilî destekê nivînke û navê tîrê û sindoqek ji erdî tiştekî dî tê de nebû.

Ev hevpeyvîne li meha îlona 1988 li Îtalya me li ser kasetê tomar kir, û nûke bi destkariyeka pir kêm pêşkêşî xendevanên kovara Hêvî dikim.

— *Kak Şêrko, yadigarêt bavê te çi li bîra te maye ?*

— Hindik tiştên kêm wekî xewna têne bîra min. Ew mamoste bû li xwendegeha Helebcê, car car li rojêt sextêd zivistanê ez digel xwe dibirme mal. Tiştekî dî ketiye tev xeyala min, ew e gava ez li gel xwe birime bajêrê Slêmaniyê ji bo çila şînî û matemîna Emîn Zekî Beg. Koreka şiîrî hatibû sazkirin, Bêkes jî beşdar bûbû û şiîrêd xwe xwendin, gava niha ez hizir dikim ev yadigar û rodanêt jiyana wî li alîkî û ew tiştên min ji dayika xwe û li dostên bavê xwe bihîstim bûne binaxa dirust bûna hesta şiîrî di giyanê min de.

— *Te kengî dest bi şiîr nivîsînê kir ?*

— Her li jiyana herzekariyê û lawîniyê min dest da şiîr nivîsînê. Baş li bîra min e rojekê ez çûm ji bo bînîna mamosta Goranê şaîr, da şiîrka xwe pêşana wî didim, min jî ber deriyê daîra wî kar lê dikir rawestam, heta hate der. Kengî hat serrast şiîra xwe derxist û destê xwe ji bo wî dirêj kir, ewîş ez dinasîm, gotî *"Ha ! Kurrî baş, çît gerek e?"*. Gotim *"Ez kurê filan kesî me, û şiîran dinivîsim."*. Gotî *"Ha! Tûş şiîra divivîsî?"*. Gotim *Belê û dixwazim li vê şiîra min binêrî."*, wî jî daxwaziya min red nekir û berçavka xwe danî û lê nêrî, gotî *"Xerab niye, lê belê..."*. Ji bilî ve rodana biçûk, yekem şiîrim li nawerasî salen 50 ê li govara "Jîn"

ê hate belav kirin. "Jîn" hemû heftiyê derdiket, bi tenê pencere bû ji bo me. Li derketina wê govarê ji bilî Pîremêrd şaîr Goran jî rolek tê de hebû. Paşî dîsa, min şiîrên xwe li ser rûpelên govara "Rojî Nuwê" belav dikirim, ku Kameran Mukrî serperiştî dikir û 12 jimare lê derçûn , min di çend hejmarên wê de şiîr belav kirin. Piraniya wa siyasî bûn û li ber kem û kurtiyên hunerî min li yekem dîwana xwe da jî belav nekirin, belam êsta eger serceme karên xwe çap bikim, misûger wan şiîra jî didanime ser.

— *Te gelek caran bajarê hêlay û çûyî nav pêşmergan, belê cara yekê kengî bû ?*

— Li naverasta salên 60 ê bû, ku Ebdurrehman Arif dest bi girtina niştimanperwerên kurd kir, dixwest min jî bigrin, ji ber hindê şar min bi cih hişt û çûme navçeyên rizgarkirî û li ser şaxên Kurdistanê. Li wir çend şaîrên din min nas kirin, yek ji wan Hejar bû. Van hemû rodana ezmûna şiîrî ya min dewlementir kir. Heta rêketina 11 ê adarê 1970 û dawiya wê jî li rojnama "Birayetî"ya Partiya Dêmokrata Kurdistan min kar kir, hingî li Bexda der diket.

— *Ez wesa dizanim gava beyana Ruwange derçû tu jî yekek bûy ji îmzakerên wê ?*

— Belê, digel Husên Arif, Mem Botanî, Celalî Mîrza Kerîm û Cemal Şarbajêrî, ez jî tê de bûm. Belavkerên beyana Ruwange nivîserên law û xudan îdeolojiyên neyek û cihê bûn, lê belê hevreybûn ji bo tazekirina edebiyata kurdî. Her li Bexdayê 3 hejmarên Ruwange derçûn, Hêviya me rizgarî bû li naveroka teqlîdiya edeba kurdî, û daxwaza me peydakirina zimane derbirînên nû.

— *Baş e Kak Şêrko, nebûna zimanekê yekgirtiyê kurdî û danana wî zimanî çawa dibînî?*

— Nebûna yekzimanê standard, nîşana karêsata parçeparçebûna axa Kurda ye, lêkdabirîna gelê kurd e. Peydabûna wî zimanê ya girêdaye bi dirustbûna kianê siyasiyê Kurda, nêzîkbûnê û muturbekirin e bi hevdû. Bi dîtina min ku reng e digel ya te neguncêt ew e ku zimane îro li Kurdistana Başûr (Soranî) bi kar tê, bibe binaxe ji bo zimanê standard, ku li ser demê Babana edebiyata kurdî girtiye destê xwe. Çûnke li hingî heta nihû yê vejiyay û nek her şiîr belê berhemên edebî û zanîstî jî yêt pê hatine nivîsîn. Ev jî ne sextgîrî û ne herêmgîrî ye, lê dîsa jî ne biryar e belkî rey e.

— Li şaîrên cihanê yarê şiîrên kî yî ?

— Diviya yekser bêjim ku min ew şiîr bi tercuma erebî xwendim, çûnke ji bilî kurdî, erebî tenya ziman e ku pê diaxivim. Şiîrên Lorca yî spanî pirr pêm xweş im, gava şiîra wî dixwînim dilê Spaniya dibihîzim, behna axa wê derê dikim. Her weha yarê têkirayî şiîra Amêrîka Latîn im. Li Ereba jî dostê şiîrên Mehmûd Derwêş im û Nîzar Qebbanî.

— Belê dax, Mehmûd Derwêş wek helwêst digel Kurda pêçevaniya şiîra xwe ye ?

— Axirême li ser şiîra axiftîn, eger...

— Lê ji nav Kurda hez li şiîrên kî dikî ?

— Ji şaîrên vî serdemî Refîq Sabîr, Letîf Helmet, Ebdullah Peşêw û Hesîb Qeredaxî. Li Kurdistana Îranê Siwarey Îlxanîzadeh, belê mixabin kêm jiya û li paş xwe komeka şiîrên pirr ciwan hêlan. Hindî şaîrên Kurdistana Bakûr in ji ber qedexekirina ferheng û çanda kurdî tûşî dijwariyêt giran bûn. Lê belê ew şiîrên ji vî alî û ji zemanên cuda de hatine belavkirin, pirsa karin û heta mirov nikarêt li axaftine bijar bike. Herwek şaîrên kurdî li Sovyêtê. Helbet mebesta min xemla hunerî ye ne ku jiyanê şiîrî, li şaîrên bi kurmanciya jorî dinivîsin yek ji başe şaîrên law Muyyed Teyîb e. Ez jî kurmanciya jorî baş nizanim lê belê dixwînim û lê jî tê digihim.

— De ji bo me tiştekî dibêjî li ser Yekîtiya nivîskarên Kurdistan, a ku li çiyayêd Kurdistana Başûr û di nav pêşmergan de hatiye damezrandin ?

— Ez ji destpêka 1984 a çûme çiya, berî ez biçim Yekîtiya nivîskaran hebû û xudanê du govaran bû "Nûserî Kurd" û "Gizing". Ewên ev Yekîtî damezirandin Ehmed Dilzar, Hemey Hemebaqî, Refîq Sabîr bûn. Yekîtiya nivîskaran li barûdûxeka gellek dijwar, li jêr bombardumanan, lê dîsa karekî baş bicih anî. Ne ku ji jimartinê, bi tenê ji bo gotinê, dê hindek nimûna bêjim, ew kitêbên ku heta niha hatine çap kirin û belav kirin yek ji wan kitêba Celîlê Celîl e "Serhildana 1880", Geşta (gerana) Rich, kurte çîrokên Yilmaz Güney, biyografiya Yilmaz Güney hatine wergerandin bi kurdî û çap û belaw bûne.

— Te navê Yilmaz anî, ez bêjim te şiîrekê ji bo wî nivîsî ?

— Belê, yeke ji wan şiîran ku li hemû koran da dixwînim.

— Gelek spas Kak Şêrko û hêviya serkewtinê ji bo te dikim.

BE YEKEWE

Êwareyek
Kwêrêk û kerrêk û lalêk
Heta wekû çend seatêk
Le pak yek da le ser kursî new baxçeyêk
Qinc û qît û lêw be bize danîştibûn
Kwêreke be çawî kerreke eybînî
Kerreke be giwêçkey laleke eybîstû
Lalekeş be cûlanewey
Dem û lêwî herdûkiyan da tê egêy
Her sê kîşiyan be yekewe le yek kat da
Bonî gulekaniyan ekird

CEJN

Hewrî layî eme le hewrî
Hîç esmanêkîtir naçe
Ke daekat û ebarê
Lê çiwar lawe awî çawanî edizrê
Xakî ême le hîç xakêkîtir naçê
Xuy yek dile û
Hemû rojê
Be çiwar xaç da daekurtê
Dayikî ême
Le hîç dayikêkî tir naçe
Le yek sal da
Sikî ew çiwar çar esûtê
Yek kes man çiwar car ekûjrê
Bo ye rojê le ahengî em xwêne da
Çiwar cejn ekêyn be cejnê!

XAK

Destim bird bo çilî darê
Letaw azar liq daçilekî
Ke destim bird bo liqeke
Nawqedî dar
Kewte hawar
Ke baweşim kird be qed da
Xak leriyewe le jêr pêm da
berd nalandî
Em careyan ke danewîm
Xolim helgirt
Gişt Kurdistan zirîkanî

KWÊR

Berxoleke
Diway girmeyek
Diway roştinî firokeke
Demî gêra
Ne giwanî bo bînrayewew
Ne ranî bo dozrayewew
Ne çuyşewe ser aweke!!

XEM

Mangî Newroz sikî pirbû be agirê
Ke agir bû "ba" rayjend û
Ke gewre bû çiya xwastî û
Şewyan lê bû
Wextî şewîş balay kird û
Bû be sanze Giryan Xwastî û her ew roje
Seat yanze
Yanze... Yanze
Xemêkiyan bû
Qij reş, çaw reş
Gewre... Gewre
Ewendey şarî Helebce...

Hevpeyvînek bi Şahînê B. Soreklî re

Mehmed UZUN

- *Ji kerema xwe, tu dikarî hebekî behsa jiyana xwe, xwendin û karê xwe bikî?*

- Di sala 1946 an de ez li gundê Mezrê, li başûrê rojavayê Kurdistanê, hatim cîhanê. Bavê min, M. Elî Soreklî, ber destpêkirina şerê cîhanî yê duwem ji gundek Soregê (Sêwreg) hatiye ev beşê welêt. Diya min, Nayla Bozanê Ebrûş, li wir bûye û meriyên wê îroj li her du hêlên şivên hêsin bi cîh dibin.

Ez heft salîn, bê ku bi zimanê erebî bizanibim, ketim xwendegeha bajarê Kobanê. Navê bajêr yê mîrî Eyn il Ereb e. Dû xwendina heft salan, ji wir ez çûme bajarê Helebê, li wê derê min xwendina lîsê di sala 1965 an de kuta kir. Di dawiya wê salê de bavê min ez ji bo xwendinê şandim bajarê Viyenê. Ta dawiya sala 1968 an min li bajarên Viyenê, Graz û Mûnix (Munich) zimanê almanî û dûre beşê rêzanî û aboriyê dixwend. Bo sedemên aborî û yên din, ez di dawiya wê salê de hatim Awistralya û ji wê demê şûn ve min piraniya rojên xwe li bajarê Sydney derbas kirine. Di destpêkê de ez bi karê makînêstiya trimbêlan mijûl bûm, dûre min biryar da ez dîsa vegerim zanîngehê. Di salên xwendinê de ez bi roj diçûm zanîngehê û bi şev di klûban de, yan wek şofêrê taksî dixebitîm. Di dawîya sala 1977 an de min xwendina xwe bi şehadeyên *Bachelor of Arts û Diploma of Education* kuta kir. Piraniya kûrsên xwendina min li ser zimanên înglizî, almanî, rêzanî û pedagojiyê bûn. Ji wê demê û vir de ez bi karê şîretvaniya hînkirina zimanan û mamosteyiyê mijûl dibim.

Ji hêla siyaseta Kurdistanî de, ta hatina Awistralya ez endamê partiyek Kurdên Sûriyê bûm. Li Awistralya, salên di zanîngehê de min tev grûbên komûnîst xebat dikir, lê îroj ez ne endamê tu partiyan im; her weha danûstandina min bi grûbên komûnistên Awistralya re tune. Ez ne endamê partiyek kurd im, ji lewra,

a) rêxistinek li holê tune, ku îroj bi rastî têkoşîna Kurdistaneke yekbûyî û serbixwe avêtiye ser milê xwe; b) di rewşa îroj de ji bo min, wek nivîskarek kurd, serxwebûna fikrî zor girîng e. Dema mirov endamê partiyekî be, pêwîst e mirov encam û mebestên partiya xwe bide ser yên xwe; wisa jî mirov nikare êdî serbest binivisîne. Li milê din danûstandina min bi komûnîstên Awistalya re tune, ji lewra, a)ji dest wan nayê der tu kelkê bigihînin têkoşîna gelê kurd; b) di rêzaniya Awistralya de giraniya wan tune û ew karkerê welêt temsîl nakin. Ji roja damezrandina Komala Kurdên Awistralya, sala 1979 an ta sala 1983 an ez serokê (di sala dawiyê de sekrekterê) vê komelê bûm. Ta wê demê ez her weha berpirsiyar û xebatkarê bernameyek radyo bûm, ku sal û nîvekê li ser pêlek FM heftê carekê dihate pêşkêş kirin. Ji îlona 1985 an û vir de bernameya weşîneka kurdî bi awayek mîrî di radyoya komên etnîk de mehê carekê tê ser pê. Ez niha berpirsiyarê wê weşînekê me.

Tenê xûşkeke min li Awistralya dijî. Endamên malbata min hemî li welêt in. Ez di sala 1971 an de li Awistralya zewicîm û îroj du zarokên me hene.

- *Tu di van salên dervayî welêt de çi hîn bûyî, te çi stand û çi wenda kir, tu dilşa yî, dilşa ninî?*

- Di van salan de ez bêtir hîni kurdbûna xwe bûm. Roj bi roj, ta niha, haya min bêtir û bêtir dikişe ser, ku çiqa neheqiyek bê hempa li netewa me bûye. Li xeribiyê em pê hisiyan, ku li hin şûnan qedexe ye mirov li segekî, yan lawirek din xe, dema ku li welatê me cendirmeyek dikare li her derê û dema ew bixwaze mirovên me bide ber şivan. Li welêt em fêr bûn, dema me gelek tişt pejirandibûn, lê li derve me di jiyanê de dît çiqa em hatine êşandine, em fêr bûn çawa jiyana netewa me hatiye qedexe kirin.

Li milê din, dema me fersend dît, em bi kesên ji hin welatên rojava û rohilat re rûnin, me dît, ku her kesek bir her tiştî bi netewa xwe bawer dike, me dît ku ew baweriya me ya di derheqê bratiya navbera gelan de tenê ji rêsandina xewn û xeyalan e, em fêr bûn, ku danûstandina aborî, sûda bazirganî rolên mezintir ji bratiya netewan de dilîzin. Ez hîn bûm, ku tenê xwediyê brînê jana brîna xwe dizane, ku tenê ewê bikaribe li dermanê brînê bigere. Ez fêr bûm ku partiya min ez hişar kiribûm, lê ji dest nehatibû der cîhanê û jiyanê bi awayek qenc û realîst bi min bide nasîn. Ez hîn bûm, ku mirov bê gelê xwe ne kese e, ku kesê Kurd çiqa xwe ji jan û êşa li welêt bi dûr xe jî, dîsa di bin bandûra wê janê de dimîne. Ez şahiya xwe di nivîsên xwe de û di xebatên xwe yên din de dibînim, lê ta roja ku welatê me bindest bimîne şahiya bi tevayî, çawa ji bo bi milyonan Kurd tune, her weha ji bo min jî nayê.

Piraniya zanebûna min, çiqa hindik e jî, ji xwendinê bêtir ji danûstandina bi mirovan re hatiye. Di van bîst û du salên derve de min ne tenê bi endamên hejmarek ne biçûk ji neteweyên cuda, ji gelên yugoslavî û polendî de bigir, heta yên Amerîka û Afrîqa, danûstand, lê fersend kete dest ku ez kesên tirk, ereb û fars nêziktir û baştir binasim. Li welêt mirov pirr caran li hemberî wan fedok e, bi tirs e, bi guman e. Bi baweriya min ji bo ev sedem piraniya Kurdan her dibin kurdperwer dibin komunîst, ji lewra tenê bi şertên ramanên partiya komunîst ya welêt kurdbûna Kurdekî têt pejirandin, ango tenê bi van şertan mirovek ereb, tirk, yan faris ta demek nêzik kurdbûna hevwelatiyek xwe dipejirandin. Ew tirs û sawa rojên xwendegehê, bi taybetî xwendegehên li dervayê Kurdistanê, dema hevalên me em bi tiliyan raber hevûdu dikirin, navên ajanên siyonîstan li me dikirin, em veqetîxwaz dinasandin, bi salan hêlîn di kûraniya hebûna me de çêkirin. Dû salên drêj ji dest min hat der ez xwe ji wê tirsê azad bikim.

Ji hêla disîplîna şexsî de salên min yên li Otrîş û li Almanya ez fêr kirim gelek tiştan û min pirr ji hin nivîskarên alman yên wekî Grass, Böll, Weiss û Brecht hez kir. Gelê alman ji aliyê edebiyat û zanebûnê de gelek kesên hêja pêşkêşî cîhanê kirine, ku rolek gewre di pêşvebirina ramanên mirovtiyê de lîztine. Hezar car mixabin ku ji nav vî gelî pirr kesên nijadperest jî derketine.

Li şûna kar jî mirov fêrî gelek tiştan dibe. Ji bo mirovê hişyar pêwendiya bi kesan re, ew jî zanîngehek e bi serê xwe ye. Di xebata siyasî de jî mirov hînî pirr tiştan dibe.

Di salên dawîn de ez hîn bûm, ku hevalek nezan dikare ji neyar bêtir zirarê bigihîne rêxistina xwe, yan şexsê hevalê xwe. Her weha ez hînbûm, ku mirov nikare kesekî bi zor bike niştimanperwer, ku hin caran baştir e mirov kesên ku naxwazin bibin niştimanperwer di rêya wan de berde.

Ez ji zarokên, ku ez xwendin didim jî fêrî tiştên cûr bi cûr bûm, bi taybetî di warê nefsiyeta mirovan de. Zarok ji mezinan bêtir vekirî ne, ji wan bêtir dikarin dilpak, xwe ji fêrî hin tiştan bim. Ez pê hesiyam, ku dû salên dûr û drêj li dervayê welat ez hê gelek mafên jinan napejirînim, ez pê hisiyam ku min di teoriyê de pirr tişt pejirandibûn, lê di pratîkê de ez wek piraniya peyayên Rojhelata Navîn ezo û şoven im, jiyana mirovekî pirr kurt e, ji lewra heta yek ji me nîv-zana dibe mirin pêşkiriyê li wî dibire. Wisa ew nezan tê rûyê erdê û nîv-nezan dihere.

Di van bîst û du salên li dervayê welat de min bavê xwe, diya xwe û birayek xwe wenda kirin, bê ku wan bibînim; min tev mezinbûna bi xûşk û brayên xwe re wenda kir; min rojên tev heval û hogiran wenda kirin; nan, av û bayê welatê xwe li şûn hiştin; pêwendiyên tev meriyên xwe, tev gundî û cîranên xwe ji hev

çirrandin; min dengê mirov û lawirên Kurdistanê û her weha bînên mit û kesên welatê xwe wenda kirin, lê tu caran ji bîra nekirin. Rojek derbas nabe, ku ez xwe lomekar dernexim. Ev hisa sûc jî rolek mezin di xebata min ya netewî de dilîze û her weha di nivîsên min de. Dema ez rojek xweş derbas dikim, bi serbestî guhdarî stranekê dikim, pirr caran bê ku bizanibim çima, ez xwe bi sûc dinasim, ji lewra mirovên me li welêt di eynî wextê de ji van tiştên ku ji bo me hêsan in, ji bo wan lûks, weqa dûr in.

Bibe, nebe, pêwîst e mirov ji xwe re babetek şahiyê peyda bike, yan na ji mirinê bêtir çare namîne, baştir e mirov dawiyê bide jiyana xwe. Şahiya me hêviya me ye. Ger ji bo nifşê me jî hêvî tune be, em dilê xwe bi nifşên li pêş şa dikin, bi hêviya ku ewê jiyanek germ têxin bedena netewa me û hebûna Kurd û Kurdistanê ji mirinê azad bikin.

- Te kengê, çawa û çima dest bi nivîskariyê kir?

- Meraqa nivîsandinê ji zarokiya min de li wir bû, lê ew meraqa hindirîn bejî ma, ji lewra zimanê xwendegehê yek biyanî bû û çiqa ramanên baş di serên mirovekî de hebana jî şaşîtiyên xwebêjê û li hevsiwarkirina peyvokan bandûrek kêm li nivîsên me dikirin û wisa ger meraqa nivîskariyê li bal kesekî hebûya, ew meraqa melûl dibû. Kesên, ku zimanê wan baş bûya jî, bi zimanê xwendegehê dûre dinivîsandin.

Di destpêka salên 80 î de hin kovarên bi tirkî û kurdî li Ewropa Rojava hatibûn holê, kovarên wek *Rizgariya Kurdistan, Dengê Komkar, Roja Nû, Berbang* û dûre hinên din. Nivîsandina min ya bi kurdî bi derketina van kovaran re dest pê kir. Min jî wek piraniya nivîskarên kurd bi nivîsandina helbestan gav avêt û ez ji hêla nivîsê û her weha ramanan de di bin bandûra hin helbestvanên bi rûmet de bûm, ango piraniya van helbestan ne orijînal bûn. Bi rastî hejmarên *Berbang* yên destpêkê bandûrek gewre li min kirin û kurteçîroka min ya yekem, *Mirina Xezalekê* di vê kovarê de hate weşandin.

Tevî ku min dest bi nivîsandina kurdî kir jî, di van salan de min wer dizanibû, ku ezê nivîskariyê bi zimanek din bikim. Min gelek gotar, helbest û çîrokên bi zimanê înglizî nivîsandin. Kurteçîrokek û çend helbestên min yên bi almanî di sê kovarên Almanya Rojava de jî bi alîkariya Ensîtuyê hatin weşandin. Hin gotarên min û sê çîrok di kovarek erebî de hatin weşandin.

Di sala 1983 an de min çîroka xwe, *Civata pêxemberan,* di kasêtekê de xwendibû. Kopiyek vê kasêtê ketibû destên bi rehmetî Qanatê Kurdo, yê ku nameyek li ser navnîşana Komala Kurdên Awistralya şandibû û tê de wisa

nivîsandibû; «....*eger nivîskarê wê çirokê heye, bêje wî, ku çîroka wî, Çîroka pêxemberan, gelek bi min xweş hatiye, ez hez dikim, ku destê xwe ji nivisandina çîrokan bi zimanê kurdî neke, bila nivîsandina xwe dom bike, çîrokan, serhatiyan û ramanan bi kurdî binivîse û bila komela we arîkarî wî bikin, nivîsarên wî çap bikin,...*» Ev gotina rehmetî û piştgirtina hin hevalên dilpak biryar bi min standin dan, ku ez nvîskariya bi zimanê kurdî bikim. Sedemên din jî hebûn û yek ji wan hindikbûna pirtûkên edebiyata kurdî ya nûjen bû. Pirtûkên li holê kêm zêde xwe bi sê pirsan mijûl kiribûn, mesela çînî, bindestî û çîrokên di nav gel de hatinî gotin. Metoda nivîsandinê hê li ser hîmên ekola kevnar didomand û çîroka kurdî di krîzek wisa de bû, ku pirr li dû yên hin gelên din mabû.

Standina vê biryarê ne hêsan bû, ji lewra mirov nikare bi nivîsandina zimanê kurdî xwe û malbata xwe xwedî bike. Wisa, pêwîst e nivîskar ji bo dravan here kar û di dema xwe ya vala de binivîsine. Dema vala jî di rojên îroj de pirr hindik e. Pêwîst bû ez xwe ji gelek xebatan, komîteyan, civînan paş ve bikişînim; her weha diviyabû ez gelek pêwendiyên bi kesan re bibirim ji bo bikaribim demê ji bo nivîsandinê biparêzim.

Ez di nivîsandinê de babetek ji yên dilşadiyê dibînim; ez bi alîkariya peyvokan agirê dilê xwe dixim der û hindirê xwe honik dikim; bawerî û ramanên xwe dikim nav çemê bêjeyan û bi yên din re parve dikim.

- Gava te dest bi nivîskariyê kir dijwariyên te çi bûn ; kêmasî çi bûn?

- Dijwariya herî mezin weşandina nivîsan e, berê û nuha jî. Di destpêkê de, dema helbestek, yan kurteçîrokek di kovarekê de dihate weşandin, ewî tijî şaşîtiyên çapê bûya. Li milê din berê û ta radeyekê îroj jî, ger nivîsek li goreyî bawerî û îdeolojiya xwedî, yan berpirsiyarê kovarekê nehatibe nivîsandin, ew ronahiyê nabîne. Ji bo nivîsên bi zimanê kurdî rêyek li holê hebû û diviyabû kesek ji wê rêyê dernekeve. Bi gotinek din, bi awayekî ne mîrî rêxistin û kovarên kurdî azadiya nivîskarê kurd, bê ku bizanibin, qedexe kiribûn, loma, wek min li jor jî xuya kir, tenê metodek û her weha îdeolojiyek li holê hebû. Dema nivîskarên neteweyekê nikaribin bi serbestî binivîsînin, ew netewe nikare ji hêla ramanî de pêşve here û ew gela ji hêla civakî û rêzanî de girtî dimîne, ger bi rastî, yan bi şaşitî ji xwe re çepikan lêdixe û dibêje aferîn, bê ku bihêlê encamên baweriyekê werin lêhûrnihêrîn, yan rexnê kirin.

Ji hêla zimên de tunebûna ferhengek baş û fireh û tunebûna pirtûkek gramerê ez hin caran dikirim tengasiyê. Di derheqê peyvokên raman û tiştên nû tên afirandin de hê îroj jî mirov dikeve tengasiyê; tiştên wek *Anti-Satellite Missiles.*

Di nûçeyên radyo de ez ev gotina bi îngilizî wek *rakêtên li dijî satelîta* dixwînim. Problêm li vir ew e, ku belkî nivîskarek din vê gotinê bi awayek din binivîsîne û yek din bi awayek din. Mixabin tu rêyên din tunin. Mirov nikare ji xwe re bibêje, pêwîst e ez tiştên wisa nenivîsînim ta ku rojekê Kurdistan rizgar dibe. Bi rastî ew kêmasiyek mezin e, ku ta roja îroj hê Kurdan nikaribûye akademiyekê holê, ku tiştên wisa ji xwe re bike kar û xebat û ji hêla netewa kurd de were pejirandin.

Ez pirr kêfxweş bûm, dema sala bihurîn hin hejmarên kovara *Hawar* (berhevkirina H. Reşo) ketin destên min. Pêwist e li vir were gotin, ku Mîr Celadet Bedirxan layiqî şûneke nemaze ye di dîroka nivîs û edebiyata kurdî de. Tenê nifşên li pêş wê bizanibin ev camêrê qedirbilind çêyake çiqa gewre ji bo netewa xwe kiriye.

Dijwariya din tunebûna demê ye. Bidaxewa roj tenê bîst û çar seet in. Hin caran di kûraniya dil de weqa raman dikelin, peyvok dixwazin werin holê, lê ji ber tunebûna demê mirov wan di hindirê xwe de diçilmisîne. Dema dû çend rojan hebkî wext ji bo nivîsê heye, îcar mirov li wan raman û bêjeyan digere nagere, lê nikare wan car din peyda bike. Bo mirovekî karker dijwar e dema ew bixwaze, hema pênûsê têxe destê xwe û binivîse.

- Ji dema te dest bi nivîsandinê kir ta îroj tu rewş hatiye guhertin? Ger pêşketinek hebe, tu wê çawa dibînî ?

- Hebûna Kurdan li dervayê welat, bi taybetî li hin welatên Ewropaya Rojava kelkek zor gewre gîhande bêjeya gelê kurd. Bi alîkariya kovar, rojname û kaxezên agahdariyê haya kesan digihê gelek tiştan û danûstandinek di nav mirovên kurd de cîh digre. Berî çend salan ev gengaziya li holê tune bû. Îroj gelek rêxistinên Kurdan yên çandî û siyasî li dervayê welêt hene û tev hemî kêmasiyan jî hin tiştên ji hêla wan de têyên weşandin sûdek mezin digihînin edebiyata kurdî, wek kovar û pirtûkên Enstîtuya Kurdî. Kovara *Hêvî*, ger bikariba bi awayek berdewamîn derketa, pêşveçûnek e; hebûna *Kurdistan Press* pêşveçûnek e... Li milê din, malên weşanan li şûnên wek Swêd û Almanya Rojava vebûn û hejmarek pirtûkên çak derxistin holê. Îroj danûstandinek, çiqa hindik be jî, di navbera hejmarek ne biçûk ji nivîskarên kurd yên li dervayê welat dijîn de heye. Mirov dikare dest bavêje têlefona xwe û dema xwast tev wana biaxafe. Her weha ji dest me tê der em îroj di mala xwe de makîneyek daktîlo bibînin. Berî çend salan, ji bo yek wek min, tiştên wisa xewn bûn. Bi kurtî, ji bo nivîskarê kurd li dervayê welêt rewş îroj ji do baştir e, lê dijwariya herî mezin ji bo nivîskarê bi zimanê kurdî hê li pêş e; *em çawa xwe bigihînin mirovê kurd ?!* Ev pirs yek ji girîngtiriyên pirsan e, ku pêwîst e em îroj bipirsin û bersîveke mentiqî jê re bê derengî bibînin. Eşkere ye, ku ji sedî nod (%90)

ji Kurdên bakur, rojavayê başûr û rojhilatê Kurdistanê nizanin bi zimanê xwe bixwînin. Ew çend kesên dizanin jî nikarin nivîsên me bigihînin destên xwe. Ev rastiya bandûrek zor kêm li nefsiyeta nivîskarê bi zimanê kurdî dike. Dema ez dinivîsînim, ez ji xwe dipirsim, gelo çend kesê ev gotara min, ev helbesta min, yan ev çîroka min bixwînin? Ez dizanim ew tene ji hejmarek pirr biçûk ji Kurdên li dervayê welat pêk tên.

Tiştek din jî hê nehatiye guhertin, ku pêwîst e were guhertin. Ew jî hebûna sê tîpên nivîsa kurdî ye. Nivîskarên kurd nikarin ji nivîsên hevûdu bi tevayî sûdê bigirin. Ez naxwazim li vir baweriya xwe di derheqê dîtina dermanan de, ji bo van problêman, bibêjim. Di civîna damezrandina Akademiya Kurdî de, li bajarê Kassel, ez li ser van pirsan di kaxeza ku min li wir xwendî de sekinîm.

- *Tu ji kî re dinivîsînî ?*

- Ez ji bêjeya neteweya xwe re dinivîsînim; ez ji nifşên sibê re dinivîsînim; ez ji entelektuelê kurd re û ji ew kesên ku ji dest wan tê der bi ev zimanî bixwînin re dinvîsînim. Piraniya nivîsên min ne ji bona cotkar û rêncberên Kurdistana îroj in, ji lewra ew îroj nikarin van nivîsan bixwînin. Ev tişt çiqa tehl be jî rastiyek e. Ev problêm min pirr mijûl dike, min zehf dilsar û xemgîn dike. Min hin kurteçîrok û helbestên xwe dagirtine ser kasêtan. Yek ji çîrokan, *Azadbûna Mehmet Karataş*, ji hêla Enstîtuya Kurdî, de hate weşandin, lê ez nizanim çiqa hatibe belav kirin, ger tu sûd kiribe, yan na. Îsal min hejmarek helbestên xwe jî dagirtin ser kasêtekê û sîh heb li heval û hogiran belav kirin. Dil pirr dixwaze, ku ez ji bo gundiyên welatê xwe ji bo rêncberên kurd binivîsim û gelek tiştên çak di vî warî de di dilê min de hene; her weha ez dixwazim ji zarokên Kurdistanê re, ji ciwanan re, ji jinan re binivîsînim, lê di rewşa îroj de, ger ez ji bona wan binivîsînim, ezê xwe bi destê xwe bixapînim, ji lewra ez dizanim, ku nivîsên min ne digihên destên wan û ne jî dikarin ji hêla wan de werin xwendin, loma ez bêtir ji kesên, ku îroj dikarin bixwînin re dinivîsînim û ji wan bêtir ji nifşên li pêş re û ji edebiyata kurdî re dinivîsînim. Her weha ez ji mirovtiyê re dinivîsînim, ji lewra neteweya min çemelek ji çemelên dara mirovtiyê ye. Tenê bi alîkariya ev çemel ez jî dibim beşek ji dara mirovtiyê. Ez dixwazim ev bîst û du salên li derve, rojên zarokî û ciwaniya xwe li welêt û hemî tecrûbeyên jiyana xwe, danûstandina bi mirovan re, xwendina xwe û hisên di kûraniya hindirê xwe de têxim xizmeta bêjeya gelê xwe. Her nivîskarek tecrûbeyek xwe di jiyanê de heye. Nîvîskarên li beşên welêt, nivîskarên kurd li welatên Rojava, yên li welatên Rojhilat, her yek ji wan rê û metodek xwe heye, her yek ji wan ê bibî çaviyekê û ev çaviyana dê çeman bînin holê û çem dê li derekê xwe bigihînin hev û têkevin derya bêjeya neteweya kurd.

- *Tu dikarî bi kurtî behsa berhemên xwe bikî ?*

- Min jî wekî pirraniya nivîskaran bi helbestan dest pê kir. Hin ji van helbestan di bin navên cuda de di kovarên wekî *Rizgariya Kurdistan, Berbang û Roja Nû* de di destpêka salên 80 î de hatin weşandin. Dû re min hin ji helbestên van salan çirrandin, yan ji nû ve nivîsnadin, ji lewra ew di bin bandûra rêya, ku min li jor behsa wê kirî de, hatibûn nivîsandin.

Dora 50 helbestên min niha ji bo çapkirinê amade ne û belkî di demek nêzik de ji hêla Enstîtuya Kurdî, de di bin navê *Bang* de di pirtûkekê de werin weşandin. Ji hêla kurteçîrokan de, di salên borîn de *Mirina Xezalekê* di kovara Berbang de, *Civata Pêxemberan* di Hêvî (2) de, *Roja Dawî ji Jiyana Mistê Kurê Salha Temo* di Hêvî (3) de û *Azadbûna Mehmet Karataş* bi serê xwe tevî kasêtekê ji hêla Enstîtuya Kurdî de hatine weşandin. Ev çîrokên li jor tev hinên nû, *Vegera Mal, Curma Mezin, Yên Bawermend û Hindiyên Sor,* kurteromanek bi navê *Namûsa Êmo* û nivîsek şanoyê bi navê *Mehkemekirina Selahiddînê Eyûbî* ê di pirtûke dî de, di bin navê *Namûsa Êmo* de werin weşandin. Hemî ji bo çapê amade ne û li cem Enstîtuya Kurdî ne.

Di dawiya sala 1985 an de min romana xwe ya yekem *Wendabûn* kuta kir. Ew ji hêla Enstîtuya Kurdî de hate weşandin. Dema Enstîtuya Kurdî hate damezrandin, min got ezê hemî nivîsên xwe pêşkêşî Enstîtuyê bikim, lê mixabin problêmên Enstîtuyê jî derketin û çapkirina pirtûkan demeke dirêj dajo. Ji hêla nivîsên din de, gelek nivîsên min yên çandî û rêzanî di kovarên kurdî de hatine weşandin. Ez niha hin gotaran ji *Kurdistan Press* re jî dinivîsînim. Gelek ji nivîsên min hê nehatine weşandin, ji lewra ew li goreyî sîyaseta Kurdan ya duhu hebkî radîkal in, lê rewş ber bi çêtiriyê dihere. Hin nivîsên min, ku berî pênc salan wê nikaribana ronahiyê bibînin, ango kesekî wê ne pêjiranda wan têxe rûpelên kovara xwe, îroj dest pê kirine werin weşandin. Nivîsara min ya şanoyê, *Mehkemekirina Selahiddînê Eyûbî* ji hêla du kovaran de hate red kirin, ji lewra di vê nivîsê de gelê kurd di sedsala 21 an de Selahiddîn ji mirinê vedigerîne û dide mehkeme kirin. Di vê mehkemekirinê de bi babetek sembolîk hemî serokên partiyan, hemî "komûnîstên Kurdan û her yek ji me, Kurdên îroj, têne mehkeme kirin. Lê di nêzikiyê de, hêvîdar im, ewê jî ronahiyê bibîne. Kesek nikare rastiyê veşêre, zû dereng şora rast wê were der.

Ez dizanim hin nivîsên min wê hinan bixeyidînin, lê xeyidandina wan îspat e, ku nivîs bandûrekê li wan dike. Di *Azadbûna Mehmet Karataş* de, bokeyê serpêhatiyê dibêje *«xwelî li serên wan be, yên bi şev dinin keran û bi roj gotina şeref û namûsê dikin.»* Vê gotinê gelek kes qeherandin, lê kesekî nikaribû bigota ew gotinek ne rast e. Nivîskar divêt goreyî wûjdana xwe binivîsîne, ne ji bona

razîkirina xwendevanan. Li cîhana rojava îroj gelek nivîskar ji bona razîkirina xwendevanan dinivîsînin, ji lewra bi vî babetî ew bi milyonan dolar pirtûkên xwe difroşin. Li milê din li hin welatên kar bona razîkirina karbidestan dinivîsînin. Her du hêl, bi gotina gelek nivîskarên hin welatan, bi ev rewşa ew tê de ne razî ne. Nivîsên ji bona razîkirina kesan, rêxistinan, yan hukûmetan werin nivîsandin di edebiyata bilind de şûnan nagirin. Ez bi xwe ji bona frotina pirtûkan nanivîsînim, ne jî razîkirina kesekî ji bo min rolek mezin dilîze, lê xeyidandina kesekî jî ne mebesta min e. Ez dixwazim xwendevanên nivîsên xwe, bi taybetî beşek ji nivîsên xwe, bihejînim û wî ji xewn û xeyalan vegerînim realîzma îroj.

Gelek nivîskarên cîhanê belengaz mirine, gelek ji hêla xwendevanan de nehatine fêm kirin, di sedsalên tarîbûnê de gelek ji wan hatine şewitandin, yan di zindanan de salên drêj derbas kirine, lê rojek hatiye, ku nivîsên hinan ji van nivîskaran, ne tenê bona netewa wan, lê ji bo mirovtiyê bûne berhemên giranbiha.

Di nivîsên xwe de, ez têdikoşim ku xwendevan jî bi xwe re mijûl bikim. Ez naxwazim her tiştî ji wî/wê re têxim kevçiyekî û drêjê devê wî/wê kim. Pêwist e xwendevan kevçiyê xwe bi xe tijî ke. Di *Wendabûn* de gelek ramanên kûr û felsefî hene. Ger xwendevan bixwaze, ewê bikaribe xwe di wan de mijûl bike û li xwebêjên cuda bigere. Mebest ne ew e, ku ew wek min bifikire, lê ew e, ku ew bifikire, mijûl bibe. Ger xwendevan nexwaze, ez nikarim wî mecbûr bikim; ew dikare serpêhatiyê bixwîne û wek hatiye nivîsandin bipejirîne, yan nepejirîne. Ez dixwazim ji rexneyên xwendevanan hîn bibim tiştên nû, lê rexneyên bê sûd ji bo min ne girîng in.

Ez hewl didim tiştek nû bidim edebiyata kurdî, tiştek orijînal. Tiştên nû her dem rexnevanan dibînin û hin caran demek divêt ta werin pejirandin. Ez hê nikarim bi awayek freh li ser van rexneyan bipeyivim, ji lewra piraniya nivîsên min hê nehatine xwendin.

- *Tu edebiyata kurdî ya îroj çawa dibînî? Başî û kêmasî çi ne û ji bo çêtirkirinê çi divê?*

- Pêwis te ez li vir zelal bikim, ku şora min li ser edebiyata kurdî, beşê kurmancî ye. Beşê mezin yê edebiyata kurdî di sedsala bîstan de ji helbestan pêk têt. Piraniya kurteçîrokên li holê li ser lawiran (yên ibretan) û zordariya cendirman û axan hatine nivîsandinê. Hejmara romanan, nivîsên şanoyê, nivîsên felsefî, rêzanî û edebî zehf hindik in.

Di hindir zikê du sê salên borîn de hin romanên nû hatin holê û li gel hemî kêmasiyan çêtiriyek bi xwe re anîn. Di romana Baksî, *Hêlîn*; di romana Uzun, *Tu*, û di çendekên din de hin metod û ramanen nû hatin ber çavan. Di demek ne pirr

dûr de, ez bawer im, bi rêya nivîsên nivîskarên kurd li dervayê welat ekolek nû wê di edebiyata kurdî de dest pê bike. Baştiriyek heye, lê bidaxewa hê bi sînor e. Tiştê herî qenc ew e, ku tev hemî dijwariyên li holê hejmarek ji nivîskarên kurd bi mêrxasî û inatî karê nivîskariyê didomînin. Li milê din gelek çîrok, kovar û nivîsên kevin ji hêla nivîskarên wekî Reşo, Bozarslan, Weşanên Jîna nû hwd de ji nû ve hatine û têne weşandin. Ev jî tiştek baş e.

Ji bo pêşvebirina edebiyata kurdî pêwist e em xwe ji bandûra edebiyatên tirkî, erebî û farisî azad bikin û şexsiyeteke nû bidin ya xwe. Her weha divêt em tiştên kevin û meseleyên zengarîn êdî li şûnê bihêlin û dest bi hin ramanên nû bikin. Pêwist e em niha li kêmasiyên xwe bigerin, dermanan ji nexweşiyên xwe re peyda bikin, şaşîtiyên kesên xwe raber wan kin, li hebûna xwe xwedî derkevin, li koka xwe bigerin û wî bi jiyana îroyîn de pêwedar bikin. Pêwist e nivîskarê kurd bikaribe bi awayek objektîv realîzma gelê xwe ya civakî û siyasî bide ber çavan û bi awayek ne atifî hûr hûr li wan mêze ke. Pêwist e em hebkî bisekinin û baş li dorhêlên xwe binihêrin, gelo li cîhanê çi dibe, haya kê ji me heye, ya kê ji me tune. Pêwîst e nivîskar bi çavek realîst li rewşa Kurdistanê binihêre, gelo hêvî ji bo me heye, çi ye, çawa dikare cîh bigire; gelo sloganên nifşên li paş û yên ne weqa li paş em ji ku gîhandin ku, bi sûd bûn, bi zirar bûn? Gelo partiyên li holê di rêya rast de ne, di ya şaş de ne? Gelo nivîskarê kurd bi çi rolê radibe, rola wî bi sûd e ? Hezar û yek pirsên cuda divêt em ji xwe bipirsin û goreyî wûjdana xwe bê tirs û şerm bersîvan bidin. Ji bo van tiştan cesaret girîng e, ji lewra dayîna bersîvên objektîv ê ne tenê hukûmetan jî bixeyidîne, lê her weha hin caran partiyên û kesên kurd. Stemkariya karbidestên biyanî, mirov dikare fehm bike, lê ya rêxistin û kesên kurd bi rastî bêtarên bê hempa ne.

Partiyên Kurdan jî pêwist e bipejirînin, ku nivîskarê kurd nikare her dem pesna kirinên partiyekî bide. Dema rêxistinek kurd nivîsên nivîskarekî qedexe bike, yan nivîskarêk niştimanperwer û welatparêz bide ber kevir û kuçan, ma gelo stemkariya wê rêxistinê nabe wek ya karbidestan ? Serbestiya nivîsandina objektîv û di cîh de pêwist e her dem hebe, li ku dibe bila bibe. Tiştên ku di derheqê vê pirsê de îroj li welatên komunîst û kapîtalîst cîh digirine dikarin ji me re bibin dersek mezin. Jê bêtir, di kovar, rojname û malên weşanan de pêwist e sensûr û qedexekirin rabe, ta nivîskarê kurd bikaribe bi rola xwe ya rast û objektîv rabe. Pêwist e em diktatoriya ku karbidestên stemkar û mêtîngehkar tînin serên me ji niha ve neyinin serên hev.

Her weha pêwist e em ji xwe bîra nekin, ku cîhana me difetile, roj bi roj pêş ve dihere. Ger em dipejirînin, ku em jî beşkek ji jiyana vê cîhanê ne, divêt em jî werin guhertin, divêt edebiyata me jî pêş ve here, mûzîka me jî, metodên me jî,

yan na, emê roj li dû roj bêtir û bêtir li dû neteweyên din bimînin. Hin kesên me li dijî guhertinê ne, dixwazin edebiyata me, mûzîka me, ramanên me neyên guhertin, lê ger em bixwazin, yan na, guhertin wê cîh bigire. Çawa ji bo neteweyên din cîh girtiye, ji bo me jî wê cîh bigire. Şora dawiyê jî girîngiya damezrandina rêxistineke nivîskarên kurd e, yeke ku bikaribe kelkê bigihîne edebiyata kurd lê bi şertê ku bibe rêxistinek xebatê ne yek li ser kaxezan, rêxistinek *nivîskaran*, ne ya her kesî, yan ya partiyan.

- *Tu niha li ser çi dexebitî? Planên te yên pêşrojê çi ne?*

- Ez ji hêlekê de çîroka *Dewrêşê Ebdî*, wek bi devê dengbejekî gelêrî hatiye gotin, dinivîsînime. Dû kutabûna nivîsandina wê, min dil heye vê serpehatiya gelêrî bi awayek nûjen ji bo şano binivîsînim û tevî çîroka orijînal di pirtûkekê de bidim çap kirin. Di eynî demê de ez bi nivîsandina kurteçîrokeke bi navê *Henry Amstrong çû cengê* mijûl im, ya ku li ser şerê Viyetnamê ye.

Çêkirina planan ji bo rojên li pêş ne weqa hêsan e, ji lewra pirr caran mirov planan çê dike, lê nikare wan, ji derdê hindikbûna demê, têxe kar. Berî demekê min dest bi nivîsandina romanekê kiribû, ku min bi serî nekir. Bokeyê çîrokê ê keşîşek îngiliz bûya, şûna çîrokê jî Kenya. Ger di rojên li pêş de demê rê da, ezê wê romanê kuta bikim.

(Ev hevpeyvîn di nîsana 1987'de hatiye pêk anîn.)

Kurteçîrok

Trên

"Xewn ji me çê dibin
Wek çawan em ji xewnan çê dibin"
Louis Aragon

Dr. Kurdo HUSÊN

Xisro û Yeşar di îstgaha pir mezin de bûn û rêya li pêşiya wan dirêj bû, pir dijwar dixuya. Wan paseportên xwe, tev bîlêtan xistibûn berikên xwe û li hêviya tirênê, li ser sînga îstgahê, wek ku agir di bin wan de bûya, ew diçûn û dihatin. Îstgah bê hawe fireh, dirêj û pehn dixuya û lampên spî yên di sînga ban de, bi sedan bûn û wan ronahî didan û çavên rêwiyên pir kêm dişewitandin, kor dikirin.

Xisro ew dera han pir mezin dît û wî nizanibû gelo mezinbûna îstgahê ji kêmbûna kesan bû yan bi rastî ew wilo bê hawe fireh bû. Li ser rêyên hesinî, tirênan, mîna lawirên westiyayî, bêhna xwe berdidan û xwe amade dikirin ji bo derên pir dûr. Li ser du textên reş, yek ji bona çûnê û yê din ji bona gihaştinê, navê bajaran û jmarên tirênan li ser hev dihatin guhertin, navin winda dibûn û navin din derdiketin û ciyên xwe, li ser rûyê textên reş çêdikirin. Xisro û Yeşar li tirêna ku diçû Kurdistanê dê siwar bibana. Di serê wan de, navên bajarên wek Diyarbekir, Mêrdîn, Qamişlokê, Zaxo, Kerkûk, Helebçe, Mahabad, Qesrê Şîrîn û navên çend bajar û gûndên din dijiyan, rengareng dibûn.

Nîv saet li ber wan mabû û heger Yeşar siwarbûbû, ciyê xwe di tirênê de peyda kiribû, li kêleka pencerê rûniştibû û li hêviya Xisro bû, Xisro, bi xwe, hêna di hundirê îstgahê de bû û dixwest çend tiştan bike. Rê li ber çavên wî, di serê wî de, pir dirêj û dijwar dixuya û wî bawer dikir ku wî xwe hêna baş amade nekiribû. Di bin asmanê ban de, di nav ronahiya spî ya lampan de, wî çixare li dû çixare dikişand. Wî çi dixwest bikiriya ? Di serê wî de pir tişt hebûn, lê wî nikaribû barê

xwe pir giran kiribaya û ji ber vî tiştî wî xwest, di wan sîh deqên mayî de çavên xwe têr bikirina ji dîtina tiştên ku dê ji ber nêrînên wî windabibana. Ji mêj ve, ji demek pir dirêj ve, ew li bajarê Parîsa mezin û tevlihev bi cî û war bûbû. Li ser dîwaran, posterên mezin îlanin pir mezin-hebûn û wan pesnê textên razanê, xwarinê, vexwarinê, kincan, bêhnên frensî û dermanên ji bo xweşikkirinê didan. Çavên Xisro li laşê jinek pir xweşik ketin. laş zer û sipî bû û ronahiya lampên îstgahê li ser tilmên paşiya şahîtok dişemitîn û di qelş û kortalên laş de winda dibûn. Keça pir ciwan ava porteqalan vedixwar. Ew lêv bi ken bû, bi herkesî re dibişirî, û diranên wê yên wek berfê spî di nav lêvên wê dên sor û dagirtî de bi hezaran ramûsan belav dikirin û dixwestin. Postera îlana ji bona ava porteqalan av bi devê Xisro xist. Du sê kes bi kumin reş, bi paltoyin reş, bi şelwarin reş, bi gore û solên reş, mîna reşkên şevê bi lez di nav ronahiya îstgahê de buhurîn û qurpe-qurpa paniyên solên wan li ser kevirên şahîtok Xisro ji nav pêlên xewnan derxistin. Lê dengê solan û dengdanên wan zû belav bûn di nav bêdengiya cî de û Xisro bi nermî, bi giranî, cardî jî, nêrînên xwe li ser laşê tazî gerandin û paşê, ber bi tirênên ku ketibûn rêzê de çû. Wî ji xwe re got ku hêna wext, li ber wî, pir hebû û wî dikaribû çend pakêtên tûtina xweş ya amerîkî bikire ji bo rêya dirêj û çavên wî li nîşana li jora dikanên tûtinê bi bêhntengî geriyan. Dikana tûtinê dixuya bû ji mêj ve girtîbu û di nav qirçe-qirça diranan de, Xisro çend xeberin pir pîs ji xwediyê wê re dan. Bêhna wî, wan demên dawî yên berî ku ew biryarê bi vegera welat, zû teng dibû. Lê di kuçekê de, di derek hinekî xewle de, mekîna ku pakêt didan hebû. Xisro cizdanê xwe yê peran derxist û piştî ku wî zû tûtina xwe helbijart, wî perçak deh frankên fransî xist qelşa peran û destikek kişand û pakêta xwe girt. Lê bi derketina pakêtê re, dengê deh frankên wî jî hat û wî nas kir ku makîne şaş bû û perên wî li wî, bi şaşîtî vegerand. Bêhntengiya Xisro yê ku xwe bextreş û perîşan didît hinekî şikest, û bi lez wî carek din, ew deh frank rada qula ji bo peran û destikê pakêtan wê carê nekişand. Xuşînî ji nava mekînê hat û kulmek pere hat xwar. Xisro zû pere berdan nava çentê destan û bi tirs li dora xwe nêrî. Kesek nebû û wî cardî pere avêtin qelşa makînê û cardî jî xuşinî ji nava mekînê hat û pere ji qula jêr herikîn û li pişt camê kom bûn. Xisro bi lez û bez, bi heyecan cama biçûk bilind kir û pere dan hev.

Cî di çentê biçûk de nema û Xisro kaxez, defter û pirtûkên xwe derxistin, xistin kîsek naylon de û cî ji bo perçên deh deh, pênc pên, çêkir. Dema perên ku wî dixistin qelşê asê diman, bi çend kulman destê xwe, bê ku ew pir deng ji makînê derbixîne, wî dihişt cardî jî bibe xuşîna peran û perçên deh frankên zer û yên pênc frankên zîvî mîna libên terezê, di korta li pişt camê de kom dibûn. Çentê destan mişt bûbû û berîkên çakêt û şelwar dihatin biçirin di bin giranbûna peran de. Xisro di dilê xwe de dixwest ku makîne perên kaxez bidana, lê xuşina ku ji wan perên hesinî dihat pir bi wî xweş bû.

Ji nişke ve, makîne nema pere dan û Xisro, piştî ku wî bi tirs li dora xwe nerî rahişt çantê xwe û ji wê dera han dûr ket. Îstgaha tirênan herdem vala bû û lampên, mîna stêrikan, di asmanê îstgahê de merov kor dikirin. Xisro li saeta dîwarî nêrî terpînî ji nava wî hat. Wî lêva xwe ya jêrî gez kir. Tirên çûbûn, ji ser zikê istgahe rabûbûn. Şivên rêyên hesinî, di nava dûrbûnê de diçikiyan, winda dibûn. Çaven Xisro li tirênek reş û dirêj, li ciyekî dûr, di îstgaha vala de ketin û wî ji xwe pirsî kî dizane, belkî ev tirên jî min bigihîne daxwaziya min ?

Wî çi dora xwe nêrî û xwest çav li karkerkî îstgahê bikeve ta ku ew çend pirsan ji wî bike, çend pirsan li ser tevgera tirênan, lê istgah, bêdeng bû, bê çûn û hatin bû, bê care-cara rêwiyan bû, bê qîrînên rojnamefroşan bû. Xisro berê xwe da ew tirêna mayî û bi gavin sist, di bin barê giran de, nêzîk bû. Ji nişke ve, dengekî qalind li pişt wî ziravê wî qetand û bû kurpe-kurpa dilê wî di sînga wî de. Deng pir wek dengê bavê wî bû.

— Tu bi ku dere diçî ?

Xisro di ciyê xwe de bû wek kevir û mêrikek nêzîkî wî bû. Polîs bû ? Berpirsyarek îstgahê bû ? Rêwiyek wek wî ji tirêna xwe mabû ? Xisro rûyê mêrik nedidît û nikarîbû bigotaya ew çend salî bû. Qurpe-qurpa paniyên solên giran bilindtir bû û xwe li wî girt.

— Min û Yeşar, me bilêt kirîn û me xwest em herin Kurdistanê, lê ez dereng gihaştim îstgahê. Yeşar anha pir dûr ketiye û gerek min pir guh li wî kiribaya. Ax! Ma ew tirêna han bi ku derê diçe ?

Mêrik li çantê di destê Xisro de nerî û ji perda dengê wî dixuya ku, di temenê xwe de, wî pir pirs kiribûn û pirsên wî gelekî bê bersîv nemabûn.

— Çi di çantê te de heye ? û çima beriken te wilo dagirtî ne ?

Xwêdanek sar bi canê Xisro herikî û deve wî ket hev. Wî xwest bireve, lê çîmên wî di bin laşê wî de dileriziyan. Wek ku mêrik bi tiştên nava Xisro bizanibe, wî xwe nêzîktir kir û destê xwe avêt destikê çente û ew ji nav tiliyên Xisro derxist. Deng ji Xisro nedihat û zimanê wî bûbû wek perçak text di devê wî de. Hemû rê li ber wî hatibûn girtin.

Mirovê îstgahê, devê çente vekir û pirqînî bi wî ket. Tîqe-tîqa kenê wî bêndengiya îstgahê dirrand. Dema ew têra xwe keniya, wî li rûyê zerbûyî yê Xisro nêrî û devê çente ber bi jêr ve kir. Ji hundire çente qûmek hûr herikî, rijiya. Qûm rijiya, wek çawan av ji deve kûz yan ji devê meşkê birije û bayekî ne pir xurt ew qûm di valayiya îstgahê de belav kir.

Bi derketina qûmê, tirsê jî xwe ji nava Xisro kişand. Tirsa Xisro şikest û

ew poşman bû ji ber ku wî kaxez, defter û pirtûkên xwe ji bona komkirina qûmê winda kiribûn. Dema wî destê xwe rada berîkên xwe, tiliyên wî ketin nav qûmê. Wî bi sistî berîkên xwe vala kirin û qûma hûr ji wan jî hate xwar. Xisro nema dizanîbû wî çi dixwest û destê xwe ber bi tirêna reş û pir dirêj vekir.

— Ma gelo ez dikarim bi wê tirêna han herim Kurdistanê ?

Ew mêrikê ku xweş rûyê wî nedihat xuya kirin, zû bi zû, bersîva Xisro neda û wextekî dirêj li Tirênê nêrî, berî ku ew bi dengekî nizam bibêje

— Xisro rebeno, ew tirêna han tirêna mirinê ye. Ma çima te wek Yeşar nekir û anha jî tu ji tirêna xwe mayî ?

Wî merovî carek din jî li tirêna reş û pir dirêj mêze kir û ji Xisro re got bêku ew rûyê xwe ber bi wî ve bike. Wî dixwest, bê guman, bersîva pirsa wî bidaya

— Na ! anha tu nikarî li vê tirênê siwar bibî. Hêna roja çûna te nehatiye.

Li ser van gotinan. Xisro ji nav ciyê xwe çenk bû. Dema wî çavên xwe vekirin, wî xwe di nav xwêdanek mezeloqî de dît. Zengilê seeta li ser masa ber serê wî lêdixist. Seet neh bû û Xisro rabû ser xwe. Wî pencerê vekir û bayekî sar derbas bû hundirê odê û çend tevzinokin sar di canê wî de çikandin. Yeşar, hevalê wî yê pir hêja hat bîra wî, û rûye wî yê bedew, li pişt cama tirênê, hat ber çavên wî. Di pencerê re çavên Xisro li darin rût ketin. Wi bi lez ser çavê xwe şûşt û bi pêlikan daket û berê xwe da Metroyê, tirêna binê zemînê. Ew dê biçûna karê xwe, lê gotinên merovê ku li îstgahê rastî wî hatibû ji ber guhên wî nedixwestin winda bibûna.

Henry Armstrong çû cengê

Şahînê B. SOREKLI

Roja derketina Henry Armstrong ji bajarê xwe baş dihate bîrê. Bavê wî taximê xwe yê çuxîn li xwe kiribû, bi serbilindî ew pêşkêşî nasdarên xwe dikir û digot «va ye lawê min Henry, ew ê ji bona xatirê welatê me here cengê. Xwedê bi Emerîka me re be!» Diya wî hêstirên xwe bi destmaleke qurmiçî dimalandin, pîrika wî duâ ji wî re dikirin, û ji wan wê de hin malbatên din xatir ji lawên xwe dixwaztin. Hevala wî Lisa, hê negihîştibû û çavên wî tim li wê hêla stasyona trênê bûn. Hema ber bi rêketina trênê bi sê-çar deqan Lisa bi rev gihîşt û milên xwe li dor stûyê wî re gerandin û lêvên xwe kirin nav yên wî. Çiqa germ û nerm bûn lêvên Lisa yên sor!

Emerîka, nîşan û sembola azadiya gelan e; Emerîka parêzdara demokrasiya cîhana serbest e û ji bo her mirovê emerîkî pêwîstiyeke pîroz e, ku ew pişta amancên welatê xwe bigire, ku ew cîhanê ji lepên komunîzmê biparêze. Ev bû bîrûbawerîya Henry Armstrong, lê ev bîrûbaweriya bi rêya weşanên giştî û xwendegehê ketibû dilê wî û hê tê de bi hawakî qenc hêvan ne girtibû, ne jî di mêjiyê wî de wek ramanekê hişkehişk hatibû pejirandin. Di destpêkê de Henry wer dizanibû, ku ewê amade be bo van ramanan canê xwe pêşkêş ke, lê dema kêr û hestî gihîştin hev, ji wî ve eşkere bû, ku ew hatiye xapandin, ku pêwist e ew xwe ji mirinê biparêze, ji vê cengê sax derkeve û xwe bigihîne mal.

«Em di çi salê de ne?" Çend saniye derbas bûn ta hat bîra Henry, ku sal ya 1967 an e. Sal di rojên şer de ne girîng in. Çi sal dibe bila ew be. Ev bûbû şeş meh û nîv ku ew gihîştibû Viêtnamê, bêtir ji 180 rojên, ku roj bi roj wî û mirinê li rûyên hev dinihêrîn.

Baranê hebekî vekir û dûre ji nişkave dîsa xuşandê. Çiqa ew ji vê baranê xulemîş dibû! Li vî welatî du serdem hebûn, ya şiliyê û ya hişk û niha dema ya şiliyê, dawiya baranê nedihat. Hevalê wî Jack, yek ji ew reşên emerîkî yên bejinzirav û drêj li kêleka wî razabû. Ev barana wek xezebê jî nikaribû wî ji xewa

wî hişyar bike. Henry piyê xwe gîhande wî û ew hejand «de rabe, bes e tu raketî; rabe, binêr çawîş tê! «Deng bi Jack neket, lê dema hevalê wî ew dîsa hejand, Jack xwe ji şûna xwe çekir û got «ez di diya çêwiş nim, lo! Berde ez razêm!» Henry got wî, ku razan di dema nobetê de qedexe ye, ku razan jiyana leşkeran dike xeterê. Dûre ew hebkî keniya û got «Tu hatiyî azadî û demokrasiyê biparêzî, lê rakevî?! « Jack devê xwe vekir bersivê bide, lê çawîşê wan, ji nişka ve di navbera herduyan de sekinî, xwe ji dîzan kir erdê û qîriya, lê dengê xwe zû daxist û bi qehir got wan «Hûn nehatine li vir li ser felsefeya bi gû biaxafin. Ji bo me tenê rastiyek li vir heye. Ger em nenin qûna diya wan, ewê di qûna ya me nin! Felsefe-melsefe, ew ya ewên dinin dayikên xwe, siyasetbazên me ye. Ger ez careke din bibînim hûn di nobetê de diaxafin, ez ê gûyê we di devê we re derxim! «Dema çawîş pişta xwe da wan, Jack di ber xwe de got «lawê dêlikê, ma tiştek di zikên me de maye, ku tu gû ji me derxî?! «Henry xwest bikene, lê xwe zept kir. Çawîşê wan xenzîrekî peyan bû, henek menek nedizanibûn, bêtir ji pênc caran birîn bûbû, merovekî bê tirs û şerm bû.

Ceng çiqa merovan diguhere, dikare lawirekî ji peyakî derxe, dikare tiştên nebûyî bi kesan kirin bide!

Carekê gurmîniyek mezin hat û yek din û yek din, dûre tiqe-tiq bi mitralyozan ket. Henry û Jack herduyan xwe ji şûnên xwe çekirin û bê hemdên xwe destên xwe dane ser têtikan û qulle li dorhêla xwe reşandin. Ji wan dora 100 metre dûr qîrîna leşkerekî dihat, xuya bû birîndar bûbû, yan ji tirsan xwe wenda kiribû. Erê, pirr caran xortên emerikî, yên ku hê nû gihîştibûn vir derpêyên xwe şil dikirin, yan di demên êrîşa endamên Vêtkong de xwe wenda dikirin, diqîriyan, bi çolê diketin. Carekê li Henry bi xwe jî wisa bûbû, lê çawişê wan xwe gihandibû wî û du sîle li wî xistibûn, ew kerr kiribû. Baş dihat bîra Henry, çawa ew li ber hevalan fedîkar derket, dema çawîş got wî «lawê qehpê, ger tu ne mêr î, tu hatî vir çi ?! Tu çima di hembêza dayika xwe ya qehpê de nemayî?!

Dengê tifing û bomban sekinî û drêj nekir baran jî sekinî û ronahiyê hêdî hêdî şûna şevreşiyê girt. Dema leşkerên emerîkî li hev civiyan, hat xuya kirin, ku ji duanzdan çar mirine û dudu birîn bûne. Çawîşê wan yek vêtnamî bi xencera xwe birîn kiribû û ew dîl girtibû. Drêj nekir helîkopterek gihîşt, yên mirî û birîn rakirin û li şûna wan hin leşkerên din danîn. Dû bijorketina hêlikopterê, çawîş cixareyek ji beriya xwe derxist û kir devê yê dîl. Dûvre wî cixareya wî jê re vêxist û bangî wergêr kir.

- Hevalên te li ku bi cîh dibin?

- Li ti deran bi cîh nabin. Tim digerin.

- Li min baş mêze ke. Ez duho ji quzê dayika xwe demeketime. Ez

dizanim, ku li gundekî bi cîh dibin. Ger tu dixwazî jiyana xwe ya bi qirêj biparêzî, kurê min, ka zû bibêje min, li ku derê ne hevalên te?

-Ez sond dixwim ji te re, ez nizanim, ez nizanim.

-Sûcê min segbavî ye, ku ez hûr-pizûrê te rûzerî li ber te rêz nakim. Ev cara dawîn e; zû bibêje, ka hevalên te li ku ne!

Deng bi yê vêtkong ne ket. Çawîş pehînek avêt serê wî û ew li ser erdê ramedand. Nuha yê vêtnamî li ser pişta xwe veketibû, xwûn ji bêvilên wî dihat der, lê li ser lêvên wî û di çavên wî de şopên ken hebûn, kenekî bi hurmet, bi tirs, kenekî wisa, ku tenê kesên ev hêla Asya dikarin li ser rûyên xwe xuya bikin. Ji nav leşkeran, yekî bejinkurt ber bi çawîş hat û got «Sergent, tu rê bide min, ez şorê di devê ev bêbavî kim. « Çawîş bersîv neda negot erê, negot na, bi destekî xwe ferman da leşkerên din, yên ku danê dû wî. Li şûna wan leşkerê bejinkurt, yê vêtnamî û wergêr man.

-Ji ev bêbavî re bibêje, ku di nav yên hatine kuştin de hevalekî zarotiya min hebû. Ezê tenê carekê ji wî bipirsim, pirsa min ducar nabe. Hevalên wî li ku bi cîh dibin?

Ji endamê Vêtkong dîsa deng derneket. Tenê ew kenê sivik li ser lêvên wî bû.

-Bila nekene, bila ev kenê bêbavan di qûna dayika xwe ke; ez dibêjime bila nekene!!

Ji devê reşaşa leşker gulleyên mirinê bariyan, wek zîpikên bariyan. Beşê jorîn yên qafê merovê dîl firiya jor û mêjiyê wî ji hev belav bû. Beşekî ji xwûna wî firiya û xwe gîhande hêleke rûyê lêşker, yê ku diqûriya, dikeniya, digiriya. Wergêr xwe ji paşî de çekire ser wî û ew sekinand, dûre ew berada, rûnişt û vereşiya. Leşker cixareyeke Lucky Strike kir nav lêvên xwe û xwûn ji serçavê xwe damand.

Dora heştê têkoşerên Vêtkong mil dabûn milên hev, siqesiq rûniştibûn. Pirr kêm bûn carên ku hejmareke weqa mezin ji wana li hev diciviyan. Îroj di berbanga sibê de zabitekî wan î bi navûdeng, Hoa, hatibû bi wan re biaxafe.

Hoa merovekî hûr î zirav bû. Çel û pênc salên jiyana wî di nav têkoşînê de derbas bûbû. Xeyn ji ew çar salên li Parîsê, piraniya rojên wî di nav daristan û gundan de hiliya bû. Ew ji maleke mezin bû û bavê wî ber destpêkirina cenga cîhanê ya duwemîn bi destên leşkerên fransizî hatibû kuştin. Hoa yek wisa bû, ku kesekî nedizanibû ew ji ku de tê û bi ku de diherê. Dikaribû li şûnekê ji nişkave were xuya kirin û dîsa wek xwe di cîh de bihêle. Pirr caran bi heftan wenda dibû, kesekî nedizanibû li ku û çawa dijî.

Têkoşerên Vêtkong di ev berbanga sibê de bi hevûdu de qemitîbûn û bûbûn cesedek. Hoa di nevîna wan de rûniştibû û bi dengekî zelal, nerm û şêrîn çemek ji bêjeyan bi ser bê dixist û di guhên têkoşeran de bi cîh dikir. Xeyn, ji dengê wî û lawirên daristanê tiştek nedihat bihîstin

«... Ewê bibêje dijminê me bê hêz e bi xwe dikene. Pêwîst e em baş bizanibin, ku dijmin ji me pirr bi hêztir e, ji me pirr dewlementir e. Her weha divêt em bizanibin, ku di nav leşkerên neyêr da peyayên boke hene, camêrên netirs, ku amade ne bo welatê xwe bimirin, lê divêt em tiştekî qe tu caran ji xwe bîra nekin. Em li ser xakê bapîrên xwe li dijî kesên biyanî, ku hatine welatê me ji hev biqetînin, hebûna me ji hev biqetînin, hebûna me ji me bidizin û me bikin kole, têdikoşine. Bi peyvên din, em bo merovtiya xwe, bo namûsa xwe, bona xatirê nifşên li paş û pêş û bona jiyaneke serbilind şer dikin. Ji xwe djminê me ev şera li ser me kiriye ferz. Loma bokebûna leşkerên wan dînbûn e. Bi sedan ji wana rast jî dîn bûne. Hinan ji wan guhên têkoşerên me yên canfîda bûnî wek morîkan di benan re dikin û dikin stûyên xwe. Li milê din roj bi roj bi hezaran ji leşkerên dijmin pê dihisin, ku ew hatine xapandine, ku hukmata wan neheq e, ku hêzên wana stemkariyeke bê hempa li gelê me dikine, ku li gellek şûnan kirinên hovitiyê bi destên hin hogirên wana li dijî gelê me cîh digirine. Êdî eşkere dibe, ku bi hezaran ji leşkerên neyêr naxwazine di vî şerî de bimirin. Dema leşkerek bi amancên şerê ew tê de bawer neke, ew êdî ne leşkerekî bi şiûr e, ew ê bike ku sax ji şer derkeve, ew ê zexeliyan bike, dizî bike û heta xwe bi destê xwe birîn bike bo ji şûna şer bi dûr keve.

« Erê, balafirên neyêr pirr in, dawiya hacetên wî nayê, bombayên wî bi hêz in û heta bi kinc û potînên leşkerên wî be pirr ji yên me çêtir in. Wek hun dizanin, hin ji me xas şer dikin. Lê em baş dizanin, ku ya me ê bi serkeve. Çawa me Fransa Ewropî şkênand, emê Emerîka Yekbûyî jî bişkênin.

«Dema leşkerekî emerîkî dimire, ew bi çavên tijî hêstir xêtir ji jiyanê dixwaze; ji welatê xwe dûr, li ser erdekî biyanî, di nav gelekî biyanî de û ber her tiştî, bo amanceke ku ne ya wî ye, bo ramakeke ne rast dimire. Mirina leşkerên neyêr rast mirin e. Li milê din mirina me ne mirin e, ji lewra ew bo amanceke di cîh de ye, ew bo mafên hebûna me ye. Bi gotineke din, em bi mirina xwe hebûna xwe tînin holê ; mirina me jiyana me ye. Welatê me bi gund û daristan û lawirên xwe ve têye şewitandinê, tadeyeke gewre li gelê me dibe, lê çavên Emerîka dibirin, ez baş dizanim ku emê bi wan karibin.

«Di nav şer de, dema cengê merovtiyê ji xwe bîra bikin, ji lewra ger neyar bi merovtiyê bawer bikira, wî ev neheqiya ê nehanîba serê me. Neyarê me tu cîh ji ramanên merovtiyê re nehîştiye. Wisa, merovtî bi ne-merovan re nabe; bo yek bikaribe polê bibire tiştekî ji polayê hişktir grîng e.

«Wek min got, dijmin bi hebûna hacetan pirr bi hêz e. Her weha zanayên wî jî jîr in û bi alîkariya hacetên xwe û rijandina drav pirr tiştan dizanin. Loma pêwîst e, em hin kirinan, hin tiştan peyda bikin, du rêyên ku li kêleka hev ber bi pêş diherin. Pêwîst e zirareke mezin bigihînin leşkeren dijmin. Ya duwem ew e, ku em bikaribin ji dijmin zûtir û ji wî çêtir bifikirin. Pirraniya we hê di destpêka jiyana xwe de ne. Ger hun sax bimînin, hunê bibînin, ku kişandina derdê ev rojên dijwar ê bê kelk nemîne ; ger hun canfîda bûn nifşên li pêş ê ta hebûna netewa me we di dilên xwe de sax bihêlin, hun nemir in.

«Agahiyên me dibêjin, bi rohilat re hêzeke dijminê ne biçûk bi hêlikopteran ê bigihê gundekî ji şûna em nuha lê nêzîk. Ewê agir berdine gund, hin gundiyan bikujin, lawirên wana tune bikin, ji lewra li cem wana guman heye, ku ew gund xwarinê dide endamên me. Ev jî rast e û pêwîst e em van gundiyan bi canên xwe biparêzin, ji lewra bê alîkariya wan em ne dikarin sax bimînin.

«Bila hun serbilind bin, bila hun tirs û sawê di dilên van dînan de biçînin, bila hun jîrên nemir bin. Ta ji dest hat der xwe medin kutşin, lê ger hun mirin bila mirina we yeka gewre be, yeka bi sûd be, bila mirina we axûyê têxe nav jiyana neyêr û bila hun bibin kulîlkeke ji kulîlkên netewe û welatê me. Baş bizanibin, lawên min, ku merov hezar salî jî xirab, mirina bi jan, jiyan bindestiye ye, jîyana koledariyê ye. Her weha baş bizanibin, ku bi zanebûn yan bê zanebûn dilên gelê we bi we re be. Bila bijî netewa me, wek hemî neteweyên cîhanê, azad û serbilind ! »

Ro êdî li hilhatinê bû, dengê dîkan û lawirên din ji hêla gund dihat û gundî ji hemî beşên gund ji xaniyan derdiketin û berên xwe didan zeviyan. Rewşeke wisa li ber çavan bû ku bîna şer ji van dorhêlan nedihat; yê nizaniba bawer nedikir ceng li vî welatî heye.

Hûnh, serokê partîzanan, di nav çemelên darekê de xwe veşartibû. Royê hêdîkan serê xwe hilda û rûyê xwe yê sor şermok xuya kir. Hêdî hêdî ronahiyê bi tevayî xwe li holê bi cîh kir û gund û dorhêlan bi keskahiyeke vekirî hatin xemilandin. «Xuya ye agahdariyên gihîştî ne di şûnê de ne,» got Hûnh di kilê xwe de. Agahdariyên wisa pirr caran ne di cîh de bûn; ji çar, yan pênc caran carekê rast derdiketin. Vê dîtinê Hûnd bi carekê de him dilşa, him xemgîn kir; dilşa, ji lewra mirin îroj jî li dûr ma û xemgîn, ji lewra vedana dehfê bê sûd ma. Ji nişkeve dilê Hûnh kire gupegup, dema dengê hêlikopterekê kete guhên wî. Hûnh zû pufê pîpika xwe kir, bo hevalan agahdar bike; du çemelên din ber bi jor çû û bi herdu destên xwe pelên darê ji ber çavên xwe wê de kirin. Dengê hêlikopterekê bû yê duduyan û dûre sisiyan, lê li şûna ber bi gund werin li roavayê wan berên xwe dabûn bakur

û diçûn. Hûnh dîsa dest pê kir bifikire û dilê wî dû demeke kurt dîsa vêsiya. «kengê dawiya vî şerî ê were,» ji xwe pirsî Hûnh. Ev bûbûn heşt meh wî jina xwe û kurê xwe yê sê salîn nedîtibûn... Ber hatina Emerîkiyan malbata wî li başûr dima, lê bi destpêkirina şer re ew derbasî bakurê welêt bûn û li nêzikî Hanoi bi cîh bûn. Heşt mehan berê, wî û çar hevalan du dîlên emerikî derbasî bakur kiribûn. Bi bîranîna vê bûyerê re Hûnh kesereke kûr kişand; «Kengê dawiya vî şerî ê were,» dîsa pirsî û herdu dîlên emerîkî hatin bîra wî. Ew gelek caran ketibû nav şer û pirr caran leşkerên emerîkî dîtibûn, lê her dem ji dûredûr ve, ta ku ew rastî wan herdu dîlan hat. Bo wî her kes û tiştê emerîkî ne baş bûn. Dema ew du dîlên dijmin ketin nav destên wî û hevalan, wan dilên xwe honik kirin, pirr lê xistin, henek û qerfên xwe bi wan kirin, lê li dawiyê dilê Hûnh dest pê kir bi wan herdu xortên çavhêşîn bişewite. Yek ji wan ciwanekî porzer bû û nîvê dema xwe bi girî derbas dikir. «Hun çi digerin li welatê me, lawên qehpan? « Hûnh ji wan pirsîbû, lê pirsa wî nehatibû fêm kirin û bê bersiv mabû. Di roja sisiyan de yê porzer nema êdî dikaribû biçe, nexweşîya malarya li wî badabû û bedena wî bi tayê diriciff. Hûnh û hevalan bi hatina êvarê re biryar dan wî bikujin û yekî ji wan şeşara xwe kişand û dawî da jiyana ciwanê porzer, yê ku di bin çemelên daran de hate veşartin û ta îroj hê nehatiye dîtin.

Di rewşeke gelemper de, dema yek tevî hevalan be, pirr caran baweriyeke gelemper xwe li hevalên beşkekî ferz dike; pirr caran merovek nikare bi bîrûbaweriyeke cuda ji hevalên xwe der be. Di rewşeke leşkerî de dijmin li ber çavên leşkerên hêlekê neyar e, kî dibe bila ew be, kurê kê dibe bila bibe.Leşkerek di nav hevalên xwe de tenê beşekî xwe dinase, lê dema tê girtin pê dihise, ku beşekî wi yî din heye. Her weha agahdar dibe, ku leşkerên hêla li hember, ew jî kêm zêde wekî leşkerên hêla din difikirin. Li milê din neheqiya ku li merovekî dîl dibe wî dê melûl dike û dilê wî ji civaka merovan sar dike. Tiştekî din jî di derheqê vê pirsê de roleke mezin dilîze kîjan hêla xwedan maf e, kîjan stemkar e; kîjan êrîşker û serdest e û kîjan berxwe dide û bindest e. Leşkerên hêla serdest û êrîşker pirr caran di dîlbûnê de wenda dibin û ger serbest werin berdan, hinek ji wan dibin dijminên civaka xwe, pirr caran ji lewra ew di nefsiyeta xwe de nesax dikevin; hindên din dibin aşitîxwaz. Li milê din, bo endamên neteweya di bin êrîşê de, di bin stemkariyê de, pirr caran hovitiya di dilbûnê dê tê serên wan, agirê têkoşînê di hindur dilên wan de hê ji berê gurtir dike û nehizkirina wan li hemberî dijmin duqat dike.

Dema Hûnh leşkerê emerîkî yê sax mayî derbasî destên leşkerên vêtnamê yên mîrî kir, ew matmayî ma, dema çavên wî bi hêstiran şil bûn, lê wî xwe girt û nehişt hevalên wî agahdarî hêstirên di çavên wî de bibin. Merovê merov

dema bi dijmin re jî bibe rêwî, tê digihê, ku leşkerê neyêr jî, kurê bav û dayika xwe ye; çawa be ew jî wek wî merov e. Çima Emerîkiyên xwedan-biryar van ciwanan dişînin mirinê,» ji xwe pirsî Hûnh, «çima dixwazin welatê me bi hukmê zorê ji hev biqetînin?» Hûnh merovekî niştimanperwer bû û bi çavê merovekî welatparêz, ku dixwaze welatê xwe bike yek û azad li rewşê dinihêrî. Haya wî ji welatên hêzmezin nebû. Wî nedizanibû, ku bo Emerîka ya îroj, welatê ku bibe piştgirê Yekitiya Sovyet xwe dike dijminê Emerîka. Di rojên îroj de Emerîka amade bû bi welatekî komunîst re jî dostiyê deyne, ger ew welat ne di bin qenadê Yekîtiya Sovyet de bûya. Bo Yekitiya Sovyet jî ev felsefa kêm zêde li wir bû, lê karbianîna wê bi hawakî weqa eşkere û bi ezotiyeke weqa kûr cîh nedigirt. Ferqeke din jî di navbera herdu welatên hêzmezin de hebû; yê duwen ramana partiyekî û planên mêjiyê wî partî. Lê Hûnh tiştekî zor grîng dizanibû, bo wî kelkka gelê Vêtnamê û serxwebûna welatê wî ji her ramanê û her amancê bihatir bû; zanebûneke wisa çiqa biçûk be jî xwedan hêzeke bê hempa ye. Hêza vê baweriyê bû ku da ser hêza welatekî, ku dewlementirînê cîhanê ye; hêza vê baweriyê bû, ku da ser hêza û xazên bi axû, ji hesin û êgir û polat gewretir îspat kir.

Dengê mîtralyoz û bombeyên bazûka Hûhn veciniqandin û hişyar kirin. Xuya bû, Emerîkiyan êrîş kişandibûn ser gundeki din, ku li bakurê gundê li pêş wî û hevalan bû; bê guman ev encama şaşitiyekê bû, ji lewra ew ne gundekî ji piştgirên Vêtkong bû û li wir du ixbarcî hebûn, ku peyayên karbidestên Saygon bûn, du kesên ku her weha bi dizî agahdarî derbasî Vêtkong dikirin.

Henry Armstrong bi tenê xwe di quncikekî klûbê de rûniştibû û hewl dida rûpela nameya ji pîrika xwe re tijî bike. Berî dest bi nivîsandinê bike di serê wî de weqa wêne û raman civiyabûn. Nuha ku ew li wan digeriya bo têxe ser kaxezê, hemî tevlihev bûbûn û ji dest Henry nehat der ew ji nîvê rûpelê bêtir tijî bike.

Klûba leşkeran wekî konekî mezin bû. Dora bîst stûnan di du qorên li hember hev de di erdê de hatibûn çikandin; hin dîreg jî bi drêjî bi serên wan de hatibûn mîx kirin, ew gîhandibûn hev, çadirên leşkerî bi hev de hatibûn qemitandin û bi ser dîreg û stûnan de hatibûn raxistin û berdan. Di hindir de mase û îskemle hatibûn danîn, lê gellek leşkeran li ser çadirên ku di hindir de hatibûn raxistin pal dabûn. Sê cotan piyên xwe li dor stûyên hevûdu re gerandibûn û li ber stranên Frank Sinatra tango baz didan. Dûyekî gewr û siq xwe di hindurê kon de û li ber şewqa sê çirayên loksa gihandibû hev, te digot belkî mijekî gran e, û bîna titûn, heşîş û marixuana di nav xwe de kiribûn yeke xweş û belav dikir.

Henry dîsa pênûs xist destê rastê û xwast binivîsîne, lê nikaribû. Geh roja yekem di jiyana wî ya leşkerî de dihate bîra wî, dema porê wî yê drêj û çeleng dane ber makînê û textê serê wî req û rût, kûz kirin; serdarekî ew li hev civandin û bi

dengekî qebe gote wan, «hun nuha ji şîr û êmzikê veqetiyan; ji vir û şûn ve dayika we ez im û hun mulkê Emerîka Yekbûyî ne. Serên xwe bilind bigirin û ji Xwedê re spas bikin, ku hun dikarin bibêjin, em endamên U.S. MARINE in.» Geh jî axaftina Kapîtan Jackson dihate bîra wî, yê ku roja kutabûna kûrsa leşkerî ji wan re gotîbû, «hun zarok hatin vê kampê û peya jê derketin. Nuha berê we li Vêtnamê ye; yek ji we bo hemiyan û hemî bo yekî. Hunê ji dijmin re xuya bikin, hun ji çi madenî çêbûne. Hun diherine azadiya me hemiyan biparêzin û ger mirin hate ber çavan jê metirsin. Leşkerên emerîkî zûbizû namirin; ta nuha jimartinên mîrî xuya dikin, ku ji dora 100 leşkerên me yên li Vêtnamê tene dudu dimirin. Ev ne hejmareke bilind e û ta duduyên me dimirin ji dijmin bîst, belkî çel, belkî sed dimirin, hin caran bi sedan,...» Geh jî bajarê wî dihat bîra wî, dê û bavê wî, pîrika wî, herdu xûşkên wî, hevalên wî,... Rojek derbas nedibû, bê ku bavê wî li mal, li ser rojên xwe yên şerê cîhanî neaxafta û serê xwe bi wan rojan ranekira. Û Lîsa jî hate bîra Henry, lêvên wê yên germ, memikên wê yên nerm û dagirtî û hêtên wê yên sipehî; û bi bîranîna wê re Henry xaziya xwe daqurtand. Malxirabê Lîsa, xayinê Lîsa! Tenê nameyek ji wê hat, dû sê mehan, ku ew nuha destgirtiya Rocky Taylor e. «Ji hemî xortên bajêr ne kes, xeyn ji ew segbavê Rocky,» gotibû Hemry, «Rocky yê serserî, ku xeyn ji xirabî û nerindiyê tiştek ji wî nedihat der.»

Henry car din nameya xwe, peyvokên hatinî nivîsandin, xwendin «Pîrika min ya hêja, ezê ji te re çi binivîsînim, çi nenivîsînim, ji ku dest pê bikim! Xweziya ez nuha li kêleka te bûyama! Ez çiqa ji ev şerê bê hêvî û bê xwebêj westa me. Bê xwebêj, ez dinivîsînim; mebesta min, bo min bê xwebêj e. Ez çiqa ji wî westiya me, tu nikarî bînî ber çavan! Ev cenga ya dînan e; kesê baqil jî tî de dîn dibe. Ez nema dizanim, em li vir çi dikin, em çima li vir in!! Pîrika hêja, em hatin xapandin, em hemî hatin xapandin, lê vê gotinê megihîne bavê min; ewê wî bikuje. Bihêl, bila ew di xewna xwe de bijî. Dema tu rojên yekşemê diherî kilîsê, min ji xwe bîra meke.»

Henry nameya xwe kuta nekir. Çawîşê wan bi lez xwe derbasî hindur kir û ferman da ku leşkerên beşê P15 di cîh de li dervayê klûbê bicivin, li kuderê wî tenê bo wan got, ku bila bê derengî herin razên. Henry dizanibû sibê dîsa şerê hebe, name di destekî de, berê xwe da şûna razanê. Li dû wî leşkerekî di ber xwe da peyvokên gemarîn dibarandin.

Bê hemdê xwe Henry dest avête beriya xwe û tê gihîşt, ku nameya pîrika wî ya nîvçe hê di beriya wî de ye. Kaxez hê di nav tiliyên wî de bû, dema çavên wî li paş deriyê hêlikoptera ew tê de li yek, dudu û sê hêlikopteran ketin. Ew li hevalê xwe Jack, yê ku li kêleka wî ya rastê rûniştibû, fetilî û haya wî kişand ser hêlîkopterên li derve. Jack serê xwe sê-çar caran leqand û di ber xwe de kire pitepit.

Li derve hêlîkopterên din demeke kurt xwe di nav mijê berbangê de wenda kirin û dema yek ji wan bi nişkeve hema çend metreyan wî de xewinî, Jack veciniqî û qîriya «Ev pîncê, lawê segan bê guman heşîşê dikşîne.»Dûre bang pîlotê hêlikopterê kir; te digot belkî wî dibihîse «hêêêê, wêda bibe ew erebeya xwe ya bê sûd. Ji xwe bîra meke, tu hatiyî dijmin bikujî, ne me!» Kenekî sivik li ser lêvên Henry xuya kir, lê deng nekir. Jack li wî fetilî û pirsî «lê çi bi te dadayî; tu çima wisa pingiriye û di şûna xwe de çilmisiyî? Tu zarokên xwendegehan, yên baqil tûnî bîra min, kuro! Mebêje, te ji nuha ve derpe tijî kiriye!!» Lêvên Henry dîsa kenekî sivik nîşan dan. «Xweziya ez bitirsiyama,» got Henry; «çawa be tirs jî hestek e. Di van rojên dawîn de nema êdî tiştek min ditirsîne, xeyn ji tunebûna meraqê. Xuya ye meraqên di dilê min de hemî hişk bûne û dema dilê merovekî meraqan wenda ke, yan hişk bike, jiyan xwebêja xwe bo wî merovî wenda bike». Vê bersîvê Jack tirsand û herdu hevalan dawî dane axaftinê.

Carekê Henry pê hisiya, ku hêlikopterên li derve nema êdî xuya dikine. Drêj nekir, ya wan jî pozê xwe ber bi jêr daxist, lê li şûna venişe di xelekekê de difetilî. Çawîşê wan xwe di navenda wan de li ser lingan bi cîh kir û bi dengê xe yê qebe deng bi axaftinê kir «Sê hêlikopter di bin me de veniştin û leşkerên Komandoyên Nemaze êrîş kişandin ser gund. Ewê bi karê gemarî rabin; ger şansê me baş be û ew alîkariyê ji me nexwazin, ê karê me tenê rakirina brîndar û yên mirî be. Bila hun amade bin, emê dû demeke nêzik dakevin.»

Dema Henry û hevalan gihîştin gund, ji hemî beşên wî dû radibû. Li hin şûnan agirê sor xuya dikir. Merov û lawir li vir û wir dibeziyan. Berî biçin, Çawîş ew li hev civandin û gote wan «Karê gemarîn hatiye kirin. Ger hun qûnên xwe biparêzin, hunê sax ji vir derkevin. Bi kesekî bawer mebin, ne bi zarokan, ne bi jinan, ne bi pîr û kalan. Ger hun li kesekî ketin gumanê, berî hun bimirin wî bikujin, yan na, hun qehpedayên xwe car din nabînin. Çavên xwe vekirî bihêlin; ev pîncan hin caran ji binê erdê têyên der. Bila haya we ji bombeyên binê erdê jî hebe. Karê xwe zû biqedînin; dû deh deqan emê li vir dîsa bicivin; deh deqe!»

Bîna şewitandina tiştan û goşt her der tijî kiribû û ji gellek şûna dengê giriyê zarokan û qîrîniya jinan dihat. Li pêş hin xaniyan laşên merovan û lawiran ramediyabûn, hin ji wan di golên xwînê de; bîna mirinê û hovitiya merovan li dijî hev ba giran kiribûn û rewşele bi hisên ji şahiyê vala, hisên tijî hiznekirin, hisên dînbûn û bêçarebûna merovan li holê dibû xewan. Komandoyên Nemaze wek şeytanan li vir û wir direviyan, diqîrîyan; te digot belkî robotên bê can in; mirin û agir ji wan dibariyan.

Henry li hemî hêlan mêze kir, lê kesek ji dijmin nedît. Çima leşkerên Komando wisa dibeziyan û diqîriyan, wî nikaribû fêm bike. Ji hindir xaniyekî ji sap

û dîregan dengê giriyê zarokan dihat. Dema Henry xwe bi nişka ve avête hindur û berê tifinga xwe ber bi hindurê xênî drêj kir, du keçikên heşt, yan neh salîn xwe ji şûnên xwe ber bi jor çekirin, reviyan quncikên xênî û berên xwe dane dîwêr. Herdu jî tazî bûn û xwûna sor ji navbera hêtên wan ber bi jêr rêz bûbû. Henry kincên wan yên li ser erdê rakirin û avêtin ser milên wan. Dûre xwe bi herdu çongan avête ser erdê û dest bi axaftinê kir, te digot dîn bûye. Geh li Xwedî lome dikirin, geh ji bavê xwe re şor dikir, geh bang serokê welatê xwe dikir û geh jî gotinên xirab ji leşkerên ev keçikana kiribûne vê rewşê re dikirin.

«Tu hatiyî li brîndarên emerîkî bigerî, lê bibî keşîşekî qûnek?» Ji nişkave hat dengê çawîş. «Zû rabe û xwe bigihîne şûna civînê,» çawiş domand, «van bêbavan êrîş kişandine gundekî dost. Tiştên te îroj li vir dîtin ji xwe bîra bike. Te nedîtin û ne jî ewê werin bîra te!»

Divabû Hûnh biryarekê bistîne. Li ber wî sê rê hebûn ta êvarê li wir bimîne û bi hatina şeveşiyê re berê xwe û hevalan bide şûneke din; here alîkariya gundîyên di bin êrîşa dijmin de, yan hevalan di komikên biçûk de ji hev veqetîne û wan ji hev belav ke. Hê biryar nestandiye rêçikeke din xwe di bîrê de bi cîh kir. Ne dûr e leşkerên dijmin dû demeke kurt bi şaşitîya xwe bihisin, duqat kir û wî biryar stand tevdêreke nû bi kar bîne.

Dengê pîpika Hûnh sê caran hat û hevalên wî zû li dora wî di xelekekê de civiyan û guhên xwe dane ser axaftina wî, yê ku wekî mizgîneke bide wan dipeyivî. Dema Hûnh û hevalan nêzikî li gundê li pêş xwe kirin ro li taştiyan bû û pirraniya gundiyan di karê xwe de mijûl bûbûn.

Li gundê din dinê kerr bûbû. Li şûna civîna leşkerên emerîkî cîh girtî hêlîkopterek venişt, bo tifing û topan gulle û bo yên ew rakirî xwarin hanî. Dûre çar hêlîkopterên din venişţin. Serdarê Komandoyên Nemaze dû axaftineke kurt ferman da leşkerên xwe, ku zû şunên xwe di hêlikopteran de bigirin û xwe bi karê li gundê din amade bikin. «Yê bimire, ewê poşman bibe,» got sedêr ji leşkerên xwe re berî ew ji hev belav bibin û têkevin hêlikopetran, «ji lewra, mizgîna min li we dû kutabûna karê îroj hune heft rojan bibin mêvanên keçikên Tokyo.» Alahe bi leşkeran ket, xwe kirin sê koman û drêj nekir hersê hêlîkopter, yek li dû yekê bi jor ketin.

Hêlîkoptera Çawîş Anderson û leşkerên wî dora pênc sed mîtro li dû yên din difiriya. Herdu gund ji hevûdu ne dûr bûn. Balafira yekem xwe gîhand navîna gund, du caran li ser xaniyên wî çû û hat, dûre venişt û siwarên xwe ji wê avêtin der, bi hevûdu dîtina lingên wan û erdê re qîrînî ji devên wan û teqînî ji yen tifingên wan hatin der û tevlîhev bûn, lê kesek Vêtnamî li holê nexuyanî, ne jî hat qîrîniya jin û zarokan. Wer xuya dikir, ku gund wekî vala ye. Bi jorketina hêlikoptera yekem

re ya duwem ber bi jêr hat, lê hê bi erdê nebûye, yekî Vêtkong ji nav komek pûş derket ber bi derîyê balafirê pijiqî, wekî brûskê gihîşt, xwe avête nav lingen Emerîkiyan û teqiya. Hêlîkopter ber bi jor hate çekirin, agir bi wê ket û di hindir zikê deh saniyan de gurmîneyek ji wê hat, ji hev qelişî û tişt û kesên di hindir xwe de tife derve kirin.

Hêlîkoptera sêwen, ya ku li wê hêla gund nêzikî li erdê kiribû, hewl daxwe rake jor, lê agir ji car haliyan de li wê bariya û ew wekî lawirekî qelew û giran di şûnê de mexel bû; ji siwarên wê kesek sax ne filitî.

Ji ser daran, ji lodan, ji bin qamîş, pûş, xaniyan û şûnên din parîzanên Vêtkong der bûn. Di hindir zikê deh deqan de kesek ji Emerîkiyan li ser lingan nema, lê hejmarek ji siwarên balafira yekem hê sax bûn û xwe li nav gund veşartibûn û balafira Çawîş Andersin hê li ezmên bû. Anderson bi alîkariya bêtêlê seroketiya hêzên emerîkî agahdar kir. Ferman hate dayîn, ku kesên sax mayî û yê brîndar bila xwe bigihînin qeraxa gund. Hêlîkoptera Anderson û leşkerên wî pêwîst e li wê qeraxê venişe, bo şûn bo leşkeran were nasîn, ger kesek li ser bêtêlê nema be. Hêlikopterek ê dû deh deqan li ser gund haya Vêtkong bikişîne ser xwe û wan bombebaran bike, yek din ê were û li nik ya Anderson û hevalan venişe. Çawîş û leşkerên xwe divêt rêyekê bibînin û têkevin gund, bo kesekî brîn li şûn xwe nehêlin. Hêlikoptereke bez li ser gund difetilî, gulleyên mitralyozan û bombe bi ser gund de dibarandin. Çawîş Anderson û leşkerên xwe êdî ji gund derketibûn. Bo derxistina şeş brîndaran pênc leşkerên wî hatibûn kuştin û çar brîndar bûbûn. Bo rakirina brîndaran leşkerên Beşê Nemaze, yên sax mayî jî hatin alîkariya wan.

Henry û Jack dora bîst mîtroyan li dû yên din mabûn. Di navbera wan de milê Jack, yek ser milê Henry. Ji bin pênc lingan av dipejiqî, ji lewra ew nuha li ser zeviyekî bûn, ku sapê rizê li ser hatibû avdan. Ji lewra çîlikên avê re qiseyên xirab digotin û Henry ji kenan lal bûbû. Çawa dikarîbû di rewşeke wisa de bikene, ew matmayî bûbû. Tenê hêlikopterek nuha mabû, firfirkên wê difetilîn û xeyn ji Çawîş Anderson kesek li derva nema bû «Zû, zû, bi lez birevin, yana, hûnê nikaribin qûnên xwe xilas bikib.» Ji nişkave teqîniyek hat, berê Henry û dûre herduyên din bi dev ketin erdê. Yê brîndar diqîriya, Jack dît ku deng bi Henry neliviya. Çawîş Anderson xwe gîhand wan û dît ku gulleyekê dawî daye jiyana Henry.

Jack nuha serê Henry dabû ser çogan xwe û digiriya; «Ma nuha dema mirinê bû, Henry? De ezê ji qehpe-dêya te re çi binivîsinim?» Têkoşerên Vêtkong nêzikî li wan kirin, çar ji wan ber bi helîkopterê dihatin. Çawîş kulmek avête Jack û ew hişyar kir. Herduyan yê brîn rakirin û beziyan. Dema gihîştin helîkopterê, yê brîndar jî miribû.

Hûhn gihîşte ser laşê Henry. Herdu çavên wî hê vekirî bûn. «Bextereşo, leşkerê biyanî,» got. Hûnh ji Henry re, «çawa te di nav ronahiya royê de li rastiyê digerî, lê dem dereng e. Ger te ew dîtibe jî, bo te sûd nema. Hêvîdar im te berî mirinê fersend dîtibe hema bi kurtî rojên zarokiya xwe bînî bîra xwe, hema ji dûr ve xatir ji dayika xwe, yan ji şû û zaroyên xwe bixwazî.»

Ew gund ê bê guman bihata bombe kirin. Divabû Hûnh zû leşkerên xwe li hev bicivîne, tevdêran bo yên brîndar û mirî bike, şîretan li gundiyan bike, ka ewê çi bikin, kude herin. Bo leşkerên dijmin dem tune bû. Hûnh jî nizanibû çima ew li ber vî laşî sekinî. Belkî ji lewra rûyê wî rûyek hanî bîra wî, rûyê leşkerê dîl yê bi malarya mirî.

Tabûtek gihîşt bajarekî emerîkî yê biçûk û di nav mezelê bajêr de hejmareke ne biçûk ji merovan civîyabûn. Dayika Henry, wêneya kur di dest de, hêstirên germ dibarandin û mêrê wê bi serbilindî guhên xwe dabûn ser axaftina qeymeqamê bajêr, ye ku nuha digot, «... hezar carî mixabin, ku pîrika Henry berî sê heftan çû heqiya xwe. Ew jina hêja, ya ku pirr ji Henry hiz dikir ê çiqa dilşa bibûya, ger wê berî mirina xwe bizaniba, ku Henry, bikeve bajarê me bi mêrxasî, bê tirs û be xem jiyana xwe bo azadî û bo welatê xwe, Emerîka me ya hêja, pêşkêş kir. Bi gotina rapora leşkerî, Henry mirin dabû ber çavan, bo hevalên xwe yên brîndar ji navbera terorîstên komunîst derxe. Gotina wî ya dawîn ev bû ye Xwedê bi Emerîka re be!»

Ji bona bîranîna du saliya tevkuştina Helebçê

Reş Girêdan

Hezar nehsed heştê heşt bû
Kurdperweran reş girêdan
Nûçe a reş zû belav bû
Kurdevînan reş girêdan

Eman, eman, eman
Helebçe girt mij û dûman
Pênc hezar Kurd cangorî bûn
Birîndaran nedît derman

Eman, eman, eman yadê
Zar, zêç, pîr, kal, teyrên Xwedê
Bi ba ê kîmyewî mirin
Reş girêdan kurdo-Werdê

Li jor de bombe barandin
Kîmyewî bûn can helandin
Qîrin, hawar û nalandin
Erd û ezman reş girêdan

Hewayê jehr jiyan kir zor
Cîhan bêdeng ma, bû çav kor
Mirin Kurmanc, Soran û Lor
Zazan, Goran reş girêdan

Mij dûman bû ezman sema
Zar, zêç mirin, kesek nema
Helebçe bû Hîroşîma
Kurdistanê reş girêda

Pêşmerge gî derketin der
Dijmin ba bû, nedibû şer
Çav kor dibûn guh dibûn kerr
Şûr, tifingan reş girêdan

Li kûçan da meyît hezar
Hewşan da pez, dewar mirar
Tevgerê dît xesar, zerar
Hêzên Kurdan reş girêdan

Deh hezar welat terk kir
Cîhan bêdeng ma, guh kerr kir
Kurdan bi jehrê ra, şer kir
Kevir, daran reş girêdan

Li newal û çal û kortan
Meyîtê keç, bûk û xortan
Amed, Mûş, Van, Cizîra Botan
Tev Mem û Zîn reş girêdan

Çar hezar gund, war û banî
Dijmin xurand, dawî anî
Li tirbe de Feqî, Xanî
Tev Cigerxwîn reş girêdan

Emperyalan dengek nekir
Sovyetê tucar şerm nekir
Ev rewş dilê Saddam şa kir
Dost û yaran reş girêdan

Lo-lo Kurdo ders bistîne
Ji xwe ra rêkî bibîne
Welatek negot Kurd kî ne
Mirovhezan reş girêdan

Em tirba xwe, xwe bikolin
Dijmin Ereb, Tirk, Moxol in
Me dikujin hezar sal in
Sal û qurnan reş girêdan

Kurdino dîrokê vekin
Binivsînin qet bîr mekin
Ruhê cangoriyan şak in
Pênûs, defter reş girêdan

Şêx Saîd, Helebçe, Zîlan
Dêrsim, Axrî, jan da dilan
Ev helbesta Rizzê Guran
Mala guran reş girêdan.

Riza ÇOLPAN

«Bîranînên Nûrî Dêrsimî»

Bîranînên Dr. Nurî Dêrsîmî, di bin semavê *Biranînê Min* de ji alî *Wêşanên Roja Nû* li Stokholmê hatin weşandin. Kitêb bi tevayî 221 rûpêl ê û ji sê birên bingêhîn pêk tê *Kîme Ez ?, Mesela Ermen, Şîetî-Elewîtî-Qizilbaşî.*

Dr. Nurî Dêrsimî bîraninên xwe jî mîna kitêba xwe ya berê ku bi navê*Di Dîroka Kurdistanê de Dêrsim* ku di 1952 de li Helebê hatiye weşandinê, her bi zimanê tirkî nivîsandine. Ji ber vê yekê, xasima Kurdên ku di parçeyên din ên Kurdistanê de dijîn û bi zimanê tirkî nizanin, bi awakî firehtir ji hebûn û zaniyariyên wê kitêba berê agahdar nebûne. Çi mixabin ku «Bîranîn» ên wî bi vê rewşa nahiz ve her rûbirû ne.Em di vê danasîna kurt de dixwazin ku ji bo xwendevanên bi tirkî nezan, bîraninên ronakbîrê hêja pêşkêş kin.

Çawa ku di giş curên nivîsarên biranîna de dixuye, ew jî bi danasîn û pêşkeşkirina jîn û neseba xwe ve dest bi nivîsarê dike. Ew li navçeya Bornag, di gundek Dêrsimê de malbata N. Dêrsimî bi navê *Coligzade* tê nasîn. Ew ne giregir û serokeşîr in lê bi aqilmendî û ronakbiriya xwe ve ketine pêş û xwedî rêz û navdariyek giranbiha ne. Wek ew bi xwe jî diyar dike, bav û bapîrên wî tim di kinê mîr û serokeşîrên Dêsimê de rûniştine, katibî û pisporî di bin çavdêrî û mamostetiya malbata Coligzade de hatine perwerde kirin. Di rewş û mercên wê dema şundemayî de ku tu dibistan û medreseyên dewletî hê neketibûn Dêrsimê an jî pir pir kêm bûn, kar û rola malbata Coligzade gelek girîng û kêrhatî bûye. Dibistanên taybetî vekirîne, xort û civanên kurd çûne wan dibistanan, bi hest û ramanên kurdîtiyê ve hatine xemilandinê. Her Dr. Dersimî jî berhema vê dibistan a kurdîtiyê ye û xwendina xwe ya ewilîn di bin çavdêrî û rêya mam û bavê xwe de temam kiriye.

Bavê wî Mela İbrahîm li gel xebata mamosteyî bi zimanên kurdî û tirkî gelek helbestên bi nirx û dilgîr jî nivîsine. Bi keman û tembûra xwe ew di nav cem û civata de strane. Her bi vê hunermendiya xwe jî derd û kulên kurdîtiyê anîne

ziman û bi vê rê ve gelê Dêrsimê şad û hişyar kiriye. Kurê wî Nurî jî di dema xwendekariya xwe ya Zanîngeha Stembolê de her tembûr kutaye û di çavê Kurdên Dersîmê de bûye xwedî şanaziyek mezin. Diyar e tembûrkutan û dêmestranî di wî demê de di nav Kurdên Dêrsimê de hunermendiyek gelek hêja û rûmetdar bû. Çi mixabin ku heya îro helbestên Mela İbrahim û Alişêrê nemir û yên din ên wî demî hê nehatine civandin û çap nebûne. Ev karan jî hê bendewarê mirovên xwedî berpirsiyarî ne.

Bi kurtebirî Dr. M. Nurî Dêrsimî di malbatek wisa ronakbîr, û welatparêz de hatiye dinyayê. Bi hoyê cîh û rola vê malbata xwe hê di demên zaroktî de bi hest û ramanên kurdîtiyê ve hatiye perwerde kirin. Hiş û hestên wî yên netewî hê di zaroktiya wî de ketine qonaxa avadanîyê. Xwendina wî ya navendî li Xozat û Xarpêtê de derbaz dibe. Di Lîsa Xarpêtê de ew û hevalên xwe gelek zû dest bi kar û xebatên tevgerî dikin û bi navê *Yekitiya xwendekarên kurd* komeleyekê saz dikin. Armanc û mebestên wê komelê ew in ku xwendekarên kurd di çarçeva maf û hestên netewî de bînin cem hev, kar û barên xwe yên xwendinê bi başî bînin cî, bêtir pêş kevin û di navbera xwendeyên vê lîseyê û yên derve de peywendiyên germ û şidandî pêk bînin. Pişt demek, xwendeyên Tirk giliyê wan ji midirê dibistanê re dikin., û welatparêzên ciwan ji ali îdara lîsê ve tên gunehkar kirin û ceza digirin. Dr. M. Nurî di biranînên xwe de navê wan hevalên xwe yên dilsoz û welatparêz wiha dide nasîn Necîb, Cemîlpaşazade Kemal, Necibxanzade Alî, Şukrî, Ehmed Nafîz... Her wiha kar û xebatên ku wan ji bo Kurdistan û kurdîtiyê kirine bi awakî rêzdar û dilovanî yad dike. Ev hevalbendiya germ û nirxdar di salên paşê de jî her dom dike. Di salên xwendekarî ya Zanîngeha Stembolê de Nurî Dêrsimî li gel karên xwendekariyê, xebata xwe ya kurdîtiyê jî dimeşîne. Dibe endamê *Komala Xwendekarên Kurd (Hêvî).* Li gel *Komela hevkarî û pêşketina kurd* û *Komela kurd ji bo belavkirina zanînê* peywendî girê dide, hinek endam û hogirên wan dinase û tim diçe cem wan. Her wiha di navbera wan komalên welatparêz û Kurdên Dêrsimê de peywendiyên germ û kêrhatî pêk tîne û bi aktivî kar dike. Dîsa di wê demê de (1912), di seroktiya Mela Xidir Efendiyê Dêrsimî de *Komela Muhibanên Kurdistanê* tê damezrandin û Nurî Dêrsimî jî dibe katibê giştî yê wê. Qasî ku dide nasînê Miralay Xelîl Beg (ji Dêrsimê) û birayê wî Hesen, Alî Paşa (ji Ezirganê), Şêx Ibrahim (ji Dêrsimê) damezranên wê komalê bûne. Paşê ev komela ji alî Devleta Osmanî ve hatiye qedexe kirinê û di derheqa damezran û endamên wê de dawe hatiye vekirin.

Ew, hê di sinifa dawiya Mekteba Beytarî de bûye ku Şerê Yekemînê Cîhanê dest pê dike û xwendeyên sinifa dawiyê gazî xizmeta leşkeriyê dikin. Demek kurt wî li Stembolê dihêlin û paşê wî wek cêgirê zabit bi rê dikin ji bo

Ezirganê. Ji 1914 heya 1916'ê li wir dîmîne. Zerer û malwêraniya ku vî şerî daye gelê kurd û Kurdistanê bi çavên xwe dibîne. Çiqas ku ji dest hat dixebite ku Kurd di vî şerî de beşdar nebin û heya endazek xwe ji xerabiyên wê biparêzin. Dr. Dersimî di *Bîranînên* xwe de bi dûr û dirêjî behsa wan bûyeran dike û Dewleta Osmanî bo ku bikaribe Kurdên Dêrsimê bikişîne nav vî şerê xwînîn bi çi awayî dek û dolavan digerîne, yek bi yek eşkera dike. Her wiha di derheqa kar û kirinên Alîşêr Efendî de jî gelek zanîyarîyên hêja pêşkêş dike. Ew, di 1916 de ji bo qedandina Mekteba Beytariyê, bi fermana leşkerî dîsa vedigere Stembolê û xwendina xwe didomîne. Di vê demê de roj bi roj êdî eşkera dibe ku Dewleta Osmanî bi ser nakeve û ber bi belabûnê diçe, hember vê, giraniya îngilîz û hevkarên wan her çû zêde dibe Dr. Nurî û hevalên wî jî destvala namînin û xebatên xwe yên kurdîtiyê bêtir germ dikin. Di sala 1919 de ew bi arikarîya Şêx Abdulqadir wekî beytar tayînê Sêvazê dibe û li gor destûr û rêbaza *Komela Pêşketina Kurdistanê* dest bi karûbarê tevgera netewî dike.

Wek hîmdarek Serhildana Qoçgiriyê di nav xebata sext û xwînîn de ji serî heya dawiyê beşdar dibe. Pişt şkestina serhildanê ew bi hinek hevalên xwe, gav bi gav şer dikin û di 1921'ê de xwe digêhînin Dêrsimê. Di *Bîranînên* xwe de bi awakî fireh behsa Serhildana Qoçgiriyê dike û çawa amadegiya wê kirine û ji bo çi ev serhildana têk diçe, hoy û dawiniyên wê çi ne, bi awakî zanatî wan yek bi yek şiro vedike.

Dr. M. Nurî Dêrsimî û Alîşêr Efendî wek du hevrêyên dilsoz, wek du ronakbîrên şorişger di xebat û berxwedana gelê Dêrsimê de bi mêrxasî cîh digirin û bêwestan dixebitin. Di qonax û kuçên Dêrsimê de hê jî tim qala wan tê kirin û navên wan egîdan bi rêz û rûmet zar bi zar digere. Bîranînên wan ji bo xort û zilamên wê heremê mîna wêneyên bêhempa ne û her di bîr û dilan de dijîn. *Bîranînên* Dr. Nurî Dersîmî û kitêba wî ya berê *Di Dîroka Kurdistanê de Dêrsim* ne tenê di warê têgihiştina Serhildana Dêrsimê ya 1936-1938 de, her di warê danezanîna dab û tore yên gelê Dêrsimê û giş aliyên jîna civakî ya wî gelî de yekemîn serçaviyên nivîsarî ne. Em di vê nivîsara kurt de nikarin girîngiya wan yek bi yek pêşkêş bikin, naverok û çarçeva wan zaniyara binirxînin. Divê ev serçaviyên hêja ji alî xwendevan û ronakbîrên kurd ve bi serinc û bi jîrî bêne xwendinê, û tim di ber dest de bin.

Nurî Dêrsimî, bi destûra Seyid Riza yê nemir, di sala 1937'ê de ji Dêrsimê derdikeve û diçe Suriyê. Armanc ev e ku di derheqa Serhildana Dersîmê de dewlet û bîrûraya giştî yên cîhanê agahdar bike, harî û hovîtiya Dewleta Tirk bide nasînê. Di vî warî de ji berpirsiyariyên xwe tîne cîh. Lê çi mixabin ku di rewş û mercên wî demî de berxwedana Dêrsimê jî mîna yên berê ji têkçûnê rizgar nebû.

Dr. M. Nurî Dêrsimî, d*Bîranînên* xwe de cîh û girîngiyek gelek mezin dide «Mesela Ermen». Wê, mîna pirsek taybetî digire pêş, û dûr û dirêj, li gor bûyerên dîrokî û serboriyên jîna xwe dinirxîne. Di xerabûna peywendiyên navbera Kurd û Ermen de rola dewletên biyanî û ya Osmaniya çi bûne, eşkera dike. Di dawiya ev 32 rûpelên pir û puxd de ji bo paşerojê daxwaza xwe bi vî awayî tîne ziman *«...Daxwaza min ev e ku ronakbîrên van her du miletan (ango Kurd û Ermen) yekitî û xêrxwaziya miletên xwe di tarîxê de pêk bînin û ji bo vê çi kar pêwist e, bikin.»*

Nivîskarê hêja di beşê «Şîetî, Elewîtî, Qizilbaşî» de vedigere ser seretayê îslamê, peydabûna mezheban û lihevketina mezhebiyan şiro vedike û di vî babetî de nerehetî û pirsgirekên ku di navbera Kurdan de hatine pêş, diyar dike. Dr. Dersîmî, li ser daxwaza Cemîlpaşazade Ekrem Begê vî beşî dixe ser *Bîranînên* xwe. Armanca wî jî ev ê ku êdî ji vê dubendiya nexweş, xortên kurd xwe rizgar bikin û dest bidin hev.

Bîranînên Min weşanek gelek hêja û kêrhatî ye. şorişgerê ronakbîr bi nivîsîna bîranîn ên xwe ve jî her xizmetek bêhempa gihandîye xebata rizgarî û azadiya gelê kurd. Kesên ku dixwazin li ser dîroka neteweyê kurd mijûl bibin, û ders û cêribandinên ku derdikevin ji bo xebata wêbê bi kar bînin divê berhemên xebata û jîna beytar Dr. Mehmed Nurî Dêrsimî tim bigrin ber çav.

Belê ew, piştjînek sext û dijvar, di 1973 de li Helebê miriye lê ji me re berhemên pir hêja û jînek bêwene diyarî kiriye. Ev ji bo şorişgerek ne kêm e.

Çend gilî li ser Bavê Nazê û pirtûka «Hêsir û baran»

Edoyê ÎBO

Îro dema em bi awakî giştî çav li edebiyata kurdî digerînin, em dibînin ku, di nav edebiyata kurdî ya nivîskî de tehr û cureyên nivîsarên vekirî ango pexşan (îngilizî ; *prose, erebî ; nesîr*) zêde pêşde neçûye. Ji nîveka sedsaliya bîstan vir de dest pê kiriye ev tehrê edebiyatê, di nav edebiyata kurdî ya nûjen da pêşde çûye, cih girtiye. Di warê roman nivîsandinê de, serpêhatî, serpêhatiyên dirêj (*novel*), bîranîn, ceribandin (*essay*), lîstikên tiyatroyê nivîsandin, weşan nasandin (*review*), gername an jî geşname nivîsandin, wek van tehran di warê gelek tehrên mayîn de jî, di vê sedsaliyê de gavine pêşketî, ji aliyê nivîskarên kurd de hatine avêtin. Serê vê koma nivîskarên kurd, *bavê romana kurdî* Ereb Şemo kişandiye. Paşê di nav gelek salan de, heta niha afirandinên cure-cure hatine weşandin, di vî warî de bi kêmanî rêyek hatiye vekirin.

Di nav salên dawîn de, di warê roman û serpêhatî nivîsandinê de, hin nivîskaran afirandinên xwe yên pêşîn pêşkêşî xwendevanan kirin. Wek, Bavê Nazê (*Çiyayên bi xwinê hatiye avdan*, 1981, *Hêsir û baran*, 1986), Mahmut Baksi (*Hêlîn*, 1984), Mehmed Uzun (*Tu*, 1984, *Mirina Kalekî Rind*, 1987), Ihsan Aksoy (*Kürdün Türküsü*, 1986), Firat Cewerî (*Girtî*, 1986), Birîndar (*Xanê-Keça Kurd*, 1982, Soro, 1983), Şahînê Soreklî (*Windabûn*, 1987)....

Bavê Nazê bi romana xwe ya bi navê *Çiyayên bi xwînê hatine avdan* ve hat nas kirin. Çend serpêhatiyên wî, di kovar û rojnamên kurdî de hatin weşandin. Paşê berhevoka serpêhatiyên wî li Swêdê bi pêşgotina Ridwan Elî ve bi navê *Hêsir û baran* hate çap kirin.

Çiya çima û çewa bi xwînê ve tên avdan? Bersîva vê pirsê, îro di nav rewşa welatên wek Kurdistanê de, dikare bê dayîn. Peyvên «çîya» û «xwîn» di dîroka edebîyata kurdî de, du peyvên gelek girîng in û hev temam dikin. Di romana Bavê Nazê de jî, ev realîta dîrokî, bi stîleke edebî ve baş tê îspat kirin. Her edebiyateke netewî bi rastî li ser bingehên pirsên civakî, aborî û polîtîk bejn dide, gul vedide. Şerê cîhanî yê duwenîn çima wek temake fireh di nav edebîyata sovyet û almanî de cihekî mezin girtîye? Bersîva vê pirsê, bi dîroka van herdû welatan ve girêdayî ye.

Romana Bavê Nazê *Çiyayên bi xwînê hatinê avdan* cara pêşîn dema di sala 1981 an de bi zimanê rûsî derket, romanê bala gelek xwendevanan kişande ser xwe. Şer û teêkoşîna gelê kurd li dijî zordestan, di warê polîtîk û şerê çekdarî de, di her warê jiyinê de, wusan jî di nav rûpelên vê romanê de berdewam dike. Çetneyî, dijwarî û tekoşîn tûj dibe. Ev yeka bi mirina mêrxasên romanê Çeto û Gulê ve baş eşkere dibe. Çiyayên Kurdistanê careke din bi xwînê ve tên avdan. Ji bo vê yekê jî, peyva «çiya» wek peyveke coxrafî ji kevir, zinar, axê ve pêk nayê, çiya di edebîyata kurdî de bûne kilam û stran, dost, çiya bûne bext û miraz di edebîyata kurdî de.

Piştî vê romanê, di sala 1986 an da, bi navê *Hêsir û baran* pirtûkeke Bavê Nazê li Stokholmê hate çapkirin (bi pêşgotina Ridwan Elî ve). Her çiqas nivîskar ev serpêhatiyên di pirtûkê de çapbûyî, bi «çîrok», nav kiribin jî, angorî terminolojiya zaravê kurmancî ew ne çîrok in. Ev afirandinan him bi tehr û him jî bi naveroka xwe ve, ji çarçeva çîrokan derketine, wek hin serpêhatiyên nûjen tên xuyanê.

Ji van serpêhatiyan, serpêhatiya *Navê min Xoşnav e...* berî çapbûna pirtûka «*Hêsir û baran*» di rojnama *Riya Teze* da hatibû çap kirin. (Hejmar 40, 1983, bi wergera Şekiroyê Xudo). Ev serpêhatiya, serpêhatiya pêşîn e ku di pirtûkê de cîh girtîye. Pirsa girîngiya «zimanê dê, pêwendiyên zimên û perwerdegariyê, dubendiyên di vî warî de îro dajon, serpêhatiyê de baş hatîye nitirandin. Ji der vê serpêhatiye, wek *Wê kengî bê, Rûreş, Serpêhatiyên Kalo, Şairko, Bîstikek bê rûmet, Hêsir û baran* çend serpêhatiyên din jî, di pirtûkê da cîh girtine.

Serpêhatiya *Wê kengî bê* pêwendiyên dayikan û zarokan, ji welat dûrketin, xerîbî, bi zimanekî xweşik ve hatîye vekolandin. Ji welat dûrketin û pirsên mayin di serpêhatiya *Bîstikek be rumet* de jî, derdikevin pêşiya me. Ev evîna li ser welat, dê-bavan, zarokan di pirtûkê de dibe hêsir û baran. Fîlozofiya gel, baweriyên bi salan di *Serpêhatiyên Kalo* de xwe baş nîşan didin. Lê belengaziya fîlozofên kurd an jî şairê kurd, di serpêhatiya *Şairko* da cîh girtîye.

Bi kurtî, hemû serpêhatiyên di vê berhevokê de cîh girtine, li ser bingehên meş û prosesên gelê kurd îro ji nav re derbaz dibe, li ser van pêlekanan bilind dibin, şax vedidin û awayekî edebî werdigirin.

Dr. Abdullah Cevdet
(1869 -1932)

Mehmed UZUN

Dr. Abdullah Cevdet kî ye ? Bijîşk, nivîskar, lêger, wergêr, fîlozof, siyasetvan, kurdperwer, serok û îdeologê rêkxistina *İttihad ve Teraki* ?.. Kîjan ji van, çi ? Gelo ew kî ye ?

Bersiv ne hêsan e. Ji ber ku ev wesfên jorîn, hemû jî, li nik Dr. Abdullah Cevdet hebûne. Wî hem bijijkî kiriye, hem jî 42 kitêb nivisîne; hem bi navê *İçtihad* kovareke siyasi 28 sal weşandiye, hem jî bi qasî 30 klasîken herî mezin yên welatên Rojhelat û Rojava vergerandine tirkî; hem kurperwerekî hêja bûye, di nav rêkxistinên Kurdan de cîh girtiye, hem jî hîmdarê tevgera *İttihad ve Teraki* bûye.

Ji lewre her kes li gor bîr û bawerîyên xwe li jiyan û xebatên Dr. Abdullah Cevdet hûr bûye û bi tenê aliyekî yan jî hin aliyên wî derxistine pê û nîşan didin. (Ma ji xwe tarîx jî ne ev e ? Bi gotineke din; ma tarix, bûyer, şexis û peywendiyên tarîxî li gor gotineke bîr û bawerîyen lêger û lêger û tarîxnasan reng naguherîne ?...)

Lê belê, di derheqê Dr. Abdullah Cevdet de tiştekî heye ku tu kes jê şik nake; wî di tarîxa osmanî û Kurdan ya destpêka 1900'î de dewr û roleke mezin lîstiye û tesîreke mezin li vê tarîxê kirîye.

Li gor agahiyan, bi kurtebirî jiyana Dr. Abdullah Cevdet weha ye ew Kurd e û li bajarê Arabgîrê, ku li Kurdîstana jorê ye , hatiye dinê, di sala 1869 de. Piştî xwendina dînî, ew li Xarpêtê (Elezîz) dixwîne û diçe xwendegeha *Askeri Ruştiye*. Piştî xwendegeha Xarpêtê, ew di sala 1886 de diçe Stembolê. Li Stembolê ew, pêşî li *Kuleli Askeri İdadisi*, paşê jî, li *Mektebî Tibbîye* dixwîne û di sala 1894 an de dibe bijîşk. Tevî xwendinê, li milekî din jî, ew dest bi nivîskariyê dike û kitêb, şiîran diweşîne. Di sala 1889 an de, ew û 3 hevalên wî (İshak Sukutî yê Diyarbekrî, İbrahim Temoyê Arnawit û Mehmed Reşîdê Çerkez) bi navê *İttihadî Osmanî*

Cemiyetî rêxistineke veşartî tînin pê. Ev rêkxistin, bi dû re, dibe *İttihad ve Teraki Cemiyetî.* (Herwekî tê zanîn, *İttihad ve Teraki Cemiyeti* piştî 1910 an dewleta Osmanî bi dest dixîne û tê ser hukim, dest bi nijadperestîya tirkî dike û li Kurdistanê bi qasî 1,5 milyon Ermenî û 500 hezar Kurd qetl dike û di dawiya dawîn de jî dewleta osmanî têk dide.)

Dr. Abdullah Cevdet li dijî zor û zordarîya dewlata osmanî dixebite û gelek caran, ji ber van xebatan, ew tê girtin, zîndan dibe. Gelek caran jî ew sirgûn dibe (Trablûsxerb, Fîzan...). Di sala 1897 an de, ew direve û dere Ewropê, Cenevrê û li wê derê, tevî hevalên xwe, bi navê *Osmanli* rojnamek derdixe. Ev li Cenevrê, di eynî wext de berpirsiyariya *İttihad ve Teraki* jî dike.

Jiyana Dr. Abdullah Cevdet ya sirgûniyê di nav aweretiyeke dilsoj de derbas dibe. Ew ji welatekî direve welatekî din û ji wir jî welatekî din... Lê, tevî her celeb bêgavî û neçariyê, ew tu carî ji xebatên xwe yên li dijî *«istibdada osmanî»* bi dûr nakeve.

Pey du salên dirêj yên sirgûniyê re, ew vedigere Tirkiyê û li Stembolê bi cih dibe û li wê derê xebata xwe didomîne. Û di sala 1932 an de (29.11) Dr. Abdullah Cevdet, li Stembolê dere rehmetê.

Ji ber ku Dr. Abdullah Cevdet bîrewerekî bê hempa, şervanekî jêhatî û fîlozefekî nûjen û têgihîştî bû, di roja me de jî, gelek lêger, tarîxnas û nivîskar li jiyan û xebatên wî dinihêrin . Di nav van lêkolînan de yên berbiçavtir ên Şerîf Mardîn û Dr. Şükrü Hanioğlu ne.(1)

Lêgerê ciddî prof. Şerîf Mardîn di kitêba xwe, *Jön Türklerin Siyasi Fikirleri 1895-1908* de, beşekî taybetî ji bo Dr. Abdullah Cevdet vediqetîne û li ser tesîrên Dr. Abdullah Cevdet û kovara wî *İçtihad* radiweste. Li gor baweriya Ş. Mardîn, Dr. Abdullah Cevdet hem hîmdarê fikrî û hem jî hîmdarê siyasî yê Jon Tirkan û Ittihat ve Teraki Cemiyeti ye. Û dîsa li gor bawerîya Ş. Mardîn, serokê komara nû ya Tirkiyê Mustafa Kemal jî piranîya fikir, bîr û baweriyên xwe ji Dr. Abdullah Cevdet wergirtine. Yanê, Dr. Abdullah Cevdet bavê Mustafa Kemal yê fikrî bûye. Di pêşgotina kitêbê de jî, Ş. Mardîn ji bo Dr. Abdullah Cevdet weha dibêje; «Di vê lêkonînê de, ez bi taybetî li ser şexsekî ku fikrên wî, ji her kesî bêtir, berbiçav bûne, hûr dibim. Gava meriv li fikrên Dr. Abdullah Cevdet hûr dibe, hingê meriv dibîne ka bîr û baweriyên Rojava, yên "materyalist-organisist-darwinist" çawan tesîr li bîrewerên me kirine.»

Û li gor Ş. Mardîn, tiştê ku Dr. Abdullah Cevdet xwestiye bike, *«perwer-*

1- a) Mardîn Şerif, *Jön Türklerin Siyasi Fikirleri 1895-1908, toplu eserleri* 1, İletişim yay. Ist. 1983
b) Dr. Hanioğlu, Şükrü, *Dr. Abdullah Cevdet ve Dönemi,* Üçdal neşr. İst. 1981

dekirina xelkê û medenîkirina girseyên osmanî»ye. Jixwe Ş. Mardîn bi çarîneke Dr. Abdullah Cevdet dest bi beşê li ser Dr. Abdullah Cevdet yê kitêbê dike. Çarîn weha ye;

«Min dil kir ronahî bireşînim ser we, şev û roj,
Ez ji heyvê çûm rojê, ji rojê jî hatim heyvê
Pêxember wa'ad dikin ku bihuşt li dinya dinê ye
Ez hatim ku vê dinyê ji we re bikim bihuşt[2]

Heçî kitêba M. Şükrü Hanioglu ye, bi temanî, li ser Dr. Abdullah Cevdet e. Kitêb xebata doktorayê ya nivîskar e. Kitêb bi qasî 430 rûpelên mezin in û ew, digel her kit-kitê, li ser jiyan, xebat, fikir û bîr û bawerîyên Dr. Abdullah Cevdet radiweste.

Lê di van her du lêkonînan de jî, tiştekî ecêb heye ew zêde li ser kurdbûn û kurdayetiya Dr. Abdullah Cevdet nasekinin. Ew, bêtir, aliyên Dr. Abdullah Cevdet yên «Ittihadî û Osmanî» derdixin pêş û li ser wan disekinin. Ş. Mardîn di kitêba xwe de, li ser vê meselê weha dibêje; «Abdullah Cevdet, li gor gotinan, li maleke "kurd" hatiye dinê. Eger ev yeka rast be jî, li vê derê noqta herî girîng, gava Abdullah Cevdet li Cenevreyê bûye, wî bi merivanên Bedirxan Paşa re ku li dijî Abdulhamîd kurdayetî dikirin, tevkariyek neaniye pê û zimanê tirkî ji bo çandeke millî wasitayeke esasî dîtiye.»[3] (Bêguman ev gotin ne rast in. Dr. Abdullah Cevdet bi Kurdan re hevkarî kiriye û ebitîye.)

Dr. M. Şükrü Hanioglu jî di kitêba xwe ya mezin de, bi tenê 8,5 rûpel li ser kurdayetiya Dr. Abdullah Cevdet radiweste.[4]

Bê guman, bi qasî kurdbûnê, Dr. Abdullah Cevdet osmanî û ittihadî jî bûye. Ew bi Tirkan re, di nav rêkxistinên Tirkan de xebitiye û dil kiriye ku welatê osmanî her yekbûyî bimîne. Lê belê, digel vê hindê jî, Dr. Abdullah Cevdet Kurd bûye, kurdayetî kiriye, di nav rêkxistinên Kurdan de jî xebitiye û li ser Kurdistanê gelek bend û nivîsar nivisîne.

Ev yeka malkambax qedera Kurdên Kurdîstana jorê ye Lêger, pispor, tarîxnas û nivîskarên tirk li ser Kurdan û tarîxa wan ranawestin. Zanîngeh, enstîtû, akademî û dezgehên zanîstî yên Tirkan -bi awakî giştî- li gor îdeolojiya resmî ya dewleta tirk difikirin û dinivîsin. Yên ku wekî dewletê nafikirin jî di lêkolîn û xebatên xwe yên zanistî de behsa Kurdan, kurdayetî û Kurdîstanê nakin. Ev her du

---

2- Mardin, Şerif, kitêba jorîn, rûpel 163. Helbest bi tirkî ye.
3- Mardin, Şerif, kitêba jorîn, rûpel 164
4- Dr. Hanioglu, M.Şükrü, kitêba jorîn rûpel 314-322

lêger û pisporên hêja Ş. Mardîn û M.Şükrü Hanioglu ji bo vê yekê mîsaleke baş in. Ew her du jî wekî dewletê nafikirin, lê ew nikarin xwe ji tirs, qeyd û şertên dewletê jî rizgar bikin. Ew wekî dewletê, nabêjin ku Kurd tunene, lê gava ew behsa Kurdan dikin jî, bi şik û xof in, ditirsin.

Ji ber vê yekê, wêranî û bêbextiyeke ecêb mezin, di warê tarîxa kurd û Kurdistanê de, li Turkiyê hukm dike. Li milekî dewlet bi xwe, bi hezaran, milyonan derewan, dibêje Kurd û welatê wan tune, li milê din jî, lêger û pispor di nav bêdengî û tirseke mezin de ne. Yanê kes hember derewên dewletê serî ranake û dengê xwe bilind nake û tarîxa Kurdan û Xelatê wan jî li pey deriyên qiflikirî û arşîvên veşartî yên dewletê dimîne.

Baş e, Kurd çi dikin? Kurd jî, bi qasî îmkanên xwe, dixebitin û li dijî bîr û baweriyên dewleta tirk radiwestin. Lê xebatên ku meriv dikare jê sûd werbigire, xebatên ku li gor qaîdeyên ilmî ne, mixabin, kêm in. Bê guman, ev yeka ne bê sebeb e; dewleta tirk rê nade ku lêger û tarîxnasên Kurdan jî bigihên û bixebitin.

Tucar, tarîx jî bi tenê, li gor qaîde û metodên zanistî, tê nivisîn. Bersiva derewan ne derew û ne jî çend peyv û qiseyên tûj in. Û ji bo bersiveke rast û zanistî jî pisporî divê. Yanê, meriv divê hay ji qaîde, metod, rê û ekolên tarîxnasî û tarîxnivisînê hebe û bikaribe bi awakî zanistî û piralî li tarîxê hûr be.

Xebata Malmisanij, *Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet*,ji bo vê yekê mîsaleke baş e.[5] Malmisanij bi lêkolîna xwe lêkolînîn Ş. Mardin û M.Şükrü Hanioğlu temam dike û kurdayetiya Dr. Abdullah Cevdet jî li van lêkolînan zêde dike. Û xebata Malmisanij, careke din jî, nîşanî me dide ku Kurd bi xwe divê tarîxa xwe binivîsin û ji wan çêtir kes nikare bi vî karî rabe.

Em Malmisanij ji xebatên wî yên li ser ziman dinasin. Xebatên wî yên li ser zaravayê dumilî di kovarên kurdî de diweşin û beşê dumilî yê li yê kovara *Hêvî*'yê jî bi alîkariya wî hazir dibe (Malmisanij bi xwe dumilî û ji Kurdîstana jorê ye.) Niha jî Malmisanij bi vê lêkolîna xwe ronakbîrekî kurd û aliyên wî yên kurdayetîyê bi me dide nasîn. Malmisanij jî wekî Ş. Mardîn û M.Şükrü Hanioglu ji gelek çavkaniyan destkewtî bûye û kitêba M.Ş.Hanioglu jî gelek alîkarî li xebata Malmisnaij kiriye. Lê navenda lêkolina Malmisanij kurdayetiya Dr. Abdullah Cevdet e. Yanê ew wekî lêgerekî kurd li meselê hûr dibe; Malmisanij li ser peywendiyên Kurdan û Sultan Abdulhamid û Kurdan û *Babialî İttihad Teraki* disekine. Di lêkolîna Malmisanij de, tevî Dr. Abdullah Cevdet, hin ronakbîrên din yên Kurdan jî hene, ku ji bîr bûne. Malmisanij li ser wan jî agahiyên hêja dide. (Hin beşên lêkolîna Malmisanij, nemaze beşên ku tê de li ser ronakbîrên din jî agahî

5- Malmisanij, *Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet*, rûpel 91, weş. Jîna Nû, Uppsala, 1986

hene, di kovarên Kurdistana jêrê (Iraqê) de jî, bi kurmanciya jêrê, weşiyane.) Karê ku Malmisanij pê rabûye, ne hêsane, wî bi nûçikan ji her derekî agahiyek peyda kiriye, wan daniye ber hev û karê xwe bi ser xistiye. Herwekî li jor hat gotin, Dr. Abdullah Cevdet gelek bend û nivîsar li ser Kurdan û Kurdîstanê nivisîne. Malmisanij ew hemû berhev kirine û di lêkolîna xwe de weşandine. Bi vî awayî, lêkolîna Malmisanij ya biçûk dibe çavkaniyeke hêja da ku em hem Dr. Abdullah Cevdet baştir binasin û hem jî bizanibin ka di despêka 1900 î de ronakbîrên Kurdan kî bûne, dû wan çi kiriye.

Lêkolîna Malmisanij despêkeke baş e. Me hêvî heye ku ew xebatên xwe didomîne û tiştên nû jî li lêkolîna xwe zêde bike. Tarîxa navbera 1900-1920 an ji bo Kurdan pir girîng e. Di wê dewrê de Kurd hem di tevgerên fikrî, siyasî û rêkxistinî de û hem jî di gerandina karên dewletê de pir xurt bûne. Ev rûpela veşartî ya tarîxa me divê, bi her awayî, derkeve ronahiyê. Bi qasî ku em dibînin, Malmisanij jî dikare di vê xebatê de roleke baş bilîze. Di dawiya nivîsara xwe de, min dil heye agahiyeke biçûk li lêkolina Malmisanij zêde bikim û çewtiyeke wî ya biçûk jî nîşan bidim.

Agahiya ku ez qal dikimê, li ser Mewlanazade Rifat e. Ew ronakbîrê kurd yê bextreş jî yek ji wan Kurdan e ku ji bîr bûne. Malmisanij di lêkolîna xwe de, bi kurtî behsa vî ronakbîrî dike. Lê welê dixuye ku Malmisanij baş bi jiyana vî ronakbîrê kurd nizane. Nemaze, bi jiyana wî ya piştî 1923 an. Mewlanezade Rifat jî, herwekî Malmisanij dibêje, yek ji wan 150 kesan e ku ji Turkiyê têṉ avêtin, di sala 1923 de. Piştî 1923 an, ew tê li Beyrûdê bi cîh dibe û li dijî Mustafa Kemal û Komara Tirkiyê dixebite. Gava Kurd rêkxistina Xoybûnê tînin pê, ew jî yek ji hîmdarên partiyê ye û ew di dan û standinên Kurdan û Ermenan û Fransizan de roleke mezin dilîze. Herwaha wî kitêbek jî nivîsîye. Kitêb li ser tevgera Mustafa Kemal, Komara Tirkiyê û bûyerên wê rojê ye. Tevî ku ew bûn 5-6 sal ku ez li pey kitêbê me min hê jî ew peyda nekiriye. Ez li vê derê navê kitêbê dinivîsim. Heye ku kitêb li nik hinan hebe, yan jî hin bikaribin wî peyda bikin. Navê kitêbê *Türkiye İnkılabının İçyüzü* ye. Mewlanazade Rifat heta mirinê (1930), bi awakî xurt, di nav tevgera kurdî de xebitî.

Çewtiya ku ez qal dikimê jî, li ser salên Mehmet Salih Bedirxan e. (Çewtî di esasê xwe de, çewtiya ku Malmisanij jê destkewtî bûye, ye). Li gor çavkaniya Malmisanij, Mehmet Salih Bedirxan, neviyê Bedirxan Paşa, kurê Mahmut Izzet Bedirxan, pismam û xwezûrê Cewdet Alî Bedirxan û bavê Rûşen Bedirxan e, di şerê cîhanê yê yekemîn de, gava ew 63 salî bûye, çûye rehmetê. Ev ne rast e. Ev çend sal in ku ez li ser vî ronakbîrê hêja yê kurd dixebitim. Li gor çavkaniyên min û agahiyên ku min berhev kirine, Mehmet Salih Bedirxan di sala 1874 an de hatiye

dinê û di tarîxa 1. Nîsan. 1915 an de wefat kiriye. Ango; gava ew çûye rehmetê, ew ne 63, lê 41 salî bûye.

Me bi tarixê dest pê kir, em bi tarixê biqedînin. Dr. Abdullah Cecdet di hejmara yekemîn ya *Rojî Kurd* de weha dibêje; «*Hem berhemên penûsê, hem berhemên fikir, li dinyê tu eser û berhemên mezin tune ku bi alîkariya cesaret û xurtiyeke mezin nehatibin pê. Ez di dema xwedan-şexsiyetbûn û xwenasîna milletan de ne... gava milletekî ne xwediyê şexsiyetekî xurt be, hingê "navê wî nayê xwendin" ji heywanekî xwedanziman pê ve, ew nikare tu tişt be... Sedsala me, ne henek e, sedsala 20 an e....*»

Zazakî*

Çebaxçur û Palîra sonîk, fistonîk, mesele û deyîrî

Arêkerdox : *HARÛN*

A) SONÎK, FİSTONÎK Û MESELEY

I-PÎR Û PSÎNG

Ceyk di bi, nibi, yow pîr bîy, yow zî psîngey yê bîy.
Ruecon ra yow ruec, pîr wazena ki şiyer derî ver di kincon xwi bişû. Taştarey dewar yenû hiel, pîr bizey xwi çirr kena, şît yê kena germin û omyen kena, kincon xwi dona arye, kena yow boxça û gêrena a psîng ra vûna
-Ez ha şin derî ver di kincon şiwen. Ti şit niwîr ez heta bîr kîye!
Pîr ber ra kuwena teber, şina derî ver.
Şiyayîş pîr ra pê, psîng dyezey şît dona "ard, pyorey şît rişnena, zon xwi kena ti ra, wena, pîzey xwi kena mird û şina sêr cilon o nişena rue, neqiş kena.
Pîr derî ver di kincon xwi şiwena, tîc ver a fînena a. Kincî kik bîy zuwa, dona arye, kena boxçey xwi û yena kîye. Onyena ki eger dyezey şît qeldiya "ard û pyorey şît rişiyo. Pîr qêrena psîngi ser û vûna
-Qeyî tû şît mi rişno? Şû şît mi biyar! Heta ti şît niarî ti kîye niyena!
Psîng zî ber ra kuwena teber, şina biz het û ti ra vûna
-Mi şît pîr rişno, yê zî ez kerda teber. Şît xwi bidi mi, ez ben don ci, wa mi bigerû zerre.

* Zazakî ra Kirdkî zî yeno vatiş.

Biz zî psîng ra vûna
-Şû velg biyar bidi mi, ex wen û şit don tû. Ti zî ber bidi pîr, wa tû bigerû zerre.
Psîng biz het ra dona ra şina dar ra vûna
-Darê, darê, velg bidi mi, ez ben don biz. Biz zî şit dona mi, ez ben don pîr, wa pîr mi bigerû zerre.
Dar zî pisîng ra vûna
-Şû awk bîyar mi ver kir, ez zî velg don tû.
Psîng şina îynî het û ti ra vûna
-Îynewo, îynewo, awk bidi mi, ez ben ken dar ver. Ya zî velg dona mi, ez ben don biz. Biz zî şit dona mi, ez ben don pîr, wa pîr mi bigerû zerre.
Îyne zî psîng ra vûnû
-Şû keynon biyar, wa mi ser o govend bigîr, ez awk don tû.
Pisîng şina keynon ra vûna
-Keynêyen, keynêyen, bîryen sêr îynîyo govend bigîryen, wa îyne awk bidi mi, ez awk ben ken dar ver...
Keynê zî ti ra vûnî
-Solî ma dirrey. Solon ma ber bidi kueşkar, wa biderzû. Ma solon kîn pay û yîn sêr îynîyo govend kinî.
Psîng solon keynon gena bena kueşkar het û ti ra vûna
-Kueşkaro, kueşkaro, solon keynon biderz. Yî zî solon kinî pay û yîn sêr îynîyo govend gîn de, îyne zî awk don mi. Ez awk ben...
Kueşkar zî psîng ra vûnû
-Şû hakon biyar bidi mi, ez zî solon keynon derzen.
Psîng şina kergon ra vûna
-Kêrgen, kêrgen, hakon bidyen mi, ez ben don kueşkar. Wi zî solon keynon derzenû. Ez solon ben, keynê kîn pay û yîn sêr îynîyo govend gîn.
Kêrg zî psîng ra vûnî
-Ma veyşon î, şû qût biyar bidi ma, ma zî hakon don tû.
Psîng şina kowari ra vûna
-Kowariwo, kowariwo, qût bidi mi, ez ben don kergon. Kêrg zî hakon don mi, ez ben don kueşkar.
Kowari zî psîng ra vûnû
-Sego varon varenû, tim û tim dalpê mi ser o yîn. Şû bon bikur wa hîn dalpê mi ser o nîyrî, ez qût don tû.
Psîng şina sêr bon, pey bonkuwe bon kuwena heta ki qefiliyê. Hama bon ser ra yena war û şina kowariy het, ti ra qût gena û bena dona kergon. Kêrg zî qût winî û hakon kinî. Hakon bena dona kueşkar. Kueşkar zî solon keynon derzenû. Solon kueşkar ra gena û bena dona keynon. Keynê zî solon kinî pay û şîn sêr îynîyo govend gîn

de. Îyne zî awk donû ci. Awk bena kena dar ver. Dar ra zî velg gena û bena dona biz. Biz zî şit dona psîng. Psîng şit bena dona pîr. Pîr zî psîng bena kêy xalon yê, psîng kena xirxirê goazon û qaxon.

II-MESELEY KOAR

Zemonek di yow myerik bi û yow zî cinîyey yî bîy. Myerik û cinyek zahf feqîr bîn. Yow hêr yîn û yow zî nevîn cilon yîn ra ziyade çîkey yîn çinyebi.
Yow ruec, myerik cinîyey xwi ra vûnû
-Xonim, ma zahf feqîr î, çîkey ma çiniyû. Nye yegey ma estî, nye dewar ma estû û nye zî xebat esta ez bikirî. Biye ma şiyer Diyarbekir, ez ûca di xwi rî yow gure vênen û xebetiyen.
Cinîyey yî zahf fikiryena, pênî di razî bena. Myerik onû nevîn cilon hêr xwi bar kenû û kuwenî rahar, hêt Diyarbekir a şinî. Xêlek şinî, rahar ra yow koar yîn ver a benû. Koar ven den ci di û ti ra vûnû
-Ez rona ha lewey rahar di pawen. Heta inkê çow niome hêt Diyarbekir a nişi ki mi zî tê berû. Xeyr xwi mi zî xwi di tê bêryen Diyarbekir.
Koar xwi nonû gunekê û zahf kuwenû yîn layk. Gunekey myerik zî pê koar yena û geyrenû a cinîyey xwi ra vûnû
-Xonim ini koar gunek o. Biye ma inî xwi di tê ber Diyarbekir.
Cinî qeyîl nibîy ki koar xwi di tê bêrî. Cinî myerdey xwi ra vûna
-Rahar ma dur yo, ma nieşkinî ini koar xwi rî rahar ra bela bikir. Ma rî lazim niyo. Biye ma xwi rî rahar xwi ra şiyer.
Myerik kuwenû cinîyey xwi layk, pênî di yê razî kenû. Onû koar nişnenû hêrî û hêr erzîn xwi ver, kuwinî rahar. Şow û ruec nivindîn rahar ra şinî, pênî di resîn Diyarbekir. Zerrey çarşu di myerik koar ra vûnû
-Ma omê resê Diyarbekir. Hîn hêrî ra biye war, ma cye ra birrîn a.
Koar hêrî ra war niynû û don xwi ri, bermenû, qêrrenû, warrenû. Zerrey çarşu di înson yîn ser o yenû pye ser û ti ra persîn
-Koaro, çinê ra ti hê bermîn?
Koar myon bermî ra vûnû
-İni her û ina cinîyey min a! İni myerik wazenû ki hêr û cinî mi ra bigerû!
Myerik û cinî zî eyî însonon ra çend raşt vûnî ni vûnî çow yîn ra înon nikenû. Pyorey yîn vatey koar ra înon kinî.
Xeber donî zabiton. Zabît yenî koar, myerîk û cinî tepişinî, bîn qadî het mehkema. Qadî ti ra persenû
-Da'wey şima çinê ya, qeyî zabiton şima ard etya?

Koar hûncî don xwi ri bermenû û myon bermî ra vûnû
-Her min o, cinîyey min a!..
Myerik û cinî zî sinye biyo se raştey gurî vûnî.
Qadî derheq yîn di nieşkenû yow qerar bidû. Zabiton ra vûnû
-Heryow tên yow çime kiryen û goştarîyey yîn bikiryen dirê vûnî se.
Zabît zî yîn gîn û bîn erzinî zendon, heryowî kîn yow çime û pê bêr di vindîn, gueştarîyey yîn kinî.
Zerrey zendon di myerik qerqiliyenû, kuffenû, nalenû û xwi rî vûnû
-Ez inkê xwi rî se ken? Ez tersen ki cinî û hêr mi ra bigîr bidî koar. Mi bîlleheq vatey cinîyey xwi nikerd. Cinîyey mi çend mi ra va «myerik, ini koar ma rî lazim niyo, biye ma xwi rî rahar xwi ra şiyer», va niva mi vatey yê nikerd.
Gueştarîyey cinyek kinî, ek ha qehiryena, bermena û xwi rî vûna
-Mi çend myerdey xwi ra va niva vatey mi nikerd. Ez nizûn ini koar ça ra ome ma rî bi bela. Ma inkê xwi rî se kinî?..
Gueştarîyey koar kinî, ek koar biyû şêy, ho wiyenû û xwi rî vûnû
-Hêr û cinî ra yow barêy mi kuwena. Ek her mi rî bikuwrû, ez xwi rî nişen ci. Ek cinî zî mi rî bikuwrû, hînya hol benû.
Eyon ki hê gueştarîyey koar, myerîk û cinî kinî, donî ra şinî qadî het û yîn çinê vat se qadî ra vûnî.
Qadî ini vatey yîn ser o qerar genû û zabiton ra vûnû
-Cinî û hêr bidyen myerîk wa xwi rî şiyerû. Koar zî binê bikuyen û beryen tebêr bacar di ca verdiyen, ça şin wa şiyerû.
Myerik û cinî verra donî. Koar zî kuwîn, kuwîn û bîn tebêr bacar di verra donî.

III-LUW Û LEGLEG

Ceyk di bi, nibi, yow luw bîy û yow zî legleg bîy. Luw û legleg ombaz cey bîn. Yow ruec luw leglegi da'wet kena. Legleg zî zahf bena şêy û dona ra şina da'wet yê. Luw ci rî (legleg rî) malyez pocena û ona yê ver di nûna rue. Malyez zahf germin bena. Legleg yow-di neqûron dona malyez ri, malyez dusyena neqûrey yê ri, neqûrey yê vêşena. Legleg nieşkena malyez biwerû û vindena onyena luwi ra. Luw zon xwi kena ti ra pyorey malyez wena. Legleg zî veyşon mûnena û o ter dona ra, şina.
İni da'wet ra pê, yow çend ruec ser di şinî, ina rê legleg luwi da'wet kena. Legleg zî ci rî nihon pocena û kena yow meri, ona luw ver di nûna rue. Luw yow-di rê zon xwi kêna fêk merî ra, zon yê ci (nihon) niresenû. Nieşkena nihon biwerû. Legley

pey neqûrey xwiwa derg neqûr kena û pyorey nihon wena, zerrey merî di yow tek niverdena. Luw zî ûca di tulinc dona, pey zon xwi hetat fêk xwi lyesena, bweçey xwi şonena tye û onyena legleg ra. İna rê zî luw nieşkena çîk biwerû, o ter veyşon veyşon dona ra şina.
Pê ona wa legleg heyf xwi luw ra gena.

B) DEYÎRÎ

I- Dedkeyna

Dedkeyna, hoy dedkeyna
Dedkeyna, delal keyna
Dedkeyna, hoy dedkeyna
Dedkeyna, delal keyna

Cinî şîn vaş xelono
Dedkeyna, hoy dedkeyna
Cinî şîn vaş xelono
Dedkeyna, delal keyna

Çînîn, on don mongono
Dedkeyna, hoy dedkeyna
Çînîn, on don mongono
Dedkeyna, delal keyna

Gêy cit nik bîn nîron do
Dedkeyna, hoy dedkeyna
Gêy cit nik bîn nîron do
Dedkeyna, delal keyna

Dedkeyna, hoy dedkeyna
Dedkeyna, delal keyna
Dedkeyna, hoy dedkeyna
Dedkeyna, delal keyna

Çirr pê bonî rueşinî
Dedkeyna, hoy dedkeyna
Çirr pê bonî rueşinî
Dedkeyna, delal keyna

Pey dedkeyna wazinî
Dedkeyna, hoy dedkeyna
Pey dedkeyna wazinî
Dedkeyna, delal keyna

Pey dezê razî kinî
Dedkeyna, hoy dedkeyna
Pey dezê razî kinî
Dedkeyna, delal keyna

Dedkeyna, hoy dedkeyna
Dedkeyna, delal keyna
Dedkeyna, hoy dedkeyna
Dedkeyna, delal keyna

II- Ay Lo dilo, lo dilo

Ay lo dilo, lo dilo
Ay lo dilo, lo dilo
Ay lo dilo, lo dilo
Îs lo dilo, delîlo

Ma şîn Warey Hesenî
Ay lo dilo, lo dilo
Ma şîn Warey Hesenî
Îs lo dilo, delîlo

Kuemey yî ha pê sêrî
Ay lo dilo, lo dilo
Kuemey yî ha pê sêrî
Îs lo dilo, delîlo

Pencerêy seraser î
Ay lo dilo, lo dilo
Pencerêy seraser î
Îs lo dilo, delîlo

*** *** ***

Ay lo dilo, lo dilo
Ay lo dilo, lo dilo
Ay lo dilo, lo dilo
Îs lo dilo, delîlo

Sêr bon Hacî kerre wo
Ay lo dilo, lo dilo
Bîn bon Hacî kerre wo
Îs lo dilo, delîlo

Hacî vazdow gerrewo
Ay lo dilo, lo dilo
Hacî vazdow gerrewo
Îs lo dilo, delîlo

Gerrewo byefayde wo
Ay lo dilo, lo dilo
Gerrewo byefayde wo
Îs lo dilo, delîlo

Şahad Hacî merre wo
Ay lo dilo, lo dilo
Şahad Hacî merre wo
Îs lo dilo, delîlo

*** *** ***

Ay lo dilo, lo dilo
Ay lo dilo, lo dilo
Ay lo dilo, lo dilo
Îs lo dilo, delîlo

Mastî payîz wenik o
Ay lo dilo, lo dilo
Mastî sibay wenik o
Îs lo dilo, delîlo

Keçon kerdo kuediko
Ay lo dîlo, lo dilo
Keynon kerdo kuediko
Îs lo dilo, delîlo

Pey patik a bîg xwi d' ko
Ay lo dilo, lo dilo
Pey kuedik a bîg xwi d' ko
Îs lo dilo, delîlo

III- Awekey Kaşon

Awkey kaşon wişena
Lê lê, lemin lê; lê lê, lemin lê
Byewey kaşon wişena
Lê lê, cêr ra cor surmelay mi

Yow tut ha ver di xwi şuwena
Lê lê, lemin lê; lê lê, lemin lê
Yow tut ha ver di xwi şuwena
Lê lê, cêr ra cor surmelay mi

Destmac sibey ver di gena
Lê lê, lemin lê; lê lê, lemin lê
Destmac sibey ver di gena
Lê lê, cêr ra cor surmelay mi

Di qom nimac xwi rî kena
Lê lê, lemin lê; lê lê, lemin lê
Di qom nimac xwi rî kena
Lê lê, cêr ra cor surmelay mi

Du'ey qedêr xwi rî kena
Lê lê, lemin lê; lê lê, lemin lê
Du'ey qedêr xwi rî kena
Lê lê, cêr ra cor surmelay mi

Sêrî çowlîg daro berz o
Lê lê, lemin lê; lê lê, lemin lê
Sêrî çowlîg daro berz o
Lê lê, cêr ra cor surmelay mi

Binî çowlîg deşto duz o
Lê lê, lemin lê; lê lê, lemin lê
Binî çowlîg deşto duz o
Lê lê, cêr ra cor surmelay mi

Wisar yenû, wext waron o
Lê lê, lemin lê; lê lê, lemin lê
Wisar yenû, wext waron o
Lê lê, cêr ra cor surmelay mi

Amnon yenû, vaştrî xelon o
Lê lê, lemin lê; lê lê, lemin lê
Amnon yenû, vaştrî xelon o
Lê lê, cêr ra cor surmelay mi

Payîz biyerû, wa ez tû biyarî
Lê lê, lemin lê; lê lê, lemin lê
Payîz biyerû, wa ez tû biyarî
Lê lê, cêr ra cor surmelay mi

IV- Cîranê

Cîranê, cîranê, cîranay mi
Koçerê, helîmê, bermala mi
Cîranê, cîranê, cîranay mi
Hevalê, hogirê, bermala mi

Malan bar kerd, şî warono
Cîranê, cîranê, cîranay mi
Şar ma bar kerd, şî warono
Hevalê, hogirê, bermala mi

Ware niyo, dibare wo
Cîranê, cîranê, cîranay mi
Ware niyo, dibare wo
Hevalê, hogirê, bermala mi

İna cîran ha ma r' bermena
Cîranê, cîranê, cîranay mi
İna heval ha ma r' bermena
Hevalê, hogirê, bermala mi

Hesron çimon esterena
Cîranê, cîranê, cîranay mi
Hesron çimon esterena
Hevalê, hogirê, bermala mi

İna cîran ha cor d' yena
Cîranê, cîranê, cîranay mi
İna heval ha cor d' yena
Hevalê, hogirê, bermala mi

Cor di yena îstrob (?) kena
Cîranê, cîranê, cîranay mi
Cor di yena îstrob kena
Hevalê, hogirê, bermala mi

Îşlig zavay neqiş kena
Cîranê, cîranê, cîranay mi
Îşlig zomay neqiş kena
Hevalê, hogirê, bermala mi

V- Zava

Zava, zava, zava
Loy, loy, zava
Zava, zava, zava
Keko, bira, zava

Yega pîl o, filhon o
Loy, loy, zava
Yega pîl o, filhon o
Keko, bira, zava

Yow nik myon di awk dono
Loy, loy, zava
Yow ho myon di awk dono
Keko, bira, zava

Monen baykey keynono
Loy, loy, zava
Monen baykey keçono
Keko, bira, zava

Keyna qic mi nidono
Loy, loy, zava
Keça qic mi nidono
Keko, bira, zava

Înşallah kîye di mûno
Loy, loy, zava
Înşallah kîye di mûno
Keko, bira, zava

Qûmî rûy ma hera wo
Loy, loy, zava
Qûmî rûy ma hera wo
Keko, bira, zava

Keynon te de riz kuwawo
Loy, loy, zava
Keçon te de riz kuwawo
Keko, bira, zava

Surmey keynon rişyawo
Loy, loy, zava
Surmey keçon rişyawo
Keko, bira, zava

Xwerton xwi r' arye dawo
Loy, loy, zava
Xwerton xwi r' arye dawo
Keko, bira, zava

VI- Dayê Gidyano

Hêwax dayê, gîdyano, day gîdyano
Hêwax dayê, mi va
Sarey mi lê deceno
Hêwax dayê, mi va
W' ez sarey xwi geno, lê ragineno
Hêwax dayê, mi va
Gen vêr kerrey Homa te'alay di ruenono
Hêwax dayê, mi va
Derdê xwi zî kerrî rî la xwi rî vûno
Hêwax dayê, mi va
Kerrey Homa te'alay hielya û hiemilyawo
Hêwax dayê, mi va
Dar û birrî la kelimiyawo
Hêwax dayê, mi va
Xwidê, ya rebbîyo, ti biqedênî maradê la cahîlono
Hêwax dayê, mi va
Xwidê, ya rebbîyo, dunya ra qeyî çow derdê çoy nyezono?

Hêwax dayê, mi va
Vor varena zimistonî
Hêwax dayê, mi va
Deyax-sabir bikir wa biyer amnonî
Hêwax dayê, mi va
Destê xwi destê mi ki, ma şiyer diyarê lê koewonî
Hêwax dayê, mi va
Ma derdê xwi zî la xwi rî vûnî

*** *** ***

Hêwax dayê, gîdyano, la day gîdyano
Hêwax dayê, mi va
Derdê ma zî la giron o
Homa te'ala, Xwidêyo,
Qe çow dunya ra derdê çoy nyezono
Homa te'ala, Xwidêyo,
Ti dunya ra biqedên maradê cahîlono

Hêwax dayê, mi va
Tarî yeno, tarîy şonî
Hêwax dayê, mi va
Tarî şonî "ard giroto
Hêwax dayê, mi va
Dumon sarey dayk giroto
Hêwax dayê, mi va
Aqil sarey Kej biryawo
Hêwax Homa te'alawo, Xwidêyo,
Ti dunya ra biqedên maradê cahîlono
Homa te'alawo, Xwidêyo,
Qe çow dunya ra derdê Misilmono nyezono

Hêwax dayê, mi va
Ruecon ra eyro rueco la ruec cum'e wo
Hêwax dayê, mi va
Vêr comî di omê pye ser gelê cem'at, la tolazono
Hêwax dayê, mi va

Hiela gi ez onya kîbar-narîn mi te de niyo
Mi çim di pyor bîy kal-kokim hotay-heştay serono

Hêwax dayê, gidyano, la day gidyano
Homa te'alawo, Xwidêyo,
Ti dunya ra biqedên maradê cahîlono
Homa te'alawo, Xwidêyo,
Qe çow dunya ra derdê la kesî nyezono

---

bermala mi : bermalîyey mi, bermalîya mi
cêr ra cor : cyer ra cwar
cor d' : cwar di, cor di
çirr : namey yow cê yo.
îs : îso
ma r' : ma rî, ma rê
nik : nikê
surmelay mi : surmelîyey mi, surmelîya mi
xwi d' ko : xwi di kiro, xwi di kero, xwi di ko
xwi r': xwi rî
zava : zoma, zama

Rindan Hemînî Miyan di

Rindan -ki rîy yînî zey aşmi çiringeno- hemînî miyan di serekê rindan ti yî.
Rîy to [bibo] zey rojî, porê to yo derg zî zey çogani.

Rindeya rîyê to zey gulîstanî. çi gulîstan? Gulîstanê rindey.
Çi rindey? Rindeya Wisifî. Çi Wisif? Wisifê Ken'anî.

Di çimê to yê mestî, zalim. Çi zalim? Zalimo kafir.
Çi kafir? Kafiro raybimayox [ki merdimî ser o keno].
Çi raybimayox? Raybimayoxê îmanî.

Lewê to yê sûrî [bibê] zey koçî. Çi koçe? Koçeyê bexçî.
Çi bexçe? Bexçeyê cennetî. Çi cennet? Cennetê kêfweşey.

Şamika lewê to [biba] zey şamika Hîndûy. Çi Hîndû? Hîndûyo sihêrbaz.
Çi sihêrbaz? Sihêrbazo fitne. Çi fitne? Fitneyê dewranî.

Ziwanê to [bibo] ze bilbil, fekê to [bibo] ze eyni.
Çi bilbil? Bilbilo fekweş. Çi eyni? Eynîyê ganîyey.

Heyrani to rê bibo aşiqi. Çi aşiqi? Aşiqa tersoki.
Çi tersoki? Tersoka gêji. Çi gêji? Gêja heyrani.

HEYRAN XANİMA DUNBULÎ (seserra XIX.)
Fariskî ra tadayox Malmîsanij

Fes Mistefa û Zeyneb Xanimi

Arêkerdox : *O. Wedat KAYMAK*

Di biray yewnan benî. Cenî jînî wirdînî zî nêweşê gedan benî. Wirdînî ra yew lajek ana, a bîni keyneki ana. Tay zeman vêreno, ma wû pî lajekî mirenî, ma wû pî keyneki manenî. Lajek û keyneki wirdî zî pîl benî, yenî dari.
Lajek datê xwi dest a geyreno. Însan datê jey ra vano
-İno çîy to yo xalo?
Vano -İno ximzikarê (xizmikarê) min o.
Birazay jey o, vano «ximzikarê min o».
Weyra zorê (zorbi) lajekî şono eki datê jey nêvano «birazay min o», vano «ximzikarê min o».
Tanî zeman ra pey fesali yew şaristan (sariştan) ra yew axa yeno keyneki lajê xwi rî wazeno.
Axa û pî keyneki qalî kenî labrê pê nînî. Axa wardeno eskerê xwi gêno şono. Lajek şono vernîya jînî, danî pê ro. Ay ki kişeno, ay ki remenî, welhesilî o mal û milkê axay gêno, ano dekeno hewşê datdê xwi, vano
-De ha to rî malê dîna dato, çimê to malê dîna d' o, han to rî mal!
Malî dekeno hewşê jey, pirr keno.
Dat keyna xwi dano birazay xwi. Biraza yew şewi tena şono cilda xwi (yew şewi tena keyneki reydi kuşta kweno). A şewi hewn veyneno ki Zeyneb Xanimi girota. Weyra o yû Zeyneb Xanimi giştirîyanê xwi pê bedilnenî. Nimajî wardeno, datkeyna xwi ca di verdeno, yella bebem şono ay şaristan. Zav şono, tay şono, şono eki yew bizwan hinik o weyra bizan di. Vano
- Silamu "eleykum.
Şane vano -'Eleykum silam Fes Mistafa!
O vano - Qey ti çi zanî ki ez Fes Mistefa ya?
Şane vano -De hewawo ki Zeyneb Xanimi va, ti yî.
Tikêna şono eki yewna hinik o owra dewarî di, vano
-Silamu "eleykum.

Mêrdeko ki dewarî ver di vano -'Eleykum silam Fes Mistefa!
O vano -Qey ti çi zanî ki ez Fes Mistefa ya?
Vano -La hewawo ki Zeyneb Xanimi va, ti yî.
Tikêna ca şono eki yew golikwan ha golikan di. Golikwan ti ra vano
-Ay cilanê xwi bidi mi, ez xwi ra dena, ti zî inî cilanê mi xwi ra di.
O ay cilanê keçelekan golikwanî ra gêno, xwi ra deno, golikwan ti ra vano
-Bew, ti inî golikan dim a şo, ti şonî hewştê Zeyneb Xanimi. Weyra yew quleba esta, cay to weyra wo. Ti a quleba zere di kuşta kwi.
O vano -Temam.
Golikan dim a, dim a şono hewşê Zeyneb Xanimi zere. Hewnêno ki e wilay yew kozek ha weyra, şono ay banekî zere di roşeno.
Yew şono vano -Zanî Zeyneb Xanim, yew keçelek hamew!
A vana -Qey senê?
Vano -La ina.
A vana -Şêrî veyn dî, wa bêro!
Şonî veyn denî, yeno. Zeyneb Xanimi vana
-Keçelek, ti çi gure kenî?
O vano -Wilay ez nişna golikan dim a şêra, mozi kenî, vazdenî, keçelê mi tînci dana pi ro, ez nişna.
Vana -La ti çi gure kenî?
Vano -Ez to rî yew kuzê aw beera, inasar çî ra vîşêr ez çekî (çîyekî) nişna bika.
Vana -Temam.
Zav maneno, tay maneno, "Ereb Şah yeno Zeyneb Xanimi xwi rî wazeno.
Qalî kenî, kenî, pê nînî. "Ereb Şah wardeno çiqas heywanê ay şaristanî estî, jînî têdînî xwi ver şaneno, talan keno, beno. çiqas "erz û "eyalê ay şaristanî esto, têdi "Ereb Şahî dimi kwenî, Kecelek tena owra maneno.
Zeyneb Xanimi şona banî ser ra geyrena, geyrena, hewnêna ki ne yew carmêd o ne yew gede wo, ne yew howl o ne yew xirab o. Vana
-Hero Keçelek, wardi! Mîçiki ewta nêmendi, ti carmêd î, ti zî wardi jînî dim a şo! Dîna xeripêna?
O vano -Zeyneb Xanim, Keçelê mi tînci dana pi ro, ez nişna jînî dim a şêra, inka ti vana se (siye) mi ra?
A vana -İnka ti carmêd î, ti zî wardi şo!
Vano -De ina wo yew estori mi rî teber ki, ez şona.
Şona, de rî yew estora hîrilingi teber kena, o gêno şono.
Şono, şono, ay pey di ja verra dano, estora xwi weyşeno (wenîşeno), yella! Kinar ro şono vernîya karbanî. Jînî miyan kweno, ay ki kişeno, ey ki remenî; şono herinda bananê jînî cew keno, talanê Zeyneb Xanimi û kel-melê jînî gêno ano şaristanê jînî.

Seki beero binê dewa ma, ay zênanê jînî, geman û hewsaranê jînî têdi beno yew ca di dekeno binê herri, hinî gilana şono cay xwi.
Ey yew Xalit wey ra beno. Xalit xwi to keno, tuf keno çiwa, vano
-Ho, ho, ho!
Û heybana[n] gêno beno şaristanî miyan.
Vengan dekweno, vanî -Xalitî talan "Ereb Şahî ra giroto ardo.
Eh, de hinî vanî «Zeyneb Xanimi leyaqê Xalitî ya!» Vanî «de nêki hinî ma Zeyneb Xanimi danî kamî?»
Xalit zî şono kuj di roşeno. Tewir tewir êmeg hedirnenî, weno.
Yew ximzikarê Zeyneb Xanimi şono vano
-Hero, Keçelê ma! Wardi, Zeyneb Xanimi danî Xalitî, çî hedirnawo, ti zî xwi rî şo çî bori.
O vano -Ti xwi rî şo bori, zera mi bere nêşona, mi bigeyri.
Vano -Hero, ti însan î, qesba mi to rî veşena. Ez vana wardi xwi rî şo tikê çî bori.
O vano -Ti şo vaji «axa, ay Keçel vano di qalê mi estî, ez yena vana», eki va «wa bêro», ez yena, nêva ez nîna.
Şono, vano -Axa, ay Keçelo ki heybinan di şono vano «di qalê mi estî, ez yena vana.»
Xalit vano -Wa nêrooo! Qey çi gurey jey owta wo, yeno ay Keçel?
Axa vano -Wa bêro. Nimajîna şima indi qalî kerdî, wa o zî bêro hela veynî qalê jey çi yî?
Şonî, vanî -Bê!
Şono, vano -Axa!
Axa vano -Ha.
Vano -İnka ino talano ki hamew, inî estorê ki hamey, bê gem û bê hewsar û bê zên benî? Ginî gemê jînî, hewsarê jînî, zênê jînî bibo.
Ê vanî -E wilay, ginî gem û hewsar û zênê jînî bibo.
O vano gem û hewsar û zênê jînî hanî ha binê filan kerra di. Eki nimajî inî mêrdimî vetî, xwi ra jey ardî, eki nêvetî hinî çi laweno?
Vanî -Temam.
Cacê (?) veyn deno, vano -Ginî şaristan di mîçiki nêşêro teber!
Nimajî der Xalitê to qatê cilanê xwi xwi ra dano, xwi keno heway axay ow dano piro şono.
Keçelek [Fes Mistefa] vano -De Xalit şo, bew hinik î binê ina kerra di!
Xalitê to şono "enê kerra hewa nano, ney, nişno hewa no.
Keçelek vano -Wa des tenî to reydi hewa nî.
Des tenî pa şonî, nişnî hewa nî, vîst ten şono, nişno hewa no.
O vano -Xalit, temaam?

Xalit vano -Temam.
O vano -Ez şona.
Şono, vano «bismîllahîrehmanîrehîm» û hima kerra gêno kinar dano. Kinar dano, geman û hewsaran û zênan vejeno, vano
-Axa, çi mend?
Axa vano -Ti se kenî Xalitî biki.
Vano -Ez tek yew lekmati dana pi ro, merd mend.
Yew lekmati dano pi ro, Xalit ca di gan dano.
Vanî -Zeyneb Xanimi leyaqê to ya!
Zeyneb Xanima to zî ximzikaranê xwi temên kena, vana
-Bew, şima estorê nerî teber nêkî! Estorê nerî de rî teber mekî!

*** *** ***

Fes Mistefa Zeyneb Xanimi heti maneno. Zeyneb Xanimi ra di lajê jey zî benî. Lajê jey pîl benî, hinî xort benî. Ne cenîya jeya verêni (datkeyna jey) jey vîr yena ne key jeyo verên jey vîr yeno ne çî. Datkeyna xwi heti zî yew şewi mendo, ti ra yew laj pîzedê ja kewto. Rebbê "alemî yew laj dawo bere.
Rojî Fes Mistefa yew estorî teber keno, şono. Seki şêro binê dewi, estor hîşşeno. Wî! Aqil yeno sere ki tew lolo! Eki datkeyna xwi girota, yew şewa teki ja heti biyo ow ca di verdaya. Ca di ageyreno.
Zeyneb Xanimi vana -Key şima bixeripiyo, şima key ma xeripna!
Vanî -Qeyê?
Vana - La bew, ha yeno! Şima estoro nerî de rî teber kerdo!
Yeno, vano -Ez şona!
Vanî -Eman, hewar, setar! Senêwa ti şonî?
Vano -Ez şona!
Vanî -Ey ti şonî, ti hinî ginî gedanê xwi nû cenîya xwi zî xwi reydi bîşêrî.
Vano -Ma şonî.
Heryew yew mayîni weyşeno (wenîşeno) ow dey rî tanî (tay) kel-mel zî dekenî, gênî şonî.
Şonî, şonî, şonî şaristandê jey. Şonî yew mergi di ronenî, xeyma xwi danî pi ro. O nêvano ki «ina dewa ma ya, şaristanê ma wo». Vano
-Lajê mi, binê ina xeymi di vindî, ez şona şaristan hela veynî çi esto, çi çino.
Lajê jey vanî -Temam.
Vano -Cay yew-mew bêro, şima nêtersî.
Vanî -Ney, ney, ma nêtersenî, ti şo bawo.

Şono, şono key datê xwi eki datê jey hima hima hinî exter biyo, eki çimê jey hinî weş nêveynenî ow eki yew xort zî ha weyra.
Xortî ra vano -Xorto, bê ma kaban kay bikî.
Xort vano -Bê ma bikî.
Kaban kay kenî, o xortî di zexeley keno.
Xort vano -Xalo, ti misafir î, ez qarişê to nêbena. Ti xwi rî heway însanî kay kenî kay biki; ti kay nêkenî meki! İno çi hewa wo, ti zexeley kenî?
Bawkalê xortî xortî ra vano -Bêmirad, bêmirad, qarişê misafirê ma mebi!
Xort vano -Ey bawkal, misafir mi di zexeley keno! De wa misafir raşt kay biko!
O datê xwi ra vano -Xalo, ino gede çîy to yo?
Datê jey vano -Lajê mi, derdê gedî mepersi.
Vano -Ney wilay xalo, ti ginî mi rî vajî.
Dat vano -İno gede tomê min o. Mi keyna xwi day birazadê xwi. Birazay mi yew şew şiyo cilda xwi û Rebbê "alemî ino gede dawo keyna mi. Birazay mi zî vinî biyo, merdo, mendo, ma nêzanî. Şiyo, nêamew, çino.
O hinî zano ki ino lajê jey o.
Ey ximzikarê jeyo verên şono cenîda jey ra vano
-İno mêrdim Fes Mistefay maneno.
A vana -Heşşi, inî qalan meki! Fes Mistefa merdo. Kam çi zano kura merdo? İno dus qalan meki, "eyb o!
Ximzikar vano -Şirtê Fes Mistefay estî. Yew şameki pey ra maney jey ra ya. Gama ki wextê cilda jey hame, mi rî yew cema îziman beerî owra ronî, ez de rî bena; o cema îziman dekeno adirî ser û xwi ver di tirêneno. De ki a şameki pa bî, xwi ra o yo. Ow ki pa nêbî, o nîyo. Mi rî yew cema îziman berî owra ronî ow şêrî.
De rî cema îziman anî, ximzikar îziman beno cilda jey ver di ronano ow xwi nimneno, yew quliki ra temaşey jey keno. Wextê hewnî ki beno, o veyneno ki jey îzimî vistî adirî ser û xwi ver a tirêna. İna keno ki e, şameki ha pa. Şono veynda cenîya jey dano, vano
-Bê, wilay ino Fes Mistefa wo, mêrdey to yo!
Ring ring ring danî ber ro. O "enê cilanê xwi xwi ra deno, vanî
-Ne cilanê xwi xwi ra di, ne qe! Ma hinî ti dîy!
Weyra lewi yewnan a kwenî, miradê yewnan şa benî.
Nimaj beno, şonî banî ser o, qesri ser o lingi fînenî lingi ser ow lajê jey hinî şeqneno.
Fes Mistefa wazeno cesaretê lajê xwi sax ko, vano
-İnka lajê mi, lajê mi, ti indi şeqnenî, ay kam o mergda şima di ronawo? A xeymi çi ya a mergi di?
Laj vano -Qey senê? Kamî mergi di ronawo? Teyr bi teyrey ba xwi newtano bêro weyra!

Vano -Hinî yo bew, xeymi ha weyra.
Laj vano -Ez şona!
O vano -Di tenan ray ki wa şêrî, çî y ki ti şonî?
Di tenan ray kenî.
Xeymi di ma lajekan vana
-Lajê mi, wardî, di tenî ha yenî!
Vanî -Wa bêrî.
Ay di tenî yenî, vanî -Hi, hi, hi!
Wirdî biray hima wardenî zananê jînî gênî ancenî ow jînî ray kenî.
Ê şonî keye, nişnî qalî bikî, vanî «be be... be...», lajek qahrêno. Vanî
-Zanê jînî di ra kerdo, zanê jînî!
Lajek vano -Ez şona!
Fes Mistefa vano -Vindi! Dina tenan ray ki!
Dina tenan ray kenî, dina tenî şonî.
Maya lajekan vana -Lajê mi, dina tenî ha yenî, wardî!
Vanî -Wa bêrî, ma nêtersenî.
Ê ki yenî, wirdî biray hima wardenî, goşanê jînî gênî ancenî, qerfnenî ow jînî ray kenî.
Ay wirdî zî tepa şonî keye.
Vanî -Goşê jînî di ra kerdî!
Hima lajekê to xwi ban ra fîneno war, vano
-Qey ganê mi ganî bo senê bêrî merga mi di ronî ow ximzikarê mi şêrî, ê inawa bikî bere?
Xwi fîneno mayînda xwi ser ow rameno.
Ey pîy jey zî dim a şono.
Lajek şono, vano -Bûûû! Mi rî vanî Lajê Fes Mistefay! Şima çi benî ki şima hamey merga mi di ronawo?
Wirdî biray zî vanî -Dbrûûû! Ma ronawo!
Şonî, yewnan ver o şonî-yenî. Pîy jînî ti ra vano
-Mekî, mekî, şima biray yewnan î!
Weyra hema lewan yewnan a denî û miradê yewnan şa benî*.

* Na estaneki heway vatişê yew cenîya Qelbîniji amey nuştiş (Qelbîn yew dewa qezayê Pîranî ya, Dewleta Tirkiye nameyê na dewi kerdo Bozoba.)

Dî Lawîkê Dêrsêmî

Arêkerdox : *FİRAT*

I- Çolo

Da dayê, çolo, çolo, çolo!
Çolê vêsayî persena tey olumo ucuz û qezenc o.
Xoso xoso, xoso, derd o, wax kul o!
Emegê na dîna gewre çiqa tol o, bos o.

Da dayê Mezra nat o Qutî ya, mi va cadeko rast o.
Na daya ma gureto werdo, zera Comerd cora ho ra nêvirasto.
La lawo, na mowa min daymet gureto werdo,
Cora zerê Comerd ho ra nêvirasto.

Da dayê xoso, xoso, xoso, ax leminê xoso!
Emegê na dîna gewre çiqa tol o, bos o!
Çerxanê Haqo talay de seyr kerê,
Seyê mi çola Xarpêtî de hepis o, ez çiqa cila ho de xos o!

Da dayê xoso, xoso, xoso, ax leminê xoso!
Emegê na dîna gewre çiqa tol o, bos o.
Haqo tu cora keş rê nêdê diyayîne.
Cora mektuba ju lajî mo û pîyê kokim ra ama înkarkerdene.

II- Zerê Mi

Er erê, zerê mi, zerê mi!
Xizirê sata tenge key bojîyê tu ano keno binê sarê mi?
Wer erê, dewa sima ver de lewa teke,
Mi ver a selam ro mo û pîyê mi ke.
Ez ke memleketê vesayî de mirenû,
Porê a delale biya binê mezela mi ke.

Erê, derd o, zerê mi, zerê mi!
Çayê herediya, bojîyê ho nîkena binê sarê mi?
Er erê, zerê mi, zerê mi!
Xizirê serê deyray key bojîyê tu ano keno binê sarê mi?

Er erê, dewa sima ver a hêgao bez o.
Xizirê serê deyray naye be ho zano.
Er erê, çimê mi to de mendo.

Er erê, zerê mi, zerê mi!
Çayê herediya, bojîyê ho nîkena binê sarê mi?
Er erê dewa sima ver de be gavan o,
Pîyê tu, tu mi nêdano, zerê mi.
Dîlegê mi ke Haqo talay de vêreno.
Û (O) çira cêno seytan ver de xizmet vîneno

Da dayê, bî ra, vêra son o.
Taye îsan zekerînî vezeno.
Bira tu ke na bantê mi memleket de cinena,
Muzir Baba to de qilba beno,
Haqo tala to de heval beno.

FERHENGOK

band kaset
be bi, ve
bez bejî, çiyo bêaw (***hêgao bez*** hêgawo bejî)
biya biyari, beri (beeri)
bî ra bî, bi
bojî boju, bazi, bazû
bos tol, veng (Tirkî di boş)
cêno gêno
cinayîne cenayîş
Comerd [tekst di] Hûmay, Homa, Ella, Alla (***Zera Comerd cora ho ra nêvirasto*** Zera Hûmay caran xwi ra weş nêkerda)
cora caran, çi ray, bincaran, bin ra, bin di
çayê çi rê, çi rî, çi ra, çinay rê, çina ra?
çerxane (çerx) çerx, dewran
çiqa çiqas, çendi, çi hendi?
çira çila, çiley
çole çale, çali
daya ma dadîya mi, maya ma, mowa ma
daymet timî, timo, daîma
de di, dir, der
deyra derya, dengiz, behr, bahr
diyayîne diyayîş, deyîş; vînayîş, veynayîş
dîlege waştiş (Tirkî di dilek)
emeg renc, kedi (Tirkî di emek)
erê herê
guretene girewtiş, gurotiş
Haqo tala Heq te'ala, Homa te'ala, Hûmay te'ala, Ella te'ala
hepis hefs
herediyayîne celiyayîş, cigriyayîş, hêrs biyayîş
heval hembaz, embaz, imbaz, "emaz, enbaz, inbaz, "imaz, ombaz
ho xo, xwi, xwu, xwe, xu
înkar kerdene înkar kerdiş
îsan însan, înson, mêrdim, merdum, mordem
ju yew, yo, jew, zew, zu
ke ki, ku, gi
kes kes
kokim pîr, kal
laj lac, laz, law, layik
lewa teke leya teki, yew ley
mektube mektub
mezele tirbi, qebri
mo moe, may, mari, dadî, day (***mowa min*** maya mi, dadîya mi, daya mi)
Muzir Baba Munzur Baba
na nê, nî, enî, inî (***naye*** nay, enay, inay)
nat naşt, na heta, ina heta
olum merg, merdiş (Tirkî di ölüm)
pî pêr, bawk, baw, babî, ba, bu
qilba qible, qelbi
rast raşt
sare sere
sate se'eti
selam silam
sey seyek, sêkur
seyr kerdene ewnîriyayîş, ewniyayîş, hewniyayîş, temaşe kerdiş
seytan şeytan, şeyton, şeyto, şeytû
sima şima
son şan, şon, san
taye tanî, tonî, tay, toy, tûy
tey te de, miyan di
tol veng
tu 1)to, 2)ti
ucuz (ucij) erjan, ercan, arcon (Tirkî di ucuz)
û o, we; aw, ay
vezeno veceno, vejeno
vêra son o vera şanî yo
vêsaye veşaye, veşate
virastene viraştiş
vînayîne vînayîş, veynayîş
Xarpêt Xalpêt, El'ezîz
zerê mi zera mi, zerîya mi, waşta mi

Qederê Keynerda Padîşay

Arêkerdox : *Koyo BERZ*

Beno, nêbeno, welatê di padîşayê beno, welatna di jî şiwaneyê beno. Cinîyê nê wiman jî bi hal benê. Welatdê padîşay di "alîmêdo bol zanaye beno. "Alîm winêno istaran ra û qederê merdiman vano. Rojê "alîm padîşay rê vano

-Padîşayê mi, do to rê keynekê bibo û Welatê Cizîri di jew şiwanî rê do lajekê bibo. Serrê keynerda to û lajdê şiwanî heştês bê, keyna to û lajdê şiwanî ya do pîya bizewiciyê.

Padîşah vano

-Senî winî beno? Ez qosqoca padîşa ya, o şiwanên o. Senî keyna mi û lajê şiwanî do pî ya bizewicîyê? Qet çiyo wina nêbeno û ez ney rê razî nêbena, nêverdana keyna mi lajdê şiwanî ya bizewicîyo!

"Alîm vano -Ti razî bê, razî nêbê do pî ya bizewicîyê.

Padîşah vano

-Bahdo beli beno, ma do bahdo bivînê senî zewicênê!

Wextê ci yeno, sehata ci bena temam, cinîyerda padîşay rê keyneki, cinîyerda şiwanî rê lajek beno. Padîşah keynera xo hewt teney nobeçîyan a dano pawiteni û nêverdano bê marda keynekeri kes wededê keynekeri kewo. Padîşah cayê nêverdano nûştey dano ardiş û keno qundaxdê keynekeri. Nameyê keynekeri jî altûnê ser o dano yazikerdiş û keno keynekeri mil ki wexto ki keynekeri vinî bo bi nê altûnî ya bisilasneyo (bişinasiyo).

Rojê teyrêdo gird yeno saray mîyan di darda tûwêri ser o halîn virazeno, hergi roj saray çim keno û wedeyê keynekeri ra winêno. Teyr do kotî ra dekewo zere û keynekeri bero, ey rind hesab keno. Winêno teqayêda wededê keynekeri tim akerdeya ki ci ra vayo pak şiro zere. Teyr vano ez do na teqa ra zere kewa û keynekeri bera.

Teyr rojê winêno maya keynekeri amê şit da keynekeri û şî. O paca ra kewno zere û tewdê qundaxdê keyneker a keynekeri gîno û perreno, şino cayêdo bol û bol dûrî, adayê di anişeno.

Raya kesî a na ada nêkewna. Na adayêda issizi bena. Teyr ada di keynekeri rê darêda girdi ser o halîn virazeno, keynekeri keno mîyan û bi xo keynekeri keno warî.

Miyabeyn ra hewtês serrî ravêrenê. Padîşah û merdimê xo welatê nêverdanê geyrenê û persê keynekeri kenê, cayê di keynekeri nêvînenê. Keyneki teyrî heti resena û ziwandê teyrî ya qisey kena. Hewtês serran tepey a lajê şiwanî û enbazandê ci ya bi kelekêda werdî ya şinê seydê masan. Wertedê bahrî di keleka nînan dîn deyêna, nê gunenê bahrî mîyan ro. Enbazî pêro pê ra benê vilay û pê kenê vinî. Lajek bahrî mîyan di raştê boximêdê tûwêri yeno û xo nê boximî ya tepşeno. Panc rojî, panc şewî bahrî mîyan di boximdê tûwêri ser o şino. Roja pancî adayê di erzêno koşe.

Lajek şino ada, winêno bol biyo veyşan, pîzeyê ci yo zey qirincêlî ya qurr-qurr keno. Lajek çorşmeyê xo geyreno, tay tar û tur xo rê arêkeno, weno, fina mird nêbeno. Şino daran ser ra xo rê belûy-melûy û yemişo wişk arêkeno, weno. Pîzeyê xo hebê ki astar keno, qurrîya pîzedê ci vinderêna. No fin hewnê ci bol yeno. Şino sersîda darênda girdi bin di rakewno û dest di şino hewna.

Ti nêvanê na keyneki jî na ada di dara ki lajek bin di rakewto, a dari ser o bena. Keyneki vînena ki lajek ame dari bin di rakewt ema lajek keynekeri nêvîneno.

Keyneki teyrî heti bîya girdi, qandê coy zey însanan qisey nêzana ki veyn do lajekî. Zey teyran a qisey kena û cor ra çend finî bi wîçwîç a veyn dana lajekî. Lajek kewno hewndo giran, nîyaşnaweno. Bahdê çendna sehatan lajek beno aya. Keyneki fina cor ra wîçwîç kena, veyn dana lajekî. Lajek winêno cor ra wîçînîyê yena, sereyê xo keno berz û winêno cor a. Winêno ki keynekên a cor di, dari ser o. Veyn dano keynekeri û vano

-Wayê, ti kam a? Ti ya çi rê hesê xo nêkena û wîçwîçî kena?

Keyneki fina hesê xo nêkena û wîçwîçî kena. Lajek vano beno ki na keyneki lal a, qandê coy nêşena qisey bikero û şino keynekeri ronano war. Lajek û keyneker a pîya ada mîyan di geyrenê. Beno şan, keyneki vijêna darda xo ser, lajek jî dari bin di rakewno. Şan di teyr yeno, keyneki bi ziwandê mirîçikan a teyrî rê mesela vana û lajekî misnena teyrî.

Teyr keynekeri rê wina vano

-Xora mi ti qandê nê lajekî remnaya û arda na ada. Mi rê winî emir deyabî, mi jî o emir ardo ca. Ney a tepey a to yû ey a enbazey bikerê, qenê ti ziwanê ma jî misena.

Hîrê rojî keynek û lajekî ya pî ya geyrenê, keyneki lajekî heti hebê qisey misena û ziwanê ci abeno, kewno qisan ser. Roja hîrini lajek û keynek a benê ê pê. Beno şan, teyrek yeno, keyneker rê wina vano

-Ti enbazê xo jî bîya, pîya tiya rakewê. Ez do meşti nê bîro to û lajekî ya postî mîyan kera û pêrdê to rê bera.

Keyneki veyn dana lajekî, lajek yeno cor û teyrek vano

-Şima xo rê pîya rakewê. Newe ez şima pê heti verdana û şina, xo hadre kerê, bîro ez do bîra şima wiman postî mîyan kera û bera. Newe girweyê mi qedîya, ez şina. Mi rê emir deyabî ez keynekeri warî kera û bewnîya ay. Çaredê şima wiman a yazîkerdebî, şima wima do na ada di pê bivînê û ê pê bê. Ew ez do şima wiman bîro bera. Heştês serrê şima bîro benê temam. Mi şima wima berdî tepey a girweyê mi qediyêno.

Keyneki ziwandê teyrî ya vana

-Beno, ma xo kenê hadre.

Teyr dano piro û şino, keynek û lajekî ya tenîya pê heti verdano.

Teyr şino tepey a, keyneki lajekî rê vana

-Bîro teyr do bîro ma wiman posteyêdê girdî mîyan kero û bero pêrdê mi heti. Teyrî rê winî emir deyayo, o jî do ê emrî bîyaro ca.

Lajek vano

-Ma wima do senî postî mîyan kewê û no teyr do ma senî bero? Teyr nêşeno ma jewî hewa do, o do ma wiman senî hewa do?

Keyneki vana

-Wili ez nêzana, hele wa bîro bibo, beli beno do senî bibo.

Teyr wextê xo di yeno, vano

-Şima wima hadre yê?

Keyneki vana

-Ma hadre yê ema ma wima do senî nî postî mîyan kewê û ti do senî ma wiman hewa dê û berê?

Teyr keyneki rê vano

-Postî mîyan kewê. Wa lajek bin di dekewo, ti jî lajekî ser o dekewi.

Lajek kewno postî mîyan, postî mîyan di beno zey mirîçikên a. Lajekî ser o keyneki jî dekewena postî mîyan. A jî zey ey bena. Teyr fekê postî girê dano, neqûrda xo ya beno piro û perreno. Wexto ki beno postî ro zeki nîm kîloy peme perro.

Teyr wirnan gêno ano sarayda padîşay mîyan û wina vano

-Nê postî mîyan di keynaya padîşaya ki bîbî vinî, esta. Xeberi bidê padîşay, wa bîro keynera xo bivîno û ci rê wihêr bivijîyo.

Teyr çewtê postî beno û keynekeri rê wina vano

-Keynaya mi, newe xatirdê to, ez qayîl nîya to ra abirîya ema emir wina yo. Ez do to qe xo vîr a nêkera.

Keyneki postî mîyan ra wina vana

-To rê oxir bo maya mina şitî, ez jî qe to xo vîr a nêkena. Ti mi rê heqê xo helal ki. To mi ver di bol cefa werd û ti bol "edizyayê.

Teyr vano

-Helal bo. No heqê mi nîyo, heqê qederdê to yo. Mi jî to ver di bol cefa nêwerdo. Hemê çîyê to ameyê mi lingan ver û mi jî to rê ardê, dayê to.

Teyr dano pi ro û pereno şino. Xeberi danê padîşay, vanê

-Teyrê keyna to postî mîyan di ardi teslîmê ma kerdi û şî. Ma rê jî va «şirê veyn dê padîşay, wa bîro û keynerda xo rê wihêr bivijîyo.»

Padîşah bi kêf a yeno û vano

-Fekê postî meakerê û mi rê veyn dê "alîmî, wa "alîm bîro bi çimandê xo ya bivîno!

Veyn danê "alîmî, "alîm yeno. Padîşah "alîmî rê vano

-'Alîm, kanî to vatê «keyna to bibo heştês serre do lajdê şiwanî ya bijewicîyo? Ewro keyna mi kewti heştês, teyrî keyna mi mi rê arda. Kanî? Lajê şiwanî pîyasa di çinîyo! To vatê istaran mîyan di asayo û istaran misnayo. İstarey-mistareyê to kotî di mendê?

"Alîm vano

-Kana keyna to ya kotî di?

Padîşah vano

-Keyna min a postî mîyan di. Hadê ma şirê bewnîyê ci ra û postî mîyan ra vejê.

"Alîm vano

-Hadê ma şirê bewnîyê ci ra.

Yenê keynekeri heti. "Alîm fekê postî akeno û keynekeri rê vano

-Keyni mi, postî mîyan ra bivijî!

Keyneki postî mîyan ra vijiyêna.

"Alîm vano

-Lajê şiwanî, ti jî postî mîyan ra bivijî!

Lajê şiwanî jî postî mîyan ra vijiyêno.

"Alîm vano

-Şima pî ya se kerdo?

Wirna pê fek ra vanê

-Ma pî ya zewicîyayê û bîyê ê pê.

"Alîm vano

-Keyna mi, no kam o?

Keyneki vana

-No waşteyê min o. Min û ney a ma adayê di pê dî û ey a tepey a ma bîmi enbazê pê û verê ney rojê ma pî ya zewicîyay.

"Alîm keynekeri ra pers keno, vano

-Kê ti kerda warî, ti kotî di bîya?

Keyneki vana

-Teyrî ez kerda warî û ez adayêda issiz a bîya.

"Alîm lajekî ra pers keno

-Ti kam ê û ti senî şî na ada?

Lajek vano

-Ez lajê şiwanî ya. Min û enbazandê xo ya vijiyaymi seydê masan. Keleka ma bahrî mîyan di dîn deyê. Enbazê mi merdî. Ez raştê kokêdê tuwêri ameya û panc rojî, panc şewî bahrî mîyan di hetan na ada şîya û na ada di vijîyaya koşe.

“Alîm padîşay rê wina vano

-Padîşah, to dî qandê qederî çiçî ameyo nînan sere di? To sifte ra qebûl bikerdê, na hendayê rezîley nîyameyê nînan sere di. Qederdê kesî di senî yazi bibo se kes do ey bivîno. Zewbî çareyê ney çinîyo. Mi to rê va, to “emel nêkerd. Winî bizani ki tay çî estê kes qedê ci nêbeno. Ti çend bi quwet benê bibi, ti çend zengîn benê bibi, ti qedê qederê çarî nêbenê. To dî? To senî kerd, senî nêkerd, to nêşa nê qederî vernî ya geyrê. No ne karê to yo ne jî karê ma yo. No karê Elay û melekandê ey o. O teyro ki keyna to berdi, o melek o. O kokê tuwêro ki lajekî xo pa tepişto, o jî Xizir o. Elay nê çirîda nînan ra riştê. Ê enbazê lajekî jî nêfetisyayê û dest di ameyê koşe.

Padîşah vano

-Ti raşt vanê, zey to ya yo. Ez ney a tepey a qarmişê girwandê Elay nêbena. Ez ney a tepey a “emel kena ki qederê kesî senî yazi bibo se kes do ey bivîno. Çaredê kesî ya çiçî yazi biyo se o yo. Bê ey çîna nêbeno.

Padîşah bahdo keyna xo rê û lajdê şiwanî rê veyve keno û wiman ra zey pê hes keno, pê ra nîyabimeno.

Bîbliyografya Dimilî (Zaza) - V

Malmîsanij

320) Abekir, «Elbazî», Roja Welat (rojnameya siyasî û çandî ya 15 rojî), Ankara, no 10 (29-9-1978), r 11
321)Asarû Şî'etu'l-Îmamîye
322)Ascoli dans les Beitrage zur vergleich. Sprachf. V, 136
323)Ayre (pêserokê ziwanî), Stockholm, no 14 (Payîzo peyên 1987)
324)Bailey, H. W.; «Persia-Language and Dialects», Encyclopedia of İslam, Leiden, 1936, 3 1050-1058
325)Baran, «Birvil û Welat», Dengê Komkar (kovara Federasyona Komelên Karkerên Kurdistan li Elmanya Federal), Frankfurt, no 10 (Kanûn 1979), r 7
326)Behrengî, Semed; «Sanika Hezî», Tadayox M. Dersîmî, Berhem (kovara lêkolînên civakî û çandî), Stockholm, no 1 (Sibat 1988), r 50-58
327)Berz, Koyo; «Arwêşî», Armanc, Stockholm, no 76 (Çileyê paşîn 1988), r 10
328)Berz, Koyo; «Di Deyîrî», Armanc, Stockholm, no 72 (Gulan 1987), r 5
329)Berz, Koyo; «Ez Qeçeko Werdî ya», «Qiseyê Çorşmey Sêwregi», Kurdistan Press, Stockholm, no 77 (17-11-1989), r 11
330)Berz, Koyo; «Hemê Hacî», Armanc, Stockholm, no 71 (Nîsan 1987), r 5
331)Berz, Koyo; «Hewt Belay», Armanc, Stockholm, no 77 (Sibat 1988), r 10
332)Berz, Koyo; «Kitabê Malmîsanijî Herakleîtosî Ser», Kurdistan Press, Stockholm, no 71 (27-04-1989), r 8
333)Berz, Koyo; «Kuşat», Armanc, Stockholm, no 78 (Adar 1988), r 10
334)Berz, Koyo; «Molciley û Devey», Armanc, Stockholm, no 76 (Çileyê paşî 1988), r 10
335)Berz, Koyo; «Na Xumxum a, Kerameta Giran a Pey ra Dim a», Hêvî (kovara çandiya giştî), Paris, no 6 (Tebax 1987), r 80-94
336)Berz, Koyo; Na Xumxum a, Uppsala, Weşanên Jîna Nû, 1988
337)Berz, Koyo; «Sererût», Armanc, Stockholm, no 79 (Nîsan 1988), s 10

338)Berz, Koyo; «Şeytan û Şêxbizinî ya», Hêvî (kovara çandiya giştî), Paris, no 6 (Tebax 1987), r 109-111
339)Berz, Koyo; «Ti do Şêx Bê», Armanc, Stockholm, no 75 (Çileyê pêşî 1987), r 10
340)Berz, Koyo; «Vatena Seyîd Rizay», Kurdistan Press, Stockholm, no 71 (27-04-1989), r 9
341)»Bêrê Pêser Dest Pê Kerênê», Dengê Komkar, Frankfurt, no 50 (15-2-1983), r 10
342)Bêwar, Diljar; «Gelo Amaca Kovara Ayre çi ye?», Kurdistan Press (rojnameya 15 rojîn), Stockolm, no 28 (11-12- 1987), r 15
343)Bira, «Xwo Naske», Roja Welat (rojnameya siyasî û çandî ya 15 rojî), Ankara, no 10 (29-9-1978), r 11
344)Brûsk; «Vatey Verîno», Kurdistan Press, Stockholm, no 71 (27-04-1989), r 9
345)Cengiz, Seyfi; «Genel Çizgileriyle Tarihte Kürt ve Zaza Hareketleri», Sosyalist İşçi (Kurtuluş Πgütü yayın organıdır), no 38, s 5-9
346)Cengiz, Seyfi; «Kürdistan üzerine Notlar Milliyetçilik mi, Sosyalizm mi?», Sosyalist İşçi (Kurtuluş Πgütü yayın organıdır), no 36 (Ekim 1987), s 11-14
347)Cuinet, V.; La Turquie d'Asie (Géografie administrative statistique...), Paris, vol. 2, r 384-404
348)Çem, Munzur; «Halk Türkülerinde Dersim İsyanı», Dengê Komkar, Frankfurt, no 93-94 (7-2-1987), r 16; no 95 (5-3-1987), r 8; no 96-97 (25-4-1987), r 14; no 98 (29-5-1987), r 13
349)Çermug, M.; «Ayre Tarihi Bir Görev üstlendi», İkibine Doğru (haftalık haber, yorum dergisi), İstanbul, no 54 (3-9 Ocak 1988), s 5
350)el-Demlocî, Sedîq; Yezîdîyye, s 237
351)Dersdar, Yado; «Zon Ser», Dengê Komkar, Frankfurt, no 13-14 (Adar-Avril 1980), r 11
352)Dersim 1937-1938 Yarım Yüzyıl Sonra», Nokta [dergisi], İstanbul, no 25 (28-6-1987), s 12-23
353)»Dersim'de Devlet Baskısı Pervasızlaşıyor, Halk Buna Karşı Direniyor», Yeni Demokrasi [dergisi], Ağustos 1989, s 32-33
354)Dersimî, Haydarê; «Di Deyîrê (Lawikê) Dersimî», Hêvî (kovara çandiya giştî), Paris, no 6 (Tebax 1987), r 116-118
355)Dervîşyan, "Elî Eşref; «Bey», Fariskî ra tadayox Malmîsanij, Hêvî (kovara çandiya giştî), Paris, no 6 (Tebax 1987), r 95-103356)
Dewran, Hasan; Tausend Winde-Ein Sturm, Berlin, Editions Orient, 1988
357)Dilêr, Azad; Ez Çizviz Nêzana, Bonn, Weşanên Enstîtuya Kurdî Şaxê Almanî, 1987
358)Dilêr, Azad; «Mi ra Qahrîyaya», Armanc, Stockholm, no 75 (Çileyê pêşî 1987), r 9
359)Dînewerî, Ebû Henîfe; Ensabu'l-Ekrad

360)Düzgün, Mustafa; « Dimilî kî Zonê Ma wo», Kurdistan Press, Stockholm, no 71 (27-04-1989), r 9
361)Dûzgûn, M.; «Torey ve Adetê Dersîmî», Berhem (kovara lêkolînên civakî û çandî), Stockholm, no 1 (Sibat 1988), r 34-40; no 2 (Gulan 1988), r 18-27; no 3 (Îlon 1988), r 48-50; no 4 (Sibat 1989), r 18-19; no 6 (Cotmeh 1989), r 33-35; no 8 (Gulan 1990), r 34-39
362)»Dûmûlî», «Donbolî», Ferhengê Cografyayê Îran, [Tehran ?], Êntişaratê Daîreyê Cografyayê Stadê Erteş, Çapxaneyê Erteş, 1330, cild 4 (Ostanê 3. û 4. Azerbaycan-Abadîha), s 219, 225
363)'Ebdurrezaq Begê Necef Qulî Xan [Meftûn], Riyazu'l-Cennet [Tarîxê Denabîle], [destnuşte, Kutubxaneyê Şahî yê Tehranî di]
364)Ehmed, Dr. Kemal Mezher; Mêjû, Kurtebasêkî Zanisû Mêjû w Kurd û Mêjû, Bexdad, 1983, r 131-132
365)'Elîşan, Mihê; «Di Fiqrey», Armanc, Stockholm, no 72 (Gulan 1987), r 5
366)'Elîşan, Mihê; «Mi Soz Daw Ombazo», Kurdistan Press, Stockholm, no 71 (27-04-1989), r 8
367)Ellinci Yılında Dersim Ayaklanması, TKSP Yayınları, 1987
368)Espar, J.; «Erol Sever'in Döktüğü İnciler üzerine», Kurdistan Press, Stockholm, no 62 (23-02-1989), r 11; no 63 (02-03-1989), r 11
369)»Ferhenga Zazakî-Tirkî», Roja Nû (kovara hunerî, çandî û edebî), Stockholm, no 18 [61], Îlon 1987, r 30
370)Firat, «Welat», Hêvî (kovara çandiya giştî), Paris, no 6 (Tebax 1987), r 119
371)Gaetano Solanelli; «Sull Armenia e sulle sue provincie appartenenti alla Turchia», in Bolletino consolare, vol. XVIII, fasc. III, 1882, Roma, Ministero degli Affari Esteri, pp. 56
372)Galetti, Mirella; Kurd û Kurdistan Le Nûsrawekanî Îtalî da (Le sedey 13.-19.'da), Wergêranî Le Îtalîyewe Casim Tofiq, Piyaçûnewey Selah Rêbwar, Stockholm, 1987, r 82, 117
373)Gewranî, "Elî Seydo; el-Qamûs el-Hedîs/Ferhenga Kurdî Nûjen (Kurdî-"Erebî), "Emman (Urdun), 1985, s 652
374)Gökalp, Ziya; Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik İncelemeler, Ankara, Koma-lYayınları, 1975, s 48-52, 59
375)Gülensoy, Tuncer; Doğu Anadolu Osmanlıcası, Etimolojik Bir Sözlük Denemesi, Ankara, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü Yayınları, 1986
376)»Gulê», Roja welat (rojnameya siyasî û çandî ya 15 rojî), no 2 (30 Çirîya pêşîn 1977), r 15
377)Hallı, Em. Kur. Alb. Reşat; «Şeyh Sait Ayaklanması ve Bastırılması», Berhem (kovara lêkolînên civakî û çandî), Stockholm, no 1 (Şubat 1988), s 6-18
378)Hallı, Em. Kur. Alb. Reşat; Türkiye Cumhuriyeti'nde Ayaklanmalar (19-04-1938), Genel Kurmay Harp Tarihi Başkanlığı Yayınları

379)»Jurnalcılık Güçsüzlüğün İfadesidir», İşçi Köylü Kurtuluşu, no 77 (Şubat 1987), s 6
380)Justi, über die Kurdischen Spiranten, s 21
381)Karabekir, Kazım; İstiklal Harbimiz, s 134
382)Karsov, A.; Zametki o Kurdax, Tiflis, 1896
383)Kaya, H.; «Şerê Ke Wertê Bra û Waû de Biqedenîme, Neqênî û û Zalim ra Dust Dest Pê Keme», Roja Welat (rojnameya siyasî û çandî ya 15 rojî), Ankara, no 11 (9 Çirîya paşîn 1978), r 7-6
384)Khorsid, Hama Fuad; Det Kurdiska Språket och dess dialekters geografiska spridning, s 23
385)»Kilmo», Roja Welat (rojnameya siyasî û çandî ya 15 rojî), Ankara, no 12 (15 Çeleyê pêşîn 1978), r 15
386)Kızıl Yol [dergisi], Bobign (Fransa), no 2 (1984), no 3 (1984), no 4 (1985), no 5 (1986)
387)»Kulturtidskriften Piya», Invandrartidningen På Lätt Svenska, Stockholm, no 23 (18-8-1988), r 3
388)»Lawka Usê Seydalî», Roja Welat (rojnameya siyasî û çandî ya 15 rojî), Ankara, no 2 (30 Çirîya pêşîn 977), r 15
389)Le Coq, A. V.; «Ebi Zazakî Hîkaya Dunya Guzelî», Kurmancî ra tadayox "Umerê "Elî, Hêvî (kovara çandiya giştî), Paris, no 6 (Tebax 1987), r 104-108
390)Lerch, Peter Îvanovîç, «Çend Tekstê Dimilkî (Zazakî)», Hêvî (kovara çandiya giştî), Paris, no 6 (Tebax 1987), r 69-79
391)Loockwood, W. B.; A Panaroma of Indo European Languages, London, Hutchinson University Library, first published, 1972, s 243-244
392)Mackenzie, David N.; «The Role of The Kurdish Language in Etnicity», in (Peter Alford Andrevs), Ethnic Groups in The Republic of Turkey, Wiesbaden, Dr. Ludwig Reichert Verlag, 1989, s 541-542
393)Malmîsanij, «Bazı Yörelerde Dımıli ve Kurmanci Lehçelerinin Köylere Göre Dağılımı», Berhem (kovara lêkolînên civakî û çandî), Stockholm, no 2 (Gulan 1988), r 8-17; no 3 (Îlon 1988), r 62-67; no 4 (Sibat 1989), r 53-56
394)Malmîsanij, «Çend Zewtî û Du'ayê Ma», Berhem (kovara lêkolînên civakî û çandî), Stockholm, no 7 (Çileyê pêşîn 1990), r 23-30
395)Malmîsanij, «Dımıli-Kürtçe Tartışması», İkibine Doğru (haftalık haber, yorum dergisi), İstanbul, no 45 (1-7 Kasım 1987), s 4
396)Malmîsanij, «Di Şaîrî», Hêvî (kovara çandiya giştî), Paris, no 6 (Tebax 1987), r 112-115
397)Malmîsanij, «Du Şaîrên Dunbulî», Armanc, Stockholm, no 72 (Gulan 1987), r 4
398)Malmîsanij, Herakleîtos, Uppsala, Weşanên Jîna Nû, 1988
399)Malmîsanij, «Herakleîtos», «Zera Mi», Kurdistan Press, Stockholm, no 77 (17-11-1989), r 10

400)Malmîsanij, «Pawitiş», «Peşmiriyayîş», «Herakleîtos»; Armanc, Stockholm, no 79 (Nîsan 1988), r 10
401)Malmîsanij, «Peşmiriyayîş», Kurdistan Press, Stockholm, no 71 (27-04-1989), r 9
402)Malmîsanij, «Vatey Verînan», Berhem (kovara lêkolînên civakî û çandî), Stockholm, no 8 (Gulanı 1990), r 51-59
403)Malmîsanij, «Waşta», «Namê Mi Gune», «Herakleîtos»; Armanc, Stockholm, no 78 (Adar 1988), r 10
404)Malmîsanij, «Zaravên Me û Zimanê Nivisandî», Berbang, Stockholm, no 5 (1982), r 12-14
405)Malmisanlı, Mehmet; «Osmanlı Döneminde Kürtçe Eserler üzerine», Tarih ve Toplum (aylık ansiklopedik dergi), İstanbul, no 54 (Haziran 1988), s 59, 61; no 55 (Temmuz 1988), s 59
406)Mamekiz, «Hemedê», «Derê Laçî», Kurdistan Press, Stockholm, no 71 (27-04-1989), r 9
407)Mezher, Dr. Kemal [Dr. Kemal Mezher Ehmed]; Çend Lapereyek Le Mêjûy Gelî Kurd, beşî yekem, Bexdad, Çapxaney el-Edîbu'l Bexdadîyye, 1985, r 275
408)Minorski, Kurd, St. Petersbourg, 1915
409)Mîran, Reşad; «Etnografya w Çend Serincêk Derbarey Hendê Layenî Etnîkî Netewey Kurd», Peyv (govarêkî werzîy roşinbîrî giştî ye), salî duwem, no 5-6 (Oktoberî 1987), r 695-698
410)Muhemmed, Mesud; Lîsanu'l-Kurd, 1986, s 6, 29
411)Mustefa, Şukur; «Berkutê Le Ser Zarî Zazayî», Roşinbîrî Nwê (govarêkî werzî ye bo lêkolînewe) (Dezgay Roşinbîrî Bilawkirdnewey Kurdî derî dekat), Bexdad, no 115 (Eylûlî 1987), r 200-211
412)Mustefa, Şukur; «Ferhengî Dimilkî-Tirkî», Hawkarî (rojnameyekî heftane ye), Bexdad, no 902 (13-8-1987), r 6, 11
413)»Notices sur la littérature moeurs et coutumes Kurdes La Langue Kurde», Hawar (revue Kurde), Damascus (Şam), no 2 (1-6-1932), p. 9
-Hawar (kovara Kurdî), Stockholm, Weşanxana Hawar, 1987
414)Nûrî, Xalê; «Pêkenînek Bi Dimilî Sofî Lawo», Mîrkut (kovara her tiştî ye, ji bo herkesî ye), Uppsala, no 3 (1987), s 22
415)Okçuoğlu, Ahmet Zeki; «Zazaların Kökeni», İkibine Doğru (haftalık haber, yorum dergisi), İstanbul, no 36 (2-5 Eylül 1987), s 54
416)Papazyan, E. D.; «Serçaweyekî Nwê Derbarey Mêjûy Gelî Kurd», Govarî Korrî Zanyarî Ermenîstanî Sovyêt, jimare 8 (1967)
417)Parmaksızoğlu, İsmet; Tarih Boyunca Kürttürkleri ve Türkmenler, Ankara, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü Yayınları, 1983, s 43, 44

418)Piran, M.; «Ebubekir Pamukçu'nun Ahlak Dersleri Dolayısıyla», Kurdistan Press, Stockholm, no 55 (05-01-1989), r 11
419)Piran, Mehmet; «Maskesi Düşen Ebubekir Pamukçu», Kurdistan Press, Stockholm, no 74 (27-06-1989)
420)Pîran, M.; «Na Xumxum a», Kurdistan Press, Stockholm, no 71 (27-04-1989), r 8
421)Qûrtî, Xwezan; «Tiştek Xemnak Bi Zimanê Dujmin», Kurdistan Press (rojnameya 15 rojîn), Stockolm, no 31 (17-02-1988), r 11
422)el-Razî [Zazî?], Emîn Ehmed; Heft İqlîm
423)»Roze Roza Dest Pêkerden a», Dengê Komkar, Frankfurt, no 24 (Çileyê pêşîn 1980), r 3
424)Rustem Xanê Ehmed Xanê Dunbulî, Îşaretu'l-Edyan (destnuşte, Kutubxaney Ensûtuyê Matînedaran ê Ermenîstanê Sovyetî di, qismê "Erebkî di, no 622)
425)Rustem Xanê Ehmed Xanê Dunbulî, Îşaretu'l-Mezahîb (destnuşte, Kutubxaney Enstîtuyê Matînedaran ê Ermenîstanê Sovyetî di, qismê "Erebkî di, no 622)
426)Sabelov (Cabolov), Ruslan Lazareviç; «Zamecanija o vokalizma zaza», Iranskoejazykoznanie Ejegodnik, Moskova, Nauka, 1981, pp. 65-70
427)Serhad, Zerwes; «üç Soru», Kürdistan Press, Stockolm, no 60 (09-02-1989), s 11
428)Sêwrekij, Laser; «Çi rê Kurdkî Nênusenê?», Armanc, Stockholm, no 78 (Adar 1988), r 10
429)Sêwrekij, Laser; «Destê Jû Kurdî çi rê Şikiya?», Armanc, Stockholm, no 79 (Nîsan 1988), r 10
430)Sêwrekij, Laser; «Heme Ca di Aysel», Armanc, Stockholm, no 77 (Sibat 1988), r 10
431)Sêwrekij, Laser; «Taktîko Newe», Armanc, Stockholm, no 77 (Sibat 1988), r 10
432)Sêwrekij, Laser; «Zûrkero Gird Kam o?», Armanc, Stockholm, no 76 (Çileyê Paşîn 1988), r 10
433)Skagermark, Pia; «Världens enda tidskrift på dimlî måste läggas ner», DN Runt Stan (Skärholmen), 16-12-1987, s 25
434)Smîrnova, Êreyîde Enatolîvna û Eyûbî, Kerîmî; «Derbarey Diyalêktekanî Zimanî Kurdî», Çend Witarêkî Kurdnasî, Enwer Qadir Mihemed Le Rûsîyewe kirdûye be Kurdî, Stockholm, Le Bilawkirawekanî Komelî Hunerî Kurdî Le Swêd, 1989, r 15-26
435)Svanberg, Ingvar; Invandrare från Turkiet etnisk och sociokulturell variaton, Uppsala, Centre For Multiethnic Research, Uppsala University, Faculty of Ars, 1985, s 30
436)Dr. Şıvan, Kürt Millet Hareketleri ve Irak'ta Kürdistan İhtilali, Stockholm, s 50-51, 89-100
437)Şoreş, Dêrsim; «Dedkêna», Dengê Komkar, Frankfurt, no 116 (15-05-1989), s 22
438)»Tidskrift på dimlî måste läggas ner», På Lätt Svenska (invandrartidningen), Stockholm, no 3 (28-01-1988), s 2

439)Tolstoy, L.; «Dendika Erûgi», Tadayox A. Diljen, Berbang, Stockholm, no 50 (11-05-1988), r 20
440)Türk İstiklal Harbi, cilt IV, Ankara, T. C. Genelkurmay Başkanlığı Yayınları, no 1, s 259-281 (Koçgiri Ayaklanması)
441)»Tunceli Göçe Zorlanıyor», İkibine Doğru (haftalık haber ve yorum dergisi), İstanbul, 15-21 Şubat 1987, s 8-16
442)Usxan, «Dersim ra», Armanc, Stockholm, no 78 (Adar 1988), r 10
443)Usxan, «Finik, Mor, Leyîrê Pisînge», Armanc, Stockolm, no 79 (Nîsan 1988), s 10
444)Usxan, «Zorunlu Bir Açıklama», Kürdistan Press, Stockolm, no 60 (09-02-1989), s 11
445)Uzun, Mehmed; «Çima Dimilî?», Kürdistan Press, Stockolm, no 71 (27-04-1989), s 8
446)Uzun, Mehmed; «Nivîskarên Kurd-5 Malmîsanij», Kurdistan Press, Stockholm, no 77 (17-11-1989), r 10
447)Uzun, Mehmed; «Nivîskarên Kurd-6 Koyo Berz», Kurdistan Press, Stockholm, no 77 (17-11-1989), r 11
448)Windfuhr, Gernot; «A Mini-Grammar of Zaza», 1976 (unpublished)
449)Xamoyan, M. U.; «K İstorîî İzûçenîya Zaza», Voprosî Frazeologîî, Stîlîstîkî î Grammatiçeskogo Stroya Vostaçnix Yazikov, Semerqend, 1972
450)»Yakala ve ∏ldür Emri», İkibine Doğru (haftalık haber ve yorum dergisi), İstanbul, no 47 (15-21 Kasım 1987), s 8-18
451)Yalçın, Hüseyin Cahit; Siyasal Anılar, İstanbul, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, 1976, s 151
452)»Yew Deyîra Destnuşta Hesreta Wetenî», Hêvî (kovara çandiya giştî), Paris, no 6 (Tebax 1987), r 120
453)»Zazaca Dil Dergisi», İkibine Doğru (haftalık haber ve yorum dergisi), İstanbul, no 36 (2-5 Eylül 1987), s 52-53
454)Zılfi, Lawikê Pir Sultanj, Berlin 1988


EMIR CELADET BEDIR HAN
&
ROGER LESCOT
KÜRTÇE GRAMERİ
(Kurmanci Lehçesi)
INSTITUT KURDE DE PARIS
—
1990
Celadet Bedir Han
Roger Lescot
KÜRTÇE GRAMERİ
INSTITUT KURDE DE PARIS
—
1990
EMIR DJELADET BEDIR KHAN
et
ROGER LESCOT
GRAMMAIRE KURDE
(Dialecte kurmandji)
Ouvrage honoré d'une subvention du Centre National de la Recherche Scientifique
LIBRAIRIE D'AMÉRIQUE ET D'ORIENT
Adrien Maisonneuve
11, rue Saint-Sulpice, Paris (6e)
—
1970

Ereb Şemo

ŞIVANÊ KURD
LE BERGER KURDE

Di *Şivanê kurd* de Ereb Şemo, bi awayekî gelek xwezayî û sade, û ne bê şiîr, bûyerên her roj, jiyana eşîrên kurdên koçer bi me dide nasîn. Mirov ewê nikaribe van nivîsaran bê heyecan û bê eleqe bixwîne, nemaze ji ber ku êdî îro ev orf û adetên sedsalan di piraniya Kurdistanê de li ber windabûnê ne.

Dans *le Berger kurde*, Ereb Chémo, avec beaucoup de naturel et de simplicité et non sans poésie, nous fait connaître, dans les détails de tous les jours, la vie au grand air des tribus nomades. On ne lira pas ces récits sans émotion ni non plus sans intérêt, d'autant plus que ces coutumes séculaires ont pratiquement disparu dans la majeure partie du Kurdistan.

INSTITUT KURDE DE PARIS

85 FF
ISBN 2-908416-01-8

EREB ŞEMO

Şivanê kurd **le Berger kurde**

INSTITUT KURDE DE PARIS

Ereb Şemo

ŞIVANÊ KURD LE BERGER KURDE

kurdî-fransizî
kurde-français

INSTITUT KURDE DE PARIS
1989

چاپەمەنییە تازەکانی ئەنستیتو

«شڤانێ کورد » (بە زمانی فەرەنسی و کوردی)
"شڤانێ کورد" ناونیشانی رۆمانێکە لە نووسینی رۆمان نووسی کوردی سۆڤیەت [ئەرەب شەمـۆ] کە لە کۆتایی ساڵی ۱۹۹۰ دا وێرای کورتە رۆمانێکی دیکەی هەمان نووسەر بەناونیشانی " کوردێن ئەلەگۆز" بە هەردوو زمانی کوردی و فەرەنسی، لە ۳۲۵ لاپەرەدا، لە یەک بەرگی رازاوەدا، لە لایەن ئەنستیتووی کوردەوە – لە پاریس چاپ و بلاو کراوەتەوە. ئەم دوو تێکستە لە لایەن کوردناسی فەرەنسی بازیل نیکیتین وەرگێردراوەتە سەر زمانی فەرەنسی، کـە ئەویش پشتی بە وەرگێرانە رووسییەکە بەستوە کە لە ساڵی ۱۹۳۵ لە شاری تفلیس بلاو کرابۆوە.

«کوردستان : کۆلۆنی نێودەوڵەتان»
ئەم کتێبە، یەکێکە لە کتێبە هەرە بایەخدارەکانی رووناکبیری تورک، سۆسیۆلۆگ "ئیسماییل بێشکچی" کە بە زمانی تورکی لەبارەی کێشەی کورد و داگیرکرانی کوردستان لە لایەن دەوڵەتانەوە نووسیویەتی. ئەم کتێبە لە ۲۵۵ لاپەرەی قەبارە گەورەدا، لە لایەن ئەنستیتووی کوردە ـ لە پاریس لە زستانی ساڵی ۱۹۹۰ چاپ و بلاو کراوەتەوە.

«مـــەم و زیــن» ی خانی.
ئامادە کردن و پەراوێزنووسینی مامۆستا هەژار. ئەم کتێبە بریتییە لە تێکستی مەم و زین ، بە هەردوو شێوە کوردییەکە، واتە تێکستە کرمانجییەکەی ئەحمەدی خانی و موکریانییەکەی مامۆستا هەژار. مامۆستا هەژار پەراوێزی بۆ نووسیوە و پێشەکییەکی درێژی لەگەڵ بلاو کردۆتەوە. ئەم کتێبە لە ۳۷۰ لاپەرەی قەبارە گەورەدا لە ساڵی ۱۹۸۹ لەلایەن ئەنستیتووی کورد بلاو کراوەتەوە.

«جارِیی گەردوونیی مافی مرۆڤ». ئەم نامیلکەیە بە زمانەکانی کوردی، ئینگلیزی، فەرەنسی، تورکی، عارەبی، لە ۹۷ لاپەرە، ئەمساڵ لە لایەن ئەنستیتووی کوردەوە بلاو کراوەتەوە. کاک کەندال نەزان پێشەکییەکی بۆ ئەم نامیلکەیە نوسیوە.

گۆڤاری **«ستودیا کوردیکا »**، ژمارە ۱ – ۵. ئەم گۆڤارە بریتییە لە یازدە وتار و بابەتی جوراوجۆری بەنرخ ، بە زمانی فەرەنسی لەبارەی زمان و کولتوور و مێژوو ی کورد، لە ۱۹۳ لاپەرە پێکهاتووە.

«زمانی کوردی: سووک و هاسان». مامۆستا کامەران بەدرخان ئەم کتێبەی، کە بریتییە لە چەند وانەیەکی رێزمانی کوردی، لە بنچینە دا لە ساڵی ۱۹٦٥ بۆ قوتابییانی فەرەنسی نوسیوە. ئەنستیتووی کورد ئەم کتێبەی لە ۲۰٦ لاپەرە دا چاپ و بلاو کردۆتەوە.

زەنگی گومان

فەرهاد شاکەلی

کە شێوەت، بەربەیانێ، لەم مەرزوبوومە هەڵدێ
ئەم بەردەلانە، وەک ئاوێنە، ڕۆژگارێ
دەست دەکاتە جریوە.
لە پەردەی پەنهانی دڵدارییەوە
گەوهەرێ دەترووسکێ،
خوێنی ساردەوەبووم دێنێتە سەما.
ئەمە چ ئەوینێکە وەکوو تیغ
دڵی وەرزە گریاوەکان دەپێکێ ؟!
ئەمە چ دڵدانەوەیێکە
کە ناوی وێرانەی دەروونم ناهێنێ ؟!

ئای لە سامی ئەم شەوەی نابڕێتەوە،
هەر زایەڵەی زەنگی گومانە
لە ئەشکەوتی بناری تەنهاییشدا
دەگاتە گوێم.

سۆڵەنتوونا، ١٩٨٧/١٢/٢٤

هەر ئەبوایە لە ئاوی رەشت بدایە
یان ئەبوایە وەکوو بنچک گرمۆڵە بی
وەک ماری سەر پەپکە بخۆی
حیلەی ئەسپت
باڕژنی مافری «خەج» ت
وەکوو سەرت
لە ناو قەڵای ئەژدەهاکدا بەند کردایە
ئەی چیت ئەکرد؟

*　　*　　*

لەبەر چاوت کەلەبچەیان کردە بازووی هەور و هەتاو
ئاویان خنکان
پەنجەی شنە بایان قرتان
لەبەر دەمتا گۆشاوگۆ شیعریان سەر بڕی
ڕیشی «مەولەوی» یان سووتان
من بۆ ئەوەی کۆت نەکرێتە پێی درەخت و، گوڵەگەنم
لە بار کێڵگە و زەوی نەچێ...
من بۆ ئەوەی جۆگە نەبێ بە کۆیلە و باران نەمرێ و
گیا پێ بگرێ
خۆم لەناو تۆدا توانەوە و گەیشتمە لات
ئەی ئەوینی شاخ و داخ و عەشقی فەرهاد
هەر ئەبوایە من بێمە لات!

ستۆکهۆڵم، مارتی ١٩٨٨

هەر ئەبووایە سەری ئەو عەشقە هەڵگری
تۆ ئەوسەرە هی خۆت نەبوو
هەر ئەبوایە بچیتەوە هەواری گوڵ و خۆڵەمێش
هەر ئەو هەوارە هی تۆ بوو.
هەر ئەبوایە بەو ژیلەمۆی عەشقەی خەزاڵ
داپڵۆخایە پێستی ڕۆژگاری تەمەنت و، هەڵقرچایە
ئەوینی ناو دۆزخی ساڵ
هەر ئەبوایە،
بۆ سێهەم جار،
کفنەکەت لەبەرکەیتەوە.
گڵۆڵەی ژان لەسەر تەشی چیاکانت هەڵکەیتەوە.
وەکوو شەهید چاو ببڕیتە:
گزنگی خوێن
گورج بیتەوە
قیت بیتەوە
لاو بیتەوە،
کاژی هەرەس فڕێ دەیت و بەدەم لاوکی سەوزەوە
بڕۆیتەوە لای گاشە بەرد، لای بەردە قارەمانەکان،
لای « داس» ی دەس زەرد و ماهی دەربەندەکان
وا نەبوایە وەکوو شەختە ئەوین ئەیبەست،
سترانەکانت لاڵ ئەبوون
کچی هەیران، سوارەی لاوک، بە نێچگاری
دەست بەرداری ماڵی وشە و ژانت ئەبوون،
ئەی ئەوساکە تۆ چیت ئەکرد؟
لەبەر دەمتا و لە پاشکۆتا کێت هەڵ ئەگرت،
چیت هەڵ ئەگرت؟
چ هۆیەک ئەیانکردی بە میوانی
«سیامەند» و کام (خەج) چاوی نێرگزی خۆی
ئەدا لەبەرۆکی خەمت؟
لە گەڵ وشەی قوربانیتا چۆن ڕووبەڕوو ئەبوویتەوە؟
مەچەکی برداوی «خانی» ت بۆ کوێ ئەبرد؟
لەکام گۆڕستانی شیعرا ئەتشاردنەوە؟
هەر ئەبوایە ببی بە گڵە و بە گەرداو،
هەر ئەبوایە مۆتەکەی ترس دەستەمۆ کەیت

خۆشەویستیت دارستان بوو، تەماشات چڕ، ئازارەکانت دارەوان،
وەک سموورە بەسەر قەدی گرێ گرێی ، رەش و سپی،
شەو و رۆژتا هەڵ ئەگەڕان، ماندوو نەبوویت، خۆت رێگە بوویت،
نەخشە نەبوو بتگرێتە چوارچێوەی خۆی، تۆ خۆت نەخشەو،
خۆت چوارچێوە و، ئەودیو ئەودیوی چوار چێوە بوویت،

*   *   *

لەو دەمەدا
بالآت باڵەبانی خوا بوو
ئاتی بە لێوی کێوەوە
بە فووی زریان و رەشەبا ، گڕ گرتیتی و بووی بە ئاواز
بووی بە لەنجە، بووی بە سەما
داربەڕۆکان پەنجەی خوا بوون
رەوەزەکان کەللەسەر و شانی خوا بوون
کە ئەیژەنیت:
دەمێ ئەبوویتە شەپۆل و باڵت ئەگرت
دەمێ ئەبوویتە باران و خوڕ دات ئەکرد،
دەمێکی تر ئەبووی بە زاری ئەشکەوت و وەک «هەزارمێرد»
لە دوێنێوە بەرەو ئێستە
بانگی هەزار هەزار ساڵت ئەکرد.
تۆ ئەو دەمە ئەسپی قەترانیی سەرکێش و جڵەوبەر بووی
(لاس)ی وێڵی دوای (خەزاڵ)ی مانگەشەو بووی.
خەزاڵ گیرخواردووی ناوتەمی قوللەی قاف بوو
دێوی سپی و دێوی رەش و درنجەکان، ئەویان بەقەفی
سمێڵ و، کوتی بسک و، قژاڵی چنگ بەستبۆوە
یارەکەی تۆ
وەک با و بۆران
ئەیزریکان
وەکوو هەور
ئەیقریشکان
ئەو تاقگەی زیندانیی بوو، پرشنگی دیل،
هەوای کۆت و پێوەند کراو، قوربانی بوو.

*   *   *

تاڤگەی زیندانی

شێرکۆ بێکەس

وەک چۆن ئەستێرە ئەکشێ: کەوانەیی، تاج پڕشنگدار،
چاو ئاگرین، گەردن زیوین، تیژ وەک عەشق،
کوت و پڕیش وەک مەرگەسات
تۆیش بەو جۆرە لەشەوێکی مانگ کوژراودا
لەشەوێکی بەژن وبالا هەڵقرچاو دا
لە وڵاتی خۆڵەمێش ولەژێر قوببەی مێژوویەکی
بریندار و زەمینێکی کوت کراودا
ئاوا کشایت
زەرد، زەرد، کشایت
ئاڵ، ئاڵ، پژایت
وەکوو بەفراو لەکاوانی ئەوینەوە، بەرەو دامێن چۆڕایتەوە
ملی کەژ و هەردی بڕاو، مەچەکی بەرد، پلووسکت بوون
وردە وردە بویتە ڕووبار، وەکوو خوێنت سوورهەڵگەڕایت
کڵپە لەتۆی ئەخواردەوە، خۆشەویستیت ئەستێرکێکی بەخشندە بوو،
لێی ئەڕژا، خۆشەویستیت، گەڵا گەڵا، سەوز هەڵگەڕا،

بەرێوەبەری ناوخۆیی، و کادر و کاربەدەستانی حزبەوە نوێنەرایەتی لێکرا، بەعسییەکان لە ڕێگای دەوڵەتەوە دەستەڵات و ئامرازی چەوسانەوەی خۆیان چەسپاند.

لە ڕاستیدا ئەم پرۆژانە، درێژەپێدانی هەمان پلان و بەرنامەی سیاسەتی چەوسانەوە بوون کە حزبی بەعس دووساڵ بەر لەهاتنە سەرحوکم دایڕشتبوون، واتە لە ساڵی ١٩٦١دا. ساڵی ١٩٦٢ دوای سەرنەگرتنی یەکیەتی سوریا و میسر، یەکەم هەنگاو بەرەو پێکهێنانی "پشتێنەی عەرەبی" نرا. ئەو پشتێنەی کە ناوچەیەکی پانوبەرینی دەگرتەوە بەدرێژایی ٣٢٠ کیلۆمەتر و بە پانایی ٣٠ کیلۆمەتر. ئامانجی سەرەکی پێکهێنانیشی لەناوبردنی هەموو چەشنە پەیوەندییەک لە نێوان کوردی سوریا و کوردی پارچەکانی تری کوردستان بوو. لە ئەنجامی بەجێهێنانی پرۆژەیەکی تر کە بە پلانی "سەرژمێری نائاسایی" ناسراوە و تەنها بۆ ناوچە کوردنشینەکان بوو، ١٥٠ هەزار کورد بە هاووڵاتی ناسوری، واتە بێگانە، لە قەڵەم دران. دەوڵەتی سوری لە ساڵەکانی حەفتادا لەژێر ناوی " گوندە نوێ سازەکان"دا پرۆژەیەکی تری داڕشت. مەبەستی ئەم پرۆژەیە بریتی بوو لە گواستنەوەی چەند خێڵێکی کورد بۆ دەرەوەی ناوچە کورد نشینەکان و لە جێگایان خێڵە عەرەبەکانی باشوری وڵات نیشتەجێ بکات.

بیری گشت ئەم پرۆژانە لە لێکۆڵینەوەیەک وەرگیرابوو کە لەلایەن عەقید محەمەد تالب هیلال، کە لە ساڵی ١٩٦٢ پۆلیسی سیاسی بوو لە ناوچە کوردنشینەکان، ئامادە کرابوو. ئەم لێکۆڵنەوەیە لەژێر ناوی *لێکۆڵینەوەیەک دەربارەی ناوچەی جزیرە لە ڕوانگەی نەتەوایەتی و کۆمەڵایەتی و سیاسی*، لەلایەن چاپەمەنی حزبی بەعسەوە لەساڵی ١٩٦٣دا چاپکرا. لەسایەی ئەم کتێبە، نووسەر، پاش ماوەیەکی کەم بوو بە وەزیری یاربوو.

دوامین بەشی ئەم گوتارە تەرخان دەکەین بە ئاوڕدانەوەیەک لە هەڵوێستی دەوڵەتی بەعس بەرامبەر بە کورد لەم دە ساڵەی دواییدا. لە ساڵی هەشتاوە، بارودۆخی کوردەکانی سوریا گۆڕانێکی زۆری بەسەرداهات، کە تەنها پەیوەندی بە بارودۆخی ناوخۆی سوریا نەبوو بەڵکو لە هەمان کاتدا بە گۆڕانکارییەکانی ناوچەی ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاست و بەو دەورەی کە سوریا لە ناوچەکەدا بینی.

چۆن دەتوانین لێکیبدەینەوە کە دەوڵەتی سوری لەکاتێکدا گشت مافێکی لە کوردەکانی خۆی داگیر کردووە، ببێتە بنکەی پەنابردن بۆ ڕێکخراوە کوردییەکانی عێراق و تورکیا؟

بێگومان "پارسەنگی ناودەوڵەتان" هۆیەکی سەرەکی ئەم دیاردەیە. شەڕی نێوان ئێران و عێراق، بارودۆخی پڕ مەترسی لوبنان، دژایەتی و بەربەرەکانی دوو دەوڵەتی بەعسی عیراق و سوری لەسەر بەدەستەوە گرتنی دەسەڵات لە ناوچەکەدا، هیمی ئەو ئاڵوگۆڕە پێکدێنن. هەڵبەت نابێ هۆکارە مێژووییەکانیش لە بیر بکرێن، هەروەک کێشەی سنووری نێوان سوریا و تورکیا کە لە سەردەمی حوکمی ئینتدابییەوە هەتا ئیمڕۆ لە ئارادایە.

له دامەزراندنی دەوڵەتی سوریاوە تا کۆتایی ئینتدابی فەرەنسی

هاوپەیمانەکان بە چەند ڕێککەوتننامەیەک، ئیمپراتۆریەتی عوسمانیان لەناو خۆیدا دابەش کرد. بەپێی پەیمانی "سایکس - پیکۆ" و کۆنفرانسی "سان - ڕێمۆ" سوریا دەکەوێتە ژێر ئینتدابی فەرەنسی و عێراق، فەلەستینیش ژێر ئینتدابی ئینگلیزی. دوابەدوای ئەم دابەش کردنانەیە کە کێشەی کورد لە سوریا خۆی دەنوێنێ. پێشتر کوردستانی سوریا بەشێک لە کوردستانی عوسمانی پێکدەهێنا. سوریا وڵاتێکە کە لە کەمایەتیی جۆراوجۆر پێکهاتووە و هەرگیز یەکیەتیەکی نەتەوەیی ئەوتۆی بەخۆیەوە نەبینیوە. ئەم کەمایەتیانەش یان مەزهەبین confessionnel (دروز، عەلەوی، چەرکەس و مەسیحی...) یاخود ئەتنیکین (کورد، ئەرمەن، عەرەب...)

لە سەردەمی ماندای فەرەنسی بوو کە سوریا ئاشنایی لەگەڵ بیری ناسیۆنالیزمی دەوڵەتی پەیداکرد. ئەو دەوڵەتەی کە تێدا کەمایەتیەکان زیاتر هەست بە پەستنەوە بە کۆمەڵگەی communaute خۆیان دەکەن لەوەی بۆ نەتەوەیەکی سوری. دەسەڵاتی ئینتدابی زانی چۆن سوود لە باری بوونی کەمایەتی لە وڵات وەربگرێت، بۆ خۆچەسپاندن و پارچەکردنی هەموو جۆرە ئۆپۆزیسیۆنێک کە بۆی هەبێت لەبەر دەسەڵاتی بوەستێت. بەم جۆرە، سیاسەتی ناسراو بە «بەشکردن بۆمەبەستی حوکم کردن»یان گرتە دەست. هەر لەسەر ئەم بنەڕەتە سوریایان دابەش بە چوار یەکێتی سیاسی entites politiques کرد و چوار دەوڵەتیان تێدا دروست کرد: دەوڵەتی حەلەب (لەگەڵ ڕژێمێکی تایبەتی بۆ سەنجاق و ئەسکەندەرونە)، دەوڵەتی شام، دەوڵەتی دروز و دەوڵەتی عەلەوییەکان. لەم ناوەدا، تەنها کورد بوو کە بەهەمان شێوەی کۆمەڵگەکانی تر کەمایەتییەکی پێکدەهێنا، وێڕای ژمارەی دانیشتوانی و تایبەتمەندێتی سنووری و بناسی نەتەوایەتی، هیچ جۆرە قەوارەیەکی Status بۆ دیارنەکرا. ئایا کورد ئامادە نەبوو دەوڵەتێک وەکو کەمایەتییەکانی تر بۆخۆی پێکبهێنێت؟ پێویستە بەبیر بهێنرێتەوە کە لەساڵی ١٩٣٧دا دانیشتوانی جزیرە ڕاپەڕینێکیان دژی دەسەڵاتی مەرکەزی دیمەشق سازکرد. داواکاری جزیریە ڕاپەڕیوەکان ئەوە بوون کە قەوارەیەک بۆ ناوچەکەیان لەلایەن حکومەتی مەرکەزییەوە بەشێوەیەکی ڕەسمی، وەکو ئەمەی بە سنجاق و ئەسکەندەرونە بەخشرا، بێتە ناسین و مافی کەمایەتییان بۆجێبەجێبکرێت. شایانی باسە کە ڕۆژنامەکانی ئەو سەردەمە ئەم جووڵانەوەیان بە «شۆڕشی جزیرە» ناودەبرد.

لەساڵەکانی ١٩٣٠دا بوو کە هەستی نەتەوایەتی کوردی لە سوریادا دەست بە پتەوبوون دەکات و دەبێتە قۆناغێکی دیاریکراو و بنەڕەت بۆ بەرەوپێشەوەچوونی باری سیاسیی کوردەکانی سوریا. چەندین ڕێکخراوی سیاسی و کۆمیتە و دەستەی ڕۆشنبیری پێک هات و بڵاوکراوەی کوردی سەری هەڵهێنا، کە لەمیانیان گۆڤاری بەناوبانگ «هاوار» لەساڵی ١٩٣٢ەوە کەوتە دەست خوێنەری کورد و هەروەها بڵاوکراوەی تر کە تا کۆتایی دەسەڵاتی فەرەنسی لەساڵی ١٩٤٦دا هەر چاپ دەکران.

ساڵی ١٩٤٦، ئەو ساڵە بوو کە دەسەڵاتی ئینتدابی دەست لەبەر داواکارییەکانی

دانشتوانان دەهێنێتە خوارەوە، کە پێش هەموو شتێک رەخنەی بەجێهێنانی حوکمی ئینتدابی لێدەگیردرا. بەهۆی پراتیکەکانی ئەم حوکمە، هەستی نەتەوایەتی "سوری" لە چوارچێوەی ئەم دەوڵەتە دروستکراوە، رۆژ بە رۆژ خۆی پتەوتر دەکرد. لە رۆژی ١٧ی نیسانی ١٩٤٦دا بە دەرچوونی فەرەنسی لە سوریا، حوکمی ئینتدابی کۆتایی پێهات و قۆناغێکی تازە لە مێژووی ئەم وڵاتە دەستپێیکرد.

قۆناغی رژێمی پارلەمانی : ١٩٤٦-١٩٦٣

دوای دەرچوونی فەرەنسییەکان، سوریا تووشی قەیرانێکی سیاسی بەردەوام بوو: نەریتییەکان و نوێخوازەکان بەرامبەر یەک کەوتنە بەربەرەکانی دژی یەکتر. نەریتییەکان خاوەن دەستەڵات بوون و ئامادە نەبوون بەهیچ شێوەیەک واز لە بەرژەوەندی خۆیان بهێنن. ئەم قەیرانە سیاسییەی کە سوریا تووشی دەبێت، ئاکامێکی میکانیزمی ئەو دیمۆکراسیە دەستکردە بوو کە لە حوکمی ئینتیدابییەوە بە میرات مابۆوە. ئەو دیمۆکراسییەی کە بە زەحمەت لە وڵاتە دواکەوتوەکاندا جێگیردەبێ.

لەگەڵ ئەمەش، ئەم ماوەیە لە مێژووی سوریادا جێگای شایانە و پێویستی هەیە زیاتر لێیکۆڵدرێتەوە: لە ماوەی ساڵەکانی ١٩٤٦ ـ ١٩٦٣ دا، رژێمێکی پەرلەمانی حوکمی سوریای گرتە دەست و سیستەمێکی هەڵبژاردن و دەنگدان لە سەر بناغەی نوێنەرایەتی کەمایەتییەکان دامەزرا. لە ساڵی ١٩٥٧دا، کۆمەڵێک رۆشنبیری کوردی سوریا و چەند سەرکردەیەکی کوردی کوردستانی تورکیا، کە پەناهەندەی سوریا بوون، حزبێکی نوێخوازی کوردییان دامەزراند.

لەگەڵ ئەمەشدا ناتەبایی و بەربەرەکانی نوێخوازەکان و نەریتیەکان هەتا ساڵی ١٩٦٣ هەر درێژەی هەبوو.

قۆناغی رژێمی بەعسی : ١٩٦٣ تا ئیمڕۆ

بەڵام، کاتێ لە ساڵی ١٩٦٣، پارتی بەعس، کە بەشێوەیەکی سەرەکی لە عەلەوییەکان پێکهاتبوو، هاتە سەر حوکم، رژێمێکی زۆردەستخوازی دامەزراند. بناغە سەرەکییەکانی ئەم رژێمە بریتی بوون لە هێزی سوپایی و دامودەزگاکانی راگەیاندن. بەعسیەکان بۆ مانەوە لەسەر حوکم چەند پڕۆژەیەکی بەربڵاویان بەمەبەستی گۆڕینی بچمی کۆمەڵەی سوری گرتە دەست. بەئامانجی دروستکردنی بنکەی "گەلی" چەندین رێکخراوی جۆراوجۆری کۆمەڵایەتی و پیشەییان، لەسەر بناغەی بنەماڵە دامەزراند، وەکو یەکیەتی ئافرەتان، لاوانی شۆڕش... یا لەسەر بناغەی کۆرپۆراسیۆن کە هەموو کۆمەڵ تێیدا نوێنەرایەتی لێدەکرێت وەکو یەکیەتی جوتیاران، یەکیەتی سەندیکای کرێکاران، یەکیەتی قوتابییان، یەکیەتی نووسەران... لەگەڵ دامەزراندنی سیستەمێکی ئیداری تازە، کە لەلایەن پارێزگار، وەکو

دامەزراندنی دەوڵەتی سوری و کێشەی کورد لە سوریا

نووسینی: ڕێنـــاس

وەرگێرانی لە فەرەنسییەوە: خانی شەرەفکەندی

مەبەستی سەرەکیمان لە بلاوکردنەوەی ئەم وتارە، بریتییە لە پێشکەشکردنی هێڵە گشتییەکانی لێکۆڵینەوەیەک کە ئێستا لە ئارادایە، دەربارەی ناوچە کوردنشینەکانی سوریا لە چوارچێوەی مێژووی هەڵکشانی سیاسی ئەم دەوڵەتە. لەم ڕووەوە دەتوانین مێژووی سوریا بە سەر سێ قۆناغی سەرەکی دابەشبکەین: یەکەمیان لە ڕۆژی دامەزراندنیەوە دەستپێدەکات تا کۆتایی ئینتیدابی فەرەنسی. دووەمیان، قۆناغی کۆماری پەرلەمانی دەگرێتەوە کە لەگەڵ دەرچوونی فەرەنسییەکان لەساڵی ١٩٤٦ دەستپێدەکات تا بەدەستهێنانی دەسەڵات لەلایەن پارتی بەعس لە ساڵی ١٩٦٣دا، کە تا ئێمڕۆ دەستتێشانی قۆناغی سێیەم، لە مێژووی سیاسی سوریادا دەکات.

بەبیرهێنانەوەیەکی مێژوویی

لەو کاتەی کە ئیمپراتۆریەتی عوسمانی لەلایەن ڕۆژاواییەکان وەکو «پیاوە نەخۆشەکە» لە قەڵەم دەدرا، تێکشکانی ڕۆژ بە ڕۆژ ئاشکراتر دەبوو. ئەمەش بەشێوەیەکی سەرەکی لە ئەنجامی خواستی ئەو گەلانەی، کە بۆ ماوەی چەندین سەدە ئیمپراتۆریەتی عوسمانییان پێکهێنابوو، بۆ ڕزگاربوون لەژێر دەسەڵاتی مەرکەزی. ئەم ڕاستییە بیانوویەک بوو لە دەست هێزە ڕۆژاواییەکان بۆ چەسپاندنی دەسەڵاتی خۆیان لەم ناوچەیە و بەجێهێنانی سیاسەتی ناسراو بە «کاپیتولاسیۆن». هەر ئەمانیش بوون کە بێ ڕەچاوکردنی خواستی میللەتانی ناوچەکە، لەدوای تێکشکانی دەوڵەتی عوسمانی،سنووری تازەیان دیاری کرد. بەم کارە، هێزە ڕۆژاواییەکان کێشەی ئاڵۆزی نوێیان خستە سەر کێشە کۆنەکان. بەم جۆرە، ئێمڕۆ گەلێکی وەکو گەلی عەرەب لەلایەن زیاتر لە بیست دەوڵەت نوێنەرایەتی لێدەکرێت، لەکاتێکدا گەلی کوردیش کە بەسەر چوار دەوڵەتدا دابەشکراوە، لە مافی هەبوونی یەک دەوڵەتیش بێبەشکراوە.

پەشت دا باسی دووهەمین مانگی زستانێ دەکات و بە (بەهمەن) ناوی دەبا کە بە کوردی واتە مانگی زۆر بارینی بەفر و (رنوو ـ رنو) ی بەفر لـە کۆێستانان سازبوون سەبارەت بەم سێ مانگە، یا باشتر بڵێم مانگەکانی زستان، ئەزمونێکی ئەوتۆم نییە، بەڵام دیارە ئەگەر ناوەکان کوردی بان چاکتر دەبوو.

سەبارەت بەناوی مانگەکانی ئاڤێستا، ئەمن ناڵێم هەر دەبوو لەوان کەڵک وەرگرن و بەس ، ئەمخێر ئەوانیش زادەی سەردەم و کات و چاخێکی تایبەتین کـە هەزاران ساڵیان بە سەرا چووە، بەڵام دەبێ دیاردە بۆ ئەم راستییە بکەم کە لەم سەدساڵەی دواییدا، فارسەکان لەئێمەی کورد مودریک تر و لەباری فەرهەنگی و ئەدەبیەوە لە پێشتر بوون و زۆربەی هەرە زۆری کەلتوور و فەرهەنگی کۆنی گەلانی ئێرانیان بە ناوی فەهلەوییات و پەهلەوییات و یان زەردەشتییات و چی و چی تر داوەتە پاڵ فەرهەنگی خۆیان و فەرهەنگ و کولتووری خۆیانیان پێ دەوڵەمەند کردووە و هیچ کاتیش وەرووی خۆیان ناهێنن کە کوردیش لەم فەرهەنگەدا بەشدارە و تەنانەت رەنگە خاوەنی سەرەکی بەشێکی هەرە زۆری فەرهەنگ و ئەدەبی پێش ئیسلام لە ئێراندا بێ. مەبەست ئەوەیە کەئێمەش لە ئاڤێستا و کتێبە کۆنەکان و شوێنەواری پێش ئیسلام وەک خاوەن ماڵێک کەڵک وەرگرین و بەشی خۆمان هەڵاوێرین، دەنا هەر ئەوەمان بەسەر دێ کە فیردەوسی بەسەر زۆربەی داستان و بەیتە کۆنەکانی کوردی هێناوە، یان وەک وەحیدی دەستگوردی چی بە سەر شێعر و هەڵبەستەکانی بابەتاهیر هێنا، کە هەمووی گۆڕین و وشەی کوردی لێ سڕینەوە. جابۆ ئێمەش لە کولتووری کۆنی پێش ئیسلاممان کەڵک وەرنەگرین و لە ناوەکانی ئاڤێستایی ئیستیفادە نەکەین؟

کرماشان، ٦٦ /٦/١٢
٨٧/٩/٣

کەوانی تیر
تشتری رازاوەی
ئاوات لەسینگان
شاراوە

(تیر یەشت، هۆرەی ٢)

دەستەی پێکهێنەری ناوەکان ئەم ناوەی بۆ مانگی ئەوەڵی پایز داناوە:

(٢) ـ گەلاوێژ، بەفارسی پێی دەڵێن (مرداد) لە ئاڤێستادا باسی هەیە، بەڵام یەشتی تایبەتی نییە، لە (١٥) ی ئەم مانگەدا تەشقی عەرز و ئاسمان دەشکێ، لەسەر ئەم باوەڕەم کە (گەلاوێژ) تەنانەت لەناوی ئاڤێستایەکەشی جوانترە.

(٣) ـ شاریڤەر 'SARIVER' کە بە فارسی بۆتە (شهریور) لە ئاڤێستادا باسی هەیە، بەڵام یەشتی تایبەتی نییە.

سێ مانگی پایزی:

(١) ـ مێهر کە بەفارسی پێی دەڵێن (مهر]. ئەمە ناوێکی زۆر کۆنە و دەگەڕێتەوە بۆسەر دەمی رۆژپەرستی و میترایەتی کوردەکان و لە کوردستاندا چەند پەرستگە و میهر ئاوایی، مێهر هەیە، وەک مێهر ئاوایی کۆنی هاترادا (الحفر) لە نیزیک موسڵێ، میهر ئاوی بوغازکۆی لە کوردستانی تورکیە. ئەم وشەیە پاشان بۆتە مێحراب و هاتۆتە ناو زمان و فەرهەنگی عەرەبەوە .

کاتێ خۆی زەردوشت کە دەستەڵات بەدەستەوە دەگرێ لە گەڵ میهرپەرستی بەربەرەکانی دەکا، بەڵام دەرەوەستی نایە و ناچار ستایشی دەکات و یەشتێکی تایبەتی بۆ ستایشی مێهر لە ئاڤێستادا هەیە:

ئەی مێهر
راپەڕە بنوارە
گڕی بڵێسەی ئاوری گۆڕان
کە لە خۆڵە مێشی خۆی
دەبێتەوە
دەژێتەوە

(مێهر یەشت، گۆرانی ٥، هۆرەی ١٧)

(٢) ـ ئاوان کە لەفارسیدا بۆتە (آبان)، واتە مانگی بارانە و زۆربوونی ئاو و ژیانەوەی چەم و رووبارەکان، لە ئاڤێستادا ناوی هەیە، بەڵام یەشتی ستایشی نییە.

(٣) ـ ئاتران ـ کەلەفارسیدا بۆتە (آذر) و بەمانای خۆش بوونی ئاگر و دەست پێکردنی دەستەڵاتدارییەتی سەرما و سۆڵە، لەئاڤێستادا ناوی هەیە بەڵام یەشتی تایبەتی بۆ پەسەند کردن نییە.

سێ مانگەی زستان:

سێ مانگەی زستان لەئاڤێستادا یەشتی تایبەتیان نییە، وەک بزانم لە خوردات

(فروردین) و بەمانای گەڕانەوەی فەرە و هەر و ڕوح و ڕەوانی پاکان ، سەرسالْ و ژیانەوەی ژینەوارە و لە ئاڤێستادا ستایشی ئەم مانگە کراوە و دەڵێ:

لە فەرە و هەر و ڕەوانی ئەوانەی کە بوون
ئەوانەی کە دەبن، دێن
یارمەتی دەخوازم
(فەروەرتین یەشت، گۆرانی ۲، هۆرەی ۱۱)

(۲) ـ ئەردی بەهەشت "ERDIBEEIST" کە لە فارسیدا بۆتە (اردیبهشت) و مانا کوردییەکەی: عەرز، زەوی و ئەرد، وەک بەهەشتی لێهاتووە، وڵات سەرسەوز و شین هەڵگەڕاوە ـ لە ئاڤێستا ستایشی کراوە :
ئەمن ئەوەم
ئەمن ئەردی بەهەشتی رووتم ، بەقەشەنگترین
پرشەنگی فرشتەکانم رازاندوێتەوە
(ئەردی بەهەشت یەشت، گۆرانی ۱۸)

(۳) ـ خوردات "HURDAT" کەلەفارسی دا کردوویانەتە (خرداد) کەمانا کوردییەکەی خۆرنشین، بەتین و بەهێزبوونی تیشکی خۆرە، لەئاڤێستادا (هوردات] ە ئێستا لە کوردی هەورامی دا ئەگەر پیتی هەوەڵ لە وشەدا (خ) بێ دەبێتە (ە) وەک خوێن کەدەبێتە هوێن و ... لە ئاڤێستادا ئەم مانگەش پەسەند کراوە .

سێ مانگەی هاوین :
(۱) ـ تیر کە لەئاڤێستادا تشترە "TISTIRE" و دەستەی پێکهاتووش بە «تیرمە» یان پێشنیار کردووە، لە ئاڤێستا دا یەشتی تایبەتی بۆ ستایشی هەیە:

ـ ئەی ماڵۆی هێمنم
خانوو خۆشەکەم
ئەستێرەی تەشتەر
هێمنایی گەورە
ترووسکەهاوێژ
دەرمانی دەردی رۆژگار
بەترووسکان راپەڕە
رابە سەر باڵان
بەروبەهەشتی ئەڤین و خۆشەویستی ئێدەم
ئەی پرشەنگی بێ سنوور
زار و پشک و تاسا
داڕێژە چەم بەسەر لێوی تینوم
فەڕەی کەیان

هەتا رادەیەکی زۆر مانای سەرەکی خۆیان لەدەست داوە. بۆ وێنە ئیتر بەدەگمەن هەڵدەکەوێ ریگاوبان لە کوردستاندا بەهۆی بارینی بەفرەوە ببەسترێ هەتا بە دووهەمین مانگی زستان بڵێین ریبەندان یان ناوەکانی وەک بانەمەر- جۆزەردان - پوشپەر- خەرمانان - رەزبەر- خەزەڵوەر.

هەرچەند ئێستا بەهۆی پێشکەوتنی شارستانیەت و شارنشینی و پەیدابوونی شاری گەورە لەکوردستاندا، مانای سەرەکی خۆیان لەدەست داوە، لاو و گەنجی شاری کورد لەگەڵ ئەم ناوانە هەتا رادەیەک ئاشنان و لەوانەیە هەر نەشزانن وئەشیان دیبێ کە لە ئاخری مانگی هاوینێ دا چۆن خەرمان هەڵدەگرن، جۆکەنگێ زەرد دەبێ، پووش کەنگێ دەپەرێ و هتد...

(٢) - ئەو ناو و لیستەی مانگەکانی کە کوردەکانی تورکیە و سوریە لە کاتی خۆی دایانهێنابوون و کەڵکیان لێ وەردەگرتن و هەتا رادەیەک ئێستاش کەڵکی لێ وەردەگرن زۆربەیان ناوی کوردی نین و فریان بەسەر کوردەوارییەوە نییە ولە ناوی مانگەکانی مەسیحی - رۆمی - عەرەبی - عیبری و سریانیان وەرگرتوون و بەهۆی بار و دۆخی تایبەتی کوردستان و نەبوونی بەرەی یەککگرتوو لە زانایانی کورد، لەم بارەوە کارێکی ئەوتۆ بکرێ بەلام کاتێ لە گۆڤاری تێکۆشەر «TEKOSER» ژمارە (٣٦)ی حەزیرانی ١٩٨٧ دا خوێندمەوە، بۆ دانانی ناوی یەککگرتووی مانگەکانی کوردی قۆڵیان هەڵماڵیوە و کۆبونەوەیەکیان بۆ ئەم کارە پێک هێناوە شاگەشکە بووم لەخۆشیان. بەلام کاتێ ناوی مانگە پێشنیارکراوەکانم هەر لەو گۆڤارەدا دی سارد بوومەوە، زۆرم پێ سەیر بوو کە کۆبونەوەکەیان نەیتوانیوە هەنگاوێکی ئەوتۆ باوێ ، چونکە لەم دوازدە ناوەی کە پێشنیاریان کردووە هەر تەنیا یەکدانەی – گولان – کوردی بوو، دەنا ئەوانی تر زۆربەیان عیبری، سریانی و عەرەبی بوون و فریان بەسەر کوردییەوە نییە، ئەو ناوانەش بریتین لە :

چلە - شبات - ئادار - نیسان - گولان - حوزیران - تیرمە - تەباخ - یلۆل - چری - تەشرین و کانون.

راستە ئەم ناوانە رەنگە لەناو خەڵکی کوردستانی تورکیە و سوریە و هەتا رادەیەک لە ئێراقدا باوبن و لەسەر زاران بن، بەلام بۆ کوردەکانی ئێران هەرنەناسراون و تەنانەت کۆمەلانی خوێندەواریش نایانزانن، چ بگا بەخەڵکی گوندی و رەمەکی، لەلایەکی ترەوە ئەوانە رەگ وریشە و بنەوانی کوردیان نییە، بە بروای من واباش بوو دەستەی پێکهاتوو سەرنجی دابایە سەرمێژووی کۆن و رابردووی کورد و لەناخی فەرهەنگ و مێژووی کۆنی کوردا ئەم ناوانەی دۆزیباوە. لەم بارەشەوە باشترین بەڵگە پێم وایە کتێبەکەی حەزرەتی مەهاباد دەساتیر و کتێبی زەردەشت واتە ئاڤێستایە. لە ئاڤێستای زەردەشت دا ناوی زۆربەی مانگەکان هەیە کە ماناکەیان ئێستاش بۆ کوردەکان لە نەتەوەکانی تری ئاریایی مەفهومترە و چاتری تێدەگەن، هێندێ لە مانگەکان لە ئاڤێستادا پەسنی تایبەتیان بۆ پەسەند و ستایش هەیە کە وا لەژێرەوە باسیان دەکەم.

سێ مانگی بەهار:

(١) - فەروەرتین "FEREVERTEN" کە لە زمانی فارسی ئێستادا بۆتە

ناوی مانگەکانی کوردی

ئەحمەد شەریفی

کێشەی ناوی مانگەکانی کوردی و شێوەی بەکارهێنانیان، کێشە و دۆزێکی تازە نییە و نزیکەی نیو سەدەیەکە لە ئارادایە. کاتی خۆی لە کوردستانی ئێراندا عەبدولڕەحمانی زەبیحی (بێژن)، مەلاقادری مودەڕیسی و دوکتۆر عوبێدوڵڵای ئەیوبیان، لەکوردستانی ئێراق دا بەشیرموشیر، گیوموکریانی و داماومۆکریانی لە کوردستانی تورکیە وسوریەدا جەلادەت بەدرخان، کامەران بەدرخان، دوکتوور بلەچ شێرکۆ و چەندکەسێکی تر هەریەکەی چەند ناو ورستەناویان بۆمانگەکانی کوردی داناوە کە بەرهەمی کاری ئەوان دەکرێ تێکرا بە دوو کەرت بەش بکەین:

(١) ـ ئەوانەی لەکوردستانی ئێران وئێراقدا، ناوی مانگەکانی کوردیان داناوە زۆرتر پەڕاونەتە سەرباری ئابووری و ئاژەڵداری و وەرزێڕی و سروشتی کوردستان و ئیلهامیان لەوبارانەوە وەرگرتووە و ناوی مانگەکانیان داڕشتووە، ئەوناوانە بەهێندێ جیاوازییەوە بەم جۆرەن :

- سێ مانگەی بەهار: خاکەلێوە ـ بانەمەڕ ـ جۆزەردان
- سێ مانگەی هاوین: پوشپەڕ ـ گەلاوێژ ـ خەرمانان
- سێ مانگەی پایز: ڕەزبەر ـ خەزەڵوەر ـ سەرماوەز
- سێ مانگەی زستان: بەفرانبار ـ ڕێبەندان ـ ڕەشەمە

کەئەمانە تێکڕا نیشاندەری باروەزخی ئاژەڵداری و وەرزێڕی و گۆڕانی فەسڵ و کەش لەکوردوستاندا نیشان دەدەن و یادگاری ئەودەوران و چاخەن کەدەتوانین بڵێین هێندێکیان ئێستا بەهۆی باروەزخی کۆمەڵایەتی و ئابووری کوردستانەوە، ئیدی

وەردەگرت. وابوو دراوێکیشی بۆ خێڵی بارزان دەهێنا. دوای جێ بە جێ کردنی کارە کانی شەوێ لە لای ئێمە دەنووست و بۆ بەیانی هەر بەو ڕێگایەی دا کە هاتبوو دەگەڕاوە و لە بەفرەکان دا ون دەبوو، لە تەواوی ئەو ماوەیەی دا کە لە کوردستان بووین، سەعید غاڵبە لە گەڵ ئێمە بوو. بە تایبەتی دوای ئەوەی کە لە نێوان ئەرتەشی ئێران و بارزانییەکان شەڕ قەوما، بۆ هەمیشە لە نێو خێڵی بارزان دا مایەوە. تا سەر سنووری ئێراق لە گەڵ ئێمە بوو، لە سەر سنوور دوای مەئمووریەتێکی کە مەلا پێی ئەسپارد چووە ئێراق، لەوێ گیرا و کەوتە بەندیخانەوە. تەجرەبەی و پێوەندی ئێمە لە گەڵ کوردە کان ئەو وێنەیەی لە زەینی ئێمەدا نەخشاند کە ڕووناکبیران لە نێو کوردە ئێراقییەکان زۆرترن و بە ئیمان ترن. ئەو سەروبەندی حیزبێکی پێشکەوتوویان هەبوو کە ڕێکخراوێکی ڕێکوپێکی هەبوو، ڕێکخراوەکەیان لە سەر بناوانی خێڵ و عەشیرە نەبوو، بەڵام حکوومەتی نیشتمانی کوردستانی ئێران لە ڕاستی دا ژمارەیەک سەرۆک عەشیرەت بوون کە حکوومەتی ئازادی کوردستانیان خۆش دەویست و لە دەوری قازی محەممەد کۆبووبوونەوە و لەڕاستی دا حیزبێکی ڕێکوپێک و پێشکەوتوو کە ڕێکخراوێکی بە تەکووزی هەبێ تەنیا بە شێوەیەکی زۆر بچووک لە گۆڕێ دابوو. هێزی ئەساسی حکوومەتی کوردستان لە عەشیرەتەکانی: هەرکی، مامەش، مەنگوڕ، و ئی وەک ئەوانە سەرچاوەی دەسەند و قازی محەممەد زیاتر وەک پێشەوایەکی ڕووحانی دادەندرا کە جێی ڕێز و حورمەتی هەموو لایەک بوو. ئەمن بۆ خۆم لە نزیکەوە قازی محەممەدم نەدیتبوو، بەڵام حەمە حوسێن خانم دی کە فیئۆداڵێک بوو. حەمە حوسێن خان خزمی قازی محەممەد و وەزیری شەڕێ بوو. قازی محەممەد بۆ خۆی لەگەڵ هاواڵەکانی ئێمە قسەی کردبوو و لە قسەکانی دا بە ئەوانی گوتبوو: "پێشەوەری تەلەفوونی بۆ کردم و گوتی ئەمن ئەوە ڕۆیشتم، ئەتۆش دەسبەجێ خۆت سازکە و وەڕێ کەوە". بەڵام ئەمن ناتوانم وەک پێشەوەری نەتەوەکەم بە جێ بێڵم و بۆ پاراستنی گیانی خۆم نەتەوەکەم لە ئەمانی خودا نێم و لێدەم بڕۆم. ئەگەر پا بنێمە دەرەوەی مەهاباد میللەتەکەم دەگیانی یەکتر بەر دەبن، ئەمن بۆ پاراستنی ئەو نەتەوەیە مەجبوورم لە مەهاباد بمێنمەوە تا ئەیرو بێ و ئەزمی تازە دابنێ، ئەمن هەر لێرە دەمێنمەوە، ئەگەر ئێعدامیش بکرێم".

یەکێک لە برادەرە کانکمان گوتی:" ئێستا شەوی هەوڵی مانگی بەفرانبارە. تەواو سێ مانگی ڕەبەق زستان و بەفرمان لە ڕێ دایە." لە شنۆ خانوویەکمان بە کرێ گرت. خاوەن ماڵەکە ژنێک بوو کە شیو و نانی نیوەڕۆشی بۆ لێدەناین. بەرنامەیەکمان بۆخۆمان دانا کە تەنیا بۆ دەرباز کردنی وەخت بوو، بەلام بەرنامەی من لە بەر ئامادە کردنی تۆپەکان، هێندێک زیاتر بوو. هەر کە گەیشتینە شنۆ سەربازەکانی دیکەشم مورەخەس کرد و بیست کەس لە بارزانییەکانم هەڵبژارد و فێری دەکار کردنی تۆ پم دەکردن. شنۆ بە بەر چیایەکی بەرزەوەیە کە هەمیشە پڕ بوو لەفر. بەیانان زۆر زوو بۆ دەم و چاو شوتن و وەرزش دەچووینە دامێنی ئەو کێوە. نیو سەعاتێک وەرزیشمان دەکرد، بڕێک هەڵدەهاتین و دوایە دەگەڕاینەوە ماڵێ، بەر چاییە کی کەم مان دەخوارد و پاشماوەی ڕۆژەکمان بە بێکاری ڕادەبوارد. شێخ ئەحمەد ماڵی لە خانوویەکی دوو ژوورە دابوو. لە ڕاستی دا یەکێک لەو ژوورانە کادێنێک بوو کە خاوێنیان کردبووە . لە یەکێک لەو ژوورانە دا ژن ومنداڵی شێخ ماڵیان دانابوو و لەژوورەکەی دیکەش دا بۆ خۆی لە سەر چار پایەیەک دادەنیشت. لە بەر دەمی هەمیشە لە قوتوویەک دا هێندێ تەلاش و چیلکە داندرابوو. ئەو خووی وابوو بە قەڵم تراشی بارێک و تیژ ئەوەندە ئەوانە دابتاشێ هەتا تەواو دەبن. ئەو کارە بۆ ئەو خۆ غافلاندن بوو بە لام دەست و پێوەندەکانی بە حیکمەتیان دادەنا و پێیان وابوو لەو کاتانە دا شێخ ئیلهامی بۆ دێ کە چ بڕیارێک دەبێ بۆ خێر و خۆشی خێڵکەی بدا. شێخ ئەحمەد پیاوێکی باش بەلام عامی بوو، تێگەیشتنی سیاسیشی نەبوو. تەنیا ئاواتی ئەوە بوو کە خێڵکەی بە سلامەت بگەیەنێتە بارزان. لە زۆربەی زۆری قسەکانی دا ئارەزووی گەڕانەوەی بارزان، بیرەوەری تری بارزان، نیسک و زەراعاتی بارزان و بە تایبەتی ئەو ئاگرانەی کە زستانان هەڵیان دە ئاییساند بەدی دەکرا . ئاگری زستانانەی بارزان بۆ ئەوان هەمیشە دنەی بیرەوەری بوو. کاتێک ئاگرێکی گەورەیان دەکردەوە دەیان گوت: "دەڵێی ئاگری بارزانە". کەسێکی دیکەش کە بەسەر هاتی دەکرێ بۆ خوێنەر جێی سەرنج بێ ، لاوێک بوو بە ناوی سەعید. ئەو لاوە لە کوردە ئێراقییەکان بوو و هەر پازدە ڕۆژەی جارێک دە هاتە شنۆ. ئەو لە ڕاستی دا ئاڵقەی پێوەندی حیزبی ڕزگاری ئێراق و خێڵی بارزان بوو. مەلا مستەفا سەرۆکی ئیفتیخاری (شەرەفی) ئەو حیزبە بوو.

ڕۆژنامەی ڕزگاری بە زمانی کوردی بە دزی چاپ دەکرا و بلاو دەکراوە. ئەو ڕۆژنامەیە حەوتووانە بوو. سەعید هەر جارەی دەهاتە شنۆ، چەند کۆپی ئەو ڕۆژنامەیەی لە گەڵ خۆی دە هێنا. سەعید لاوێکی ئازاو بەجەرگ بوو، هەر پازدە ڕۆژەی جارێک سەر و سەکوتی پەیدا دەبوو. ئێمە دەمانزانی کەنگێ دێ.. سەعات چار یان پێنجی دوای نیوەڕۆ دەگەیشتە جێ. یەکێک لە ڕابووردنەکانی ئێمە تەماشای هاتنی ئەو بوو کە ڕنووە بەفری بەرزاییەکانی پشتی شنۆی دەدڕی و دەهاتە پێشەوە. دەمەو ئێواران ڕەشاییەکمان دەدی کە لە بەفر ڕۆ دەچێ و هەڵدەستێتەوە ، بە تاقی تەنیا و بە پێیان ، لە چەنگەی بەفر و سەرما دا تەنیا گۆچانێکی بە دەستەوە بوو و ئەو ڕێگایەی دەپێوا. ئەو دەهات و گیرفانی پڕ بوو لە ڕۆژنامە، دەستووروالعەمەل و پەیام بۆ مەلا مستەفا کە وڵام و بیر و ڕای لێ

هەرکە وەزع دەگۆڕێ ، قوڵی خانیش دەسبەجێ سەنگەر دەگۆڕێ، ئالای ئێران لە نەغەدە هەڵدەکا و بەڕێوەبردنی ناوچەی سندووس دەخاتە دەست خۆی، بە ناوی قەواموسەڵتەنە خۆی دەکاتە فەرماندار و بەشداریکیش بۆ نەغەدە دیاری دەکا، هەر ئەو سوارانەی کە هێشتا میداڵی بیست و یەکی ئازەر (سەرماوەز) یان بە سینگییەوە بوو، دەبنە مەئمووری پاراستنی هێمنی و دەست دەکەن بە گرتن و سەرکووت کردنی ئەوکەسانەی کە هێشتا بۆ فیرقە بە وەفا بوون. لەم ناوانە دا دەبیسین کە شەش ئەفسەری فیرقەیی لە چاپخانەیەک دا نووستوون. لەوان ڕۆژان دا، ئەو ئەفسەرانە بۆ ئەم بوونەوەرە هەلپەرستانە کە دەیانەویست سووچی ڕابردووی خۆیان بشۆنەوە، پارووەیەکی چەور بوون. گرتن وتەحویل دانەوەی ئەوان بە هێزە دەوڵەتییەکان دەیتوانی دەوسییەی "ڕەشی" کەسانێکی کە خزمەتیان بە فیرقە کردبوو پاک و خاوێن کاتەوە. هەر چۆنێ بێ، ئەوانە شەوێ دەڕژێنە ناو چاپخانەکە و هەر حەوت کەس ئەفسەرەکە: زەرپەخت، ئیحسانی، تیوای، ئەرتیشیار، تەوەکولی، عەلی ئەسغەری و نیکەلاً دەگرن و چەکیان دەکەن، هەر بەو شەوە لە مزگەوتێک دا زیندانییان دەکەن و بە بیانووی پشکنینیان ڕووتیان دەکەنەوە، بۆ بەیانی دەیانبەنە ئەو خانووەی کە ناویان نابوو بەشداری (جێی قایمقام). لە ڕێ، یە کێ لە کوردە بارزانییەکان بە ناوی کاکە ساڵح ئەو ئەفسەرانە دەبینێ، لە سەر و بنی شتەکە سەر دەردێنێ و شێخ محەممەد سدیق ئاگادار دەکا. لە بەشداری، (خانووی قایمقام)، کاتێک دەستی ئەفسەرەکانیان بەستبوو و خەریک بوون بیان بەن بۆ پێشوازی ئەرتەش و بە ڕەواڵەت بیانکەنە قۆچی قوربانی، کوڕی شێخ محەممەد سدیق بۆ خۆی و چەند بارزانی چەکدار دەگەنە جێ، ئەفسەرەکان ئازاد دەکەن ، قەرەپاپاغەکان چەک دەکەن و بەشداری دەشێوێنن. هەر ئەو قەرەوڵە توڕە و تووسن و دەوڵەتخوازانەی ماوەیەک لەمەو پێش، دەبنە فیدایی و موریدی ئەفسەرە کان، دەسبەجێ کەل و پەلە تالان کراوەکانیان بە داوای لێ بووردنەوە دەدەنەوە و هەر کامێکیان هەوڵ دەدا خۆی بە وەفاتر و بەئەمەگ تر لە حاست فیرقەی دیموکرات بنوێنێ، دەلیلیشیان ئەو میداڵەی ٢١ی ئازەر (سەرماوەز)ە یە، کە هێشتا بە سینگیانەوەیە! کاتێک ئەمن گەیشتمە نەغەدە دوو ڕۆژ بوو ئەو ئەفسەرانە ئازاد کرابوون و لە خەتەرێکی بێ سێ و دوو ڕزگاریان ببوو. ئەمن و سەربازەکانم بە ئاڕایشی ڕێکوپێکی نیزامی هاتینە نێو نەغەدە . ئێمە ئێستا خۆمان هێزێکی تەواو بووین: دە ئەفسەر ، ٢ تۆپ و نزیکەی سەت و سی ـ چل سەرباز. هەر بۆیەش شوێنێکی جیاوازمان بۆ خۆمان دیتەوە و دامەزراین. چەند ڕۆژێک چاوەڕوان بووین . سەربازەکان بەرە بەرە سەبر و سیکەدانەیان تەواو دەبوو. ع ئامانجێکیان لە ڕوانگەی خۆ دا نەدەدی. لە ڕاستی دا سەربازەکان هەستیان دەکرد کە خەریکن لەبەر من بیگاری دەکەن. ئەمن لە ئازەربایجان را هێندێکم دراو لە گەڵ خۆ هێنا بوو. هەر یەکەی بڕێکم دراو دانێ، کە بتوانن بگەنەوە ماڵ و حاڵی خۆیان ، تفەنگەکانم لێ وەرگرتن و مورە خەسم کردن، تەنیا چەند کەسی زۆر کارامە نەبێ کە هەڵبەت لە سەر دڵی خۆیان بۆ پاراستنی تۆپەکان گلم دانەوە. پاش ماوەیەکی کورت لە گەڵ ڕێنوێنێک یان بە قسەی بارزانییەکان " شارەزا" یەک چووینە شنۆ. وەبیرم دێ کاتێک گەیشتینە شنۆ وبۆ ئەوەی ڕۆژمان لێبێتەوە، چووینە چایخانەیەک.

قۆڵی چاکەتەکەی کردەوە ویردییە بەردەمی، و شێخیش تفو بەڵغەمی سینگی لەوێ کرد. لەگەڵ ئەو ڕێزنان و متمانەیەش دا، مەلامستەفا قسەی دڵی خۆی و بیروڕای خۆی سەبارەت بە شێخ ئەحمەد بە ئێمە دەگوت .

پێشتر گوتم کە مەلامستەفا نیوەی دووهەمی مانگی بەفرانبار بوو کە لەتاران ڕا گەڕاوە. تامانگێک دوای گەرانەوەی لە تاران، نێوانی خێڵی بارزان و دەوڵەتی ئێران چاک بوو، تەنانەت ئەرتەشی ئێران جارێکیش لۆرییەکی بۆ ناردن، بەلام مەلامستەفا بە بیانووی سەرما و ڕاوێژ لەگەڵ شێخەکانی بارزان لە دانەوەی چەک وچوڵ و ناردنی چەند خێزانی بارزانی بۆ هەمەدان دەستی گێڕاوە.

دوای مانگێک بوو کەئەرتەشی ئێران بەرەبەرە لەخۆ بە دەستەوەدانی بارزانییەکان ناهۆمێد بوو ودەستی کرد بە دامەزراندن و هێز کۆ کردنەوە لە دەوروبەری ناوچەی بارزانییەکان و خۆی بۆ پەلاماردان بۆ سەر بارزانییەکان ئامادە کرد، بارزانییەکانیش خۆیان کۆ دەکردەوە و ئامادەی دەست کردنەوە بوون. بارزانی یەکان ئەو دەمی لە نەغەدە، شنۆ و دەشتەبێڵی مەرگەوەڕ دامەزرابوون. بەرلەوەی بێمە سەر باسی چۆنیەتی خۆ ئامادە کردنی هەردوو لا و دەست پێکردنی شەڕ، باسی چارە نووسی خۆمان و ئەوەی کە لەو سەروبەندی دا لە چ وەزعێک دابووین دەگێڕمەوە.

ئەمن و ڕەشیس دانا دوای ئەوەی لە مەهاباد تووشی بارزانییەکان هاتین و بڕیارمان دا لە گەڵیان کەوین، بە ژمارەیەک سەربازی خۆمان و ئەفرادی بارزانی دا تۆپەکانمان بەڕێ کرد و بۆ خۆمان بەرەو نەغەدە ڕێمان گرت. شەش ئەفسەری دیکە کە گوردانەکەیان لە بۆکان بلاوەی پێکرابوو، دوای گەیشتنە مەهاباد و پێوەندی گرتن لە گەڵ قازی محەممەد، بەرەو ڕەزائییە دەڕۆن. بەو هومێدەی کە بەوێ دا بەرەو شووڕەوی بچن، بەلام لە نێزیک ڕەزائییە خەبەریان پێدەگا کە ئەو شارە لە دەست موخالیفەکانی فیرقەی دیموکرات دایە، جا بۆیە لە نیوەی ڕێ ڕا دەگەڕێنەوە و بەرەولای نەغەدە دەچن . سەعات ۸ی شەوێ دەگەنە نەغەدە و لە چایخانەیەک لادەدەن. لەو دەمێ دا هێزی بارزانییەکانیش گەیشتبوە نەغەدە و لە لایەن شێخ محەممەد سدیق (یەکێک لە براکانی شێخ ئەحمەد) ڕا حکوومەتی نیزامی ڕادە گەیندرێ. جارچی بە نێو ئەو شارۆچکە دا وەڕێ دەکەون و هاوار دەکەن: "حوکم، حوکمی شێخ محەممەد سدیقی بارزانییە. لە سەعات ۹ی شەو ڕا هاتوچۆ یاساغە.» برادەرە ئەفسەرەکانی ئێمە، دوای نان خواردن لە چایخانەکە، لە بەر بێ ئەزموونی ومتمانەی خۆڕایی لە چایخانەکە دا لێی دەنوون و خەبەریان لەوە نابێ کە ئەو دەمی نەغەدە لە ژێر دەسەلاتی دوولایەنە: بارزانییەکان و قەرەپاپاغەکان. قەرەپاپاغ، عەشیرەتێکی ترک زمانە کەوەک دوڕەگەیەک لە ناوچەی کوردستان لە نێوان مەهاباد و ڕەزائییە دا، نیشتەجێ کراوە. ئەو ناوچەی ئەوانی لێ دەبن بەناوی سنتووس مەشهوورە و ناوەندەکەی نەغەدەیە. ئەو دەمی سەرۆکی عەشیرەتی قەرەپاپاغ کەسێک بوو بەناوی قوڵی خانی بورجالو (بوزچەلوو دروستە، نووسەر بەهەڵەی ناوبردووە– تێ بینی وەرگێر) کە لەلایەن فیرقەی دیموکراتی ئازەربایجان را دەرەجەی سەرهەنگی درابوویە و هەر لەو ئاخرییانەش دا بە خۆی و بە هەزار سواری قەرەپاپاغ بۆ شەڕی دژی حکوومەتی ناوەندی ئامادە ببوو.

دەبێ بترسێ. بەڵام ئەوان لەو هەموو چەکانە ناترسن ، ئەوان تفەنگیان هەیە و پارویەک نان و لەسەر شاخان دەژین.» مەلا مستەفا درێژەی بەقسەکانی دا و گوتی: ڕەزمارا دەیهەویست ئەو هەموو چەکانە بەمن نیشان دا و بمترسێنێ، ئەمنیش ئاوام وەڵام داوە... لە ناوەڕاستی مانگی بەفرانباردا بوو کە مەلا لە تاران ڕا گەڕاوە. پێوەندی نێوانی مەلا مستەفا لەگەڵ ئێمە کەچەند ئەفسەر بووین زۆر خۆش بوو، وای هەست دەکرد کە باشتر لەخەڵکی دیکە لە قسەکانی دەگەین. هەڵبەت مەلا خۆی وەک گوێ لەمست و فەرمانبەری شێخ ئەحمەد نیشان دەدا بەڵام لەوەش نەدەپرینگایەوە بەئێمە بڵێ شێخ ئەحمەد فێئۆداڵێکە و پێی خۆشە سەرۆکایەتی فێئۆداڵی و ئایینی بەسەر خێڵەکەی دا بکا.

سەرۆکایەتی شێخ ئەحمەد و شێخەکانی دیکەی بارزان ، سەرۆکایەتی فێئوداڵێکی تووڕە و تۆسن و بە تەماع نەبوو، خێڵی بارزان لە دڵەوە بڕوای ئایینی پێ هەبوو، ئەوی بە پێشەوای ئایینی، خەڵیفە ونوێنەری شێخی بارزان دادەنا. شێخی بارزان لەڕاستی دا نیشانە و ڕەمزی بیروباوەڕی دینی خێڵی بارزان بوو. مەلا مستەفا دەیگوت :« شێخ ئەحمەد بەئاواتەوەیە هەر چی زووتر بگەڕێتەوە بۆ بارزان لە ئێراق، لەوێ لە سەرکورسییەکی دانیشێ و خەریکی دارخۆش کردن بێ . (ئەوە خوو و خدەی شێخ ئەحمەد بوو) دەست وپێوەندیکانی لە دیارییەوە دانیشن و هەر بانگی کەن : ئەز بەنی ، ئەز بەنی. ژیانێکی ئارام ، ئاسوودە و بێ گێرە وکێشەی هەبێ » . بەڵام شێخ ئەحمەد ناتوانێ لەوە تێ بگا کە گەڕانەوە بۆ بارزان مانای لە کیس دانی تفەنگە، و ئێمە ئەگەر تفەنگ و چەکەکانمان لەکیس بدەین دەبینە جەماعەتێکی بێچارە و لەڕ و لاواز کە خەڵکی دی دەبێ سەبارەت بە ئێمە بڕیار بدەن، بنێشتە خۆشکەی سەر زاری مەلامستەفا هەمیشە ئەوە بوو دەیگوت: ئینسان تائەو کاتەی چەکی بە دەستەوەیە، جڵەو و ئیختیاری بە دەست خۆیەوەتی، بەڵام هەر کە چەکەکەی لە کیس دا، خەڵکی دی بڕیاری بۆ دەدەن ، پیاو مەجبوورە ، هەر چەندیش ناخۆش بێ، مل بۆ ئەم بڕیارە ڕاکێشێ. لەناو خێڵی بارزاندا زۆر کەس هەن کە نایانەوێ چەکەکەیان لە کیس بدەن، بە تایبەتی سەدو بیست کەس لەجەماعەتی ئێمە لە ئێراق حوکمی ئیعدام یان لەسەرە. » مەلا مستەفا شورەوی بە تەنیا شوێنی پەسیو بۆ خۆی دەزانی کە بۆ ماوەیەکی کاتی بچنە ئەوێ و لە دەرفەتێکی لەباردا بۆ کاری حکومەتی کوردستان بگەڕێتەوە ئێراق».

مەلا دەیگوت: ئەمن کۆمۆنیست نیم، هیچ حەزیش لە کۆمۆنیزم ناکەم، ئەمن دیمۆکراتم و پێم خۆشە لە ئاشتی و سەفا و وەکوویەکی لەگەڵ نەتەوەکەم بژیم و بتوانم ڕۆژێک ئاڵای کوردستان هەڵکەم، جا فەرق ناکا ئەو شوێنە هەر کوێیەک دەبێ با ببێ، چ ئێراق ، چ ئێران یان تورکیە.

مەلا مستەفا ئێمەی بەمەحرەمی خۆی دەزانی و داوای لێدەکردین شێخ ئەحمەد بە شێوەیەک ڕازی کەین کەفکری چوونەوەی بارزان لە مێشک دەرباوێژێ. ئەو لەگەڵ ئەوەشدا ئاوای باسی شێخ ئەحمەد دەکرد. هەر وەک لەپێشتر گوتم، بەتەواوی خۆی بەگوێ لەمست و پێڕەوی وی دەزانی، و تەنانەت خۆشی بەو کارەوە ڕادەنا. زۆر چاکم لەبیرە، ڕۆژێک مەلا لە خزمەتی شێخ دا لەسەر حەسیرێک دانیشتبوو ، شێخ سینگی پاک دەکردەوە و خەریک بوو تف بکا، مەلا مستەفا دەسبەجێ لوگمەی سەر

دەیانگوت: بێدەنگ، بێدەنگ» و دەرگایان نیشانی من دەدا. پێم گوتن چما زمانتان نییە، بۆ خۆتان لاڵ کردووە و هەر بێدەنگ بێدەنگتانە، بۆ قسە ناکەن، چی دەتانەوێ بیڵێن. دیسان بەچاووبرۆ ئیشارەیان کرد، دەمزانی مەبەستیان چییە، بەڵام دەمەویست قر و قەپ نەمێنن و قسە بکەن، هەر چێکی بێ شاش بەنی ئادەمە. دوایە دەرگایان کردەوە و دیتم ئەعلاحەزرەت لەوێ دانیشتووە، چوومە پێشی سڵاوم لێکرد، جێیەکی نیشان دام و فەرمووی لەگەڵ کردم، لەسەر کورسییەک دانیشتم. هەرکە دانیشتم گوتم : ئەی ئەعلاحەزرەت!

زشیر شتر خوردن و سوسمار　　　عرب را بەجایی رسیدە اسـت کار
کە تـاج کیانی کنــــد آرزو　　　تفو برتو ای چـرخ گردون، تـفو!
«عەرەبی شیری ووشتر خۆر و مارمێلکە خۆر – کـاری گەیشـتۆتە جـێیەکی ئەوتۆ
بە تەمای تـاجــــی کیانییـە　　　دەک بەتف و لەعنەت بی، چەرخی گەردوون!

ئێمە ڕەعیەتی تۆین، تاقی کەسرا لە بەغدایە، ئێمە ڕەعیەتی تۆین، وەرە ڕەعیەتەکانی خۆت ئازاد کە.. مەلا مستەفا درێژەی بە قسەکانی دا و گوتی: دوو سەعاتم قسە بۆ شایەکەتان کرد. شا ئەمنی زۆر کەوتە بەر دڵی، دوای دوو سەعات ویستم هەستم، گوتی دانیشە، گوتم ئیتر هەڵناستم مەگەر دەستوور بدەی، دیسان قسەم بۆ کرد. ئەو سەبارەت بەدامەزرانی ئێمە لە ناوچەیەکی ئێراندا قسەی کرد. وەڵامم داوە دیارە ئەعلاحەزرەت ئێوە زۆر سەخی و بەخشەندەن، ئەمن گشت پێشنیارەکانی ئێوە قەبووڵ دەکەم، بەڵام دەبێ شێخ ئەحمەد بڕیار بدا. ئەو سەرۆکی خێڵە. لەسەر ئێوەی ئەفسەریش قسەی لەگەڵ کردم و گوتی تەحویل تان بدەمەوە ، پێم گوت : ئەزبەنی! ئێمە ئەوەمان نەگرتووە کە تەحویلیان بدەینەوە، ئەوانە شەش گەنجن (لەناو ئێمەدا کە دە نەفەر بووین، شەش کەسمان ئەفسەری ڕەسمی ئەرتەشی ئێران بووین)، تەمەنی هەموویان بەسەریەکەوە ناگاتە سەد ساڵ، لە باتی ئەو شەش گەنجە، ئەمن هەژدە گەنج و لاوتان دەدەمێ، بنەماڵی من و شێخ ئەحمەد و براکانی دیکەم هەژدە لاومان هەیە، هەمووی لاوی پێگەیشتوون و لەباتی ئەو شەش لاوانە، ئەو کوڕانەی خۆمانت دەدەمێ، بەڵام نابێ ئێوەش بە وە ڕازی بن و ئەو شانازییانەی کە تاکوو ئێستا شێخی بارزان بۆی بە میرات بەجێ هێشتووین، لەناو بەرین و تف و لەعنەتی بەرەی پاشەڕۆژی بارزان نەسیبی خۆمان کەین.». بە کورتی لە تاران پێشنیاریان بە مەلامستەفا کردبوو، گوتبووی: ئەگەر شێخ ئەحمەد ڕازی بێ ، دوای ئەوەی سەرمای شکاند گواستنەوە بۆئەوەی دەست پێ بکا و وایان قەرار دانا بوو لەبەرەی لۆرێکی گەنم چەند خێزانی بارزانی دوای دانانی چەکەکانیان، بەرە بەرە بگوێزرێنەوە شوێنی تازەی نیشتەجێ بوونیان.

مەلا مستەفا بۆ بەحەق دانانی ئەو ڕێکەوتنە دەیگوت: ئەگەر ئەو پێشنیارەم نەسەلماندبایە لە کۆڵم نەدەبوونەوە. «لەتاران مەلا مستەفایان برد بوو بۆ دیتنی کارخانەکانی چەک دروست کردن، قۆرخانە، سەڵتەنەت ئاوا، هێزی هەوایی و زانکۆی ئەفسەری. بۆ خۆی دەیگێڕاوە دەیگوت: ڕۆژێک بردیانمە زانکۆی ئەفسەری، بە ڕەزمارام گوت: «ئەگەر ڕاستت بوێ جەنابی ژنراڵ، ئەمن لەو هەموو چەک و جبەخانەیە و لەو ئەرتەشە بەهێزە ترسام، بەڵام ئەوەی ڕاستی بێ، خێڵی بارزانی

پاشە کشەی بارزانییەکان لە کوردستانی ئێران

(پاشماوەی ژمارەی رابردوو)

ئەبو حەسەنی تەفرەشیان

وەرگێرانی : حەسەنی سەیف

مەلامستەفا باسی سەفەرەکەی خۆی بۆ دەکردین، دەی گوت ئێمەیان بردە لەشکری نووی قەسر و لەوێ میوانداریيان لێکردین. لەو ماوەیەدا چاوم بە قەواموسەڵتەنە ورەزمارا کەوت. رەزمارا ئینسانێکی زۆر زیرەکە وقەوامسەڵتەنەش پیاوێکی خۆڵەکن زۆر و هێز لەکن خۆشە. لەگەڵ شاش قسەم کرد، مەلامستەفا بە راوێژی تایبەتی خۆی بەزمانی فارسی بۆی دەگێڕاینەوە :

«ڕۆژێک لەگەڵیکیان لەسەر نام، مل پێچێکیان لەمل هاڵاندم، پاڵتۆیەکیشیان لە دووکانی پیرایش بۆ کڕیم، ئەرتەش پارەی دابوو چلم بۆ بکرن، بەلام سەرهەنگ غەففاری زۆل دەیەویست پارەکە بخوا و کۆنە لیباسی خۆی دەبەرمن کا. بۆ من پاڵتۆی نوێ و کۆن وەک یەک وابوو، بەلام ویستم لێی حاڵی کەم کە ڕاستە ئێمە خەڵکی شاخ و کێوین بەلام لە هەمووشت حاڵی دەبین. بە غەففاریم گوت: کاک سەرهەنگ، بۆ دەوڵەتێک وەکوو ئێران بەو هەموو مێژووەوە شەرمە چل وبەرگی کۆن دەبەر میوانێ کا، ئەو دەسبەجێ بردمیە دووکانی پیرایش و گوتی: هەرچێکی دەتەوێ هەڵگرە. هەر ئەو پاڵتۆیەی ئێستا لەبەرم دایە لەپیرایشمان کڕی. دوایە منیان بردە کۆشکی شا.

لە ژووری چاوەڕوانی شادا هەموان بە چاوبڕۆ قسەیان دەکرد و پەیتا پەیتا



هـ .س. ئۆیبەری

٣- لەو سەردەمەدا و تا ئێستاش شتێک بەناوی وەزارەتی مەعاریف لە سلێمانی نەبووە و نییە، بێگومان نووسەر مەبەستی بەڕێوەبەرایەتی مەعاریفی ئەو کاتە بووە.

٤- گۆرانییەکی میللی ناوچەی ڤێرملاند (گەرمیانی)ی سوێدە.

٥- (پارتی دیموکراتی کورد)ی مەلامستەفای بارزانی ئەوکاتە سازنەکراوە، بەڵکوو لە ساڵی ١٩٤٦، هەبووە، بەڵام لەو دەمەدا مۆڵەتی کارکردنی ئاشکرا دراوە.

٦- لە گۆڤارەکەدا وشەکە وانووسراوە، بەڵام نیوێکی ئاوا، کەسانی شارەزای ئەوێش، نایناسن. ئێ پێمان وایە خاتوو سیگرید وشەی (کامپەکە)ی بەرگوێ کەوتووە و وای نووسیوە.

٧- ستیگ ڤیکاندەر: ساڵی ١٩٠٨لە دایک بووە. پاش ئەوەی لە زانستگەکانی ئوپسالا و کۆپنهاگن پاریس خوێندوویەتی، لە ساڵی ١٩٣٨دا لە زانستگەی ئوپسالا دکتۆرای وەرگرتووە و لەساڵی ١٩٤١ پلەی دۆسێنتی دراوەتێ لە زانستگەی لوند و لەساڵی١٩٥٢دا لە زانستگەی ئوپسالا بووە بە پرۆفیسۆر لەبواری سانسکریت و توێژینەوەی بەراورد لە زمانە هیندوئەورووپاییەکاندا کاری کردووە. بۆ لێکۆڵینەوە توێژینەوە لە لوبنان و سووریا ژیاوە لەساڵی ١٩٥٣دا و لە ١٩٥٩ و ١٩٦٢-١٩٦٣ لە تورکیا ژیاوە، پاییزی ١٩٥٨دا لە ئەکادیمیای ئۆبوو و توروون تیلیزپیستو لە فینلاندە دەرسی گوتۆتەوە. جگە لە لێکۆڵین و توێژینەوەی زمانەوانی و مێژووی ئایین، ستیگ ڤیکاندەر نووسینی لە سەر چیرۆکی شیعریی هیندی ئەفسانەی هیندی بڵاوکردۆتەوە. کۆمەڵێ تێکستی کوردی کۆکردۆتەوە و لە کتێبێکدا بە ناوی ecueil des textes Kourmandji لە ساڵی ١٩٥٩ لە زانستگەی ئوپسالا بڵاوی کردۆتە وە. ساڵی ١٩٨٦ کۆچ دوایی کردووە.

دەستی کردەوە بە خوێندنی دەرسە کوردیکانی . کاتێک کە باوکم سەفەری کرد و گەڕایەوە بۆ سوێد، ئێمە، تا ئەو دەمەی کە هەل و دەرفەت هەبوو، بەردەوام هەر هاموشۆی کوردانمان دەکرد. دوائیوارەش پێش ئەوەی عێراق بەجێ بێڵین لە مارسی ١٩٦١دا، سەرکردەیەکی کوردمان لە گەڵ سەرکەردەیەکی ناسیۆنالیستی عەرەبدا بانگێشتن کردبوونە ماڵ، بەلام دواتر وای لێ هات کە کارێکی وا بە هیچ جۆرێک نەکرێت.

بارودۆخ و رەوشی کوردەکان لە عێراقدا بە شێوەیەکی توند و خراپ گۆڕا و جەنگی خوێناوی براکوژی هەڵگیرسا. باوکم لە پشتگری و خۆشویستنی کورددا چەند بۆی کرا لە ماڵ لە ئوپسالا خەریک و بەردەوام بوو و منیش پێوەندییەکی چڕ و خەستم لە گەڵ کۆمەڵەی جیهانی کوردستاندا هەبوو کە پێگەکەی لە رۆتردام بوو. لە رێگەی ئەو کۆمەڵەیەوە هەموو زانیاری و ئاگادارییەکم سەبارەت بە کورد لە هەر کاتێکدا دەست دەکەوت و پێدەگەیی ، ئەو دەمە خەڵکی سوێد بە دەگمەن دەیانزانی کە کورد هەیە.ئەمڕۆ گەلێک کوردمان لە نێواندایە، چ وەکوو هاوولاتی سوێدی یان میوانی بێگانە. با لەم ولاتەدا وامەست بکەن کە لە ماڵی خۆیاندان و شتێک بە فەرهەنگی ئێمە پێشکێش بکەن و جارێکیش لە جاران وەکوو دیارییەک ئاوڕێک لە دوو دۆستی گەورەی کورد لەنێو توێژەرە سوێدیکاندا بدەنەوە و بیرێکیان لێ بکەنەوە: پرۆفیسۆر ستیگ ڤیکاندەر(٧) کە بەم تازەیە کۆچی دوایی کرد، هەروەها باوکم پرۆفیسۆر ه.س نوبیەری کە تا ساڵی ١٩٧٤ لە ژیاندا بوو. ئەوان هەر دووکیان بە گەرمی هاوبەشی ،چارە نووسی کوردیان کردو بە توێژینەوە و لێکۆڵینەوەی زمان و مێژوویانەوە خەریک بوون و لە گەڵیشیاندا هاودەرد بوون.

پەراوێزی وەرگێڕ :

١- ئەم گوتارە یەکەم جار لە گۆڤاری (Svensk-Kurdisk Journal) ی ژمارە ١-٢ی ساڵی ١٩٨٦دا، کە لەلایەن "کۆمەڵەی فەرهەنگی سوێد - کوردستانەوە" لە سوێد دەردەچێ، بڵاوکراوەتەوە.

٢- هـ .س.نوبیەری: هەنریک سامۆێل نوبیەری، لە ١٨٨٩/١٢/٢٨ لە «سوێدەربێرکە» لە سوێد لە دایک بووە و ساڵی ١٩٧٤ کۆچی دوایی کردووە. ساڵی ١٩٠٨ بۆ خوێندنی رۆژهەلاتناسی و زمان چۆتە زانستگەی ئوپسالا و بووە بەشاگردی مامۆستای بەناوبانگی زمانانی سامی K. V. ZETTERSTEEN و پاشانیش بووە بە جێگری لە هەمان زانستگەدا. ساڵانی ١٩٢٤-١٩٢٥ لە میسر خوێندوویەتی. لە ١٩٣١-١٩٥٦ پرۆفیسۆری زمانانی سامی بووە و پاشانیش بووە بە پرۆفیسۆری زمانانی ئێرانی و لە بواری ئێراناسیدا لە مەڕ ئایین و مێژوو و زمانەوە بەتایبەت زمانی پەهلەوی کاری زۆری کردووە. بواری سەرەکی توێژینەوە و لێکۆڵینەوەی ئەو، زمانانی سامی، بەتایبەت زمانی عەرەبی بووە. لەساڵی ١٩٤٨ەوە ئەندامی ئەکادیمیای سوێدی بووە. ئەندامی دەستەی نووسەرانی «ئینسکلۆپیدیای ئیسلامی» بووە. ساڵی ١٩٥٧ لەلایەن کۆنگرەی جیهانی رۆژهەلاتناسانەوە مەدالیای زێڕینی Lidzbarski وەرگرتووە. هەرچەندە لە بواری زمان و ئایین و ئێراناسیدا زۆر خەریک بووە و کاری کردووە، بەلام لە تەمەنی ٧٠ ساڵیدا و لە ساڵی ١٩٦٠دا بۆ یەکەم جار سەردانی ئێرانی کردووە و ساڵی ١٩٦٣ یش بۆ جاری دووەم سەریداوەتەوە. مامۆستا و زانا و زمانەوان و توێژەرێکی دیار و ناسراو بووە.

کارەساتاویتر دەبوو و نەرمە بەردی سەیریش دەبوونە هۆی وریا کردنەوەی مرۆڤ ، بەرەو ژوور بە نێو تونێلێکی درێژی تەواو نەکراودا، کە فەرەنساوییەکان لە کاتی شۆڕشدا بە جێیان هێشتبوو، تاوەکوو دەزگە و زنج و کۆڵیت و خێوەتمان لەو بەرەوە وەدی کرد و دەنگی زەنگی بڵند و ترسناکمان ژنەفت. بەستەکە لەسەر چەمی سیروان لە لایەن سێ کۆنتراکتەر (مقاول)ی ئەمەریکایی و دەزگەیەکی ئەڵمانییەوە دادەمەزرێ لە گەڵ کۆمەڵێک ئەندازیار کە سەر بە وڵات و نەتەوەی جیاوازن و بۆ ئەوەی ئەلەکتریک (کارەبا) باکووری عێراق بگرێتەوە. لە نێو ئەو هەموو نەتەوە و خەڵکی وڵاتە جیاوازانە دا یۆگۆسلاڤییەک وەدەرکەوت کە بەنێو خێوەتگە (ئۆردووگا) کە دا لە کامەلا (٦) گێڕاینی. خێوەتگەکە لە کۆمەڵێک زنج و کۆڵیتی خنجیلانەی سپی ژمارەدار پێکهاتبوو، بە دەوری مەلەوانگەیەکدا بوو کە پیادەڕێ [شۆستە] و داری بە دەورابوو و دەرگەیەکی هەبوو لە تاقی سەرکەوتن دەچوو! هەرزنج و کۆڵیتێ دوو ئاشپەزخانە و دووگەرماوی هەبوو.

فرۆکەوانە ئەڵمانییەکان و دوو ئەڵمانی دیکە و «کرێکەر» و نیمە رۆیشتین بۆ کۆشکی جێگری سەرۆکی ئەندازیاران کە بەستەکەی پیشاندایین. ئەگەر مرۆڤ هیچ شتێک دەربارەی بەست نەزانێ فریو دەدرێ بەوەی کە لە شێوەیەکی خەیاڵی و تەلیسماویدا بیانبینێ، تا رادەیەک وەکوو ئەوەی کە کارکەرە کوردەکان بە گاڵتەوە دەڵێن وایە کە لاندرۆڤەرێکی بچووک کوڕی لاندرۆڤەرێکی گەورەیە. ئەمە ئەندازیارێکی ئەڵمانی گێڕایەوە بۆ سەلماندنی، نەک ئارەزووی گاڵتە و شۆخی لای کوردەکان بەڵکوو «دواکەوتوویی و بەجێ ماوییان لە بارەی تەکنۆلۆژیاوە»!!!

لەژێر ئاسمانی پڕ ئەستێرەی کوردەواریدا:

گوتوبێژ و دەمەتەقێی کاتی شیو خواردن لە نێو زنجەکەدا کە بانگێشتن کرابووین بۆ ئەوەی تێیدا بنوین، شێوەیەکی جیاوازی وەرگرت لەوەی بارەگای خەبات لە سەرەوە. لە بارەی خەڵاتی نۆبێلەوە کە پاسترناک وەریگرتبوو و لەبارەی ئەدەبی یۆگۆسلاڤی و لە مەڕ تفاق و ناوماڵە رێکخستن و لەبارەی فۆلفگانک لە بیونهاردی کۆمۆنیستی وازهێنا و سەبارەت بە مانگ و لەبارەی ماتماتیک و لەمەڕ هێز و تیرەیەکی ئەمەریکاییەوە کە باوەڕیان وایە کە زەوی تەختە و لەبارەی بابەتگەلی گەپاوی ونیوگەپاوی ترەوە، دووایین. لە مەڕ کوردیش پەیڤین لە کاتێکدا کە حەوتەوانە بەسەر سەرمانەوە وەستابوو وئاسمانیش بە ئەستێرەکانییەوە لە هەموو جارێکی بەغدا روونتر دەدرەوشایەوە. سۆزیی داهاتوو بەرەو بەغدا شۆڕبووینەوە بە فرۆکەیەکی VWی چکۆڵە ، بە بەرزی ٦٠٠ مێتر ولەگەڵ کاپتن ڤایس» دافڕین. بە سەر کوردستاندا بە رێگە شاخاوییەکانییەوە و بە نشێو و دۆڵ و چەم و رووبار و ئاوەڕێیەوە، بەسەر کێڵگەی چوار گۆشەی پێدەشتەکاندا و بەرەوخوار بۆ بێناوانەکان، فڕین. فرۆکەوانەکە گوتی: «هیچ خۆش نییە مرۆڤ رۆژێ دووجار بەم رێگەیەدا بفڕێت، بڕوێت و بێیتەوە».

کە گەڕاینەوە بۆ ماڵ پاکیزە راوی کە بە حیلمی بە نێو بانگە لە گەڵ خوشکەکەیدا دانیشتبوو. پاکیزە خەریکە «ئاڤێستا» وەردەگێڕێتە کوردی. باوکم

لێم دزرا..) و منیان له گەڵ خۆیاندا برد بۆ بانگێشتنێکی چای و له وێ فێری هەڵپەرکێیەک بووم که له گەڵ چوار کچدا کردم، بەرانبەر بەوە گۆرانی «ئاخ گەرمێن تۆی جوان» م بۆ گوتن (٤). ئەوجا کاتی ڕۆژئاوابوون چووینە سەرچنار، که چیاکانی دەتگوت پشکۆن. پاشان باوکم و من لای خانوویەکی بەردین گل درایەوە، لەوێ تابلۆیەکی نیۆنی هەڵواسرابوو، لێی نووسرابوو: *خەبات*.

بارەگای بارزانی

ئێمە وامان زانی ئەمە قاوەخانەیەکە یان جێگەی کۆبوونەوەی لاوانە. کورد لە هەموو جۆرە تەمەنێک له سەر پلیکانەکان دانیشتبوون. کوردێکی درێژ هات و بە توندی دەستمی گوشی و بە ئینگلیزی گوتی: «شەوباش Good night» منیش بە گاڵتەوە گوتم: «دەتانەوێ هەرلە ئێستاوە بڕۆن؟»، ئەوە تەنێ سڵاو و بەخێرهاتن بوو. لەژوورە درێژ و بارێکەکەدا ئەم وێنانە هەڵواسرابوون : لە نێوەڕاستدا ژنێکی کورد کە بە پیر و لاوی کورد دەورەدرا بوو، بۆمان دەرکەوت کە ئەوانە شەهیدن و لە ڕێی خەباتدا دژ بە ئیمپریالیزم و بۆ مافی کورد شەهید بوون. وێنەکەی ئەو لاوە هی ماوتسی تۆنگ (کەڵەو سەردەمەدا وانێو دەبرا) و لینین بوو. ئێمە لەنێو بارەگای «پارتی دیموکراتی کورد» ی تازە سازکراوی (٥) مەلا مستەفای بارزانیدا بووین. تووشی لێپرسینەوەیەکی ڕاستی بووین سەبارەت بە سوێد:

– ئێوە ئەندامن لە هیچ پەیمانێکی سەربازیدا؟

– نە.

– ئایا چ وەبەرهێنانێکی سەرمایەداری بێگانە لە وڵاتی ئێوەدا دەکرێ؟

– نە.

– ئێوە چەند پارتیتان هەیە؟

– پێنج. هەموویانمان ژمارد.

– چەند کۆمۆنیستتان هەیە؟

– تا ڕادەیەک کەم.

– بۆ چی؟

– لە بەر ئەوەی ئەم دەوڵەتی خۆشگوزەرانیی کۆمەڵایەتییە باشتر بۆ ئێمە دەگونجێ لە شێوە و فۆرمێکی دی کە ئێمە لەو بڕوایەداین دەمانکاتە پاشکۆی هێزێکی دی. ئێمە دەمانەوێ سەر بە خۆ و ئازادبین و لە ئاشتیدا بژین.

– دەی خۆ ئێوە دەوڵەمەندن؟

– بەڵێ بەڵام تا پێش سەد ساڵێک ئێمەش تا ڕادەیەک وڵاتێکی پاشکەوتوو بووین. کەس ئەم باسەی گوێ لێ نەبوو بوو و هەموو دڵنەوایی خۆیان دەکرد و دڵ پڕ لە هیوا بوون و پێیان وابوو کە شتێکی سەیرە.

وەکوو کۆتایی هێنانێک بە مانەوە کەمە تایبەتییەکەمان لە سلێمانیدا تاکسییەکمان گرت و چووین بۆ لای بەستەکەی دەربەندیخان. دەشت و وشکایییەکە

سەرپێنییەکانی لە پێ داکەند و دای بەمن. منی گەوج و دەبەنگیش هەروا ڕەشۆکی سەرگوناکانیم ماچ کرد، ئەوەش بوو بە هۆی تیز و گاڵتەی هەمووان و کچەکانیش دەستیان بەهاوار و چەپڵەلێدان کرد و کچەکەش ماچەکانمی گێڕایەوە و ماچی کردم . ئەوجا براین بۆ ژووری پۆلێکی دی و ە.س. نوێبەری لە نێوان کچانی منداڵتردا کەلە نێوان ۱۲و ۱٦ساڵاندا بوون خۆی بینییەوە و دەورە درابوو.

پێشتریش لە بیرۆی بەڕێوەبەر لەگەڵ سێ مامۆستای شۆخ و جواندا دانیشتبووین کە بانگهێشتنی قاوە و چای ترشیان کردین. ئەوان پرسییان: «دەتانەوێ گوێ لە چ وانەیەک بگرن؟» ە.س. نوێبەری گوتی: «بەتەواوی ئارەزوودەوە، مێژوو».

وانەیەک لە مەڕ مێژووی کورد

چووینە دیوی پۆلێکەوە کە مامۆستاکە لەوکاتە دا خەریک بوو دیکتە(ئیملا)ی شتێکی دەکرد. زۆر دیکتەکردن و لەبەرفێرکردن، نەبوونی کتێبی خوێندن لە وڵاتێکی وەکوو عیراقدا دەگەیەنێ و پیشان دەدات. هەموو دەفتەرەکان بە خێرایی خرانە نێو تەختەکانەوە و وانەیەکی ئاساییشێوە بەعەرەبی دەستی پێکرد. مامۆستاکە گوتی:

«تەنێ لە پۆلە پلە نزمەکاندا بە کوردی وانە دەگوترێتەوە، بۆ پۆلی پلەی بەرز هیچ کتێبی خوێندن بە کوردی نییە».

مامۆستا کۆمەڵێک پرسیاری سەبارەت بە ئاشوورییەکان و بابلییەکان و ئەکەدییەکان و سۆمەرییەکان کرد و دەستی کچان بە کۆمەڵ بەرزەوە بوو و وەرامەکانیش گورج وخێرا و بەڕوونی دەدرایەوە. مخابن کە بۆمان ڕێکنەکەوت لێیوان و بۆچوونی مامۆستاکە خۆی لە بارەی مێژووی نوێوە ببیستین. تەنێ یەک خوێندنگەی دی گەڕاین ، ئەوجا پێمان وابوو تەواوی خوێندنگەکانی سلێمانیمان دیوە، کە سەرجەم ٤٠ دانە بوون. لەو خوێندنگەیەی دی کە چووین، کچەکان بە پێشکۆشی سپییەوە و بەرێکوپێکی بە دەوری مێزێکدا وەستا بوون کە سێ دەفری لە سەر بوو و لە نێو دەفرەکانیشدا: ۱- بسکویت. ۲- هێلکەو ڕۆن. ۳- کێکێکی بەشەکر هەبوون. ئەو کارەیان بە بۆنەی کۆتایی تاقیکردنەوەوە کردبوو. لە هەریەکە شتێکمان خوارد. لە دواییدا و لە ژووری نیگار کێشان هەمدیس تووشمان بوو بە تووشی شەوقی گۆناسێوینەوە، کە تکای دەکرد و دەیگوت: «دەمەوێ بخوێنم، دەرس بخوێنم». پاشان باوکم بە نائومێدییەوە پرسیاری کرد: «دەتوانم بچمە کتێب فرۆشییەک؟» کۆمەڵە هاوەڵە ڕووخۆشەکان کە لە تەکماندا بوون ئەو داخوازییەیان بە جێ هێنا و چووینە ئەوێ و وەستاین و دەستمان کرد بە پەڕەهەڵدانەوە و تێڕوانینی کتێبی کوردی لە تاکە گەنجینەی کتێب کە لەو شارەدا بوو، ئەنجامیشمان زۆر لاواز و بێفەڕ هاتە بەرچاو. زۆربەی کتێبەکان چ کتێبی شیعر و چ کتێبی سیاسی، کۆمۆنیستانەبوون . لەبەری ئەوە کڵاوی کوردیمان کڕی، کە یەکێکە لە نموونە هەرە جوانەکانی کاری دەستیی کوردی. سەعات چوار کاتێک گەڕاینەوە بۆ میوانخانەکە، دوو مامۆستای کچ و کچێکی دی کە ناوی جەمیلە بوو لەوێ وەستابوون و جەمیلە دەسێ جلی کوردی لە باوەشدا بوو و جلەکان *بەدیاری دران بەمن* (یەداخەوە پاشتر لە ئەڵمانیا

حەزیان دەکرد و دەیانویست هەموو شتێک دەربارەی کچانی سوێد بزانن، بەڵام باوکم کێشرایە نێو بازنەیەک لە مامۆستا کچە لاوە شۆخەکان کە جلی مۆدێرنیان لەبەردابوو. ئەوان نەخش و نیگاری کوردییان پێشان داین کە خۆیان کردبوویان. پاش قاوە خواردنەوە لەگەڵ کێکدا کە خۆیان دروستیان کردبوو بانگ کراینە نێو هۆڵێکی گچکەوە و لەوێ پەنجا کچێکی گەنج بە پاڵتۆی ئەستوورەوە خزابوونە ژوورەوە. خۆیان ئارایش نەکردبوو و پێستیان زیپکاوی و هەرزەکارانەبوو و چاوانیشیان رەش و جوان و رەنگی رووەتیشیان زۆر گەش و لەشساغ و بێ خەوش بوون. پێنج کچی بالابەرز و کەڵەگەت لە بۆ رێزی ئێمە و لەبەر دڵی ئێمە جلی کوردییان لەبەرکردبوو منیش وەکوو پێویست رێک دەستێ جلی وەکوو ئەوانم لەبەرکرد. جلەکان لەمانە پێکهاتبوون : دەرپێی کیسە ئاسا کەلە نیوەی بەرەو خوار بۆلای دەرقاچەکەی و چەپ و راست زەردبوو، کراسێکی نیوە درێژی تەنک کە ئەو دیوی لێوە دەبینرا و قۆڵەکانی زۆر درێژ بوون و لە پشتەوە پێکەوە گرێ دەدران و نیوەی درێژیی قۆڵەکان دەکەوتنە سەرشان و لە ژێر ئەو کراسە شیفۆن یان نایلۆنانەوە ژێر کراسێکی مۆدێرنی نایلۆنین کە داوێنەکانیان بە نەخش و نیگار رازێنرابووە دەبینرا، لەسەرەوەش سوخمەیەکی نایابی نەخشێنراو کە هەریەکەیان جۆرێک بوو، ئەوەی من کۆتری ئاشتی چکۆڵە وجوانی پێوە دوورابوو. قەراخی سوخمەکەش گۆبەرۆکی زێڕو زیوی پێوە بوو کە دەبریسکایەوە، بە سەر هەموو جلە کانیشەوە چەند بڵێی خشڵ هەڵگیرابوو.

پێڵاوگەلیکیش کە لە پێی کچەکاندا بوو نەخشێنراوبوون ، هێندێ جار بە پاژنەی پلاستیکی. پێنج کچەکە – سەریشیان نەبەستبووەوە – چەند شێوەی جیاواز هەڵپەرکێیان کرد. ئەمان لە کاتی هەڵپەرکێکردنندا دەستی یەکیان دەگرت. ئەم دەستگرتنە لای کچانی هیندی ، بۆ نموونە، هەرگیز نابینرێ. شێوەی پێ دانان و هەنگاوتانی سەماکە تا رادەیەک یەک جۆرە بەڵام رێکوپێک و لەسەر ئاوازە . ئەو کچانەی کە وەستابوون و تەماشایان دەکرد دەستیان کرد بە چەپڵەلێدان و هەڵپەرکێکەرانیان بەدەنگی بەرز و هات و هاوار و غەڵبەغەڵب گەرم کرد. جار بە جاریش سەیرێکی باوکمیان دەکرد بۆ ئەوەی بزانن هەڵوێستی چییە، بێگومان پێیان باش بوو.

لە ناکاو کچێکی بەدەو راوەستا و گۆرانییەکی خەباتگێڕی سیاسی چڕی و ئەوانی دیکەش بۆیان سەندەوە و بوون بە کۆرس بۆی و ناو بەناویش گۆرانییەکەیان دەبڕی بۆ ئەوەی بابژییەکی عەبدولکەریم قاسم بکەن و پاشان بۆ ئاشتی و یەکێتی گەل وجارێکی دی بۆ قاسم و ئەوجا بۆ ئاشتی و پاشان بۆ کۆمار و بۆ برایەتی کورد و عەرەب و لە دوایشدا دیسان بۆ ئاشتی بابژی دەکرا. ئێستا ئیدی کاتی ئەوەبوو کە باوکم شتێک بڵێت. ئەو وای پێ باش بوو کە هێندێک گۆڕان پێویستە بۆیە وشەی ئازادی نێو برد. ئەوجا دەنگ و هاواری کیژان بێسنوور و بێکۆتایی بوو. باوکم گوتی : «کە گەڕامەوە بۆماڵ باسی بەسەر هات و بینینەکانم لە کوردستان بۆ لاوانی سوێدی دەگێڕمەوە». بە دوایدا شەپۆلی دەنگی بەرز و قاڵە و هاوار بەرز بووەوە و ئەگەر کچەکان بیانتوانیبا باوکم هەڵگرن و بەرزکەنەوە بۆ ئاسمان بێگومان دەیانکرد. نەسرین، کچێک بوو کە لەو نزیکانە وەستابوو،

کوێیەک دەرۆیشتین دەنگی «عەرەب وکورد برایە» دەهات و ئەوەش کە ئەوەی دەگوت هەردوو پەنجەی شایەتمانی پێکەوە دەگرت و بەوە وێنەی برایەتی پێشاندەدا. لە میوانخانەکە چاوەڕوانی سەر نووسەرێکی کورد بووین کە نێوی نووسرابوو دێتە دیدەنیمان و هەرگیزیش نەهات. لەباتی ئەو فوئاد رەشید سەرۆکی دەزگەی فەرهەنگی لە گەڵ مووسایەکدا هات کە بەڕێوەبەری بیرۆ بوو. ئەو شەوە کە ساردترین شەوی سلێمانی بوو، هێندە سەرمامان بوو کە ناچار بانگمان کردنە دیوەکەی باوکم و لەوێ خۆمان بە پەتۆی ئەستوور و پۆشەن پێچایەوە و دانیشتین. پاش ئەوەی کە بە درێژا لەمەڕ کوردستان و ئەو سەرکەوتنەی کە وەدەس هاتبوو بە پشتگیریکردنی فەرهەنگی کوردی، پەیڤین، دەستمان کرد بە دووان لە بارەی سویدەوە. ئەوان هەردووکیان زۆر زۆر ستایشیان دەکرد و لایان پەسەندبوو، بە پێچەوانەشەوە هەموو شتێکی کوردستانیشیان لا خراپ بوو. من دڵیانم بەوە دایەوە کە باسی هەموو شتێکی خراپی لای خۆمان ، لە سوید ، بکەم. بەڵام باوکم ئەوەی هیچ پێ خۆش نەبوو. لە راستیدا پاشان پێکهاتین و ئەوجا باوکم گوتی: «بۆچی تۆ بەو شێوەیە وڵاتی خۆت رەش دەکەیت ودەشکێنیتەوە؟! Right or wrong my country,!». بەڵام من لەبەر ئەوەم بوو تائەوان بەرانبەر بە پێشکەوتنی ئێمە هەست بە کەم و کووڕی و ناتەواوی نەکەن.

پێنجشەممە ٢٨ی ژانیوەری چووینە وەزارەتی زانیاری (معارف) سلێمانی(٢) لە لایەن مووسا و کوردێکی چکۆڵەی ئینگلیزی زان کە نێوی مەجید سەعید بوو وماموستایەکی ردێن نەتاشراو کە نێوی مەحموود ئەحمەد و هەروەها مامۆستایەکی نەخش ونیگار کە شەوقی نێو بوو و سەرۆکی «نێوەندی بیستن و بینین» بوو، پێشوازی کراین و ئەمان بوونە هاوەڵی هەمیشەیی و بەردەواممان بە درێژایی ئەو رۆژە گرنگە. شەوقی داوای بۆرسی (ستیپێندیوم - منحة دراسية) خوێندنی لێکردین لە سوید یان لە «ئەڵمانیای دیموکراتی». بۆ هەر کوێیەک دەرۆیشتین شەوقی گۆناسێوین بەقژە رەشە لوولەکەیەوە و دەسە چلە شیکەکەیەوە لەبەر دەممانا وەستابوو و بڕوانامەی (گواهی نامە) کانیشی بە دەستەوە بوو. مخابن ئێمە دەمانزانی کە هەموو داوا کردنێک دەبێ لە رێگەی حکوومەتی عێراقەوە بێت و لەبەر ئەوەش بە هیچ شێوەیەک هیچ نەدەکرابۆ تاکە کەسێک ، بەتایبەت ئەگەر ئەو کەسە لە بواری هونەریدا کار بکات.

ئەم شەوقی یە گۆناسێوینە فیلمێکی رەنگداری ١٦ ملیمی لە بارەی جەژنی شۆڕشەوە لە ساڵی ١٩٥٩ دا لە سلێمانی پێشان داین. نە زڕنێوش و نە فرۆکەی جێتی لێبوو، وەکوو خۆنواندنەکەی بەغدا، بەڵکو تەنێ کچانی شۆخ و شەنگی سەماکەری کورد و گوندییەکان کە بەپیادەیی دەرۆیشتن.

سەمایەکــی کوردی

من گوتم : حەز دەکەم سەمایەکی کوردی ببینم . لەبەر ئەوەی کوردستان ناوچەیەکە کە خۆزگە و داخوازی میوانی تێدا دەسبەجێ دەهێنرێتە دی، ئێمەیان بردە خوێندنگەیەکی کچان و لەوێ بە کچانی کونجکۆڵ و فرەپرسیار حاتە درام کە

کردمان ئەوە بوو کە سەردانێکی قازیی شارمان کرد، موحەممەدی خاڵ. خاڵ خەریکی تەواوکردنی فەرهەنگێک بوو لەسەر ئەو زمانە کوردییەی کە لێرە پێی دەپەیڤن ، سۆرانی.

قازی لووتێکی درێژ و دوو چاوی نزیکبین و تیژ و چکۆلە و دەمێکی نووقاوی هەبوو. فێسە سوورە بە بانداژی سپی پێچراوەکەی کە هەموو قازییەکان لە سەری دەکەن هاتبووە نێو چاوانی وتوند چەسپی سەری بوو بوو.

گوتوبێژێکی بەسوود

گوتوبێژێکی بەسوود لەنێوان باوکم وقازیدا بە عارەبییەکی کلاسیکی کرا. من ئەوە تێگەیشتم کە چاپکردنی فەرهەنگێک بەچوانی ، لەم ناوە کارێکی سەختە. ئەوەش فێربووم کە زمانی کوردی، زمانێکی فرە دیالێکتە و ئەو دیالێکتەش کە ئێستا بۆ نووسین بەکار دەهێنرێت دیالێکتی سلێمانییە و کوردەکان لە تورکیا دیالێکتی جیاوازیان هەیە.

خاڵ گوتی کە کوردەکانی عێراق ریالیستن (واقعی) و بڕوایان بەوەش نییە کە کوردستانێکی سەربەخۆ کەهەموو کوردی ئەو وڵاتانە بگرێتەوە چێ دەبێ و ساز دەبێ، مەگەر لەوانەبێ پاش جەنگێکی جیهانی دی و دابەشکردنێکی نوێی جیهان. پاشان بۆمان دەرکەوت کە زۆربەی ئەوکوردانەی سەرەوە کۆمۆنیستن و پێیان وایە کە تەنێ یەکێتی سۆڤیەت دەتوانێ ئازادی بۆ کوردستان بهێنێ! جێی سەر سووڕمان نییە کاتێ کە پارتی کۆمۆنیستی عێراق خەریک بوو داوای مۆڵەتی کارکردنی ئاشکرای دەکرد، دروشمی «کوردو عەرەب برایە» ی هەڵگرتبوو و لە پرۆگرامەکەشیدا گەلێک خاڵ سەبارەت بە مافە نەتەوایەتییەکانی کورد هەبوون - باوکم گوتی: «من هاودەردییەکی گەورەم لە دڵدایە بۆ ناسیۆنالیزمی کوردان. کورد یەکێکە لەو گەلە زۆرانەی سەر زەوی کە هەمیشە و ئێستاش چەوسێنراونەتەوە و بە پاشکەوتوویی هێڵراونەتەوە. تاکە تاکە کورد لە مێژووی وڵاتانی خۆیاندا هەڵکەوتوون. ئەو سەلاحەددینە مەزنە کە هەمووەمان دەچینە زیارەتی گۆڕەکەی لە دیمەشق، کوردبوو. یەکێک لە کەسێتییە (شخصیە) فەرهەنگییە هەرە زیرەک و شارەزاکانی میسر، ئەحمەد تەیموور پاشا، لە خێزانێکی کوردی سووریا بوو. کوردەکان دەرفەت و بواری مەزنیان هەیە کاتێک کە دێنە نێو هەل و مەرجی دیکەوە. شتێکی سروشتییە کە ئەوانەی سەرکەوتوون و بۆیان رەخساوە وەهەڵکەوتووە کەبەهرە و زیرەکیی خۆیان وەپێش بخەن، خۆزگە و ئاواتێکی گڕگرتوویان بۆ ئازادی و سەربەستکردنی گەلەکەیان لە دڵدایە». لەقاوەخانەیەکی سلێمانیدا دانیشتین و دەمەتەقێ و گوتوبێژمان کرد و بە گشتمانەوە دەمانگوت کە باشترین هەلێک کە کورد لە عێراقدا هەیەتی ئەوەیە کە دەست بداتە ئەو دەستەی کە حکوومەت لە بەغداوە درێژی دەکات. ئێمە باوەڕمان نەدەکرد کە پان - عارەبیزم کە لەنێو هێندێ دەستە و تاقمدا بڵاو بووبۆوە، چارەسەربێت، چونکە نیوەی عێراق کەمینەی نەتەوایەتی بوو و لەهەمووشیان گەورەتر کوردبوو. هێڵی قاسم ئاوەابوو:

عیراقێکی عێراقی بۆ عەرەب و کورد و ئەرمەنی و ئاسووری و...هتد. بۆ هەر

زەردباوەکاندا، کە خێرا بوون بە چیای لەت و پارچەکراو، بردینی. وردە بەردی زۆر و زەبەندە و رەقەن و وشکانی ئاسمانێکی بەھارەی شینی درەوشاوە بەسەر زەوییە رووتەکەدا کەوانەی دابوو. جگە لە دەنگی ئۆتۆمۆبێلەکە ھیچ دەنگێکی دی نەدەبیسرا. لە زارکی (ژوورگەی - مدخل) ھەر گوندێکدا پسوولە کاغەزە بە نرخەکەی وەزارەتی بەرگری : « پرۆفیسۆر نوبیەری و کچەکەی...» مان دەردەھێنا و پێشانمان دەدا. لە نێوان گوندەکاندا تەنێ مێگەل وشوانمان دەبینی. لەپڕ، بێ ئەوەی مرۆ بەبیریدا بێت لە پاش ھەورازێک، زنجیرە شاخێکی بە بەفر داپۆشراو لەبەردەمماندا قوت دەبێتەوە. چیای زاگرۆس لەو دوورە، لە ئێران! باوکم دەڵێ: دەبێ گەچ یان بەردی قسڵ بێت. من دەڵێم: دەبێ ئەوە بەفر بێت. قسەی ھیچمان دەرناچێ، بەڵام من ھەر بەردەوامم لە خەون بینین بە شاخەبەرزە بەھەشتییەکانی لای ئاسۆوە.

ئەو دۆڵەی کە سلێمانی تێدایە بەرین و پان و تەختایی و دەشتە و زنجیرەکەژەکەی تارادەیەک نزمە. بەڵام لەکاتی خۆراوادا ئەوچیا وشکەبۆر- قاوەییانە دەبنە ئاگرێکی گڕو بڵێسەدار.

ئەم دۆڵە لەو دۆڵانە نییە کە بە شێوەیەکی سەرسوورھێنەرانە (شیرو ھەنگوین) ی پێدا بڕوات. مرۆڤ بیر لەوە دەکاتەوە کە چۆن دۆڵێکی ئاوا بژێوی سەرتاپای شارێک، کە پێتەختی کوردانە، دابین دەکات. کۆمەڵە شاخی چڕ و مەزنی پیرە مەگروون بۆ خۆی بە تەنیا لەو تەختاییەدا قوت بۆتەوە. دەسبەجێ گەشتەکانی خۆمم وەبیر دێتەوە لە بەشە شاخاوییە باشوورییەکانی تری ئاسیادا، لە ئازەربایجانەوە لە رۆژاوا تاوەکوو نیپاڵ و وڵاتانی ھیمەلایا لە رۆژھەڵات. تەنانەت شتێکی ھاوبەشیش لە نێوان دانیشتوانی ئەم جۆرە ناوچە رووتەن و وشکانەدا ھەیە و وەدی دەکرێ ئەویش ئەوەیە کە ھەرگیز تفەنگیان لێ دوور ناکەوێتەوە وململانێیان لەگەڵ ژیاندا سەختە. ئەفغانەکان و پەتانەکان وکوردەکان - مەبەستم بەراوردکردنی ھەموو شتێک نییە - خوو نەریتی فەرھەنگیی خۆیانیان پاراستووە.

ئەو کوردانەی کە ئێمە لە نێو چادەدا دەیانبینین سەروڕووی جوان و رێک وپڕیان ھەیە و باڵابەرز و بە ھێز و زەلامن. ھەرکە دەچینە نێو دایەرەیەکەوە و لەگەڵ کارمەندێکدا چای یان قاوەیەک دەخۆینەوە، ھەر ئەو خەڵک و مرۆڤە نەرم و شل و بڕێکیش ھەوێراساییانەی پشت مێزی نووسین دەبینین کە لە ھەموو دایەرەکانی جیھاندا دەبینرێن. شێوەی جل لەبەر کردنی خەڵکمان زۆر پێ جوانە، رانکی کەوە (شینی تۆخ) یان بۆر و کراسی دوو قۆپچە و مێزەری ریشوودار و پشتێنێکی زلی رەنگاورەنگ. ژنەکان کراسی درێژی رەنگاورەنگ وپشتێنی پان و کڵاوی رەشی تا ھەنیە داچۆڕاو و عەبایان ھەیە.

چارشێوییش تەنێ ژنانی چینی نێوەندی شارەکان دەیپۆشن. لە زارکی (ژوورگەی) سلێمانیدا بایەکی سارد و ناخۆش دای بەرووماندا. بایەکە بە نێو دیوارەکاندا خۆی دەگەیاندە میوانخانەکەی کە لێی بووین و شەوێ ھەریەکە بە خواردنیشەوە ۲٤/۸۰ کرێمان دەدا. ژوورەکان سادە وساکار بوون بەڵام ھەم ئاوی گەرم و ھەم مێزی نووسین و چرای خوێندنەوەشی تێدا بوو. باوکم مەکینەی ردێن تاشینەکەی لە بیر کردبوو، ئەمنیش پیجامەکەم! پاشان کردمان بە خوو و لەو ژوورە ساردانەدا ھەرچی جلێکی گەرم کە ھەمانبوو لەبەرمان دەکرد- یەکەم شتێک کە

پشوویەکی نائاسایی

ئەمن بۆ خۆم هەر یەکسەر پاش شۆڕشی ١٩٥٨ لە گەڵ کچە چکۆڵە یەک ساڵانەکەمدا چووبوومە کوردستان. چۆن ڕێککەوت؟ جێگەی پرسیارە. هیچ بێگانەیەک نەیدەتوانی بە نێو عێراقدا بگەڕێ و بسووڕێتەوە. من بڕیارم دابوو بەهەر شێوەیەک بێت بە زووترین کات دوای گەیشتنم بە عێراق کوردستان ببینم و لە وەزارەتی نێو خۆ داوای ڕێدانم کرد و ئیزنم خواست. وەکوو هۆیەکیش بۆ گەشتەکەم سووک وەاسان نووسیم «پشوودان»! دیپلۆماتەکان لە بەغدا بڕوایان بە گوێی خۆیان نەدەکرد کاتێک بیستیان کە ئەمن ڕێگەی گەشتکردن دراوم. خۆم و منداڵەکە بە شەمەندەفەر چووین بۆ مووسڵ، لەوێ لە ماڵی خێزانێکی عەرەبی دۆست ماینەوە، کە بەم تازانە بە هۆی یاخیبوونەکەی شەووافەوە، ماڵەکەیان تالان کرابوو. تا ئەوکاتەش مرۆڤ تا ڕادەیەک بۆنی خوێنی ئەو هەموو مردووەی سەرجادانەی دەهاتە لووت .

ئێمە سواری پاسێکی ئاسایی ڕێگەی دەرەوە بووین و بەرەو سەرەوە بۆ هۆتێلی مەزنی تووریستی لە سەرسەنگ وەڕێ کەوتین، لە سەرسەنگ شافەیسەڵ و عەبدولئیلاە، کەبەو تازەیە لە شۆڕشەکەدا کوژرابوون، کۆشکی هاوینەی ئاساییان هەبوو(من وام بۆ هەڵکەوت ئەو کۆشکە لە ناوەوە ببینم). ئەو هوتێلە مەزنە ڤالا بوو. لە لایەن هەزاران مێش و کچە چکۆڵەکەم و من خۆمەوە ئاوەدان کرابووەوە. بە چوار دەوری ئەستێڵە چیوەکەدا هەموو بەیانییەک کۆمەڵێک کورد دادەنیشتن و دەیانڕوانییە «ئیسە» و من کە چۆن خۆمان دەخستە ئەستێڵەکەوە. ئێواران دەچووینە سەرەوە بەرەو باخێکی گچکە کە کوردەکان کردبوویان بە خوو و هەموو ئێوارەیەک لەوێ خڕدەبوونەوە و دەیانکرد بە گۆرانی و شایی. ئێمەش لە گەڵیاندا دەبووین و چەپڵەمان لێدەدا. تەنێ پیاوان دەهاتن. هەر زوو لە گەڵیاندا بووین بە دۆستی چاک و ئەوانیش لە ئاگاداری و چاودێری کردنی ئێمە دا باوکانە بوون و بەرانبەرمان دۆستانە بوون. پاش چەند ڕۆژێک ئەفسەرێکی عێراقی هات و بە توندی و تووڕەییەوە پێی گوتم ئایا من تێناگەم کە بۆ ژنێکی تەنیا و منداڵێکی بچووک زۆر دژوارە کە هەر دوو مانگ دوای شۆڕشی تەمموز لەم هوتێلەدا بن لە نێوەندی ئەم کوردستانە کێوییەدا. من پێکەنیم.

ئەم جاریش دەبوو باوکم و من جارێکی دی بگەڕێینەوە بۆ کوردستان ، من بە دەربڕین وشەی دڵڕفێن و پەسەند و دڵگیر باسی جوانییە بێبەر و وشکەکەی کوردستانم لای باوکم کردبوو. ئەمجارەیان بە فڕۆکە ڕۆیشتین و دوای سەعات و چارەکێک لە کەرکووک بووین. کەرکووک بە ئەمبار و گەنجینە مەزنە نەوتییە زۆرەکانییەوە خۆشگوزەرانیی عێراق پیشان دەدات، لێرە ١١٣ کەس زیندەبەچاڵ کران کاتی ئاژاوە و فەرتەنەکەی پاش شۆڕش، زۆربەیان تورکمان بوون، ئەمڕۆ، ٢٦ی ژانیوەری ١٩٦٠، واپێدەچوو کە هێمن و ئارام بێت. هیچ خانووی سووتاوی لێنەبوو وەکوو مووسڵ. بە خۆمان و ئیزننامەکانمانەوە چووینە کن پۆلیس و بەپەلە بەرەو دەشت و دێهاتە کوردییەکان وەڕێ کەوتین .

ڕێگەیەکی قیرتاوی ڕاست و ساف و لووس بە نێو تەپۆڵکە و گردە قاوەییە

هـ . س نویبەری لە کوردستان (١،٢)

نووسینی : سیگریدنویبەری کالله
وەرگێرانی لە سویدییەوە: ئەمجەد شاکەلی

کاتێک کە پرۆفیسۆر هـ.س نویبەریی باوکم، هات بۆ ئەوەی جەژنی لە دایکبوونی ٧٠ ساڵەی خۆی لای ئێمە بکات لەبەغدا، ئێمە وەکوو دیپلۆمات لە بەغدابووین. یەکێک لە ئاواتەکانی باوکم ئەوەبوو کە کورد ببینێ.

لە سەردەمی ڕێژیمی عەبدولکەریم قاسمدا لە ساڵانی ١٩٥٩–١٩٦٠ دا بوو کە کوردەکانی عێراق بۆ ماوەیەکی کورت وکەم ئۆتۆنۆمییەکی فەرهەنگییان هەبوو وبە ئازادی دەژیان. باوکم دەشیەویست بە زووترین کات دەرسی کوردی بخوێنێ. ئێمە توانیمان پاکیزە حیلمی بدۆزینەوە، کەلەگەڵ هێندێ کوردی بەناوبانگی سلێمانیدا بانگێشتنی چای کردین. خاتوو پاکیزە حیلمی مامۆستایەکی کوردی بۆ باوکم پەیدا کرد، کە هەموو بەیانییەک لە نێو باخچە جوانکیلەکەماندا لە کەنار دیجلە بەرانبەر بەرزە لەگەڵیدا دادەنیشت.

٢٤ی فێبریوەری ١٩٦٠ باوکم سەمینارێکی لەمەڕ «گەشەکردنی زمانی فارسی و سەرنجێکی تایبەتی لە زمانی کوردی» بەئینگلیزی بۆ خوێندکارانی کورد لە زانستگەی بەغدا گرت. ئەوە دەبێ تا رادەیەک شتێکی گرنگ و سەیر بووبێت بۆ ئەو خوێندکارە لاوانە کە بۆ جاری یەکەم ببیسن ئەورووپاییەکی زمانەوان بە شێوەیەکی زانستییانە لە مەڕ زمانی ئەوان دەدوێ. پاشان ئەوان پرسیاری ئەوەیان کردکە: «کام زمان کۆنترە، کوردی یان فارسی؟» یان «ئێوە زۆرتر حەز بەکام زمان دەکەن، فارسی یان عەرەبی؟». باوکم کە بریسکە و درەوشاوەیی لە چاودا بوو، زیرەکانە و دادگەرانە گوتی: «کوردی».

٦٤- بڕوانە: La reedition de Kurt Tarihi d'I. NURI, Istanbul, 1976, Yontem y., p.11-12

٦٥- "ئاخۆ دەیانەوێت سالانی سەرکەوتن و سەربەستی و ئازادی نەتەوەیەک. نمونەی بەجەرگی و جەنگاوەری لە دۆستان و دوژمنان بشارنەوە، نەتەوەیەک کە بە بریسکەی شمشێرەکانی تاریکی مێژووی جێهێشت و ڕێبکردە ڕووناکی و ڕۆژمانی چەندان سەدە بە ئازایەتی و پاڵەوانی، هێنایە لەرزین" N. DERSIMI, Kurdistan Tarihinde Dersim, Halep, 1952, p. 336-330.

٦٦- بڕوانە: B. CHIRGUH (Celadet BEDIRKHAN), La Question kurde , Le Caire

٦٧- بڕوانە: M. SENCER, Dinin Turk Toplumuna Etkileri, Ist., 1974, May y., p. 325.

٦٨- بڕوانە ئەو وێنانەی کە لە بڵاوکراوەی کوردە ئەورووپاییەکاندا بڵاو کراونەتەوە: Ronahi et Roji Nu و هەردووکیان لە سەردەمی شەڕی جیهانی دووەمدا لە بێروت چاپ دەکران.

٦٩- "پێویستە لەسەرمان کە بەزووی فێری پیتە نوێکانی تورکی ببین. هاوولاتیان فێر بکەین ، بە ژن و بە پیاو و بەدارا و نەدار و ئەم ئەرکە بە ئەرکێکی نیشتمانی و ناسیۆنالیست سەیر بکەن" گوتەی ئەتاتورک. بڕوانە O.ERGIN, Turk Maarif Tarihi, vol . 5, Istanbul, 1978, (1ere ed. 1954), Cagri y., p. 1764.

٧٠- ئۆرگانی خۆیبون بوون، هاوار لە ساڵی ١٩٣٠ەوە بە پیتی لاتینی بڵاو دەکرایەوە. دەربارەی ئەو کۆمیتەیە بڕوانە دیپلۆمەکەم: Le probleme national kurde، لاپەڕە ١٠٨-١١٢

٧١- بڕوانە: s. JAVAD, Iraq and the Kurdish Question, London, 1981, p. 11.

٧٢- ئەمانە بریتیبوون لە: دوکتۆر فواد بەرخۆ؛ شاعر جبران؛ کۆلۆنێل یوسف زیا، پارێزەرو کۆنەئەندامی پەرلەمان حسن حەیری، کەمال فەوزی، تۆفیق، حۆکە ئیشکەری، سەعید محەمەد، ئیحسان نوری و چەند کۆلۆنێل و ئەفسەری دی کورد. بڕوانە: F. IBRAHIM , Die Kurdische Nationalbewegung im Iraq, Berlin , 1983, p.223, M. S. FIRAT, Dogu Illeri ve Varto Tarihi, op. cit., p.123 ; B. CHIRGUH, La Question Kurde, op. cit., p.20 ; et I. PARMAKSIZOGLU, Tarih Boyunca Kurt turkleri ve Turkemenler, Ankara, 1982, TKAE y., p.84.

٧٣- بڕوانە: Daily News, 02.03.1925, (no 178), FO E 1394/1091/44.

٧٤- بڕوانە: S. BEDERKHAN, The Case of Kurdistan against Turkey, Philadelphia, 1928, p.69.

٧٥- بۆئەوەی کە هیچ تەمێک لەسەر بەکارهێنانی زاراوەی Volkislam دروست نەبێت، پێویستە ئەوە ڕوون بکەینەوە کە ئێمە وامان بەکار هێناوە وەک ئامرازێکی تەکتیک کە هەندێک هەڵسوکەوتی سیاسی و کۆمەلایەتی تایبەتی پێ ڕوون بکەینەوە، نەک بۆ نیشاندانی دیاردەیەکی نوێ، چ لەلایەنی کۆمەلایەتییەوە و چ لەلایەنی ئایینییەوە کە واتای دژ بە ئیسلام یان جیا لە ئیسلام بێت.

٤٤- بڕوانە: , Tunceli Vilayetinin Idaresi Hakkinda Kanun, loi no 2884 du 25.12.1935
Publiee in Kavanin, 1936.

٤٥- بڕوانە: Bulletin periodique de la presse turque, no. 120, 1936, p. 8 ; N. DERSIMI,
Dersim Tarihi, op. cit. p. 181-184 ; 220.

٤٦- بڕوانە:, H. KIVILCIMLI, Ihtiyat Kuvvet : Milliyet, Istanbul, 1979 (redaction 1934)
p.47 ; et M.M. Van BRUINESSEN, op. cit. p.261.

ڕۆژنامەکانی تورکیای ئەو دەمە بە دڵگرانییەوە دەڕوانە ئەوەی کە چۆن کوردان "چەتەیی وەکو ئاپاکیەک دژی نیشتمان ئایین":

٤٧- بڕوانە: A. YUCEKOK, Turkiye de Din Egitim Orgutlerinin Illere Gor
Dagilim in Siyasal Bilgiler Fakultesi Dergisi, v. XXV, 1970, p : 140 -141.

٤٨- بۆ ئەو هۆکارانە بڕوانە دیپلۆمەکەم. لاپەڕە ٢٤٣-٢٥٦ کە لەمەوبەر لێی دواین.

٤٩- کەمال دەربارەی ڕاپەڕینەکەی شێخ سەعید دەڵێت:

"ئەم شەڕە وەک شەڕێکی ئایدیال دەناسرێت. بۆ یەکەمین جار لە مێژووی تورکدا سە ڕیازمکانمان جەنگاون بۆ ئایدیاکانیان و بۆ ئامانجێکی پیرۆز". بۆ ئەمە بڕوانە: T. Z. TUNAYA, Turkiye de Siyasi Partiler, Istanbul, 1952,
p : 169.

٥٠- بۆ ژمارەیەک لەو نووسینانەی کە لە بڵاوکراوەکانی ئەو سەردەمەوە وەرگیراوە بۆ دەربڕینی ڕوانگەیەی "مارکسیانە" دەربارەی ئەو هاوکارییەی نێوان ئاغا کوردەکان و کەمالیسم بڕوانە: ... H. KIVILCIMLI, Ihtiyat kuvvet
op.cit., p. 81-99.

٥١- دەربارەی ناسیۆنالیسم بڕوانە : E . KEDOURIE, Nationalism, Hutchinson Univ. Lib. , London, 1979, (1ere ed. 1960) ; et E. GELLNER, Nation and Nationalism, Oxford, 1983.

٥٢- بڕوانە: C.A.O. von NIEUWEHUIJZE, Sociology of the Middle East, A Sociological
Stocktaging and Interpretation, Brill, Leiden, 1971, p : 346

٥٣- بڕوانە: E. KEDOURIE, Nationalism, op. cit., p. 102

٥٤- دەربارەی بڵاوکراوەی کوردە تورکی لاو بڕوانە: C.O. TUTENGIL, Yeni Osmanlilardan Bu Yana Ingiltere'de Turk Gazeteciligi, (1867-1969) , Istanbul, 1969, p. 92-93 .

٥٥- دەربارەی کارتێکردنی جەوەدەت لە کەمالیسم بڕوانە: T. CAVDAR, Turkiye'de Burjuva Demokratik
Duzene Yonelik ilk Hareketler, Yeni Ulke (Ankara), no 4, 1978, p.243.

٥٦- دەربارەی ژیانی و بەرهەمەکانی بڕوانە: S. HANIOGLU, Bir Siyasal Dusunur Olarak Doktor
Abdullah Cevdet ve Donemi, Istanbul, 1982, et H.Z. ULKEN, Turkiye'de cagdas Dusunus Tarihi, Istanbul, 1979, Ulker y., p. 240-251.

٥٧- بڕوانە: W.N. Jr. HOWELL, The Soviet Union and the Kurds, these soutenue a
l'Univ. de Virginia, 1965, p. 216.

٥٨- بڕوانە: H. IBRAHIM, Bir Hasbihal , Jin (Istanbul) , no 1, 7.11.

٥٩- بڕوانە: M. SELIMBEGI, Kurtlukte Terakki Cereyanlari , Jin, 26.04.1919

٦٠- بڕوانە:, Ibid. , art. cit.

٦١- بڕوانە: TEWFIK, Kurtlerde Vahdi Zeka , Jin , 25.02.1919

گۆڤاری ژین لە نێوان ساڵانی ١٩٨٥-١٩٨٨ لە لایەن محەمەد ئەمین بۆزەرسلان، لە پێنج بەرگدا، لە ئۆپسالا چاکراوەتەوە.

٦٢- دەربارەی گەشەکردنی باوەڕەکانی شەریف پاشا و پەڕینەوەی لە عوسمانیسمەوە بۆ کوردایەتی بڕوانە هەردوو دیپلۆمەکانم
L'opposition liberale dans l'Empire ottoman (1908-1914) (preparee sous la direction de
F. Furet, Paris, juin 1987 .

وە: Le Probleme national kurde en Turquie, deja cite.
کە لەمەوبەر باسمان کردوون.

٦٣- "وەچەکانی هەر نەتەوەیەک ئەگەر بە شانازییەوە پیاهەڵدانی کارە پیرۆزە مەزنەکانی باپیرانیان نەکەن، کە لاپەڕەکانی مێژووی نەتەوەیان پڕ کردووەتەوە، لە ژیاندا بە هیچ ناگەن جگە لە نزمی و سەرشۆڕی" بڕوانە: K.Bitlisi, Kurdler Irani
Degilmidir ? , Jin, no. 18, 08.05.1919

Hakkında Meclis Görüşmeleri, Ankara, (ed. Univ. d Ankara), 1957

٢٦- بڕوانە: Bagdad Times, 7.4.1925.

٢٧- بڕوانە: E. LINDSAY and A. CHAMBERLAIN, Constantinopole, Feb., 24.1925. (n.154), FO E 424 / 262.

٢٨- بڕوانە: C. MADANOGLU, Anilar, op. cit., p : 223.

٢٩- دەربارەی ئیسلام لە ناوچەی کوردانا. بڕوانە:
A. BUTRUS, " The Nakchibendiyya - Majaddidye in the Ottoman Lands" Die welt des Islams, vol xx11, 1982,
هەروەها: M.M Van Bruinessen, Agha, Sheikh and the State, Utrecht, 1978.

٣٠- بڕوانە: R. W. OLSON- W.F. TUCKER, " The Sheikh Said Rebellion in Turkey", Die Welt des Islams, vol. XV111, op. cit., p : 261.

٣١- بڕوانە: M.M Van Bruinessen, Agha, Sheikh and State, op. cit., p : 261.

٣٢- بڕوانە: Ibed, لاپەڕە ٢٤٨ هەروەها B. CEMAL, Şeyh Said İsyanı, İstanbul, 1955, لاپەڕە ٢٠.

٣٣- بڕوانە: M. LINDSAY, Notes sur l'insurrection du Kurdistan de fevrier a avril 1925 in, Constantinople, 02.06.1925, (no 429), FOE 3340/1091/44.

٣٤- ئەم نامەیەی شێخ سەعید لەلایەن (ڕۆژی نوێ) وە لە سلێمانی لە ١٩٦٠ دا بڵاو کرایەوە. لاپەڕە ٣٦-٣٨. هەروەها بڕوانە ئەو بەڵگنامانەی کە بڵاو کراونەتەوە لەلایەن:
M.S.FERAT, Doğu İlleri ve Varto Tarihi, İstanbul, 1961, M.E. b.y., p: 130.

٣٥- بۆ چۆنیەتی بەرپابوونی ڕاپەڕینەکە بڕوانە:
M.M.Van BRUINESSEN, " Popular Islam, Kurdistan Nationalism and Rural Revolt", in J.M.Bak, G.Beneche, (eds), Religion and Rural Revolt, Manchester, 1984 هەروەها
بڕوانامەکەم، لاپەڕە ٢١٢ – ٢٢٨.

٣٦- بۆ بەشێکی ئەو خێڵانە بڕوانە:
M. GÖLOĞLU, Türkiye Cumhuriyeti, Ankara, 1971. لاپەڕە ١٠٧، هەروەها بڕوانە:
M.S.FIRAT, Dogu Illeri ve Varto Tarihi, op. cit. لاپەڕە ١٢٥.

٣٧- بڕوانە: L.DILLEMAN, Les Francais en Haute Djezirah, (archives de CHEAM, , n : 50. 538), P: 50.

٣٨- دەربارەی حاجۆ بڕوانە: DILLEMAN, op. cit. p : 52-53 ; Bruinessen, op. cit., p : 115 ; J. MALIA, M. Kemal ou la Renovation de la Turquie, Paris, 1929, p ; 233 ; A. GIBERT - M. FEVERT, Le Djezirah et son reveil economique , Revue de Geographique de Lyon, 28(1953), p : 10-11.
بۆ وەرگێڕانی نامەکەی حاجۆ بۆ بڕوانە: aussi la traduction de lettre de Hadjo a Naif, in colonial Office, London, 23.04.1926 (n : C.8105. 126) FO E 2583/ 228/65.
هەروەها بڕوانە: Nota by M. JARDINE, Concerning the Kurdish Revolt under Hadjo London, 23.06.1926, Colonial Office, (n : C. 12231/26), FO E 3910/228/65.

٣٩- دەربارەی هەندێک لە نامەکانی سەرکردە کوردەکان بڕوانە: La lettre de certins chefs kurdes a Amin and other kurdes traduite par Colonial Office, 10.08.1926 (C 15217/26) FO 4698/228/65.

٤٠- بڕوانە: Milliyet, 01.05.1930, et note de M. JARDINE, cite suppra, note : 38.

٤١- دەربارەی یەکێک لەو ڕاپەڕینانە (ئەوەی Sassoun) بڕوانە: Les memoires de MADANOGLU, Anilar, op. cit.,

٤٢- دەربارەی کوردانی دەرسیم بڕوانە: P. J. BUMKE Kizilbas - kurden in dersim (Tunceli, Turkei) Marginalitat und Huresie in Anthropos, 1979, n. 74.

٤٣- بڕوانە: N. DERSIMI, Dersim Tarihi, İstenbul, 1979, (1er ed. Halep, 1952), p. 162, H. ÖZTÜRK, Tarihimizde Tunceli ve Ermeni Mezalimi, Ankara, TKAE y., 1984, P.39.

١٤- بڕوانە: notamment N. ULUG, Tunceli Medeniyete Açiliyor, op.cit., et A.KEMALI,
Erzincan Tarihi, İstambul, 1930 ; Milliyet, 12.07.1930, 13.08.1930 et Akbaba, 15.07.1930.

هەروەها چەند کاریکاتێرێک کە لە ڕۆژنامەی Milliyet, دا بڵاو کراونەتەوە بەتایبەتی ئەوانەی ١٢- ٧- ١٩٣٠ و ١٣- ٨- ١٩٣٠ ئەوەی Akbaba ١٥- ١٧- ١٩٣٠.

١٥- بۆ یەکەمین ڕۆژی کردنەوە ژمارەیەک لە Halkevleri (ماڵی گەل) بڕوانە:
دەربارەی قوتابخانەکان Halkevleri, İstanbul, 1969, CHP İstanbul Gençlik kolu., p. 13 - 14.
بڕوانە دیپلۆمەکەم، لاپەرە ٥٨ – ٥٦.

١٦- ئامانجی ئاشکرای ئەو یاسایانەی کە دەرفەتی ڕاگوێزانی لایکان دەدەن بەم جۆرەیە: "ئەرکەکانی دەوڵەت بۆ چەسپاندنی فەرهەنگی تورک بەسەر ئەو کەسانەدا کە هەمیشە دوورەپەرێز بوون لەو فەرهەنگە، بە ڕوونی پەنجەی بۆ ڕاکێشراوە لە (یاساکاندا). ئیدی کۆماری تورک ڕازی نابێت بە هەبوونی کەسانێک کە بە پێ ی یاسا سوود لە پێناسەی ئەم وڵاتە وەردەگرن و ئاڵای تورکیان خۆشئەویست... بۆ ئاسانکردنەوەی تواندنەوەی ئەو کەسانەی کە فەرهەنگی تورکیان هەیە بەڵام بە زمانێکی تری جگە لە زمانی تورک دەدوێن، دەگوێزرێنەوە لەو جێگایانەدا کە دەوڵەت بەخۆی ئارەزووی لێ یە جێنیشینیان دەکات. بڕوانە:- İ. BEŞİKÇİ - Kürtlerin Mecburi İskanı, Ankara, Komay y., 1976, p.161 ١٦٥,

دەربارەی جێنشینکردنیشی بڕوانە: Journal officiel, no 2773, du 21.06.1934, traduite en francais, in: CHEAM, 1934, Archives du CHEAM, no 60.
هەروەها بڕوانە: یاسای ژمارە 2848 du 18.09.1938 in Kavanin, vol. 16, 1936.

١٧- بۆ ژمارەیەک لە تێبینیەکان بڕوانە: M. K. ATATÜRK, Nutuk, İstanbul, 1972, (p.1103, 1ere ed. 1927) ; K. KARABEKIR, İstiklal Harbimiz, İstanbul, 1960, Türkiye y., pp. 1103 - 1113, etc..

١٨- بڕوانە: شەرەفنامەی شەرەفخان:
Şerefname, İstanbul, 1971, Ant y. et M. KUNT, The Sultan Servants, Princeton univ. Press. 1978.

١٩- دەربارەی زیادبوونی دەسەڵاتی خێڵایەتی، بڕوانە کتێبەکەی S. LONGRINGG:
Iraq 1900 to 1950, A Political, Social and Economic History, Oxford, 1953.

٢٠- بڕوانە: St. DUGUID, " The Polhci of Unity : Hamidan Policy in Eastern Anatolia", Middle Eastern Studies, vol. IX, n: 2, 1973 .
هەروەها بڕوانە: B. KODAMAN, "Hamdiye Hafif Suvari Alaylari : 11. Abdulhamid ve Doğu Anadolu Aşiretleri", IUEF Tarih Dergisi, Istanbul,n:2,1979

٢١- بڕوانە: S. ZARCEKI, " La Question kurde - armenienne", Revue de Paris, Mars - Avril ١٩١٤,

٢٢- بڕوانە بڕوانامەی P. RONDOT: Notes sur les Mirans, s.d. Renee., (archives de CHEAM, n:19), p. 9 - 13,
هەروەها گوزارشتەکانی: S.D.N., Question of Fronther betweeri Turkey and Irak, Geneve, 1942, p.29. Mandats, Rapport de la Commission chargee par le Conseil de l'Etude de la Frontiere entre la Syrie et l'Irak, 1932, p.: 36 - 37.

٢٣- بڕوانە: İskan Kanununun Bazı maddelerinin Değiştirilmesine Dair Kanun, , Loi no 2848 du 18.09.1938, Kavanin, vol 16, 1936.

٢٤- بڕوانە: C. MADANOĞLU, Anılar (1911-1938), İstanbul, 1982, Cagdas y., p. 160 e. s. , A. N. SOZER, Diyarbakir Havzası, Ankara, 1969, (ed. de l Univ. d'Ankara), p. 65, 110.

٢٥- بڕوانە لێدوانەکانی پەرلەمان بۆ چەسپاندنی یاساکان ١٩٢٤: A.S. GÖZÜBÜYÜK, 1924 Anayasası

١٩١٣ وە تا ١٩٢٢ درێژەی کێشا زیاتر بوو. جگە لەوەش هەل و مەرجی ژیئۆپۆلیتیک وابوو کە ناوچەی کوردان تەواو ئاوەڵا بێت بۆ کارتێکردنی ڕووداوەکانی ئەو دیوی سنوور (بێگومان بەسەر ئەودیو سنووریش). بەڵام لە شارەکانی رۆژئاوادا ئەوە نەبوو. نەبوونی سیستەمی خێڵەکی (هەروەها نەبونی هاوکاریش)، مل کەچی ئایینی بۆ دەوڵەت، بریتی بوو لە ناڕەزاییەکی کۆمەڵایەتی. ئەمەش نەریتێکی حەنەفی بوو کە زۆر لەپێش کۆماریشدا هۆکاری لەناوبردنی بوو. تەنیا ئەوە ماوەتەوە کە لێکۆڵینەوە لەبارەی (Volkislam) (٧١) و هەموو جۆرەکانی دیکەی دەربڕینی ناڕەزایی قووڵ بکرێتەوە وەک: چەتەیی، مانگرتن، کێشە لەگەڵ ژاندارم و کارگێڕان وتاد... لێرەوە جێی دەهێڵین بۆ تۆژەرەوەکان کە دەتوانن شتی زۆر سەرنج ڕاکێشەر و گرینگی لێ بەدەست بێنن.

تێبینی و سەرچاوەکان:

١- بڕوانە: W .S.EDMONDS , " Notes on a Tour to Diarbekir, Bitlis and Much, Constantinople, May 21, 1930, (n: 68), Foreign Office Fo. E 2678/1279/44.

٢- بڕوانە:ئانالیزی Gellner لەسەر "Rulers in a Moses situation",
E. GELLNER, Legitimation of Belief, Londres, Cambridge Univ. Press, Londres, ١٩٧٤,

٣- بڕوانە: K. NACİ, "Türk Devletinde Halkçılık", "ÜLKÜ", Ankara, 3.4.1933

٤- بڕوانە: M. E... BOZKURT, Atatürk İnkilabı, İstanbul, Atıny., 1967, (1ere edition , 1940) ,p. 137, 155 - 156.

٥- ئەم فۆرمولە لوت بەرزە هی ئایدیۆلۆگی کەمالیستەکان P.SAFA ە. بڕوانە:
P. SAFA, Türk İnkilabına Bakışlar, (Cumhuriyetin 15. Yili Munasebetiyle), İstambul, Kanaat kitabevi, 1938, p. 19

٦- بۆ هەموو تێکستەکانی تیۆری و کۆنگرەکان لەو بارەیەوە بڕوانە: İ.BEŞİKÇİ, Türk Tarih Tezi ve Kürt Sorunu, Ankara, Komal y., 1977.

٧- بڕوانە ژمارەکانی گۆڤاری کەمالیستەکان: Kadro و هەروەها:
S.S. AYDEMİR, İnkilap ve Kadro, Ankara, Bilgi y., 1967, (1ere ed. 1932).

٨- بڕوانە: A. Engin Sosyalist Geçinenlere Karşı Atatürkçülük Savaşı, İstanbul, s.d. S. SİNANOĞLU, Türk Hümanizmi, Ankara, 1982, TTK y.

٩- بڕوانە: F. RIFKI (ATAY) , Moskova -Roma, İstanbul, 1936.

١٠- ئەمە لە A.US, 1930-1950 Haıra Notları, İstanbul, 1966. دا لە لاپەرە ٣٩ دا بڵاو کراوەتەوە. بەڵام وەزیری دادپەروەری ئەتاتورک M.E.BOZKURT, دەڵێت:
باوەری من بەو جۆرەیە... ئەوانەی کە تورکی ڕاستەقینە نین لە نیشتمانی تورکدا تەنها یەک مافیان هەیە: مافی بوون بە نۆکەری تورکان، مافی بوون بە بەندەی تورکان". بڕوانە: ڕۆژنامەی Milliyet, 19.9.1930

١١- بڕوانە: in C. KUTAY, Celal Bayar, İstanbul, 1938, vol. 3, p.1354

١٢- سەرکوتکردنی ڕاپەڕینی شێخ سەعید پێویستی بە پەنجا ملیۆن لیرەی تورک بوو. ئەم پارەیەش سێ یەکی بودجەی ساڵانە بوو. بۆ سەرکوتکردنی ڕاپەڕینی ئارارات شەست و شەش هەزار سەرباز و زیاتر لە سەد فڕۆکە بەشداریان کرد. بۆئەوەی دەرسیم پێویستی بە زیاتر لە پەنجاهەزار سەرباز بوو. بە پێی تەفسەرێکی تورک خەرجی ساڵانە بۆ هێشتنەوەی سوپا لە ناوچەکەدا، دە ملیۆن لیرەی تورک بوو. بۆ ئەمانە بڕوانە دیپلۆمەکەی من لەژێر ناونیشانی:

١٣ - بڕوانە: یاسای ژمارە: ١١٦٤ی ٢٦-٦- ١٩٢٧ دەربارەی:

ئەورووپایی کاری زۆر تێکردبوو هەموو شتێکی تری جگە لە ناسیۆنالیستی بە ناڕەوا دەزانی (٧٦). مەڵبەندی لە نیویۆرک، پاریس، دیمەشق، تاران، بە غدا و لە بەیروتیش هەبوو و توانی لەشکرێکی سوپایی بەهێز ڕێکبخات و لەژێر سەرکردایەتی ئیحسان نوری پاشادا (کە کۆلۆنێلێکی عوسمانی و کۆنە ئەندامی ئازادی بوو و "خۆیی بوون" کردی بە ژەنێراڵ) توانی دەوڵەتێکی کاتی دابمەزرێنێت. بەڵام ئەم کۆمیتەیەش نەیدەتوانی کارتێکردنێکی وای هەبێت، ئەگەر سەرکردە ئایینی و خێڵەکیەکانی کورد لە تورکیا و سوریا و ئێران و عێراق بەپشتگیری کردنی سوپایی و ئایینی رازی نەبووبنایە، بێگومان نەبەشی زۆری کۆدەکردنەوە و نە بانگەوازی ڕێکخستنەکەش لەگەڵ باوەڕی ڕۆشنبیراندا دەگونجا. ڕاپەڕینی دەرسیمیش کە وابزانم لەو زنجیرەیەدا لە هەموویان خوێناوی تر بوو، سەرەڕای نەبوونی کۆمیتەیەکی ڕێکخراو لەلایەن ڕۆشنبیرانەوە، سەرەڕای بەشداری کردنێکی زیاتر سەمبۆلی "خۆیبوون"، تەنها کاری ڕۆشنبیرانی ناسیۆنالیست و شێخانی عەلەوی بوو.ڕاپەڕینە بچوکەکان بەهۆی نەبوونی پەیوەندیەوە، نەیانتوانی یارمەتی لەڕۆشنبیرانەوە وەربگرن. بۆیە بەگشتی کەمیان خایاند.

کەواتە ئەم هاوکاریە، هاوکاریەکی هەندێک نامۆ بوو لە نێوانی دو هێزدا، کە لەلایەنی کۆمەلایەتیەوە "دوژمن" و ناکۆک بوون. بەڵام هەر ئەو هاوکاریەش بوو کە درێژە پێدانی ڕاپەڕینەکانی ١٩٢٥ و (١٩٢٧- ١٩٣٠) و (١٩٣٦- ١٩٣٨)ی گونجاند. با بەکارهێنان و سوودوەرگرتن لە ڕۆشنبیران لەولاوە بوەستێ، چونکە لێرەدا مەبەستمان تەنها لە یەکگرتنەوە و لەیەکترچوونی حەتمی دوو نارەزایی بە سروشت جیاوازە. یەکەمینیان دژی مەرکەزییەت و تێهاتنی دەوڵەتی و گۆڕانکاری سەپێنراو لە بالاوەو لەلایەن ناسیۆنالیستی تورکەوە، کە ئارەزووی تێکشکاندنی نەریتی کۆمەڵگای کوردی دەکرد. واتە ڕاپەڕینەکە لە هەندێک ڕووەوە لە ڕاپەڕینەکانی ژێر دەستەلاتدارێتی عوسمانی دەچوو، ئامرازێکی پاراستنی هەیکەلی کۆمەلایەتی و ئابوری و ئایینی بوو. ئامرازەکانی کۆکردنەوە و ئامادەکردنیان "نەریتی"ن ، "هۆشیاری نەتەوەیی" زۆر جار وەک پاشگرێک خۆی دەنوێنێت. دووەمیان بەپێچەوانەوە نارەزاییەکی دژ بە بوونی دەوڵەتی نیە – ئەو دەوڵەتەی کە ئەگەر بەبەکارهێنانی زەبروزەنگیش بێت خواستاری شارستانییەتە – بەڵکو دژی دەوڵەتی تورکە کە لە بناغەدا لە کەمالیسم جیاواز نیە. جگە لە کوردایەتی و ئارەزووی پیادەکردنی سیاسەتێکی کوردانە بەسەر کوردان و لەژێر دەستەلاتی دەوڵەتێکی کوردیدا کە لە بنەڕەتدا نەیدەتوانی جیاواز بێت لە دەوڵەتی کەمالیست.

بەرلەوەی کە کۆتایی بەم گوتارە بێنم حەز دەکەم چەند وشەیەک دەربارەی ئەو هۆکارانە بڵێم کە وایان کرد ناوچە کوردیەکان و بەتایبەتی لادێکان تەنها بمێننەوە لە خۆڕاگرتنێکی ئەوتۆی دژی ڕژێمی کەمالیست کە شێوە دەوڵەتێکی دەستەلاتداری بە زۆر سەپێنراوە بەسەر تورکیادا. وەڵامی ئەم پرسیارە بێگومان سادە نیە، چونکە بینیمان کە بزوتنەوەی کورد ئەنجامی ئەمبەر و ئەوبەری دوو جۆر نارەزایی بووە. ئەو هەل و مەرجە نەیدەتوانی لە بەشەکەی تری تورکیادا دروست ببێت. لە لایەکی تریشەوە گەرچی ڕاستە کە نارەزایی بەرچاو دەکەوتن (هەروەک منمن و ریز و سامسون) بەڵام وادیارە کە ئارەزووی ئاشتی و هێمنی، لەدوای ئەو شەڕەی کە لە

خۆیانەوە لاسایان کردەوە و بە هەنگاوێکی شارستانیشیان لە قەڵەم دا (٦٩). کاتێک "کەمال" فێربوون و قبوڵکردنی پیتی لاتینی بە ئەرکێکی نیشتمانی لە قەڵەم دا، ناسیۆنالیستە کوردەکانیش هەمان کاریان کرد (٧٠) . بگرە ئەمەیان کاتی هەرە زۆرکەمی ویست کە رۆشنبیرە کوردە بیرئەورووپاییەکان بە خۆشیەوە لاسایی بکەنەوە. ئەمە سەرەرای ئەوەی کە لە ئێران و لە عیراق جەماوەری کورد هەر بە پیتی عارەبی دەینوسی (٧١). دەبێت ئەوەش بڵێین کە ئەو ئامرازانەی ناسیۆنالیستانی کورد بۆیان دەلوا بە کاری بهێنن، لەرادەبەدەر کەمتر بوون لەوانەی کە کەمالیستەکان لە بەردەستیاندا بوو. نەبوونی فشاری دەوڵەتی، بێگومان سنوری کارتێکرنی هەڵکەوتوانەی کوردی تەسک کردەوە. بێگومان ئەمە هیچ لەو دوو نمونەیە کەم ناکاتەوە کە لەبارەی خاڵی هاوبەشی شێوەی بیرکردنەوەی هەڵکەوتوانی کەمالیست و کوردان نیشانمان دان، کە هەردووکیان تەواو شەیدای ئازایەتی بێ بەزەییانەی دوکتۆر عبدالله جەودەتن.

(٦)

س. جەواد دەربارەی هۆشمەندانی ناسیۆنالیستی کوردی ئێراق دەڵێت:

" ئەم رووناکبیرانە بۆ ماوەیەکی کەم چوونە ژێر رکێفی سەرکردە خێڵەکیەکان، بەو هیوایەی کە بتوانن رۆژێک راپەرینێکی بەجەوهەر خێڵەکی بە راپەرینێکی نەتەوەیی بگۆرن".

وابزانم ئەم روانگەیە باری بەشێکی زۆری رۆشنبیرانی ناسیۆنالیستی کورد لە تورکیادا روون دەکاتەوە. لەراستیدا ئەم دیاردە نوێیە سروشتی نارەزایی کوردانی ژێردەستی کۆمارەکەی گۆری. لەگەڵ دەرکەوتن و رێکخستنی داخوازیەکانی کە روو لە هەموو "نەتەوەی" کورد دەکات، راپەرینە بە سروشت خێڵەکی – ئایینیەکان رواڵەتێکی سیاسیان بەخۆیانەوە گرت و ئەمەش لەناو پرۆژەیەکی گشتیدا رەنگی دایەوە، بەنیازی دامەزراندنی دەوڵەتێکی نەتەوەیی.

هۆشمەندانی کورد، هەر لە ١٩٢٣ وە، لە مەیدانی چالاکیەکانیاندا بە ئاشکرا بە شان و باڵی جیابونەوە هەڵیاندەدا. کۆمیتەی نهێنی ئازادی کە لەوەبەر لەلایەن ژمارەیەک لە رۆشنبیران و ئەفسەرانی کوردەوە دامەزرابوو (٧٣) توانی سوپایەکی بەهێز لە دە هەزار چەکدارێک پێکبهێنێت، لەژێر فەرمانداریتی سەدو پەنجا ئەفسەردا کە لەوەبەر لە لەشکری عوسمانیدا بوون (٧٤). کۆمیتەکە سەرکردایەتی بزوتنەوەکەی دایە دەست پیری تەریقەتەکان (شایانی باسە کە شێخ سەعید لەنێوانیاندابوو) چونکە بەبێ ئەوە بزووتنەوەی خێڵەکان مەیسەر نەدەبوو. خۆئامادەکردنەوەی بزووتنەوەکە بەشێوەیەکی ئێگجار خێرا لەدوای تێکشکانی ١٩٢٥، کاری کومیتەیەکی دیکە بوو۔ خۆیی بوون ۔ کە لە ١٩٢٧ دا لەلایەن ژمارەیەک لە رۆشنبیران و ئەفسەرانی کوردەوە، کە لە دەرەوە دەژییان، بە هاوکاریەکی باشی پارتی ئەرمەنی "تاشناک سوتیون" دامەزرێنرا (٧٥). ئەم رێکخراوە کە بیری

دەپێچێتەوە... ئێمە لە چەرخێکی وادا دەژین کە تەنانەت یەک سەعات لە نەزانین (خەوتن) واتای مردنی نەتەوەیەکە" (٥٩).

"توانامان هەیە لە نهێنییەکانی هێزە نەریتییەکانی لەدایک بووی ئەورووپا و ئەمریکا تێبگەین. ئێستا دەزانین کە ئەو هەوایەی کە لەو ناوچانەوە دێت رەشەبایەکی ژاراوی نیە، بەڵکو وزەی ژیانە".

"کوردان، وێڕای ناڵەباری مەرجەکانیان، دەتوانن لە دەمێکی کەمدا ئەو شارستانییەتە بەرزە بگونجێنن و ئەرکی پێشبردنی ئەو کاروانە ئاڵۆزە لە ئەستۆ بگرن".

"ئەو شارستانییەتە بۆ ئەو کەسانەی کە بۆ بەهێزبوون تێناکۆشن نەهامەتییە، بەڵام دەرمانە بۆ ئەو کەسانەی کە ئارەزووی دەکەن" (٦٠).

"ئەو دەمارگیرە ئایینیانە کەسانی بێ بارن و خۆیان لەژێر چەندان رەنگ و شێوەی جیاوازدا دەشارنەوە. دەترسن کە لە خەوەهەستانی گەل، هیچ بەندەیان بۆ نەهێڵێتە و هەموو ئەو سامانەی کە بە بێ ماندووبوون بەدەستیان هێناوە تەفروتونا ببێت" (٦١).

"ئەو نەتەوە پچوکانەی کە خۆیان رێک دەخەن، پێش هەموو شتێک دەبێت ئاکاری خۆیان چاک بکەنەوە و بیری خۆیان لەگەڵ سەردەم و پێویستییەکانی چەرخ بگونجێنن" (٦٢).

بەم جۆرە ناسیۆنالیزم پڕۆژەی دەوڵەت و لە هەمان کاتدا پڕۆژەی کاری نوێ خوازی بەشەرعی دەخستەوە. بێگومان زۆر لەپاش "کۆمیتەی یەکێتی و پێشکەوتن". بەڵام زۆریش لەپێش کەمالیستەکانەوە هۆشمەندانی کورد جێگەی ئایین و خەرافاتیان بە ناسیۆنالیزم و بە نوێ خوازی پڕکردەوە. لەراستیدا ئەم پڕۆژە نوێیە کۆمەڵایەتییەی کە زۆر کەم (لە دواتر هەر هیچ)لە ئایین و نەریتی کۆمەڵایەتی دەدوا، لە ١٩٢٥ بەولاوە رۆڵێکی گرینگی بینی لەبواری کەم کردنەوەی توانای کارتێکردنی ناسیۆنالیستەکان بەسەر شارە کوردەکان.

شان بەشانی وازلێهێنانی تێزی پان عوسمانیزم (وەک لەلای شەریف پاشا دەبینرێت) (٦٣)، ئەو تایبەتیانەی کە ناسیۆنالیستی پێ دەناسرێت، هێندی هێندی جێگای خۆیان کردەوە! چەرخی گەشەدار کە لە ئەفسانەی کاوەی ئاسنگەرەوە هەڵبەسترا (٦٤)، گرنگی دان بە شەهیدانی مێژوو و گۆڕەکانیان ئەمیش لە زۆر کاتدا هەڵبەستراو (٦٥)، زیندوکردنەوەی ئەفسانەی ئازادی کە بە درێژایی هەزاران ساڵ لە گیانی کورددا بە هەبووە (٦٦)، لێکۆڵینەوە لە نەریتی راپەرینە خێڵەکیەکان و ئەوانی تریش لە روانگەیەکی ناسیۆنالیزمییەوە (٦٧)، دانی واتای خەباتی شارستانی بە خەباتی ناسیۆنالیست...تاد، هەموو ئەم خاڵانە جێگای خۆیان لە گوتار و لێدوانی ناسیۆنالیزمی کوردی سەردەمی کەمالیستدا کردەوە.

لەیەکچوونی وشە و زاراوە و دارشتنی ئەم گوتارانە و ئەوانەی ناسیۆنالیزمی تورکی کەمالیست زۆر زەقن. لەوەش زەقتر، خوێنینەوە و بە یەکترگەیشتنەوەی هەردوو رێگاکانی ناسیۆنالیستی کەمالیست و ناسیۆنالیستی کوردانە لە پراتیکدا. ئەو "شۆڕشە" جلوبەرگیەی کە هەرکەس دژی بوایا بە دوژمنی رژێم دادەنرا و ئەنقەرە بە توندی سزای دەدا (٦٨)، هەر خێرا ناسیۆنالیستە کوردەکانیش لەلای

خاڵێکی ناوکۆیی نێوان ناسیۆنالیزمی کورد و ئەوانی تری ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاست بە یاد دێنینەوە کە «ئە. قەدووری » جوانی بۆچووە : نەبوون یان لە باشترین باردا لاوازی چینی نێوەندی، دەرفەتی دایە ڕۆشنبیرانی ناوچەکە کە ببنە هێزی هەڵگری ئەو باوەڕە (٥٤). ناسیۆنالیزمی کوردیش لەو ڕووەوە تاک و جیاواز نیە. ئەم ناسیۆنالیزمە کە پەروەردەی دەستی ڕۆشنبیرانە کە خۆیان وەچەی خێزانە ناودارە کۆنە بەگەکانن، هەروەها ئەفسەرانی سوپا بوون. لە هەمان کاتی ئۆپۆزیسیۆنی تورکدا کە ئەمیش بیری ناسیۆنالیزمی زۆر گرتبووە خۆی، سەری هەڵدا (٥٥). یەکێک لە بەناوبانگەکانی ئەو ئۆپۆزیسیۆنە، عەبدولا جەودەتە، کە باوکی گیانی گۆڕانکاریەکانی کەمالیستە (٥٦)، کە شوێنەواری خۆی بەسەر بیری ناسیۆنالیسمی کوردی ئەو دەمە (١٩٠٨- ١٩٢٢) دا و تەنانەت بەسەر کەمالیستیشدا بەجێهێشت. ئەندامێکی چالاکی ناسیۆنالیزمی کورد لە سەردەمی شەڕی سەربەخۆیی دا، ئەو دوکتۆرە سوپاییە کە قوتابی G. Le Bon و F.Isnand بوو، بیری پێشکەوتنێکی "بێ بەزەیی" لە ئیمپراتۆری عوسمانیدا بڵاو کردەوە. بانگەوازی کۆتایی هێنان بە ئایینی دەکرد کە دەبوایە بە بڕوای ئەو، جێگا بۆ " ماتەریالیسمی بیۆلۆژی " چۆڵ بکات. هەروەها جەودەت خۆی کردبووە دەمڕاستی بیری سەربژاردەیی لە تورکیا و پشتگیری جۆرێک لە هەرەوەزخوازی لەژێر دەستەڵاتی دەوڵەتدا دەکرد. بەباوەڕی ئەو ناسیۆنالیزم ئەنجامێکی پێویستی پسیکۆلۆژی بوو بۆ دابین کردنی یەکێتی "نیشتمان" یش، باشکردنی باری بیۆلۆژی ڕەگەزی بە باش دەزانی (٥٧).

ناسیۆنالیزمی کورد بەهۆی سەرقاڵییەوە لەنێوان (١٩٠٨- ١٩١٨) بۆ ڕێکخستنی پان عوسمانیزم کە بتوانێت کوردستان پێشبخات، هەتا ١٩١٩ لەسەر شانۆی سیاسیدا دەرنەکەوت. بەپێچەوانەی (١٩٠٨- ١٩١٨) تایبەتێتی پان عوسمانیزم، لە ١٩١٩ دا جگە لە پشتگیری جەودەت، بێگومان پرۆژەیەکی ڕوونی خواستاری دەوڵەتێکی نیشتمانی و هەروەها شارستانی و نوێ خوازیشی هەبوو. "ئەم ئەوە نوێیە کە بیری بێگانەی وەکوو ناسیۆنالیزم، دیموکراسی و سۆسیالیزم زۆر کاری تێکردبوو، هیوای کوردستانێکی ئازادی لە لەناوبردنی شار و لادێچێتی دا و لە باشکردنی باری- سیاسی و کۆمەڵایەتی دا دەبینی" (٥٨).ئەو پرۆژە کۆمەڵایەتییە کە بەدرێژایی هەموو ئەو سەردەمەی کە بۆ ئێمە گرینگە، بناغەی شەرعیەتی ناسیۆنالیسمی کورد بوو، لە دروستکردنی دەوڵەتێکدا تەنها ئەنجامێکی لۆژیکی بۆ مافی چارەنووس یان مافێکی تەواو گونجاو لەگەڵ پرەنسیپی ویلسۆنیدا نەدەبینی. ئەو دەوڵەتە دەبوایا ڕێگا بۆ پتەوکردنی یەکێتی نەتەوەی کورد خۆشبکات و دەرفەتی شارستانی بۆ گەشەکردنی لەناو کورداندا وەدی بهێنێت. سەردەم بەبڕوای ئایدیۆلۆگەکانی ناسیۆنالیزمی کورد، سەردەمی شارستانییەتە و ئەوانەی فریانەکەون پێی بگەن بێگومان تیادەچن. بەم جۆرە ناسیۆنالیزم دەبووە باوەڕی کوردان و دەرفەتی دەدان کە ئەوانیش سود لەو دەمە وەربگرن و خۆیان بە یەکێک لە نەتەوە شارستانیەکان بزانن. کارتێکردنی بیری جەودەت زۆر کەم شارڕابۆوە. وەک دەبینین:

"ڕێبازە سیاسیە کۆنەکان بەرەو ئاوابوون دەچن. دەبینین کە پێشەوای دیکە و پرانسیپی دیکە دێنە گۆڕێ. بیر بەسەر تۆڕەییدا زاڵ دەبێت. ڕووناکی تاریکی

(٤٨). چەسپاندنی ئەرکی سەرشانی راپەرینەکە وەک جیهادێک و رەتکردنەوەی (قوتابخانەی دەوڵەتی، سەربازی کردن، مارەکردن لە دادگا...تاد) نەریت و یاسای ئایینی تێکەڵ بە هەیکەلی کۆمەڵایەتی راپەرینەکە کرد. بەڵام هۆکاری دی، لەنێوانیاندا (باری هەل و مەرجی سەردەمی ناوچەیی، دابڕانی راپەرینەکە لە بەشەکەی تری تورکیا...تاد) (٤٩)، سیمای خێڵایەتی و ئایینی راپەڕیوان کە هۆکاری هەبوون و بزوتنیان بوو، لە هەمان کاتیشدابووە هۆی سەرنەکەوتنیان. بەرگری کردن لە شارەکان بۆ ناسیۆنالیستەکان سەخت بوو، ئیدی لە ١٩٢٥ وە دەوڵەتیان تێکچوو، سیمای بڵاوی و پارچەپارچەیی لادێ، داهاتووی بزوتنەوەی ناسیۆنالیستی کزکرد و لە زۆر کاتدا پێشگیری یەکێتی هێزی لادێی کرد. دەستەڵاتی کەمالیست کە هەستیاری گرینگی کێشەی کورد بوو (٥٠) توانی، بە پێچەوانەی باوەڕەکانی خۆیەوە، کە رەتکردنەوەی هەموو بەشکردنێکی دەستەڵات بوو، سوود لە ناکۆکی خێڵەکی وەربگرێت و هاوکاری رێ بۆخۆی پەیدا بکات (٥١).

(٥)

سەرچاوەی ناسیۆنالیزمی رۆژهەڵاتی ناوەڕاست، روانگەی هۆشمەندەکانی سەر بە رۆژئاوایە. ئەم باوەڕە لە لایەنی سیاسییەوە، واتای دامەزراندنی دەوڵەتێک بۆ نەتەوە، لە زۆر کاتدا خەیاڵی، یان دروستکردنی دەوڵەت بەبنیەشکردنی ئەوی تر دەگەیێنێت (٥٢). ئەمەش، بەلای کەمەوە لە رۆژهەڵاتی ناوەڕاستدا، هاوشان بوو لەگەڵ "نوێکردنەوەدا" (٥٣). "نوێ کردنەوە" بۆ بەدەستهێنانی "دەوڵەتی – نەتەوە" شتێکی راستە. ناسیۆنالیزمیش بۆخۆی شتێکی راستە بۆ پێویستی گەیشتن بە "شارستانی"، واتا بۆ پێویستی پیادەکردنی بازدان لە سەدە گەشەدارەکانی رابردووی ئەفسانەییەوە بەرەو ئایندەیەکی گەشەداری داهاتووی ئەفسانەیی. سەدەی گەشەدار چەند ئەفسانەییش بوبێت، پاسپۆرتی راستەقینەی واتایی و بیری بۆ داخوازی مافی هەبوونی دەوڵەتێک و داهاتوویەکی ئازاد پێکهێنا. راستە کە دەشێت ناسیۆنالیزم بە هەموو جۆرێکەوە وەک هەستێکی هەڵە سەیر بکرێت، بەڵام لەگەڵ ئەوەشدا لە مێژووی کۆمەڵایەتی هاوچەرخی رۆژهەڵاتی ناوەڕاستدا، نەک هەر تەنها کەم نەبوو بەڵکو گرنگییەکی مەزنی هەبوو. بێ ئەوەی بمانەوێت بەراورد لەنێوان ناسیۆنالیزمی کورد و ناسیۆنالیزمەکانی تری رۆژهەڵاتی ناوەڕاستدا بکەین، تەنها ئەوە وەیاد دەخەینەوە کە ناتوانین یەکەمەکەیان، گەرچی لەپاشدا سیمای کتومتی رێبازە جیایی خوازەکانی جیهانی سێیەمی بەخۆیەوە گرت، (لاوازی بیری، توانای دیاری کراوی رێکخستن، بێ توانایی لە خۆبەشەرعی کردندا چ لەناوەوە و چ لە دەرەوەی ئەو دەوڵەتەدا کە بە رەسمی لەلایەن کۆمەڵەی نەتەوەکان، یان وەک لەواییدا ناوی نرا نەتەوەیەکگرتووەکانەوە ناسرابوو) بە دیاردەیەکی جیاواز و دابڕاو لەوانی تر تێبگەین.

چەکدارەکانی ساڵانی ١٩٢٦- ١٩٣٠ بوو. جارێکی تریش هەروەک چۆن لە ڕاپەڕینی ١٩٢٥ دا ئایینیە کوردەکان (ئەم جارەیان نە بە تەنها هی تورکیا بەڵکو لە ئێران و عێراق و سوریاشەوە) بەهۆی بانگهێشتنی ڕێبازی گەورەی نەقشبەندییەوە (٤١)، هەروەها بیر و نەریت و ڕەوشتی ئایینی (٤٢)، ڕۆڵیان هەبوو لە هەڵگیرساندن و درێژەپێدانی ڕاپەڕینەکەی ئارارات و ڕاپەڕینە بچوکەکانی تر دا. دوا ڕاپەڕینی ئەو زنجیرەیە، ئەوەی دەرسیم بوو کە سەرەڕای تایبەتێتی کتومت عەلەوی، نمونەیەکی گشتیمان نیشان دەدات. لە خۆیدا خاوەنی ڕابردوویەکی شۆڕشگێر و فەرهەنگێکی ئایینی خەباتگێر بوو. هەروەها خاوەنی سیستەمێکی هاوکاری زۆر پتەو و بەهێزی نێوان هۆزەکان (٤٣). ئەو ناوچەیە لەدوای ڕاپەڕینی ١٩٢١ تواتی ئۆتۆنۆمی خۆی تا ١٩٣٥ بپارێزێ. ڕاپەڕینەکەی (١٩٣٦ - ١٩٣٩) بەرگری بوو لەو ئۆتۆنۆمیە، بەخۆئامادەکردن و کۆکردنەوە و هاوکاری هێزی سەییدەکان و سەرکردە ئایینیەکانی کۆمەڵگای عەلەوی (٤٤). هەڵسەنگاندنی داخوازیەکانی سەید ڕەزای مەزن و سەرکردەکانی تری ڕاپەڕینەکە، بەو ئەنجامەمان دەگەیەنێت کە پەیوەندییان لە پلەی یەکەمدا بە ڕەتکردنەوەی دەوڵەتەوە بوو. ئەو دەوڵەتەی کە سوور بوو لە سەر "تابولەرەزاکردنی" ناوچەکە بەمەستی تۆوچاندنی ژیان و شاری تورک (٤٥). کەواتە تێگەیشتنی ئەوە دژوار نیە کە بۆچی هەر شتێک کە پەیوەندی بە پیادەکردنی یاساکانی (١٩٣٤- ١٩٣٥) لە دروستکردنی قوتابخانە و بنکەی سوپایی و پرد و ڕێگاوە هەبوو، بە شێوەیەکی توندوتیژ لەلایەن خێڵەکانی دەرسیمەوە ڕەت دەکرایەوە (٤٦). داخوازی ناسیۆنالیستەکانیان لە چوارچێوەی گوتاری کۆک و یەکگرتوودا دەردەخران کە توانای هەژاندنی ناوچەی غەیرە عەلەوییەکانیشیان هەبوو. ئەمەش سروشتی بەرفرەوانی ناڕەزایی لە دەوڵەتی نیشان دەدا. ناسیۆنالیستەکان بەم داخوازییانە وەڵامی دەوڵەتیان دەداوە و لە هەمانکاتیشدا خۆیان دەخستە هەمان رادەی ڕەوایی ئەو. لەڕاستیدا ترسی لە دەستدانی ئۆتۆنۆمی خێڵەکی و بە شەرم زانینی ژیان لە ژێر حوکمی ڕژێمێکی بێ بەینەت - بۆ عەلەوییەکان کە وەچەی ژێر یاسای عوسمانی بوون - بەس بوو بۆ سەرکردە نەریتیەکان کە ببێتە هۆیەکی مەزن بۆ ئامادەکردنی بەخێرایی دەیان هەزار خەباتگێر. یەکەمین هۆکار ئاگری نەریتێکی کۆنیشی هەڵگیرساندەوە کە واتای سەرپێچی کردنی ڕژێمی دەدا و لەوە بەدواوە بەرفراوان بوو: چەتەیی ، کە بۆ ژیانی ئابوری و کۆمەڵایەتی خێڵەکان زۆر پێویست بوو. ئەم نەریتە هەروا بە سادەیی و بە دامەزراندنی سنور و گومرگ و هەندێک مۆنۆپۆلی دەوڵەتی وازی لێ نەدەهێنرا. جگە لەوەش زۆرهێنان بۆ ژمارەیەک لە ئەندامانی خێڵەکان کە بە چەکەوە خۆیان بشارنەوە، هیچی نەکرد جگە لە گرژکردنی باری بێ متمانەیی. ئەمەش بەبێ هیچ گومانێک بووە سەرچاوەیەکی سوپایی کە چەکدارانی لێوە بچنە ڕیزی ڕاپەڕینەکە (٤٧).

دووەمین هۆکار، واتا شەرمکردن لە ژیانی ژێردەستەیی ڕژێمێکی بێ ئەمەگ، بووە هۆی دروستبوونی سەرچاوەیەکی ڕاستەقینەی بزوتنەوەکە، چ لەلایەنی پسیکۆلۆژی و چ لەلایەنی ئابورییەوە. ئەمەش بە قەدەغەکردنی تەریقەتەکان بەهێزتر بوو. تەریقەتەکان کە گەرمێتی پشتگیرییەکی باشی لادێیان هەبوو، توانیان مەدرەسە - فێرگەی قورئانی - کە تا ئەم دواییە زۆر چالاک بوو، بپارێزن یان دابمەزرێنن

خێڵەکیەکانی کرد بۆ راپەرین بۆ رزگارکردنی ناودارانی کورد و ئیسلام و هەروەها بۆ دەرپەڕاندنی "بۆزکورتی تۆران" بێ بەینەت و "داپزاو و ترسنۆک" لە کوردستاندا (٣٥). بەڵام ئەمە لە کاتێکدابوو کە دەستەڵاتداریتی کەمالیست هێشتا چ لە دەرەوە و چ لە ناوخۆدا لاواز بوو، هەروەها هێشتا هەموو پرۆژەکانی پیادە نەکردبوو، لەبەرئەوە راپەرینەکە نەیتوانی هەموو خێڵە کوردەکان بەلای خۆیدا رابکێشێت و بەتایبەتی لە ناوچەی زازادا، کە ناوچەی شێخ خۆی بوو مایەوە (٣٦). بەشێک لەو خێڵانە بێ لایەن مانەوە، بەشێکی تریش کە کەم نەبوو، هاریکاری ئەنقەرەی کرد بۆ سەرکوتکردنی بزوتنەوەکە (٣٧). لۆژیکی خێڵایەتی و ئاڵۆزی پەیوەندیەکانی نێوان خێڵەکان و دەوڵەت، هەروەک چۆن لە چەندان راپەڕینی تری خێڵایەتی دا، یەکێتی هێزی لادێیان نەشیاو کرد. لەو بارەیەوە "دیلمان" جوانی روون دەکاتەوە:

"بەشێوەیەکی گشتی، خێڵ بەپێی یاساکانی ناوخۆی دەجولایەوە. هیچیان نەیان توانی بەرەیەکی یەکگرتوو بەرەنگاری دوژمن بکەنەوە. لەگەڵ زیادبوونی مەترسیدا، کێشەی ناو خۆی هۆزەکان توندوتیژتر بوو و هەر جارێک سەرکردەیەک هەوڵی دا بەرەنگاری تورکان ببێتەوە، ناحەزێک بەراسبەری، بۆ جێگرتنەوەی بە یارمەتی دوژمن، راست دەبووەوە. لەبەر ئەو ناسکیەی ناوخۆی خێڵ، بەرگری ئاشکرا کەمی خایاند: ئاغا راپەڕیوەکان زۆریان بۆ هات و یەک لەدوای یەک لەگەڵ خێزانەکانیاندا هەڵاتن و زۆریان چوونە جەزیرەی باڵا" (٣٨).

خێڵە بێدەنگ و هاوکارەکانی (دەوڵەت) تاوەکو سەرکوتکردنەوەی راپەڕینەکە نەکەوتنەخۆ و هەڵنەستانەوە. لەوکاتەدا هەڕەشەی دەستەڵاتداریتی دەبێتە واقیعێکی راستەوخۆ. هەر لە هەمان کاتیش دایە کە خێڵەکان هەڵدەگەڕێنەوە و پێداویستی مرۆڤیی راپەرینەکانی ١٩٢٦- ١٩٣٠ یان دابین دەکەن. حاجۆ کە سەرکردەی بەتوانای خێڵی هاوارخان بوو نمونەیەکی سەلمێنەرە لەو رووەوە: سەرکردەیەکی زۆرداری خێڵایەتی بوو، بۆ بردنەوەی ململانێی ناوخۆ و بۆ دەستەڵاتگرتنی بەسەر خێڵەکەدا، هاریکاری کەمالی کرد. بەم شێوەیە توانی ناحەزەکەی، عەلی باتێ، کە نزیک بە ناسیۆنالیستە کوردەکان بوو لەناو بەرێت. لەکاتی راپەرینەکەی شێخ سەعید لە ١٩٢٥ دا، ئەو لەنێوان هاوکارە نزیکەکانی کەمالدابوو. دوور لەوەی بەخشیشی پێ بدرێت، خێڵەکەی بووە نیشانە هێرشی راستەوخۆی دەسەڵاتداریتی مەرکەزی لە ١٩٢٥دا. لەراستیدا لەبەرئەوەی کە ئارەزوومەندی گواستنەوەی خێڵەکانی سەرسنور بوو، چونکە وەکو مەترسیەکی ئەمڕۆ یان سبەی سەیریان دەکرا، ئەنقەرە ئیتر نەیدەتوانی لە دەست و چاوبازیدا، لەگەڵ حاجۆ بەردەوام بێت. ئەویش هەوڵی راپەرینی دا، بەڵام سەرنەکەوت و بە پەنابەری چووە سوریا و لەوێ "وەک پاشایەک" پێشوازی لێ کرا و هەر لەوێش بووە ناسیۆنالیستێکی چالاک، بێ هیوای رێککەوتن، هەمیشە بانگی رۆشنبیرانی بۆ بەجێهێنانی ئەرکەکانی سەرشانیان "بەرامبەر بە نەتەوە" دەکرد (٣٩). سەرکردە نەریتیەکانی تریش هەر بە زمانێکی لەو جۆرە دەئاخاوتن (٤٠). ئەمە تەواو روونە بۆ نیشاندانی هەندێک هەڵخزان لە ناڕەزاییەکەدا، بەڵام بەکارهێنانی ئەم زمانە ئەو راستیە ناشارێتەوە کە ئامادەکردنی رێکخراوی خێڵایەتی بەردەوام بناغەی تەنانەت بانگهێشتنی

تەنانەت مانی خودی خێڵەکانیش (وەک یەکێتی ئابووری و کۆمەڵایەتی) کەوتە مەترسییەوە (٢٢). دەوڵەت سەرەڕای "بێ ئەمەگی" بۆ پەیمانەکانی سالآنی شەڕ، هیچ نەرمیەکی بەرامبەر بە دەستەلآتی خێلایەتی کە بە سروشت لەگەڵ دەستەلآتی مەرکەزیدا ناکۆک بوو، نەنواند. بە زۆرەملێ لەناوبردنی خێڵەکان بەمەبەستی بە تورک کردنیان و بردنیان بەرەو شارنشینی [٢٣] و پەرش و بلاوکردنەوەیان بەسەر ناوچەکانی رۆژئاوادا بووە خووی دەستەلآتداریتی ئەنقەرە. بەزەبر پێ چۆل کردنی سەرسنورەکان (٢٤) لە لایەن دەوڵەتەوە ئاکامێکی بەدواوە نەبوو جگە لە زیادکردنی بێمتمانەیی کوردان. پشتبەستنی رژێم بە ناسیۆنالیزمی تورک – وەک بناغەیەکی ئایدیۆلۆژیکی (٢٥) و دەرکەوتنی سروشتی بێ ئەمەنی پەیمانەکانی رابردوی، باری لەجاران ئالۆزتر کرد. گۆڕانی هەڵویستی کەمالیستەکان لەهەمبەر ئایین وەک دلۆپە ئاوێک بوو کە سەرڕێژی بە جامەکە کرد. ئەو لێکداپچڕانەی کە لە ئارا دا بوو، بە لابردنی خەلیفە و بە هۆی ئەو گۆڕانکاریانەوە بوو کە لەوەبەر لەلایەن رابەرانی ئەنقەرەوە دەسپێکرابوون. لەڕاستیدا ئەو کردارانەی دوایی، دەوری بالآیان هەبوو لەوەی کە سەرکردە کوردەکان چیدی ئیسلام بە جێگای برایەتی نەزانن کە بیان بەستێتەوە بە تورکانەوە (٢٦). گوتەی "کوردێکی زرینگ" کە بە ناوی شێخ سەعیدەوە بلاو بۆتەوە بە جوانی پسیکۆلۆژی ئەو دەمەی کوردانمان بۆ روون دەکاتەوە:

"جاران خەلیفەیەکی هاوبەشمان هەبوو، ئەوەش هەستێکی وای بە گەلە ئایینداریەکەمان دەدا کە لە هەمان کۆمەڵگادا لەگەڵ تورکاندا بژی. بەلآم لەوەتەی خەلیفەیان لابردوە، تەنها هەستکردن بە زۆرداری تورکانمان بۆ ماوەتەوە" (٢٧).

"ئیسلام بناغەی یەکێتی نێوان کورد و تورک بوو، تورکەکان پێشێلیان کرد. ئێستا کوردەکان، پێویستە داهاتووی خۆیان دابین کەن" (٢٨).

ئیدی لە مێشکی کورداندا "ئەڵلا" بووە پەنا و پشت، چونکە پاشا بۆ سەربازانی تورک تەرخانکرابوو: "سزن بویوک پاشا لەرینیز وارسا، بزم دەبویوک ئەڵلاهیمیز" "ئەگەر ئێوە پاشای گەورەتان هەیە، ئێمەش خوای گەورەمان هەیە" (٢٩).

واتە هۆکاری سەرکردە نەریتیەکان و چەکدارە سادە کوردەکان بە شێوەیەکی گشتی، بەرلەوەی کە لە هەندێک کاتدا ناسیۆنالیست بێ، ئایینی بوو. راپەڕینەکەی شێخ سەعید لە بنەڕەتدا ئیسلامی بوو، یان بڵێین، بە رەنگدانەوەی زۆر بەهێزی بەشداری کردنی شێخان و موریدانی ڕێبازی قادری و نەقشبەندی، ئیسلام گەلی بوو (٣٠). ئەو شێخانەی کە پێشەوای ئایین و جاجاریش سەرکردەی گەلی و سوپایی بوون وەکوو "پارێزەری نەریت" سەیر دەکران (٣١). شایانی باسە کە ئەو دوو ڕێبازەش (تەریقە) "موریدەکانیان لە چینەکانی خوارەوەی کۆمەڵدا کۆدەکردەوە" (٣٢). پێشەوای ئایینی و بەگشتی پێشەوای راستەقینەی راپەڕینەکە شێخ سەعیدی پالو یان (پیران) بوو. سیمایەک بوو کە ڕێزی لێ دەگیرا. هەروەها کارتێکردنی ئایینی و هەروەک چۆن توانای ئابوری زۆری هەبوو (٣٣). بەرلە کڵپەگرتنی راپەڕینەکە، لەگەڵ چوارسەد لە موریدەکانی، بەدرێژایی چەند مانگێک شێخ پرۆپاگەندەی بۆ پەیامەکەی کرد (٣٤). لەو گەشتەیدا (کە لە گەشتی دەروێشێکی نەقشبەندی دەچوو کە لە ١٩٣٠ لە منمن دا کردی) بانگی پێشەوا ئایینی و

(کە یەکەمین دەست تێخستنی ڕاستەقینەی دەوڵەتی تێدا هەستپێکرا) ئاژاوەیان تێنەکەوت. لە ڕاستیدا، یەکەمین زنجیرە ڕاپەڕینی کورد (١٨٠٦ - ١٨٨٠) شتێک نەبوو جگە لە هەوڵێکی بێهودە بۆ پاراستنی ئەو ئۆتۆنۆمیەی کە دەمێو دەسەڵاتی کەم تا زۆری زۆردارانەی خێزانە ناودارەکانی کورد و بۆ پاراستنی بالادەستی ئیسلامی (لەرێگای کوردەوە) بەرامبەر بە میللەت، بەتایبەت میللەتی ئەرمەن.

ئەو بۆشاییەی کە تێکشکاندنی خێزانە گەورەکان دروستیان کرد، دەسەڵاتی خێڵایەتی لە نزیکەی سەرانسەری لادێکانی کوردستاندا، بەهێزتر کرد (١٩). "ئاشتی" کورد بەدی نەهات تا ئەو دەسەڵاتە نوێیە بەرەسمی لەلایەن سوڵتان عەبدولحەمیدەوە ناسرا و توانرا دژی ئەرمەنییان لە شێوە و لەژێر ناوی "حمیدیە ئەشیرەت ئالایی لەری" (سوارەی خێڵانی حەمیدییە) (٢٠) بەکار بهێنرێت. سەرهەڵدانی کۆمیتەی یەکێتی و پێشکەوتن لە ١٩٠٨ دا کە ناسیۆنالیست و هاوێنکە سازبوو، پەیوەندی باشی لەگەڵ کۆمیتەی شۆڕشگێڕانی ئەرمەنیاندا هەبوو. سەرەرای ئەوەش گومانی بێ ئاییینیان لێ دەکرا. دەسەڵاتداریتی خێڵایەتی هەڵچوو و سەرلەنوێ ڕاپەڕین ناوچەکانی کوردستانی داگرتەوە. لە ترسی لە لەدەستدانی خاکی ئەرمینیا کە لە دوای کوشتارەکەی ١٨٩٥ وەدەستیان هێنابوو، هەروەها لەترسی پەیدابوونی دەوڵەتێکی چاولەدەر دژی دەسەڵاتیان، کوردی بەرەو ناسیۆنالیزم راکێشا [٢١]. جارێکی تریش دەوڵەت لە بەردەمی دەسەڵاتی خێڵایەتیدا ملی دا و بەدرێژایی سالانی شەڕی یەکەمی جیهانی بۆ بەردەوام بوون لە کوشتاری ئەرمەنیاندا هاریکاری لە گەڵ کردن.

شەڕی سەربەخۆیی ١٩١٩- ١٩٢٢ چی نەکرد جگە لە بەشەرعی کردن و شلەژاندنی ئەو ڕێککەوتنە ئەویش بە گەرەنتی دان بە کورد و دابین کردنی ئۆتۆنۆمییەکی ئابووریانەی بەقەد لایەنی دیمۆگرافی. لە رووی سەربەخۆیی بوونەوە، کەلەلایەن هۆشمەندانەوە پشتگیری لێدەکرا، جگەلەژمارەیەکی کەم لەخەڵک کەس گوێی لێ نەدەگرتن. لەکاتێکدا هاوکارییەکە زۆر گرینگ بوو، چ بۆ مانەوەی دەسەڵاتی کەمالیست و چ بۆ دەسەڵاتی خێڵایەتی.

(٤)

دامەزراندنی کۆمار لە ١٩٢٣ ئەو مانایەی بۆ کورد دەگەیاند کە لەبەر چەند هۆیەک هاوپەیمانەتی دەبوایە هەڵبوەشێتەوە و لە هەمان کاتیشدا هەڕەشەیەک بوو لە کورد . سنوورە نوێیەکانی دەوڵەت (بەپێی نەخشەکێشان بۆ سنوورەکان لە ١٩٢٦دا) ناسروشتی بوون و یەکێتی خێڵەکانی تێکدا (وەک چەندانی دیکەی ناوچەکە) و بەسەر چوار ولاتدا (تورکیا، سوریا، تورکیا، ئێران) دابەشی کردن. دوابەدوای ئەمە، سنوورەکان (بەهۆی پۆلیس و سوپا و گومرک و...تاد) کەوتنە بەر چاودێرییەکی لە جاران توندوتیژتر .

لەگەڵ دامەزراندنی سنوورە نوێیەکان، نە تەنیا ڕێکخراوی خێڵایەتی بەڵکو

ناڕەزاییانەدا زاڵ بن. رواڵەتی ناسیۆنالیستی رژێم، هەروەها هۆکاری دی کە لە دواتردا لێیان دەدوێین، زیاتر زەمینەی ناڕەزایی کوردی خۆشتر دەکرد. هەرچەندە، بەرەنگاربوونەوەی کوردان دژی ئەزموونی کەمالیست گەلێک توند و تیژ و درێژخایەن بوو، بەلام دوور بوو لەوەی کە سروشتێکی یەکانگیر و ڕێگایەکی یەکگرتووی هەبێت. پاساوی بەرهەڵستکارییەکە بەپێی ئەو ئەکتەرانەی کە بەشداریان تیادا دەکرد، لە بناغەوە گۆڕان. رەنگە بتوانین لە دوو ڕێبازی جیاوازی بەرەنگاربوونەوە بدوێین، تەنانەت هەردووکیان سەرەڕای گۆڕانی هەڵوێستیشیان دژی دەوڵەت، بەر لەسەرهەڵدانی کۆماری تورکیا لەکایەدا بوون. کاتێک ئەو دەستەڵاتە لە ١٩١٩ تازە سەری لە هێلکە دەرهێنابوو و خۆیشی بە خاوەنی هیچ پرۆژەیەکی نوێژەنکەرەوە نەدەزانی، هەڵوێستی کوردان دژی دیاردەی کەمالیست زۆر جیاواز بوو ؛ بەشی هەرە زۆری کۆمەلایەتیەکان و پیاوە ئاینییەکان و سەرکردە خێڵەکییەکان، پاش ئەوەی کە رابەرایەتی دوو زنجیرە ڕاپەڕینیان لە دوو کاتی جیاوازدا کرد (لە نێوان ١٨٠٦– ١٨٨٠ و ١٩٠٨– ١٩١٤ دا) بوونە هاوپەیمانی هێزە کەمالیستەکان ، بۆ ڕێگرتن لە ئیحتیمالی گەڕانەوەی ئەرمەنیان و بۆ پاراستنی ئیسلام و خەلیفە. بەلام بەپێچەوانەی ئەوان، هۆشمەندانی کورد، کە پەروەردەی قوتابخانە بیرییەکانی دوایین ساڵانی عوسمانی بوون، تێڕوانینێکی نەیارانەیان لەمەبەر کەمالیستەکاندا هەبوو و پشتیوانیان لە مافی دەوڵەتێکی سەربەخۆی کورد کرد. بەلام فرەیی هێزی باڵی یەکەم، مەیدانێکی تەسکی بۆ چالاکی ئەمان هێشتەوە. لەگەڵ ئەوەشدا ئەم دوو باڵە جیاوازە توانیان جێی خۆیان بکەنەوە. جا بۆ سانایی کردنەوە دەتوانین ناویان بنێین نەریتیخواز و ناسیۆنالیستی نوێژەنکەرەوە.

پەیمانە کەمالیستییەکان دانیان بە برایەتی نێوان هەردوو گەلدا دەهێنا (١٧) و ئەمەش وەک گەرەنتیەکی پتەو، بێگومان ڕۆڵێکی گرنگی لە هاوپەیمانێتی کردنی سەرکردە خێڵەکی و ئاینییەکاندا لەگەڵ دەستەلاتدارێتی کەمالیستەکاندا بینی. تەنها لە ساڵی ١٩٢٢ وە و پاش پیادەکردنی کۆمار ئەو پەیوەندیە پچڕا و سەرکردە نەریتیەکان هەڵویستی توند و تیژیان دژی دەستەلاتدارێتی وەرگرت. لەوە بەدوا دوو هەڵوێستی توند و تیژ لەئاست کەمالیستەکاندا سەری هەڵدا: سەرکردە نەریتییەکان کە کۆنە هاوکارانی کەمال بوون و هۆشمەندە ناسیۆنالیستەکان. لە ناو گرنگترین ڕاپەڕینی کورداندا، واتە ڕاپەڕینی شێخ سەعید لە ١٩٢٥ و ئارارات لە (١٩٢٧– ١٩٣٠) و دەرسیم لە (١٩٣٦– ١٩٣٨) دا، ئەم دوو هەڵوێستە جیاوازەی دژ بە کەمالیستەکان ڕۆڵی تەباییان بەخۆیانەوە دی.

(٣)

بە چوونەنێو ئیمپراتۆرییەتی عوسمانی و بە پێی ڕێککەوتنێک کە گەرەنتی ئۆتۆنۆمیەکی ڕاستەقینەی پێدا بوون، ناوچە کوردییەکان تا دەرکەوتنی مەرکەزییەت

"شارستانی" وەکوو یەکێک لە ئامانجە ئاشکراکان و خاڵە بنەڕەتییەکانی «فەلسەفەی مێژوو» ی کەمالیستەکان، ئەدەکرا ببێ دەستەڵاتی سەربژاردە [نوخبە]کان و هەڵگرانی ئەو "پەیامە" پەیڕەو بکرێ و بەئەنجام بگەیەنرێت (٤). گەرچی سەربژاردەکان پێیان سپێررابوو کە کۆنکرێت کردنی مێشک بەباشی بەڕێوە بەرن[٥]، بەڵام زیاتر پەیامی شارستانی کە دەگەڕێتەوە بۆ نەتەوەی تورک زایینەری گشت شارستانیەکانی مرۆڤایەتی (٦) و خاوەن و بوونی بەهرەیەکی بێ وێنە بۆ "بەدیهێنانی سەرکردە" (٧). نەتەوەی تورک لە کەسی ئەتاتورک خۆیدا و لە پارتەکەیدا و لە رژێمەکەیدا، ئامرازی پێویست و لەباری دۆزییەوە بۆ بوون بەیەکێک لەبنکەکانی شارستانی نوێی جیهان (٨). هەروەک لە ئیتالیای مۆسۆلینی و یەکێتی سۆڤێتی ستالینی دا (٩). سەرەڕای ئەوەی کە بە درێژایی سەدەکانی رابردوو، لەلایەن دوژمنەکانیەوە، هەروەک چۆن لەلایەن رابەرەکانی خۆیەوە ناپاکی لەگەڵ کرا، بەڵام ئەم نەتەوەیە لە خەیاڵی کەمالیستەکان دا، بەردەوام، سەرەڕای رزگاریش، لەلایەن هێزە دواکەوتووەکان ئابڵۆقە دەدرا. ئەو هێزانەش بەگشتی بریتی بوون لە دەرەبەگەکان، بیرتەسک و تاریکەکان. گەرچی ئەو هێزانە، رەپ و راست دەیانتوانی، لە ناوچەکانی رۆژئاوای کۆماردا هەبن، رووداوی مەنەمن لە ١٩٣٠ دا ئەو راستیە ناخۆشە دەسەلمێنێ. بەڵام لەگەڵ ئەمەش بنکەیان لە ناوچەکانی رۆژهەڵاتدا بوو، لەو شوێنەی کە "بەربەستی کورد" پێشگیری لە "گۆڕانی دەوڵەت بە دەوڵەتێکی لە سەراسەر تورک" دەکرد (١٠) . لەبارەی ئەو " بەرهەڵست " وە، ئەتاتورک زۆر خۆی توندوتیژ نیشان دەدا: "شادم کە لەبەردەمی ئێوە دا رایبگەیەنم کە نەمانهێڵاوە و ناشهێڵین هیچ جۆرە شتێک دەرفەتی ئەوەی هەبێت کە بتوانێت ببێتە کۆسپ و لەمپەر لەبەردەم نەتەوەکەمان، لە گەیشتن بە پلەیەکی بەرزی شارستانی و ئەو خۆشبەختییەی کە شایستەیەتی" (١١) . واتە بە بێ تێکشکاندنی ئەو کۆسپە کوردە، نەتەوەی تورک نەیدەتوانی بە شارستانی بگات. لەراستی دا هۆ نیگەرانکەرەکان کەم نەبوون: شازدە راپەڕین، یەک لەدوای یەک کە پێویستیان بە کۆششێکی لە رادەبەدەر بوو بۆ لەنێوبردنیان (١٢)، دەزگایەکی بە سروشت سوپایی (١٣)، کە راستەوخۆ بەسترابێتەوە بە "سەرکردەی ئەمر" ەوە (١٤)، پڕۆپاگەندەی ناو فێرگەکان (١٥) و راگواستنی بە کۆمەڵ (١٦) بەسن – لەنێوانی چەندانی دیکەدا – بۆ نیشاندانی باری ناسکی رژێمی کەمالیست لە ناوچە کورد نشینەکاندا.

(٢)

"نوێژەنکردنەوەی "دەستەڵاتداری" و "ناسیۆنالیزم"، کە هەردووکیان سەرگۆشەی گوتار و پراتیکی کەمالیستەکانی پێک دەهێنا، زیاتر قورسایی خۆیان خستە سەر ئەوەی کە پەیوەندی بە کێشەی کوردەوە هەبێت. گەرچی رژێم لە رۆژئاوای تورکیادا، سەرەڕای گەلێک نارەزایی، توانی بەلای کەمەوە بۆ سەردەمێکی دیاریکراو رەوایی خۆی بسەپێنێت، بەڵام لە ناوچە کوردییەکاندا بە پێچەوانەوە بوو و تا ١٩٣٨، مێژووی دوا راپەڕین و مردنی دامەزرێنەری کۆمار، نەیانتوانی بەسەر ئەو

نەریتگەری یان ناسیۆنالیزم: وەلامی کوردان بۆ رژێمی کەمالیست

نووسینی: حامید بوزەرسلان
وەرگێڕانی لە فەرەنسییەوە: گۆڤاری هیوا

بیزەی مەدەنیەت "شارستانی" لە شارە کوردەکاندا، وەکو بیزەی "مەشروتیەت" لە سالأنی ١٩٠٨-١٩٠٩ دا، گەلێ رێزی لێ دەگیرێت. ئەم وشەیە واتە بەکارهێنانی شەپقە لەلایەن ژن و پیاوەوە، خواردنەوە، هەلپەرکێ، ملوانکە، بۆینباخ، کەم چوون بۆمزگەوت، بەدەگمەن رۆژوو گرتن، بەباشتر زانینی غزناونووس کردن لە کۆمەلەی فرۆکەوانانەدا لە چاو زەکات دان، فتبۆلێن، ئەلفوبێی لاتین، هەروەها هەموو هەلس و کەوتی گاورانی "بێ باوەڕان" کە لەم دواییەدا سەرکەوتنی وەدەست هێناوە (١).

"نوێژەن کردنەوە" و "دەستەلاتگەری" ئەم دوو وشەیە کە توانادارن دەمەتەقەی زانایان بوروووژێنن، لە راستیدا ناساندنیان سەختە. بەلام لەگەل ئەوەشدا زەحمەت نییە بۆتاقی کردنەوە سەرنجێکی پێکهاتەکەیان بدەین و بەدوای رەوشیاندا بگەرێین لە بواری رەوشتی فەرماندارانی دەولەت - نەتەوەکانی جیهانی سێهەمدا (٢). بە پێی خوورەوشتی قال بوو بە بیری نەتەوەگەرێتیی فەرمانداران کەمالیست، بەکار هێنانی دەستەلات ئامرازێکی پێویست و لە هەمان کاتدا رەوا بوە، بۆ گەیاندنی نەتەوەی تورک و بگرە نەتەوەکانی دیکەش بە ژیانی "شارستانی"، وەک چۆن یەکێک لە خاوەن قەلەمەکانی رژێم بەتوندی روونی دەکاتەوە:

«ئێستا هەموو دنیا ئەوە دەزانێت کە تورکان، ئەگەر پێویست بەوە بکات، شارستانی و ئازادی بەسەرهێنزە و بەهێزی شمشێر فێری نەتەوەکانی تر دەکەن» (٣).

[   ] کوڕی تەوفیق ئاغا
عەبدولڕەحمان ئەفەندی کوڕی ناجی ئەفەندی
ڕەئوف ئەفەندی ـ نووسەری ئەوقاف
حەمید ئەفەندی کوڕی حاجی فەتاح

ئەمانەی خوارەوەش سەرۆک خێڵن کە هاتوونەتە ناو کۆمەڵە یان تەنها خۆیان ناونووس کردووە:

ڕەفعەت بەگ کوڕی ئیسماعیل بەگ ـ داودە
حەسەن بەگ کوڕی ئیسماعیل بەگ ـ داودە
موحەممەد خورشید ئاغا ـ داودە
عەزیز عەباس ئاغا ـ داودە
شێخ عیزەددین ئەفەندی ـ تاڵەبانی
شێخ حەسیب ئەفەندی ـ تاڵەبانی
شێخ جەمیل ئەفەندی ـ کاکەیی
سەید سولەیمان ئاغا ـ کاکەیی
عەلی ئاغا
و چەند کەسی تریش.

دەڵێن لقێکیش لە ئاڵتون کۆپری لە ژێر سەرکردایەتی ساڵح ئاغا کوڕی موحەممەد دالی ئاغا دامەزراوە. هەر چەندە هەندێ ئەندامی چالاک هەن کە دەوریان لەناو بزووتنەوەی ناوخۆیی و هەروەها بزووتنەوەی عێراقیشدا هەیە، بەڵام کۆمەڵە بەتەواوی خۆی بۆ بڵاو کردنەوەی ڕۆشنبیری لە ناو چینە کوردەکان تەرخان کردووە و دوورە لە مەبەستی سیاسی.
کۆمەڵەی زانستی کەرکوک پەیوەندی گەرموگوڕی لە گەڵ « زانستی » ی سولەیمانی و هەروەها هەندێ کەسی بەرژەوەند پەرست لە ڕەواندوز و هەولێر هەیە.

کۆتایی

بەناوی یاساوە یاری بەم یاسایانە دەکرد کە لە لایەن پارێزگارەوە دادەنران. جەمال بابان لە لایەن [Qaghi] یەوە هاریکاری دەکراو حاجی موستەفا پاشاشی بەکار دەهێنا بۆ سەرنج راکێشانی شێخەکان لە ژێر یاریکردن بەو بیرەی کە شێخ قادری برای شێخ مەحمود بە پارێزگاری نوێ دانراوە. جەمال بەگ رێز و خۆشەویستی وەزیری دادگای ئەو ئەکات، ناجی بەگ سەعیدی بۆ خۆی راکێشابوو و پشتگیرییەکی باشیش دەکرا لە لایەن نوێنەری بەغدا، دوکتۆر شاکیری موحەممەد. هەروەها برادەرانی وەکو رەشید مەستیش دەنگی ناوخۆی سولەیمانییان بۆدابین کردبوو. مەبەستی سەرەکی ئەم پلانە دامەزراندنی بناغەی بەرەو پێشبردنی فراوانترین بزووتنەوەی کوردی بوو، بە بێ ترس. جەمال بەگ کابرایەکی دونیادیدە و تەماحکارە، پایەی پارێزگار چاوی تێر ناکات. باشیش دەزانێ کە ئۆتۆنۆمی کوردی بەبێ بوونی رێکخراوێکی رێکوپێک و خاوەن تاقیکردنەوەیەکی زۆر، نایەتەدی. هەرکە لە سولەیمانی بوو بە دادوەر، بە گورجوگۆڵی هەرچەند کورسی فەرمانڕەوایی هەبوون بە ئەندامانی خێزانی بابان پڕی کردنەوە. ئەم پشت قایمییە وای لێکردوە کار لە لیواکانی تری کوردستانی عێراق بکات. جەمال بەگ بەدڵ و بەگیان کوردە، بیری لە ناوچەکەی خۆی گەورەترە، بەڵام زۆر دوورە لەوەی ببێتە دوژمنی ئینگلیز.

پلانەکە شکستی هێنا و بازنەی بەرپوەبەران پەراگەندە بوون. کۆمەڵەی زانستی وردە وردە ژیایەوە. ئێستا زیاتر بۆ بڵاوکردنەوەی رۆشنبیری کار دەکات و دوورە لە پەڵەی سیاسی. گەشەسەندنی زانستی و ئەو هاوکارییەی بەدەستی دەهێنێت راسترین دەربڕن کە کوردە ژیرەکان هەوڵی بەدەستهێنانی سەربەستی دەخەنە ئەستۆی نەوەیەکی تر. ئەو بەزمو هەرایەی کۆمەڵەی پێدا رەت بوو، مەترسی ئەم جۆرە ئامرازانە لە دەستی کوردە ناسیۆنالیستە سەرگەرم و بەتواناکان دەردەخات.

پاشکۆی ژمارە (٢)

کۆمەڵەی زانستی کەرکوک:

ئەم کۆمەڵە لە٢١ی حوزەیرانی ١٩٢٦کرایەوە، لە لایەن ئەم فەرمانبەرانەوە:

سەرۆک: مەلا عەبدولقادر ئەفەندی - سەرۆکی ئەوقافی ناوخۆ
جێگری سەرۆک: موستەفا ئەفەندی - هەولێر [خانەنشین]
عەبدولخالق ئەفەندی کوڕی حوسێن نەقشبەندی

ئەندامەکان:

ئەحمەد ئەفەندی - [خانە نشین]
قادر ئەفەندی کوڕی حەسەن بەلوا - [خانە نشین]
عیزەت ئەفەندی

کۆمەڵە لە بار و زروفێکی باشدا کەوتەکار. کوردە ناودارەکان لە سەرانسەری باکوری عێراقدا رێزیان لێنا و یارمەتی داراییان پێش کەش کرد. خێڵەکی و شارنشینەکانیش بەهەمان شێوە . لەسەرەتادا کۆمەڵە تەنها لە پێناو بڵاوکردنەوەی رۆشنبیری کاری دەکرد. دەستەی شەوانە پێکهات و شەونخوونیەکی باشیان دەکرد. وانە لەسەر بابەتی جۆراوجۆر دەووترایەوە.

لە گەڵ هاتنی حاجی موستەفا پاشا بۆ سولەیمانی، لە سەرەتای مایس دا کۆمەڵەی ئەدەبی تێکچوو. هەر لەسەرەتاوە حاجی موستەفا بۆ مەرامی خۆی بەکاری هێنا. ئەگەر بۆ پەرلەمانی عێراق هەڵبژێردرابا، ئەوە ئەندامە کوردە لەکارکەوتووەکانی پەرلەمانی بەرەو پارتێکی سیاسی یەکگرتوو دەبرد. پاش ئەوەی سەرنەکەوت و خێڵەکان دەنگیان بۆ نەدا، کۆمەڵەی بەکار هێنا بۆ سەرکۆنە کردنی مێتۆدی هەڵبژاردن لە عێراق بەگشتی و لە سولەیمانی بە تایبەتی.

موتەسەریف بەهاندانی [I.O] ی پۆلیس و بەهۆی دەستڕۆشتوویی خۆشی وەکو سەرۆک لە کۆمەڵەی ئەدەبی سەرزەنشتی جەمال بابانی دەکرد بەوەی کەوا ئاگاداری ئەم مەسەلەیە بووە و رێگای داوە کۆمەڵە ئەم جۆرە رەخنە ریسواکەرە لە ووتووێژی سیاسی بگرێت. هەر لە سەر ئەم مەسەلەیە جەمال بەگ و موستەفا قەرەداغی بڕیاری وازهێنانیان لە کۆمەڵەی ئەدەبی دا. چەند رۆژێک دوای ئەوە، رەفیق ئەفەندی نامەیەکی نووسی بۆ موتەسەریف، تیایدا دەڵێ: ئەو ئەندامانەی لە ناو کۆمەڵەی ئەدەبی ماون پایەی سەرۆکایەتی پێڕانابینن و داوای لێدەکەن بڕیاری وازهێنان بدات. بەلام کاتێ ڕەفیق ئەفەندی بینی بەم کارەی تووشی بەربەرەکانێی ڕاستەوخۆ بۆتەوە لەگەڵ حکومەت، نامەکەی کێشایەوە و داوای لێبووردنیشی لە ئەحمەد بەگ کرد.

چەند مانگێک دوای ئەم مەسەلەیە، کۆمەڵەی زانستی هەر بەردەوام بوو لە چالاکیەکانی، بەلام بەشێوەیەکی پەرت و بڵاو و لاواز، وەکو مەکینەیەکی سیاسی لەکار کەوت. لەگەڵ بڕیاری وازهێنانی جەمال بەگ بابان و شێخ موستەفا قەرەداغی، ئەندامانی زانستی دەستیان کرد بە کۆبوونەوەی نهێنی لە ماڵی ئەندامەکان، بۆدانانی پلانێک و خستنی موتەسەریف و کۆمانداری پۆلیس. ناتوانین بڵێین پێش روودانی ئەم ئەستەنگە بچووکانە پلانێکی لەم جۆرە لەئارادابوە، بەلام وادیارە دەستپێشکەریان کردووە و چەند بیرێکی گەورەیان خستۆتە مێشکی جەمال بابان و بووە بە یاریدەدەری بەتوانای حاجی موستەفا پاشای کارکردە و ئاژاوەچی.

ئاشکرایە کە جەمال بابان بەگ هەوڵێکی زیرەکانەی داوە بۆ ئەوەی لە جیاتی ئەحمەدبەگ ببێتە موتەسەریف، کۆمانداری پۆلیسیش کە بە لایەنگیریکەری پارێزگار ناسراوە، بەدەرکردن بدات. وەکو دانوەر، جەمال بابان هێزی خۆی دەردەخست

دەكات.

ب – تا ئێستا هیچ نیشانەیەكی دەست خستنە ناو بزووتنەوەی كوردی لە لایەن ڕووسەكانەوە، بەئاشكرایی دیار نییە، بەڵام لە حاڵەتێک ئەگەر بۆڵشەفییەكان بیانەوێ گیروگرفت بۆ بەریتانیەكان بنێنەوە لەخۆرهەڵاتی نزیک، ئەوە لەم ئامرازە باشتریان لەدەست دا نیە. بۆ ئەوەی بزووتنەوەی كوردی ببێتە دامەزراوێكی دەست ڕۆیشتوو، ئەمڕۆ پێویستی بە پارە و ڕێكخراوی كارامە و هێزێكی بێ لایەنی بەهێز هەیە كە بتوانێ جیاوازییە بچووكەكانی خێزان و خێڵە كوردەكان لە ناو ببات.

دەڵێن گوایە سەرۆكی كۆمیتەی كوردی لە توركیا، خالید بەگ جبراتلی لە كۆنسوڵی ڕووس لە وەرمێ نزیک بۆتەوە و داوای یارمەتی لێ كردوون بۆ ڕاپەڕینەكەی ١٩٢٥، لەوكاتەوە ماوەی چوار ساڵە ڕووسیا لەمەسەلەی كورد دوورە.

پاشكۆی (١):

كۆمەڵەی زانستی- سولێمانی

لەسەرەتای بەهاری ١٩٢٦ دا نامەی داواكاری (عریضه) ڕێكخستنی كۆمەڵەیەكی ئەدەبی و ڕۆشنبیری لە سولەیمانی لە لایەن ئەم كەسانەوە پێشكەش بە حكومەت كراوە:

ڕەفیق ئەفەندی-پارێزەر
ڕەمزی ئەفەندی-بازرگان
فایق بەگ-موڵكدار
مارف بەگ

داواكارییەكە قبوڵ كرا و كۆمیتەیەک لەم هەڵبژێردراوانە پێک هات:

سەرۆک :	ئەحمەدبەگ-پارێزگار «موتەسەریف»
جێگری سەرۆک :	جەمال بەگ بابان-دادوەر
سكرتێر:	ڕەفیق بەگ -پارێزەر
ژمێریار:	فایق بەگ-موڵكدار

ئەندامەكان:

شێخ موستەفا قەرەداغی
عیزەت بەگی عوسمان پاشا
حەمە ئاغا عەبدولڕەحمان
ڕەمزی ئەفەندی

هیچ ئەنجامێکی گەورە دیار نیە. هەرچەندە هەندێ بەڵگە هەن کە موسڵ بەگرینگترین مەڵبەندی هاموشۆی چەند پارتێکی کوردی لە تورکیا و سوریا و عێراق دادەنێن، بەڵام وەکو شارێک هیچ هەڵوێستێکی ناوخۆیی دیاریکراوی تێدا نییە. لە پارەوە، لەوەتای تەفروتوونا بوونی «کۆمەڵەی پێشکەوتن» ئەم پەیوەندیانە بەنهێنی بەجێ دەهێنرێن. لە بەر ئەوە ناتوانین چالاکی خەڵکەکە لەم رووەوە بزانین، بەڵام دڵنیاین کە لە موسڵ و زاخۆش جموجۆڵ هەیە.

٥- رێکخراوە کوردییەکانی دەرەوەی عێراق:

زانیاری دەربارەی پشتیوانی کوردی لە دەرەوەی عێراق زۆر کەمە، هەندێ کورد لە عێراق دەنگوباسی تەواویان لاهەیە بەڵام دەترسن، یاخود نایانەوێ بیدرکێنن.

دڵنیاین کە رێکخراو لەسوریا و ئێران هەن. هەریەکەیان لەیەک کات لەشوێنی خۆی چالاکی دەنوێنێ، بەرادەیەکی زۆریش. گرینگترین بنکە بەیرووت و حەڵەب و تەورێز و سنەیە. دەربارەی رێکخراو لە تورکیا هیچ شتێک نازانین، بەڵام بەهەمان شێوەش دڵنیاین کە بنکەیەکی نهێنی لێ هەیە. شوێن پێی پەیوەندی لەنێوان ئەم رێکخراوانە و کوردە بەرژەوەندچییەکان بەئاشکرایی دیارە، بەڵام بەرادەیەک نییە بتوانرێ راپۆرتێکی باشی لە بەر بنوسرێ.

٦-ئەنجام:

أ-جگە لەو گیروگرفتە ناوخۆییانەی کە خەریکن لە ناوچەکانی سەر سنووری نێوان رەواندوز و هەڵەبجە سەرهەڵدەدەن بەهۆی چەند شالاوێکی چاوەڕوان کراو لە کوردستانی ئێران، بزووتنەوەی کورد لە عێراق بە رادەیەک نییە وامان لێ بکات بەخۆکەوین و بە خێرایی شتێک بکەین. ئەگەر بێتو کۆمیتە ناوخۆییەکان بەم شێوەیە لەکارکردن بەردەوام بن و وردە وردە بەشێوەیەکی باشتر رێکبخرێن، لەوانەیە ئەنجامیان بە پلەی یەکەم بەهێزکردنی بیری نەتەوایەتی بێت لەناو خێڵەکییەکان، بەرادەیەک کە مەسەلەی کۆکردنەوەی باج لە لایەن دارودەستەی عەرەب تووشی گیروگرفتی زۆر دەبێت. زۆر دڵنیانین لە وەی کە ئەم ئەنجامە لە داهاتوویەکی نزیک روو بدات، بەڵام نابێ ئەوە لەبیر بکرێت کە تەنانەت خێڵەکییەکانیش هەست بەوە دەکەن کە رۆژێک دادێ عەرەب نوێنەرایەتی ئەو یاسایانە دەکات کە ئەمڕۆ بەرێوەیان دەبات. هیچ مەسەلەیەک وەک ئەمە یاریدەی پەرەسەندنی بیری نەتەوایەتی نادات.

شایانی باسە، ئەگەر بێتوو شتێک نەکەین بۆ کوردستانی عێراق، ئەوە پارتی خودموختاری [home rule] کوردی وردە وردە گەشە دەکات، هەروەکو چۆن لە ئیرلەندە گەشەی کرد. هەروەها حکومەتی عەرەبی لەچوارچێوەی سنووری خۆی بەرەنگاری دوژمن دەبێتەوە. هەر چەندە ئێستا بەدیهاتنی ئەم مەرجە کزە، بەڵام لە حاڵەتی یەکگرتنی گشتی کورد گەورەترین مەترسی بۆ دەوڵەتی عەرەبی دروست

و گشت چینەکان بەفەرمانبەر و خێڵەکی و شارنشینەکانەوە، وردە وردە خەریکن بیر لە کوردستانی سەربەخۆ دەکەنەوە. سەرۆکەکانی دزەیی و خۆشناو و گەردی کە بە خاوەن بیروڕای توندوتیژ ناسراون لەم رووەوە، ئەگەر هەست بە فرسەتێکی کەمی سەرکەوتن بکەن لەتوانایاندا هەیە لە رووی هێزەوە یارمەتیان بدەن.

رەوانـدوز:

سیاسەتی رەواندوز لە ژێر سەرکردایەتی سەیدتەها دایە، دەسەڵاتی ئاسایی و ناوخۆیی سەدەی رابردووی بڵندپاشا [١] لەناوچووە. سەید تەها رووناکبیرترین ناسیۆنالیستی خاوەن هێزە و سەر بەگەورەترین خێزانی دەسەڵاتدارە. ئامانجی سەرەکی بەدیهێنانی ئۆتۆنۆمی کورد و وەدەستهێنانەوەی سەرمایە لەناوچوەکەیەتی. ئێستا سەید تەها پەیوەندی بەهێزی لەگەڵ کارگەرانی پشتیوانی کورد [٢] لە عێراق و تورکیا و ئێراندا هەیە، وسەر بەبچووکترین کاروباری سیاسی ناوخۆیە، جا لە هەر شوێنێک بێت. هەموو شتێک دەکات بۆ بلاو کردنەوەی پڕوپاگەندەی پشتیوانی کوردی. سەید تەها مرۆڤێکی ئەوەندە بێ عەقڵ نییە تا واهەست بکات دەوڵەتێکی سەر بەخۆی کوردی جیهانی لەماوەی چەند مانگێک، تەنانەت چەندساڵێکیش دابمەزرێ. ئەسمکۆ، ئەشێخ مەحمودو ئەشێخ سەعیدیش ئەم هێز و توانا بێ پایانەیان نییە. ئەو چاوەڕوانی فرسەتێک دەکات و خەریکی پتەوکردنی پایەی خۆیەتی و پەیوەندیشی لەگەڵ هەموو پارتەکان هەیە. لەلایەن بەریتانیاوە باوەڕ پێکراوە، بەلأم بۆی هەیە لە ژێرەوە پەیوەندی نهێنی لەگەڵ رووسەکان هەبێت کە هاوسۆزی خۆی لایان دەنوێنێ.

سەید تەها زۆرهەوڵ دەدا پەیوەندی لەگەڵ حکومەتی ئێران دروست بکات و لەژێرەوەش لەگەڵ کوردە یاخی بووەکانی ئێران بێت، هەروەها بەهەمان شێوەش هەوڵ دەدات پەیوەندی هاوڕێیانە لەگەڵ سەرکردە ئاشوریەکان بەهێز بکات، گومانیش هەیە نامە گۆڕینەوەی تەواو لە نێوانیاندا هەبێ. ئەگەر بێتو هیچ جۆرە ئۆتۆنۆمیەک لەچوارچێوەی سنووری عێراقدا ئەدرێتە کورد، ئەوە تەماحی سەید تەها پەل دەهاوێت بۆ جیاکردنەوەی زۆربەی کوردستان و بەڕێوەبردنی لەلایەن خۆیەوە. سەید تەها مرۆڤێکی شیلگیر و ئارام گرتوە. وەسواس و دوودڵ نییە، ئەگەر فرسەتی بۆهەڵکەوێ دەزانێ چۆن سوودی لێ وەربگرێ. بەلأم هیچ ئەکات باشترە لەوەی بەرەوڕووی نشوستییەکی تر بێتەوە.

سنوری باکور:

ناتوانین بڵێین لەسنووری باکور دا هیچ «هەڵوێستێکی ناوخۆیی» تایبەتی هەیە، چونکە بنکەی زۆر گرینگی لێ نیە. ئەگەر چی هەمان بیری نەتەوایەتی لەناو خێڵەکان بلاو بۆتەوە و لە جارانیش بەهێزترە، بەلأم تەماحی پیسی هەندێ لە ئاغاکان و هەریەک لەناوچەکەی خۆی، بەسەر کاروبار دا زاڵە. دڵنیاین کە کوردە هەلأتووەکانی تورکیا لە سوریا پەیوەندیان بەخێڵکانی مەڵبەندی زاخۆوە هەیە، بەلأم

پشدەرییەکان لەباکور و هەورامییەکان لەباشور، دوو خێڵی بەهێزن و خاوەن پایەیەکی سروشتی مەزنن. هەستی نەتەوایەتییان زۆر بەهێزە و پەیوەندی زۆر بەهێزیان لە گەڵ خێڵەکانی ئێراندا هەیە. ئەمانە تائێستا هەستیان بەگرانی مەسەلەی باجدان نەکردوە. پشدەرییەکان خاوەن خەسڵەتی بێ هاوتان لە لەناوبردنی جیاوازییە بچووک و بێ نرخەکان لە پێناوی مەسەلە گشتییەکە.

ئێستا دەنگۆ باس هەیە کە گوایە شێخ مەحمود پەیوەندی بە دەستە یاخی بووەکانی ئێرانەوە هەیە و پارتی پشتیوانی کورد [Pro-Kurdish] لە سولەیمانی پەیوەندی تەواوی بە ڕێکخراوەکانی کەرکوک و موسڵ و بەغداوە هەیە.

زانستی کوردان [zanisti-kurdan] یاخود کۆمەڵەی ئەدەبی سولەیمانی ئەرکی باشترین بیری ناوخۆیی کورد بەجێ دەهێنێ لەبڵاوکردنەوەی ڕۆشنبیری کە جەوهەری بەدەستهێنانی سەربەخۆییە. تا رادەیەک لەمەدا سەرکەوتوون، ئەگەرچی هەندێ ئەندامی وریا و چالاک هەن لەناو کۆمەڵەی زانستی، بەڵام کاری ئەمڕۆیان سەر بەهیچ مەبەستێکی سیاسی نیە.

کـەرکـوک:

کەرکوک، هەروەک سولەیمانی، خۆی بە بەشێکی سەربەخۆ و جیا لەبەشەکانی تر دادەنێ. هەستی بەهێزی ئێستای پشتیوانی کورد کە بەم دواییە لە سەرتاپای کەرکوک دەنگی داوەتەوە، دەگەڕێتەوە بۆ ڕۆڵی ئەفەندییە کەرکوکلییەکان لەسەر خەیاڵی نەتەوەیی و شاخاوی ئەو خێڵەکییە کوردانەی لەدەوروبەری شار دا دەژین. ئەم تورکمانە کەرکوکلییانە کەهەردەم لەشتێک دەگەڕێن دژی بەرژەوەندی حکومەتی عەرەبی بێت، بۆهێنانەدی مەبەستی خۆیان لەگەڕانەوەیان بۆ تورکیا، زۆر بەئاسانی و بەخێرایی ئاوازی خۆیان گۆڕی. بێگومان سیاسەتی خێزانە دەرەبەگ و باک یاردەکان [back-yard] دەورێکی زۆر گەورەیان هەیە لەسەر ئەم جوڵانەوە ناوخۆییەی کەرکوکلییەکان و هەروەها لەدەرەوەش هاریکاری دەکرێن و یارمەتی دەدرێن. ئەم هەوڵە بۆیەکخستنی ئەم جوڵانەوەیە لەگەڵ ڕێکخراوەکانی سولەیمانی و ڕواندوز و موسڵ و بەغدا. ئەگەرچی زۆربەی ئەندامانی کۆمەڵەی زانستی وریا و چالاکن، بەڵام کاری ئێستایان دوورە لە مەبەستی سیاسی. (بڕوانە پاشکۆی ٢)

هـەولـێر [ARBIL]:

هەمان ئەو شتانەی لە سەرەوە باسمان کردن لە هەولێریش هەستی پێ دەکرێ. هەرچەندە لە ناو شار جموجۆڵی بزوتنەوەیەکی گەورە لە ئارادا نیە، بەڵام دانیشتوانی وەک پێشووریز لە حوکمڕانی عەرەب نانێن. داروودەستەی تورک نەماوە

حوکمی ئینتیدابی بەریتانی دەمێنێتەوە، ئەوکاتە چینەکان بەگشتی خۆشحاڵ دەبن بەدروستکردنی ولایەتێکی کوردی لە ناو چوارچێوەی سنووری عێراق، بەمەرجێ پەیوەندی راستەوخۆیان لەگەڵ حکومەتی عێراق لە ژێر چاوەدێری جێگری باڵای بەریتانی بێت و کاروباری ناوخۆش، خۆیان بەڕێوەی ببەن. بڕیار لە بەغداوە دراوە لە لایەن ئەو عەرەبانەی کە کورد بە چاوێکی سووک سەیریان دەکەن، هەر وەکوو سەیرکردنی ئێمە بۆ رەشەکانی ئەفریقیای ناوەڕاست، وە مەسەلەی پارەدان بە کەسانێکی سەر بە رەگەز و زمانێکی جیا لە هی خۆیان زۆر ئازاریان دەدا. ژمارەیەکی زۆر کەم رازین بەو بەڵێنانەی کە لە کۆتایی ساڵی ١٩٢٥ دا دراون، تەنانەت بە بەجێهێنانێکی نیوەچڵیش، بەمەرجێ لەئاکامدا زمانی کوردی بببێتە زمانی رەسمی کوردستانی عێراق...هتد. کوردەکان هەست بە نەمانی هەڕەشەی تورک، لەسنووری باکوور دەکەن، ئیتر گرینگی دەدەن بە مەسەلەی خۆیان. هەروەها لەو بڕوایەدان کە داروودەستەی عەرەبی بۆی نوسراوە شوێنی داروودەستەی ئیمپراتۆر بگرێتەوە کە ئانێستاش لێی دەتۆقن، ئەم پێش بینییە نارەحەتیان دەکات.

زۆربەی کوردە رووناکبیرەکان، بەتایبەتی ئەوانەی پایەی رەسمیان هەیە نارەزایی دەردەبڕن بەرامبەر بەوەی کە تەنها کوردە رەشتاڵەکان بۆیان هەیە ببنە ئەندام لە پەرلەمانی عێراق. هەروەها دژی ئەوەن کە ئەو ئەندامانە کەسانێکن بە ئاسانی جڵەو بەردەدەن لەبەردەم سیاسییە زیرەکە عەرەبەکان. کۆنترۆڵ کردنی چاپی کوردیش ئازاریان دەدا.

ج ـ چەند تێبینییەکی بچووک دەربارەی باری ناوخۆی هەریەک لەشارەکان کە بۆی هەیە بە هۆی دەستەی سێیەمەوە لەعێراق یەکبخرێن:

سولەیمانی:

بێجگەلە سەرهەڵدانی شێخ مەحمود کە کارەکتەرێکی ناوخۆیی و خاوەن ئامانجێکی ناو خۆییە و نوێنەری تەنها جوڵانەوەی سولەیمانییە، رای گشتی بریتییە لە سولەیمانییەک بۆ سولەیمانییەکان. ئەم هەستە تا رادەیەک بەندە بە باری تۆپۆگرافی و سەربەخۆیی جارانی خێزانی بابانەکان لەسەدەی رابردوو. هەموو گروپەکان رازین بەوەی سولەیمانی ببێتە ویلایەتێکی سەربەخۆ بەڵام نایانەوێ هیچ کام لەدەستەکانی شێخان، بەگزادە یان ئاغاوات [Aghawat] فەرمانداری بکەن و بەرژەوەندی خۆیان لە دەرەوەی ناوچەکەی خۆیان بهێننەدی. سولەیمانی شەڕخوازو نارەحەتە، پێویستی بە مۆسۆلینییەک هەیە. سیاسەتی تازەی ئەم دەستە جۆراوجۆرانە ئامێرێکی بەهێزە لە دەستی ئاژاوەچییە بیرفراوانەکان.

لەپاشکۆی خاڵی یەکەم کەمێک باسی هەوڵدانی تازەی کوردی عێراقمان کردوە بۆ جیا کردنەوەی سولەیمانی بە هۆی راگەیاندنی کۆمەڵی ئەدەبییەوە بۆ ئەوەی ببێتە بنکەی رووداوە گەورەکان.

تەقەلای ئەفەندییە سەرگەرمەکانی - پشتیوانی کورد - بێتە دی و لەحاڵەتی تێبینی کردنی لاوازبوونی حکومەتەکانی بەغدا و تاران و ئەنقەرە، بە هۆی گیروگرفت لە لایەکی تر پەلەی لێ بکرێ، یان بەشێوەیەکی زۆر ئاسانتر بە هۆی هێزێکی دەرەکییەوە کە نیازی لە ناوبردنی هاوسەنگی ئەم دەستە نارەحەتانە بێت، سەرکوت بکرێت.

دەتوانین دەستە جیاکانی ئەم دەزگایە بەم شێوەیە بخەینە روو:

١- سەرۆک خێڵەکان، بەئێرەیی نێوخۆ و حەزە شاخاوییەکانیان و گیانی نەتەوەیی زیادە رۆیانەوە.

٢- «کۆمیتە ناوچەیی» یە ناوخۆییەکان، کە لەژێر ناوی ناسیۆنالیزم بۆ گەیشتنە مەبەستی خۆیان لە سیاسەتی داهاتوو، لە ریزی پێشەوە کار دەکەن.

٣- کۆمیتەکانی عێراق و ئێران و تورکیا کە هەوڵی یەکخستنی کۆششی کۆمیتە ناوچەییەکان دەدەن بۆ بەدیهێنانی جۆرە ئۆتۆنۆمییەک لە چوار چێوەی سنوورە نێو نەتەوەییەکان کە سەر بە دەستەڵاتی حکومەتەکانی ئەم ناوە بێت.

٤- کورد، زۆربەیان خاوەن سروشتێکی شۆڕشگێرانەی توندوتیژن، لە هەموو شارەکان ئامانجی سەرەکیان بەکار خستنی هەوڵ و تەقەلای دەستەی سێیەمە، لەهەرسێ دەوڵەت بۆ دروست کردنی تەقینەوەیەکی مەزن کە هێزە ئەورووپییەکان ناچار بکات، بۆ بەرژەوەندی ئاشتی خۆرهەڵاتی نزیک، گرینگی بە مەسەلەی کورد بدەن. خاڵی یەکگرتنی دەستەیەک لەگەڵ یەکێکی تر لەم چوار دەستەیەی لەسەرەوە ناومان بردوون، ئەمڕۆ ئاڵۆز و نادیارە.

٤- بزووتنەوەی کورد لە عێراق:

ا- هەرە گرینگترین و پێشکەوتووترین دەستە لەم دەستانەی سەرەوە، لە هەر سێ دەوڵەت، ئێستا دەستەی سێیەمە کە هەوڵی وەدەست هێنانی ئۆتۆنۆمی کورد دەدا لە چوارچێوەی سنوورە نێونەتەوەییەکان. لە خوارەوە هەموو ئەو زانیاریانەی لە بارەی ئەم دەستەیەوە دەستمان کەوتوون بەدرێژی خراونەتە روو. ئەمە نموونەیەکی باشی دەستەکانی تورکیا و ئێرانیشە.

ب - سەرەرای باری ناوخۆی هەر پارچەیەک، هەموو چینەکانی کوردی عێراق لەناوەوە، دڵنیان لەوەی کە حوکمرانی دام و دەزگای عەرەبی و وەزارەتی عەرەبی پشتگیری کراو لە لایەن سوپای عەرەبییەوە، قەت نایەتەدی. ناتوانن واز لەو بیرە بهێنن کە بە پێی بریاری کۆمەڵەی نەتەوەکان [League of nations] کورد لە ژێر

جوداوازیان ناوەتەوە بۆ بەدەستهێنانی سەربەستی کورد. هەروەها تراژیدیای راپەڕینێکی پەرت و بڵاو و ناڕێکیان دژی حکومەتە دەسەڵاتدارەکان دروست کردووە. ئەمانە وای بۆدەچن کە نەبوونی پەیوەندی و هاتوو چۆ (اتصالات) کە لە رابردوودا دەورێکی لاوەکی بینیوە لە نەبڕانەوەی رەگەزی کورد، ئەمڕۆ گەورەترین رێگرە لە بەردەم هەر کۆششێک بۆ دامەزراندنی دەوڵەتێکی سەربەخۆ. هۆی سەرەکی تەسک بینی زۆربەی سەرۆک خێڵەکان و نەزانی و بێ ئاگایی کورد لە جوگرافیای وڵاتی خۆی دەگەڕێتەوە بۆ نەبوونی پەیوەندی و هاتووچۆ. هەرئەمەشە هۆی نەبوونی هاوبەشی ئابووری و سیاسی لە نێوان پارچەیەک و پارچەیەکی تری کوردستان. پیشەکان دەرەکین و (external) هیچ شارێکیش وەکو پایتەخت نەناسراوە. ئەم دەستەیە هیچ مەترسییەکیان بۆ سەر بەڕێوە بردنی ئێستای کاروبار نیە، خۆیان تەرخان کردوە بۆ بڵاوکردنەوەی رۆشنبیری کە نهێنی گەشەکردنێکی سروشتی و پێ بە پێی ئۆتۆنۆمی تیا رەچاو دەکرێ.

٣- مەترسی:

هەستی ناڕەحەتی و ناڕەزایی لە کوردستاندا بەشێوەیەکی پتەو لە زیادبووندایە. کوردی تورکیا، بەم دواییە، راپەڕینێکی توند و تیژ و رێکخراویان بەرپاکرد کە بە هۆی نەبوونی پشتگیری کردنێکی خێراوە سەرنەکەوت، هەرچەندە بەهۆی بەکارهێنانی هێزێکی بێڕەحمانە، بەشێوەیەکی کاتی دامرکاوەتەوە، بەڵام گیانی یاخی بوون بەردەوام زیندووە، بۆی هەیە سەر هەڵبداتەوە. کوردی ئێرانیش راپەڕینێکی لاوازیان بەرپاکردوە بۆ ئەوەی بیسەلمێنن کە سەرەڕای هەوڵی حکومەتی ئێران بۆ کونترۆڵ کردنی کاروبار بەهۆی پۆلیسی ئاساییش کە لەلایەن سوپاوە پشتگیری دەکرێ، تێکۆشانی فراوانتر بۆ بەدەست هێنانی سەربەستی لەئارادایە. کوردی عێراق، کە تا ئێستا بە نیمچە رەزاییەکەوە رێز لە چەمکی کۆنترۆڵی عەرەب کە لەلایەن بەریتانیاوە پشتگیری دەکرێت دەنێن، خەریکن هەست بەوە دەکەن کە یارییەکە زۆر درێژەی کێشاوە. دەرکیان بەوە کردوە کە ئەوان لە چاو خزمەکانیان لە ژێر حوکمی تورک و فارس دا ئاسوودەترن، بەڵام ئەم ماوەیە دەمارگیر بوون لە ترسی ئەوەی بەریتانیا یارییەکە بوەستێنێ و چاوەڕێی ئەوەیان لێ بکات پەیڕەوی فەرمانە راستەوخۆکانی دامودەزگای عەرەبی بکەن و پاداشی پڕاوپڕی باجیش بدەنە خەزێنەی بەربەرڵڵای عەرەب.

ئەمڕۆ دەزگای راپەڕینێکی رێکخراو، ساوا و دواکەوتووە و ناتوانێ کار بکات. بەڵام لەگەڵ ئەمەش شوێنی سەرنجە ئەم دەزگایە بە هیچ شێوەیەک ناتوانێ کوردستانێکی سەربەخۆ بنەخشێنێ و رێک بخات و بە هێزی بکات، بەڵام هیچ گومانی تێدا نییە کە کەسانی کارامە و لێهاتوو، هەروەها پارە، زۆر بە ئاسانی دەتوانن باکوری عێراق و خۆرئاوای ئێران و با شوری تورکیا بەرەو بارێکی ئەنارشی ببەن و ئەنجامی سەختیشی هەبێت بـۆسەر باری هێمنی خۆرهەڵاتی نزیک. مەرجی ئەم کارە بۆی هەیە بە شێوەیەکی هەڕەمەکی لە ئەنجامی هەوڵ و

٢- دامەزراوی قووچەکی شێخە ئایینیەکان، سەیدەکان، مەلاکان، دەروێشەکان. ئەمانە لە زۆربەی سەرۆک خێڵەکان ڕووناکبیرترن و خاوەن ڕوانگەیەکی فراوانترن، بەڵام هەمووی بۆ زیاد کردنی هێزی ناوخۆیی خۆیان دەخەنە کار.

٣- سەرۆک خێڵەکان.

٤- ژمارەیەکی زۆری خێڵەکییەکان کە بە پێچەوانەی زۆربەی عەرەبەکان، کوێرانە و بێ پرسیار پەیڕەوی سەرۆکەکانیان دەکەن.
دەستەیەکی کەمی بازرگانەکان، کە گرینگیەکەیان تەنها ئەوەیە نوێنەرایەتی سیستەمی ئابووری دەکەن و بەهەموو شێوەیەک پێشبڕکێی خێڵەکان دەکەن بۆ ئەوەی لە ئەنجامدا بکەونە سەر شارەکان.

ج - لە لای زۆربەی سەرۆک خێڵەکان چەمکی سەربەخۆیی کورد بریتییە لە سەربەستی کۆکردنەوەی قەرز و باج بۆ خۆدەوڵەمەند کردن. بۆ ئەوەی هەریەکێکیان بە ئارەزووی خۆی لە مەیداندا بخولێتەوە و گوزەرانی لە هی دراوسێکەی باشتر بێت. خێڵەکییەکانیش لەم ڕوانگەوە پەیڕەوی سەرۆکەکانیان دەکەن و مەسەلەی باج وەرگرتن بە مافی ڕەوای سەرۆکەکان دەزانن. بەڵام زۆر بەزەحمەت ئەو پارە زیادەیەی کە لە لایەن حکومەتێکی بێگانەوە سەپێندراوەتە سەریان دەدەن. تەنها ترس وایان لێ دەکات بیدەن، چونکە نە ئەوان و نەسەرۆک خێڵەکانیش سوود لەم پارەیە نابینن کە دەڕێتە خەزێنەی دەوڵەت.

زۆربەی پیاوە ئایینییەکان هەمان ڕوانگەی سەرۆک خێڵەکانیان هەیە، بەڵام ئەوان، هەندێ لە خێڵ و ناوچە و هەروەها خۆشیان وەکوو نموونەی سەرەکی هێز لە بەرچاو دەگرن. سەرکردە ئایینییەکان توانایەکی لە ڕادە بەدەریان هەیە لە هەڵپێچان و ترساندن و کۆنترۆڵ کردنی سەرۆک خێڵەکان، تەنانەت لەناو ماڵی خۆشیان.

بەلای ئەفەندییە نیمچە ڕۆشنبیرەکانەوە پێکهاتنی دەوڵەتێکی کوردی یۆتۆپیایی، کە هەموو چینەکان لێی دڵنیان، بەدەستهێنانی وەزیفەیەکی باش و مانگانەیەکی زۆرە. بەم نیمچە ڕۆشنبیرییەوە ناتوانن بێ نرخی هەڵچوونی هەندێ لە خێڵ و شێخەکان بهێننەدی، لە کاتێکدا کە بەشی هەرەزۆری کوردستان لە خەودایە. ئیرەیی و چاوچنۆکی و بە تینی هەستی شانازی کردن بە ڕەگەز لە هەڵوێستی عەقڵی خێڵەکییەکاندا، فرسەتێکی باشی بۆ ڕەخساندوون تا لە ناو حەز و ئارەزووی خۆیاندا بخنکێن. ئەمانە نمونەی ئەو پیاوانەن کە پیسترین دوژمنی مەسەلەی کوردن، لەهەموو ڕوویەکەوە. بە هەمان شێوەش بۆیان هەیە گیروگرفت بۆ ئەو حکومەتانەی پەیوەندیان بە مەسەلەی کوردەوە هەیە، دروست بکەن.

دەستەیەکی کەم ڕووناکبیر و دونیادیدەی کورد هەن، ئاگری تێکۆشانێکی

بزووتنەوەی کورد

١- بە گشتی:

أ- هەر لە سەرەتای مێژووەوە، کوردستان هێرش و دەسەڵاتی بێگانەی لە سەر بووە، بەڵام قەت داگیرنەکراوە. ئەگەر چی لە هەندێ سەردەمی جیاجیادا، هەندێ پارچەی بچووک، لەشێوەی چەند میرنشینێکی سەربەخۆدا سەریان هەڵداوە و هەندێ پارچەش، بەم دواییە، لە سەر نەخشە رەشبوونەتەوە،بەڵام کورد هیچ کات وەکو میللەتێک نەناسراوە و قەتیش تێکنەشکاوە. ئەمڕۆ، هەروەکو هەزارەها ساڵ پێش ئێستا، کورد ژمارەیەکی زۆری یەکنەگرتوو پێکدەهێنن کە دابەش کراون و ناچارکراون مل بۆ دامەزراوی حکومەتە بێگانەکان کەچ بکەن، لەگەڵ ئەمەش هەردەم خاوەنی کەسایەتی و زمانی تایبەتی خۆیان بوون وگرد و دۆڵەکانی خۆیان خۆشویستووە و هەردەم شانازییەکی زۆر بە رەگەزی خۆیانەوە دەکەن .

ب - کورد لە بنچینەوە زۆر زانا نییە، نەزانە و خۆشی بە ڕووانگەی تەسکی خۆیەوە بەستۆتەوە، لە ناو بەربەرەڵڵاییەکی عەقڵی وادا دەژی کە تەنها چاوچنۆکی نەک ئایدیالیزم دەتوانێ بە تەواوی بە ئاگای بێنێتەوە. کاتێک، دوای جەنگ، شەپۆلی ناسیۆنالیزم بە هەموولایەکی جیهاندا سەری دەکرد و زۆر وڵاتی نوێ دروست بوون، کوردەکان لە خەودا بوون. تاوەکو دەوڵەتی تورکیای نوێ و دەوڵەتی ئێرانی نوێ بە تەواوی و لە هەموو ڕوویەکەوە شوێن پێی خۆیان نەگرت، کوردەکان بە شێوەیەکی چالاکانە نەکەوتنە خۆیان و نەیانووت بۆچی ئێمەش وەک عەرەبستانی نوێ مافی خۆمان نەدراوەتێ. لەو کاتەوە کورد هەلی ئاشتی لە دەست داوە.

٢- دەوڵەتی نوێی کوردستان

أ- ئەمڕۆ کوردستان لە هەمان باری ئەورووپای سەدەکانی ناوەڕاستدا دەژی. بەسەرجەمی باڕۆن و سوارچاک و قەشە و رەنجدەر و هەروەها تەسک بینی، کە نوێنەرایەتی سیاسەتی ئەوکاتی دەکرد. هەموو تاکەکەسێکی کورد لەدڵەوە باوەڕێکی پتەوی بە چەمکی سەربەخۆیی کوردی هەیە و ئامادەیە خۆی بۆ بەخت بکات، بەڵام پێناسەی تەواوی بۆ ئەم زاراوەیە بەندە بە باری کۆمەڵایەتییەوە لە ژێر سیستەمی دەرەبەگایەتیدا.

کورد بە گشتی زۆر دڵنیان لەوەی کە داهاتوویەکی شاراوەی دوور، یۆتۆپیایەک دادێنێ تیایدا کورد دەسەڵاتی بێگانەی لەسەر نامێنێ و خۆی حوکمی خۆی دەکات.

ب - گرینگترین چوار چینی کومەڵایەتی لە کوردستان ئەمانەن:

١- ئەفەندییەکان: هەندێ ڕووناکبیریان تێدا هەیە بەڵام زۆربەیان خاوەن زانیاری کەمن و بۆ مەبەستی بچوکی خۆیان دەژین.

نهـــێـنی

ناوەندی سەرەکی هێزی ئاسمانی سەرچاوەی ژمارە: ١/٤٠٧
بەریتانی لە عێراق

بەغـــدا،

٣٠ مارسی ١٩٢٧

بۆ سکرتێری وەزارەتی هێزی ئاسمانی
Adastral House, Kingsway,
London W.c.2

گەورەم :

١- بۆ ئاگاداری، لێرەدا راپۆرتێکی تایبەتی دەربارەی بزووتنەوەی کورد لە عێراق خراوەتە روو.
٢- وا دەردەکەوێ کە کوردەکان ئامرازێکی چاک و بەهێزبن لە دەست ئەوانەی دەیانەوێت گیروگرفت بۆ دەوڵەتی عێراق بنێنەوە، بە تایبەتی بۆلشەفیەکان، ئەگەر هەلیان بۆ رێکەوێ.
٣- پەیوەندی ئەم راپۆرتە بە رێکخراو و دامەزراوی سوپای عێراقی، کە ئێستا لە ژێر نەخشەکێشاندایە، گرینگی خۆی هەیە. بەتایبەتی پەرەگرافی ٦ (أ).

شانازی بەوە دەکەم گەورەم،
بیمە خزمەتکاری گوێڕایەڵت،
(ئیمزا) ت.س.ر. هیگنز

Air Commodor, Chief Staff Officer
British Force in Iraq

بەڵگەنامە

بـــزووتـــنـــەوەی کـــورد

وەرگێرانی لە ئینگلیزییەوە
ئەزمەند بەگی خانی

«بزووتنەوەی کورد» بەڵگەنامەیەکی ئارشیڤی وەزارەتی دەرەوەی بەریتانییە کە لە Public Records Office لە لەندەن پارێزراوە، لە ۳۰ مارسی ۱۹۲۷ لەلایەن ئاوەندی سەرەکی هێزی ئاسمانی بەریتانی لە عیراق نووسراوە و بۆ سکرتێری وەزارەتی هێزی ئاسمانی لە بەریتانیا ناردراوە. ناوەرۆکی ئەم بەڵگەنامەیە بریتییە لە ئامادەکردنی راپۆرتێک دەربارەی باری سیاسی لە کوردستان و بزووتنەوەی کورد لە کوردستانی عیراق.

Ahmedi Khani
ئەحمەدی خانی

Mem et Zîn
مەم و زین

Edition établie et annotée
par Hejar

ئامادەکردن و پەراوێزنوسینی:
هەژار

Institut Kurde de Paris
106, rue La Fayette, 75010-Paris

1989

بابان) و هتد....
١٩- هەمان ئەم بۆچوونە، لەگەڵ گۆڤاری ژین یش دا ١٩١٨-١٩١٩ پێکەڵپێک دەبێتەوە.
Jin (1918-1919), M.E.Bozarslan. Cild1, Stockholm: 1985. -٢٠
٢١- بڕوانە گۆڤاری کوردستان ١٩١٨-١٩١٩، ژمارە (٢)، ل ٢١-٢، ل ٢٢-٢٤، هەروەها ژمارە (٤)، ل ٤٢، ل ٤٣-٤٤.
٢٢- بۆ شارەزایی زیاتر لەبارەی ژیانی (محمد میهری)، بڕوانە سەرچاوەکانی ژمارە(٦، ٢٣، ٢٤)
٢٣- نەجمەدین مەلا: یادی زانایەکی کۆچکردوومان (محمد میهری)، لە ر. ژین. سلێمانی: ٩ی مایسی (١٩٥٧)، ژمارە (١٣٤٣) ل، ١.
٢٤- جوتیار حاجی تۆفیق: محمد میهریی هێژا و ئەمر، لە گ. بەیان، بەغدا: ١٩٨٩، ژمارە (١٥٨)، ل ٢٨-٢٩.
٢٥- هەمان ئەم پارچە شیعرەی منداڵان، کە لە ژمارە (٦)، ل ٧٠-٧١ ی گۆڤاری کوردستان دا، بە ئیمزای (زینۆ) بڵاو کراوەتەوە؛ جارێکی دیکە- دووای نزیکەی ١٣ ساڵ، بە هەمان ناونیشانی (دەلالیا زارۆکان) لە گۆڤاری هاوار ژمارە ٥، ل ٢ دا، بە ئیمزای (ئەمین عالی بەدرخان) بڵاو کراوەتەوە.ئێمە وا تێ دەگەین ئەو "زینۆ" ناوەی گ. کوردستان، ئەمین عالی بەدرخان خۆی بێ. لە گۆڤاری هاواردا، سێ کۆپلەی دیکەی بۆ زیاد کردووە، کۆپلەکانی پێشووشی، لەرووی زمان و رێنووسەوە دەسکاری کردوون. جێی سەرنجە، کە گۆرانیبێژ (شڤان) ئەم پارچە شیعرەی منداڵانی کردۆتە گۆرانی.

کوردستان، ژمارە ٤٣-٤٤، بەغدا، کانوونی دووەمی ١٩٧٧، ل ٤١.

١٣- مستەفا "نەریمان": بیبلۆگرافیای کتێبی کوردی (١٧٨٧-١٩٧٥). چاپخانەی کۆڕی زانیاری کورد، (١)، بەغدا: ١٩٧٧. ل ١٧. "بەپێی بۆچوونی مامۆستا نەریمان، ئەم کتێبە بەناونیشانی "نهج الانام" بلاو بۆتەوە.

١٤- ئەم کتێبە، لە ساڵی ١٩٨٨دا دۆزرایەوە و لە دەزگای « وەشانخانا کوردستان» لە ستۆکهۆڵم سەر لەنوێ لە چاپ دراوەتەوە.

١٥- بۆ شارەزایی زیاتر لەبارەی ئەم کتێبەوە بڕوانە سەرچاوەی پێشوو، ل ١٧.

١٦- عەبدولرەحیم رەحمی هەکاری، نووسەرێکی زۆر چالاک و فرە بەرهەمی گۆڤاری ژین (١٩١٨-١٩١٩) بووە، عەبدولرەحیم هەکاری وێڕای (مستەفا شەوقی) تا ئێستا "رەخنەگری کورد" ناوی لە بەرهەمەکانیان نەداوەتەوە، بەڵام بزووتنەوەی نوێخوازی و تازەبوونەوەی شیعری کوردی، پێش "عەبدولرەحمان بەگی نفووس " و " شێخ نووری" و "پیرەمێرد" و "گۆران"، بەڕاستی: لەم دوو شاعیرەوە، لەم دوو سەربازە و نەوە دەست پێ دەکا. نووسەری ناوبراو، خاوەنی یەکەمین شانۆنامەی نووسراویشە، کە لە مێژووی ئەدەبیاتی کوردی دا بە زمانی کوردی نووسرابێ، بڕوانە (گۆڤاری ژین، کۆکراوە و لە چاپدانەوەی "محەمەد ئەمین بۆزئەرسەلان"، ژمارە (١٥) و (١٦) جلدی چوارەم، وەشانا دەنگ، ستۆکهۆڵم: ١٩٨٧، ل ١٤-١٧).

١٧- رووناکبیری کورد (عەبدوڵلا جەودەت)، رۆڵێکی بەزەبر و دیاری هەبووە بەسەر خۆشکردنی کڵپەی ئەم بیرە نەتەوەخوازییەی کورد لەو سەردەمەدا، بەتایبەتی لە ساڵانی دووای (١٩٠٨) بەولاوە. کۆمەڵەی هیوا "هێڤی". بە چاپخانەکەی ئەو (چاپخانەی اجتهاد) گۆڤارەکەی خۆیان چاپ و بلاو دەکردەوە.

١٨- ئەم دیاردەی زۆرتر بە تورکی نووسینە، تەنانەت بابایەکی وەکوو پیرەمێردی شاعیریشی گرتبووە. پیرەمێرد بەشێکی زۆری وتارە رووناکبیریەکانی خۆی بە زمانی تورکی لە گۆڤاری (ژین) و (اقدام) یا بە زمانی فارسی لە گۆڤاری "فرهنگ" و "شفق سرخ" دا بلاو کردۆتەوە. هەمان شت لەبارەی رووناکبیرە پێشڕەوە کوردەکانی دیکەش، وەکو: (عەبدوڵلا جەودەت) و (عەبدولرەحمان بەدرخان) و (ئیسماعیل حەققی بابان) و هتد....

١٩- هەمان ئەم بۆچوونە، لەگەڵ گۆڤاری ژین یش دا ١٩١٨-١٩١٩ پێکەڵپێک دەبێتەوە.

٢٠- Jin (1918-1919), M.E.Bozarslan. Cild1, Stockholm: 1985.

٢١- بڕوانە گۆڤاری کوردستان ١٩١٨-١٩١٩، ژمارە (٢)، ل ٢١-٢، ل ٢٢-٢٤، هەروەها ژمارە (٤)، ل ٤٢، ل ٤٣-٤٤.

٢٢- بۆ شارەزایی زیاتر لەبارەی ژیانی (محمد میهری)، بڕوانە سەرچاوەکانی ژمارە(٦، ٢٣، ٢٤)

٢٣- نەجمەدین مەلا: یادی زانایەکی کۆچکردوومان (محمد میهری)، لە ر. ژین. سلێمانی: ٩ی مایسی (١٩٥٧)، ژمارە (١٣٤٣) ل، ١.

٢٤- جوتیار حاجی توفیق: محمد میهریی هێژا و نەمر، لە گ. بەیان، بەغدا: ١٩٨٩، ژمارە (١٥٨)، ل ٢٨-٢٩.

٢٥- هەمان ئەم پارچە شیعرەی منداڵان، کە لە ژمارە (٦)، ل ٧٠-٧١ ی گۆڤاری کوردستان دا، بە ئیمزای (زینۆ) بلاو کراوەتەوە؛ جارێکی دیکە- دووای نزیکەی ١٣ ساڵ، بە هەمان ناونیشانی (دەڵالیا زارۆکان) لە گۆڤاری هاوار ژمارە ٥، ل ٢ دا، بە ئیمزای (ئەمین عالی بەدرخان) بلاو کراوەتەوەمێنە وا تێ دەگەین ئەو "زینۆ" ناوەی گ. کوردستان، ئەمین عالی بەدرخان خۆی بێ. لە گۆڤاری هاواردا، سێ کۆپلەی دیکەی بۆ زیاد کردووە، کۆپلەکانی پێشووشی، لەرووی زمان و رێنووسەوە دەسکاری کردوون. جێی سەرنجە، کە گۆرانیبێژ (شڤان) ئەم پارچە شیعرەی منداڵانی کردۆتە گۆرانی.

نووسراوی (زینۆ)، پارچە شیعرێکی منداڵانە، لەسەر شێوەی تازە وتراوە. (٢٥)

١٣- شئونات، شریف پاشانک بیاناتی، ل ٧١-٧٢، وتارێکە لەبارەی چالاکییەکانی شەریف پاشا لە کۆنفرانسی ئاشتی - لە پاریس. هەڵوێستی ئەم و (کۆمەڵەی ئیتیحاد و تەرەقی) لە هەمبەر مافە نەتەوەییەکانی گەلی کورد، بە زمانی تورکی، لە گۆڤاری (اقدام) ی تورکییەوە وەرگێڕاوە.

١٤- (عقر، تعیین، تشکر، ارمنستانە دائر محقابر مطالعە)، بە زمانی تورکی، ل ٧٢، کۆمەڵێک دەنگوباس و هەواڵی جۆراوجۆرە.

پەراوێز:

١- د. کەماڵ مەزهەر لە کتێبی "تێگەیشتنی راستی..." ل ٢٣٣ دا دەڵێ: (سەید حوسێن ناوێک بەرپرسیاری بوو... بە پێنج زمان: کوردی و تورکی و عەرەبی و فارسی و فەرەنسی وتاری بڵاو دەکردەوە... گەلێک ژمارەی بە وێنەی ناودارانی کورد رازێنراوەتەوە...هتد) کەچی بەپێی ئەو ژمارانەی لەلایەن ئێمەن و بەپێی ئەو دوو ژمارەیەی ٨ و ٩ کە د. مارف خەزنەدار لە گۆڤاری رۆژی کوردستان، ژمارە (٤٢،٤٤) دا بڵاوی کردوونەتەوە: هیچ سەید حوسێن ناوێک لە گۆڤارەکەدا بوونی نیە، وتاریشیان بە زمانی فەرەنسی تێدانیە، هەروەها هیچ یەکێکیش لەو ژمارانە وێنەی ناودارانی کوردی تێدانیە.

٢- د.کەماڵ مەزهەر: هەمان سەرچاوەی پێشوو، ل ٢٣٢

٣- گۆڤاری ژین (١٩١٨-١٩١٩). هەروەها هەندێ بڵاوکراوەی کوردیی دیکەش لەو سەردەمەدا لە هەمان ئەم چاپخانەیەدا چاپ و بڵاو کراونەتەوە.

سەرچاوە فەرەنسییەکان ئەوەیان بە تەواوەتی ساغ کردۆتەوە کە چاپخانەی "اجتهاد" ، کە گۆڤاری رۆژی کوردی پێ چاپ کراوە ، هی رووناکبیری کورد (عەبدوڵلا جەودەت) بووە. هەوڵدان بۆ ساغکردنەوەی خاوەنی ئەم چاپخانەیەی نجم استقبالەش شتێکی گرنگ و پێویستە.

٤- د. کەماڵ مەزهەر: ھ. س. ل ٢٣٣

٥- د. مارف خەزنەدار: هەندێ دەستنووسی کوردیی مینۆرسکی و...، گ (رۆژی کوردستان)، ژمارە ٤٣-٤٤، بغداد: كانون الثاني ١٩٧٧، ل ٣٨-٤٥

٦- Malmisanij û M.Leweni: Rojnamegeriya kurdi, wesanen jina nu, Stockholm. 1989.

٧- یانیش ئەگەر حەز بکا، دەتوانێ راستەوخۆ داوا لە بەڕێوەبەرایەتیی کتێبخانەی لانگۆز بکات - لە پاریس. ژمارە و کۆدی گۆڤارەکە ئەوەیە: Mel. Tur. 9.19

٨- لەم بارەیەوە، بەشی هەرە زۆری وتارەکان بە زمانی تورکی "عوسمانلی" نووسراون، ئنجا "عەرەبی" و پاشان "کوردی".

٩- دیاردەی ورگێران لە زمانی بێگانەوە بۆسەر زمانی کوردی، لە گۆڤاری "رۆژی کورد" و لەو سەردەمەدا بەگشتی، ئەگەرچی لە شێوەی دیاردەیەک و "شەپۆلێک" وەدیار ناکەوێ، بەڵام لەگەڵ ئەوەش ئەم دوو تێکستە وەرگێردراوە، بایەخ و مەغزای تایبەتی خۆیان هەیە.

١٠- هەمان نووسەری ناوبراو، لە گۆڤاری ژین دا (١٩١٨-١٩١٩) بەشێوەیەکی زۆر فراوان، هەمان ئەم بەهرەو توانایەی خۆی - لە بواری وەرگێڕان لە کوردییەوە بۆ تورکی- تاقی کردۆتەوە.

١١- رۆژنامەی " تێگەیشتنی راستی" لە ژمارە (٥٨) لە رۆژی ٩ی کانوونی یەکەمی ١٩١٨، بۆ یەکەمین جار چاوپێکەوتنێکی رۆژنامەنووسیی بڵاو کردۆتەوە. بڕوانە (د. کەماڵ مەزهەر: تێگەیشتنی راستی و ...]

١٢- بڕوانە: (د. مارف خەزنەدار: چەند دەستنووسێکی کۆنی مینۆرسکی و...]، گۆڤاری رۆژی

ڕۆشنبیری و کۆمەڵایەتیی کوردستانی تورکیایە، بە زمانی تورکی.
٨- حوادث خارجە، بە زمانی تورکی، ل ٥٤، کۆمەڵێک دەنگوباسی ڕۆشنبیری و هەواڵی سیاسییە لە بارەی جموجۆڵی کوردان، لە دەرەوەی کوردستاندا.
٩- خولیا پرووانە تشبثات، بە زمانی تورکی، ل ٥٥-٥٦، نووسینی (محمد عثمان بدرخان) لەبارەی هاوخەباتبوونی کورد و ئەرمەنیەکان، وێڕای چەند قسەیەک لەبارەی هەندێ لە ڕۆژنامە ئەرمەنیەکان و بیروبۆچوونیان لەبارەی کورد.
١٠- حسب حال دگەل وطن، بە زمانی کوردی، دیالێکتی سۆرانی، پارچە شیعرێکی ستوونییە، نووسراوی (مستەفا شەوقی) وێڕای دێڕبەدێڕ وەرگێڕانی تێکستەکە بۆسەر زمانی تورکی، لەلایەن شاعیر خۆیەوە.

ژمارە (٦): ٢٢ی نیسانی ١٩١٩/١٣٣٥

١- تتمە (بیداری)، ل ٥٨، پاشماوەی پارچە شیعرێکی ژمارەی چواری گۆڤارەکەیە، بە زمانی فارسی، نووسراوی (ع.ق).
٢- پروتستو، ل ٥٨، بە زمانی تورکی، گۆڤاری (کوردستان).
٣- کوردلردە افکار عمومیە، بە زمانی تورکی، ل ٥٨-٦٠، وتارێکە لەبارەی ژیانی دینی و ڕۆشنبیریی گەلی کورد لەو سەردەمەدا، نووسراوی (ابن الرشید).
٤- دساتیر عصرە قارشی کردستان، بە زمانی تورکی، ل ٦٠-٦٢، نووسراوی لاوی دەلال (عبدالواحد).
٥- کورد مهاجرلری نە اولەحق؟ بە زمانی تورکی، ل ٦٢-٦٣، نووسراوی (محمد عثمان بدرخان).
٦- کردستان و کردلر، بە زمانی تورکی، ل ٦٣-٦٥، نووسراوی (سیداحمد عارف برزنجی زادە)، پاشماوەی وتارێکی ژمارە چواری گۆڤارەکەیە.
٧- ارمنسانک پایتخت و قوە عسکریەسی، ارمنی پطریقنک بیاناتی مناسبتیلە، بە زمانی تورکی، ل ٦٥-٦٦، نووسراوی (جانو ارضروملی) لەبارەی ژیانی سیاسیی ئەرمەنیەکان و پەیوەندیان بە گەلی کوردەوە. هاوخەمی و هاوخەباتیی ئەو دوو میللەتە.
٨- کرستانک وضعیت خارجیە و داخلیەسی، آمریقان هیئتک و اناطولی یە عزیمتی مناسبتیلە، ل ٦٦-٦٧، نووسراوی (س.ح.) بە زمانی تورکی.
٩- غیرت بکێن، مایوس نەبین، بە زمانی کوردی، دیالێکتی کرمانجی، ل ٦٨، نووسراوێکە لە پێشەکی دا بە پەخشان و لەدوواییش دا بۆتە شیعرێکی ستوونیی درێژ، نووسراوی (عبدالرحمن النورس).
١٠- لبو هڤالی ماتمدار (ماتم)، بە زمانی کوردی، دیالێکتی سۆرانی، ل ٦٨ پارچە شیعرێکی ستوونییە، نووسراوی (مستەفا شەوقی)، وێڕای دێڕبەدێڕ وەرگێڕانی شیعرەکە بوسەر زمانی تورکی لەلایەن شاعیر خۆیەوە.
١١- ادبیات کوردیەدن بعض نمونەلر، پارچە شیعرێکی (نالی) وێڕای وەرگێڕانی دێڕبەدێڕی شیعرەکە بۆسەر زمانی تورکی، لەلایەن (محمد میهری) یەوە، ل ٦٩-٧٠.
١٢- دلالیا زاروکان، بە زمانی کوردی، دیالێکتی کرمانجی، ل ٧٠-٧١،

٧- وەظیفا مە چیە؟ نووسینی (محمد شەفیقە ئەوراسی زادە) بە زمانی کوردی/ دیالێکتی کرمانجی، ل ٣٨-٤٠، لێکۆڵینەوەیەکە لەبارەی ئەرکە نەتەوەییەکانی رووناکبیرانی کورد لەو قۆناغەدا- لە گۆشەنیگایەکی (پان ئیسلامی) یەوە.

٨- ایقاظ النائم و تهییج القائم، بە زمانی عەرەبی، نووسینی (محمد میهری)، ل ٤٠-٤١، وتارێکە باسی رۆڵ و بایەخی کۆمەڵەی "کوردستان تەعالی" دەکا، داوا لە رۆڵەکانی کورد و رووناکبیرانی کورد دەکا کە هاوکار و هاوخەباتی ئەو کۆمەڵەیە بن.

٩- تحیە المحبە و الوداد علی اطلال و جبال اکراد، شیعر بە زمانی عەرەبی، نووسینی (میهری)، ل ٤١-٤٢. پارچە شیعرێکی ستوونی کوردپەروەرانەیە، تەواو نەبووە.

١٠- اساس، کورجە صرف و نحو، مولفی: م.م. ل ٤٢، پاشماوەی وتارێکی ژمارە دووی گۆڤارەکەیە. بڕوانە ژمارە (٢)، ماددەی (٧).

١١- کردستان سیاحتنک، بە زمانی تورکی، نووسینی (حمدی وەهبی خرپوطلی)، ل ٤٢-٤٣. پاشماوەی وتارێکی ژمارەی رابردووە.

١٢- عرفان، کوردجە لغت، بە زمانی تورکی، مولفی: م.م.ل ٤٣-٤٤. پاشماوەی وتارێکی ژمارە دووی گۆڤارکەیە. بڕوانە ژمارە (٢)، ماددەی (٨).

١٣- لەگەڵ سوپاسنامە و پڕۆپاگەندەیەک، بە زمانی تورکی، ل ٤٤.

ژمارە (٥): ٣ی نیسانی ١٩١٩/١٣٣٥

١- داخلیە ناظری جمال بک افندی حضرتلرینە، آچیق مکتوف، نووسینی (محمد)، بە زمانی تورکی، ل ٤٥/٤٧، چەند داواکاری و پێشنیهادێکە لە بارەی مافە رۆشنبیری و نەتەوەییەکانی گەلی کورد.

٢- تلغراف، بە زمانی تورکی، لەلایەن دەستەی بەڕێوەبەرایەتیی گۆڤاری کوردستانەوە، ل ٤٧-٤٨.

٣- مخرج: کردستان تعالی جمعیتی ریاستنە، ل٤٨-٥٠ (ناوەرۆکی دوو تەلەگرافە لەنێوان کۆمەڵێک رۆشنبیرانی کورد و کۆمەڵەی (کوردستان تەعالی)، هەروەها وەڵام و روونکردنەوەیەکی دەستەی بەڕێوەبەرایەتی گۆڤارەکە.

٤- کرستان جمعیتە، بە زمانی تورکی، ل ٥٠، نووسراوی (فواد)، بە ناوی سەرکردایەتیی کۆمەڵەی (کورد تەعالی) یەوە لە دیاربەکر نووسراوە.

٥- دیاربکر کورد تعالی جمعیت محترمەسی نظر دقتنە، ل ٥٠، نووسراوی دەستەی بەڕێوەبەرایەتیی گۆڤاری (کوردستان)، بە زمانی تورکی. وەڵام و پێشنیهاد بۆ کۆمەڵەی (کورد تەعالی جمعیتی) لە دیاربەکر.

٦- تاریخدن بیر صحیفە، بە زمانی تورکی، ل ٥٠-٥٢، نووسینی (صبری سلیمان)، لەبارەی بارودۆخی کۆمەڵایەتی و سیاسی و عەشایریی کوردستانی تورکیا دەدوێ.

٧- حوادث داخلیە (تعیین، تشکر، باب عالینک مخطرەسی، تبلیغ رسمی، عبدالخالقک توفیقی)، ل ٥٢-٥٤، کۆمەڵێک هەواڵ و دەنگوباسی سیاسی و

ئەدەبی و ناودارانی کورد دەکا، گرنگی دەداتەوە بە خاسیەت و بەهرە و توانا "هاوچەرخەکانی" میللەتی کورد لەو قۆناغەدا.

٢- کردستان مجموعەسی مناسبتیلە، بە زمانی تورکی، نووسینی (کمال فوزی خێزانی زادە)، ل ٢٨-٢٩، وتارێکی سیاسیی کوردپەروەرانەیە، وەڵامێکی ئایدیۆلۆژیی رەخنەگرانەیە بۆ وتارێک کە لە گۆڤاری (ژین) دا بلاو بۆتەوە.

٣- کردستانە بر سیاحت، بە زمانی تورکی، نووسینی (احمد وەبی خرپوطلی)، پاشماوەی وتارێکی ژمارەی رابردووە، ل ٢٩.

٤- ایلری (آتی) غزتەسنە، بە زمانی تورکی، نووسینی (عزت ملیح)، ل ٣٠-٣٢، وتارێکی رەخنەگرانەیە لەبارەی ناوەرۆکی گۆڤاری مانگانەی (آتی) کە لە (١٦ شباط ١٣٣٥) لە ئەستەمبوڵ بلاو کراوەتەوە و تێیدا "لە چەند وتارێکی خۆیاندا" بە خراپە باسی گەلی کورد و بزووتنەوەی سیاسیی گەلی کوردیان کردووە. نووسەر بەرپەرچی بیروبۆچوون و وتارە شۆڤینییەکانی ئەو گۆڤارە تورکیە دەداتەوە. بە شیعرێکی (نالی) کۆتایی بە وتارەکەی هێناوە.

ژمارە (٤): ١٥ مارتی ١٩١٩/١٣٣٥

١- تبریک، بە زمانی تورکی. لەلایەن گۆڤارەکەوە، ل ٣٤. پیرۆزبایینامەیەکە بۆ کۆمەڵەی "کوردستان تعالی جمعیتی" و ئەندامەکانیان. تەبایی و هاوکاری و هاوخەباتیی گۆڤاری (کوردستان) پیشان دەدا لەگەڵ کۆمەڵەی "کوردستان تەعالی جەمعیەتی".

٢- کردستان و کردلر (١)، بە زمانی تورکی، نووسینی (سید احمد عارف برزنجی زادە)، ل ٣٣-٣٤، لێکۆڵینەوەیەکی مێژوویییە لەبارەی رەچەڵەک و بنەچەی نەتەوەیی کورد و وڵاتی کوردان. وتارەکە تەواو نەبووە.

٣- کردلر و کردستان، بە زمانی تورکی، نووسینی (عبدالواحد). ل ٣٥-٣٦. وتارێکی مێژوویییە لەبارەی گەلی کورد و وڵاتی کورد.

٤- بیدادی، شیعرێکی ستوونییە، بە زمانی فارسی، نووسینی (ع.ق)، ل ٣٦، شیعرەکە بانگێکی نەتەوەییە بۆ راپەرینی کوردان و داواکردنی مافە نەتەوەییەکانیان. لەوە دەچێ ئەم شیعرە هی (عەبدوڵلا جەودەت) بێ. شیعرەکە تەواو نەبووە.

٥- عرض شکران، بە زمانی فارسی، نووسینی (محمد میهری)، ل ٣٦-٣٧. نرخاندنێکی شیعری (بیدادی) یە، کە دەڵێ "از طرف ذی شرف یک سروری معظم و سیدی مبجل و مکرم ارسال شدەاند".ئەو کەسەش هەر دەبێ "عەبدوڵلا جەودەت" بێ، کە لەو سەردەمە شیعری رۆمانسیانە و نەتەوەییانەی بە زمانی تورکی و فەرەنسی و فارسی دەنووسی و بلاوی دەکردنەوە.

٦- ادبیات کردیەدن بعض نمونەلر، نووسینی (محمد میهری)، ل ٣٧-٣٨، دوو پارچە شیعری (مستەفابەگی کوردی) و (مەلا ئەحمەدی جزیری)، وێرای دێرپەدێر تەرجەمەکردنی تێکستەکان بۆسەر زمانی تورکی.

ژماره (٢): ٩ی شوباتی ١٣٣٥/١٩١٩

١- موجودیت حاضرەمز، بە زمانی تورکی، نووسینی (محمد میهری)، دوو لاپەڕە و نیو، لە شێوەی سەروتاردایە، باسی بارودۆخی «ئێستای» میللەتی کورد و کوردستان دەکا - بەتایبەتی لە ئێران و تورکیادا. وتارەکە تەواو نەبووە.
٢- تانکرید طفل... بە زمانی تورکی، نووسینی (عبدالواحد)، لاپەڕەیەک و نیو، وتارێکە باسی گیروگرفتەکانی تاکەکەسی مرۆڤی کورد دەکا، هەڵوێستی دەوڵەتە گەورەکانی دراوسێ و ئەورووپا لە ئاست میللەتی کورد.
٣- انباء ابناء الوطن، بە زمانی عەرەبی، نووسینی (سید محمد بن الشیخ سید عبدالقادر)، ل ١٦-١٧، باسی ئەو ئەنجوومەنە دەکا کە لە فەرەنسا پێک هاتووە بۆ لێکۆڵینەوە لە کێشەی میللەتی کورد و مافە مرۆڤایەتیەکانی گەلی کورد، هەوڵ و تەقەلای شەریف پاشا؛ داواکردن بۆ یەکگرتنی هێزە کوردیەکان.
٤- تحیە المحبە والوداد، بە زمانی عەرەبی، نووسینی (محمد)، ل ١٧-١٨، شیعرێکی ستوونییە، بیری کوردستانێتیی تێدا بەیان کراوە.
٥- وەظیفا مە چیە؟، بە زمانی کوردی، د. کرمانجی، نووسینی (ئەرواسی زادە محمد شفیق)، ل ١٨-١٩، وتارێکە باسی بارودۆخی گەلی کورد دەکا، ئەرکە رۆشنبیری و نەتەوەییەکانی مرۆڤی کورد لەو قۆناغەدا دیاری دەکا: چۆنیەتیی وەدەستهێنانی ئازادی و سەرفەرازی کوردستان.
٦- ادبیات کردیەدن بعض نمونەلر، نووسینی (م.م.) ل ١٩-٢١، بریتیە لە سێ پارچە شیعری (مستەفابەگی کوردی) و (جزیری) و (نالی) بە زمانی کوردی، وێرای دێربەدێر تەرجەمەی تێکستەکان بە زمانی تورکی (عوسمانی).
٧- اساس، (کورد) لساننە عائد قواعد صرفیە. مولفی (م.م.)، ل ٢١-٢٢، وتارێکە بە زمانی تورکی نووسراوە، لەبارەی رێزمان و زمانی کوردی. "وا تێ دەگەم پێشچاوخستنی کتێبێکە کە لەو کاتەدا لەبارەی رێزمان و زمانی کوردییەوە، لە نووسینی (م.م.) بلاو کراوەتەوە". وتارەکە تەواو نەبووە.
٨- عرفان، نووسینی (م.م.)، ل ٢٢-٢٣، وتارێکە بە زمانی تورکی، لەبارەی (فەرهەنگێکی کوردی- تورکی- عەرەبی- فارسی- فەرەنسی) بە ناوی (عرفان) لە نووسینی (م.م.) لەو ساڵەدا بلاو کراوەتەوە. هەروەها باسی دیالێکتیکە جۆراوجۆرە کوردیەکان دەکاو بە یەکتریان دەگرێ. وتارەکە تەواو نەبووە.
٩- کردستانە بر سیاحت، نووسینی (احمد وهبی خرپوطلی)، وتارێکە بە زمانی تورکی، باسی جوانی و جوگرافیای کوردستان دەکا. تەواو نەبووە.

ژماره (٣): ٢٥ی شوباتی ١٣٣٥/١٩١٩

١- مزایا و استعداد فطریمز، بە زمانی تورکی، نووسینی (محمد میهری)، ل ٢٥-٢٨، پاشماوەی وتارە درێژەکەی ژمارەی پێشووە؛ باسی مێژووی رۆشنبیری و

خاوەنی رۆژنامەکە:(محمد میهری)

ئەگەر چاوێک بە بزووتنەوە رۆژنامەنووسییەکەی سەرەتای ئەم سەدەیەدا بخشێنین، بۆمان دەردەکەوێ کە رۆڵی (محمد میهری) لە بزووتنەوە رۆشنبیرییەکەی ئەو سەردەمەدا، ئەگەر هاوشانی رۆڵی رووناکبیرانی وەکوو (عبدوڵلا جەودەت) و (عەبدولرەحمان بەدرخان) و (عەبدولکەریم سلێمانیەیی) و... ئەوانی تر نەبێ، ئەوا کەمتر نیە.

محمد میهری، جگەلەوەی خاوەن و بەرپرسیاری گۆڤاری "کوردستان" بووە و بەردەوام بە ناوی خۆی و بە نازناوی (کاکە حەمە) و (م.م.) بە زمانەکانی تورکی، کوردی، فارسی، عەرەبی وتاری بلاو کردۆتەوە، لە هەمان کاتدا نووسەرێکی زۆر چالاکیش بووە لە گۆڤاری ژین دا. جگەلەوەش لە هەموو ئەم کۆمەڵە و رێکخراوە رۆشنبیری، نیمچە سیاسیانەدا ئەندام بووە: کۆمەڵەی هێڤی (١٩١٣)، کۆمەڵەی تەعالیی کوردستان، کۆمەڵەی نەشری مەعاریفی کوردی (٢٠). چالاکانە خەباتی کردووە. لەبواری پەرەپێ سەندن و بووژاندنەوەی زمانی ستانداری کوردیش دا، وەک لەسەرەوەشدا باسمان کرد: دوو کتێبی نووسیوە و بلاوی کردوونەتەوە، یەکەمیان (مقدمه العرفان)، دووەمیان (اساس) (٢١).

محمد میهری (١٨٨٩- ١٩ی نیسانی ١٩٥٧)، لە گوندی "دشە"ی سەر بە ناوچەی جوانرۆ، لە کوردستانی ئێراندا لە دایک بووە. لە هەرەتی گەنجی دا روو دەکاتە شاری فارس، ئنجا (ئەرزەرۆم)، لەوێوەش لە ساڵی ١٩١٢ دەچێتە ئەستەمبوڵ، تێکەڵ بە رووناکبیر و شۆرشگێرە کوردەکانی ئەوێ دەبێ. ئاشنایەتیەکی تایبەتی و پتە و لەگەڵ (ئیسماعیل حەقی بابان) پەیدا دەکا کە لەو دەمەدا وەزیری (مەعاریف) بوو، هەر بە یارمەتی ئەویش، وەکوو پیرەمێردی شاعیر لە کۆلێژی "حقوق" دەخوێنێ و لە کۆتایی دا دیپلۆم وەردەگرێ و دەبێتە (پارێزەر) (٢٢).

مامۆستا (نەجمەدین مەلا) لەبارەی ئەو رووناکبیرەوە دەڵێ:"هەمیشە بیروهۆشی لەلای نیشتمان و نەتەوەکەی بوو، ئاواتی سەربەرزی و ئازادی کوردستان بوو" (٢٣).

بەپێی هەندێ سەرچاوە، هەمان ئەم محەمەد میهرییە، تا ساڵانی پەنجاکانیش لە نووسین و چالاکی نەکەوتووە: چەندین وتاری بایەخداری لەبارەی زمانی یەکگرتووی کوردیەوە لە گۆڤاری (هەتاو) ی هەولێردا بلاو کردۆتەوە (٢٤).

خۆی رۆیشت، بە یەکجاری دنیای بەجێ هێشت، بەلام کۆمەڵێک بەرهەم و یادگاری جوانی لە دووای خۆیەوە بۆمان بەجێ هێشت، لەوانە: گۆڤاری «کوردستان» ١٩١٩-١٩٢٠، کە بووە سمبوولێک، نیشانەیەک... لە رەوتی تازەبوونەوەی فەرهەنگیی نەتەوەکەماندا.

دەی – وەک پێویستە با بە چاوێکی پڕ لە رێزەوە، لاپەرەکانی "کوردستان"، کوردستانی بریندار و راچەنیوی ئەو سەردەمە، هەڵبدەینەوە...

٣- وەک لەرێگای خوێندنەوەی گۆڤارەکە خۆیەوە بۆمان دەردەکەوێ: لەسەدا شەست و پێنجی نووسراوەکانی گۆڤارەکە بە زمانی (تورکی) نووسراون. ئەوانی تریش بە زمانەکانی کوردی، عەرەبی، ئنجا فارسی.

ئەم دیاردەی زۆرتر بە تورکی نووسینە، ئەوەمان نیشان دەدا کە رۆشنبیرە کوردەکانی ئەو سەردەمە، یا راستتر ئەوانەی کە لە گۆڤاری "کوردستان" دا نووسیویانە، سەرەرای توانا و بەهرە و بیری کوردانەیان، سەرەرای تێکۆشان و ئیلتیزامی دڵسۆزانەیان بۆ نەتەوەکەیان، بەڵام لەگەڵ ئەوەشدا دەبینین هێشتا هەر پابەندی رۆشنبیری و زمان و کولتووری میللەتەکانی دراوسێن، بەتایبەتی "تورک": زەمینەکەیان هێشتا هەر زەمینەیەکی «عوسمانلی» یا زەمینەیەکی کلاسیکییە؛ نەیانتوانیوە خۆیان بە تەواوی و بەشێوەیەکی دابڕ لە داب و نەریتە کلاسیک و عوسمانیەکان جیا بکەنەوە، بۆ نموونە، بەلای کەمەوە، بتوانن کەوا سوود لەو زمانە کوردییە ئەدەبییەی پێش خۆیان (١٨٩٨-١٩١٨) وەربگرن و پەرەی پێ بدەن؛ ناوەرۆکی راپەرین و بزووتنەوە رووناکبیری و نەتەوەییەکە لە ئاستێکی زمانەوانیی پێشکەوتووتر و فراوانتر (لەوەی کە هەیە) عەکس بکەنەوە. ئەمەش دیاردەیەکە، نەک تەنیا گۆڤاری "کوردستان" بەڵکو گۆڤاری "ژین" و گەلێ گۆڤاری دیکەی ئەو سەردەمە دەگرێتەوە. دەبینین خاوەنی گۆڤارەکە، محمد میهری (خۆی)، کە یەکێکە لە چالاکترین رووناکبیرە دڵسۆز و شارەزاترین زمانەوانەکان، کەچی *لەسەدا* نۆەتی وتارەکانی خۆی بە زمانی تورکی نووسیون (١٨).

کەواتە ئەگەر تازەکردنەوەی زمانی نووسین، بە مەرجێکی بنچینەیی دابنرێ لە هەر راپەرینێکی فەرهەنگی دا، ئەوا دەبێ بڵێین کە گۆڤاری "کوردستان" -کە تەنیا لە سەدا پازدەی بابەتەکانی بە زمانی کوردی نووسراون - بینینێکی یەکلایەنەی هەبووە بۆ ئەو شۆڕشە فەرهەنگییەی کە ویستوویەتی بەرپای بکات (١٩).

بەپێی ئەو پێنج ژمارەیەی کە لەلای ئێمەدان (ژمارە ٢، ٣، ٤، ٥، ٦) خشتەی بەکارهێنانی زمانەکان بەم شێوەیەن: (٣٧) بابەت بە زمانی تورکی، (٩) بابەت بە زمانی کوردی، (٤) بابەت بە زمانی عەرەبی، (٣) بابەت بە زمانی فارسی.

لەبارەی نووسەرە هەرە چالاک و فرە بەرهەمەکانی کە نووسراوی خۆیان لە گۆڤاری "کوردستان" دا بڵاو کردۆتەوە - بە پێی ژمارەکانی (٢، ٣، ٤، ٥، ٦، ٨، ٩)- ئەمانەن:

١- محمد میهری، کە بە شێوەیەکی زۆر بەبڕشت و چالاکانە وتار و بەرهەمی تێدا بڵاو کردۆتەوە: زیاتر لە (٢٠) وتار و بابەت.

٢- أ. ع. بەرزنجی زادە (عبدالواحد برزنجی زادە) یان بە تازناوی (لاوێ دەلال): زیاتر لە (٤) ماددەی بڵاو کردۆتەوە.

٣- ئەحمەد وەهبی خەرپوتلی: زیاتر لە (٣) ماددە.

هەروەها (محمد شەفیق ئەرواسی زادە)، (ئەحمەد عارف)، (سالح بدرخان)، (کەمال فەوزی خێزانی زادە)... لە شاعیرانیش: (مستەفا شەوقی)، کە لە هەموو "شاعیرەکان" زیاتر، بەرهەمی خۆی بە زمانی کوردی بڵاو کردۆتەوە.

"دنیووەر" رووناکبیرە نەبووایە، ئەوا بزووتنەوە ڕۆژنامەگەرییەکەش و چووزەرەی تازەبوونەوە ئەدەبییەکەشمان لەدایک نەدەبوون، یا بەلای کەمەوە گەلێک درەنگتر لەوەی کە بوو دەکەوتنەوە.

یەکێک لە نیشانە و بەڵگەکان بۆ بەرەوانیشاندانی ئەم قسەیەی سەرەوەمان، ئەوەیە کە لە گۆڤاری «کوردستان» دا (هەروەها لە هەموو گۆڤارەکانی دیکەی ئەو سەردەمەدا) دەبینین، نەک هەر تەنیا وتار و لێکۆڵینەوەکان ناوەرۆکێکی ناسیۆنالیست و کوردانەیان هەیە، بەڵکو تەنانەت هەموو ماددە و نووسراوە ئەدەبییەکانیش، بۆ نموونە بڕوانە شیعرەکانی (مستەفا شەوقی: ژمارە ٥ لاپەڕەی ٥٦؛ ژمارە ٦ لاپەڕەی ٦٩؛ ژمارە ٩ لاپەڕەی ١١٥) هەروەها شیعرەکانی دیکەی ژمارە (٦) و (٩)، تەنانەت هەموو ئەو شیعرانەش کە بە زمانەکانی تورکی و فارسی و عەرەبی نووسراون (ژمارە ٢، ٤، ٦...هتد).

سەرتاسەری شیعر و بەرهەمە ئەدەبی و زمانەوانیە بڵاوکراوەکانی ناو گۆڤاری کوردستان (١٩١٩-١٩٢٠) لە سەرچاوەی بیرێکی ناسیۆنالیستانەی ڕاچڵەکیوی سازگارەوە ئاویان خواردۆتەوە. شیعر، هەروەها بەشێوەیەکی گشتی "ئەدەبیات" لەم گۆڤارەدا و لەو سەردەمەدا، بە پلەی یەکەم و لە پێشەوەی هەموو شتێکی دیکەوە، پابەند بووە بە بیری نەتەوەخوازی و سەلماندنی ناسنامەی نەتەوەییمان. شیعرو ئەدەبیات، بە ئیلهامی، هەروەها لەپێناوی ئەو بیرە نەتەوەییەدا نووسراون (١٧).

گۆڤاری «کوردستان» وەکوو هەر گۆڤار و ڕۆژنامەیەکی دیکەی ئەو سەردەمەی ڕاپەڕینی کورد، گرنگیی یەکەمی، بە پلەی یەکەم لەوەدایە کە بزووتنەوە نەتەوەخوازییەکەی ئەو سەردەمەی کوردستانی، لە ئاستی سەرەزارەکییەوە، لە ئاستی کارەسات و ڕاپەڕینە ڕۆژانەکانەوە گەیاندۆتە ئاستی نووسین، ئاستی بیرکردنەوە، ئاستی هۆشیاری و ئایدیۆلۆژیا: ئاستێک کە ئیتر "مێژوونووسەکان" ئەم بزووتنەوە ڕۆژنامەنووسییە، ئەم نووسینانە، بکەنە "بەڵگەیەک" سەنەدێک، نیشانەیەک.

٢- خاسیەتێکی دیکەی ئەم بزووتنەوە نەتەوەخوازییەی کە بەشێوەی نووسین و وتاری جۆراوجۆر لە گۆڤاری «کوردستان» دا بڵاو بۆتەوە: جیاوازیی دیدی سیاسی و فرەیی بیر و بۆچوونەکانە.

دژایەتی و ناکۆکیی بیروڕاکان، دەمەقاڵێ و گفتگۆکردن، ڕەخنەگرتن ، وەڵامدانەوە، لەسەر لاپەڕەکانی گۆڤاری "کوردستان" دا تا بڵێیی گەرم و توندوتیژ بووە؛ بۆ نموونە لە ژمارە (٣)، لاپەڕی ٣٠-٣٢، لاپەڕی ٢٨-١٩، گفتگۆ و دەمەقاڵێیەکی زۆر توندوتیژ لەنێوان دوو ئایدیۆلۆژیای جیاوازدا لەبارەی مەسەلەی (سەربەخۆیی کوردستان) بڵاو کراوەتەوە: بیری چارەسەرخوازی (ڕیفۆرمیسم) لەهەمبەر بیری گۆڕانخوازی شۆڕشگێڕانە.

لەلایەکی دیکەشەوە دەبینین، لە هەمان کاتدا، بیری (پان ئیسلامی) و ڕێبازە دینییەکانیش، ڕووبەرێکی فراوانیان لەسەر لاپەڕەکانی گۆڤارەکەدا داگیر کردووە.

ئەم دیاردەیە، لەلایەک دیموکراسی بوونی دەستەی نووسەرانی گۆڤارەکە و ڕێبازەکەیان نیشان دەدا، لەلایەکی دیکەشەوە جیاوازیی ئەو زەمینە "چینایەتی" یا "ئایدیۆلۆژی" یەی کە توێژی ڕووناکبیرانی کورد لەو سەردەمەدا، هەناسەیان تێدا هەڵمشتوە.

شارەزاییەکی زیاتر و فراوانتر لەبارەی بڵاوکراوەکانی ئەو سەردەم و هەروەها لەبارەی ژیانی رۆشنبیری و ئەدەبیی ئەوکات پەیدا بکەین.
جگە لە پڕوپاگاندە و لەسەرنووسینی ئەو کتێبانەی کە لە بیبلۆگرافیاکەدا پیشانمان داون، گۆڤاری «کوردستان» لەسەر بەرگی دوواوەی گۆڤارەکەدا، زۆر بەکورتی پڕوپاگاندەی بۆ هەندێ بڵاوکراوەی تریش کردووە، لەوانە:
١- عەقیدا مەلا خەلیلی سێرتی: منظوم علم حال و علم اخلاق.
ئەم کتێبە بەپێ بەرواری دەرچوونی گۆڤاری «کوردستان» پێویستە لەپێش ساڵی (١٩١٩) دا، یا هەر لە ساڵی (١٩١٩) دا دەرچووبێ. مامۆستا (نەریمان) دەڵێ کە ئەم کتێبە (نهج الأنام) (١٣) چەند باسێکی ئایینییە بە شیعر داڕێژراوە، بە زاراوەی کرمانجی ژووروو لە ٢٣ لاپەڕەدا، لە ساڵی ١٩١٨ لە ئەستەمبوڵ، لە چاپخانەی ئەوقافی ئیسلامیەدا چاپکراوە (١٤).
٢- عقیدا ملا احمدی خانی: منظوم علم حال و علم اخلاق.
بەپێی ئاگاداریی مامۆستا نەریمان، ئەم کتێبە، بە ناونیشانی "عقیدە الایمان" نووسراوی (ئەحمەدی خانی)، بە شیعر رێکخراوە، لە (٦) لاپەڕەدا، لە ئەستەمبوڵ، لە چاپخانەی «ئەوقافی ئیسلامیە» دا چاپ و بڵاو کراوەتەوە (١٥).
٣- عەقیدا کوردان. عبدالرحیم افندی: منظوم علم حال و علم اخلاق.
مامۆستا نەریمان لە کتێبی بیبلۆگرافیاکەی دا، باسی ئەم کتێبەی نەکردووە، بەڵام ئەگەر سەیرێکی بەرگی دوواوەی ژمارە (٨) ی گۆڤاری (ژین) بکەین، بە ئاسانی بۆمان دەردەکەوێ کە ئەم کتێبە نووسراوی شاعیر و نووسەری نوێخواز (عەبدولرەحیم رەحمی هەکاری) یە (١٦). لە بەرگی دوواوەی ژمارە (٨)ی گۆڤاری (ژین) دا، بە زمانی تورکی، باسی ناوەرۆکی ئەم کتێبە بە درێژی کراوە.
٤- مقدمە العرفان، م.م. "محمد میهری"، بە تورکی نووسراوە "پەیامێکە، مەبەستی: یەکگرتنی زمانی ئەدەبیی کوردییە".
هێندەی ئاگام لێ بێ: جارێ هیچ کەسێک ئەم کتێبەی نەدۆزیوەتەوە. بەڵام هەندێ سەرچاوە هەن کە بە درێژی باسی ئەم کتێبەیان کردووە، لەوانە: گۆڤاری ژین (١٩١٨-١٩١٩) ژمارە (٨) بەرگی دوواوەی، هەروەها گۆڤاری کوردستان (١٩١٩-٩١٩٢٠) ژمارە (٢) و (٤).

چەند سەرنجێکی دیکەی گشتی لەبارەی رۆڵی گۆڤاری «کوردستان»:

١- وەک لەسەرەوەش دا پەنجەنومامان کرد: گۆڤاری کوردستان (١٩١٩-١٩٢٠) لەپاڵ بڵاوکراوەکانی دیکەی ئەو سەردەمە، یەکێکە لەو گۆڤارە کوردییانەی کە بە شێوەیەکی زۆر قووڵ و فراوان، بیری نەتەوەباوەری (ناسیۆنالیست) ی کوردیان تێدا خراوەتە روو. راستییەکەشی، ئەم بیرە نەتەوەباوەری (ناسیۆنالیستی) یە، لەو قۆناغی پێگەیشتن و فراژووبوونەی خۆی دا، بزوێنەری هەرە بنچینەیی و هەرە لەپێشەوەی بزووتنەوە ئەدەبی و رۆژنامەگەرییەکە بووە. ئەگەر سەرهەڵدان و نەشونوماکردنی ئەو بیرە ناسیۆنالیستییە نەبووایە، ئەگەر خەماڵنی ئەو توێژە

خۆیان ناچن. جگە لەوەش بە زمانێکی کوردیی خۆش و پاراو نووسراوە.

ئەم پارچە شیعرەی منداڵان، زیرەکیی نووسەر و هۆشیاریی سەردەمەکەمان بۆ دەردەخا کە هەر لەوساوە بایەخی بە منداڵ، بە گۆشکردنی هۆشیارانەی نەوەی تازە داوە. «بڕوانە پەراوێزی ژمارە ٢٥»

٢- وەرگێڕان لە زمانی کوردییەوە بۆ زمانی بێگانە:

هێندەی ئاگامان لێ بێ: یەکەمین بەرهەمی نووسراوی بێگانە کە تەرجەمەی سەر زمانی کوردی کرابێت و لە ڕۆژنامان دا بڵاو بووبێتەوە: دوو هەواڵدانی (غ. مزداني)یە، کە لە گۆڤاری ڕۆژی کورد (١٩١٣) بڵاو کراونەتەوە؛ یەکەمیان شیعرێکی تورکیی شاعیری تورک (محمد عاكف)، دووەمیشیان وتارێکی (محمد عبده) یە، لە ژمارە (٢) و (٣) ی گۆڤارەکەدا بڵاو کراونەتەوە و بە یەکەمین دوو تێکستی تەرجەمەکراو لە زمانێکی بێگانەوە بۆسەر زمانی کوردی لە قەڵەم دەدرێن (٩). بەڵام وەرگێڕان لە زمانی کوردیەوە بۆسەر زمانێکی بێگانە - لە مێژووی ڕۆژنامەگەریی کوردیدا، لە گۆڤاری «کوردستان» دا (١٩١٩-١٩٢٠) بە شێوەیەکی زۆر خەست و دیار و فراوان وەدیار دەکەوێ. ئەم شەپۆلەش لەسەرەتادا لە ڕێگای گۆڤاری ژین - ەوە دەستی پێ کرد.

محەمەد میهری، بەڕێوەبەر و خاوەنی گۆڤاری «کوردستان» خۆی، دەکرێ بە یەکەمین وەرگێڕی کورد لە قەڵەم بدرێ، کە لە گۆڤاری "کوردستان" دا هەوڵی داوە بۆ یەکەمین جار نموونەکانی شیعری کلاسیکی کوردی تەرجەمە بکاتە سەر زمانی تورکی و بڵاویان بکاتەوە (١٠). دووای ئەمیش، شاعیری نوێخواز (مستەفا شەوقی) هەندێ لە شیعرەکانی خۆی وەرگێڕاوەتە سەر زمانی تورکی و لە ژمارە (٥) و (٦) ی گۆڤارەکەدا بڵاوی کردوونەتەوە.

بەم شێوەیە دەبینین کە تەرجەمە کردنی ئەدەبیاتی کوردی (بەتایبەتی شیعری کلاسیکیی کوردی) بۆ سەر زمانی تورکی، ڕووبەرێکی فراوانی لەسەر لاپەڕەکانی گۆڤاری «کوردستان» دا داگیر کردووە. ئەمەش بەمەبەستی ئەوە کراوە کە ناسنامەی ئەدەبی و ڕۆشنبیریی و نەتەوەییمان، لای خوێنەران و ڕووناکبیرانی تورک و غەیرە تورک، ئاشکرا ببێت و بسەلمێ.

لەڕووی کاری ڕۆژنامەگەری و تەکنیکی ڕۆژنامەگەریشەوە، پێشچاوخستنی ئەم دوو خاڵە بە گرنگ دەزانین:

٣- گۆڤاری کوردستان، وێڕای ڕۆژنامەی «تێگەیشتنی ڕاستی»، یەکەمین گۆڤاری کوردییە کە تەکنیکی چاوپێکەوتنی ڕۆژنامەنووسیی بڵاو کردۆتەوە (١١). لە ژمارە (٨)ی گۆڤاری کوردستان دا، لە ڕۆژی ٢٨ی مانگی شەعبانی ١٣٣٧ (١٩١٩)، چاوپێکەوتنێکی ڕۆژنامەنووسی، لەگەڵ سیاسەتمەدار (مستەر ئارتوور پوتورد) ساز کراوە و لە لاپەڕەی یەکەم دا بڵاو کراوەتەوە(١٢).

٤- گۆڤاری «کوردستان» وێڕای ژین (١٩١٨-١٩١٩)، یەکێکە لە یەکەمین ئەو گۆڤارانەی کە پڕوپاگاندە و هەڵسەنگاندن و پێشکەشکردنی کتێب و بڵاوکراوە کوردییەکانی ئەو سەردەمەی، لەسەر لاپەڕەکانی خۆی دا و هەروەها لەسەر بەرگی دووەوەی گۆڤارەکەدا بڵاو کردبێتەوە. ئەم دیاردەیە، هەڵبەتە یارمەتیمان دەدا کە

جۆرە دۆکیوومەنت و گۆڤارانەی ئەوکات (لەوانەش: گۆڤاری کوردستان) ساغ دەکرێنەوە. چونکە ئەم هەواڵ و باس و خواسانە، بە شێوەیەکی راستەوخۆ، لە قووڵایی سەردەم و رووداوەکان خۆیانەوە، جگە لەمەش بە قەڵەمی نووسەر و «مننەوەر» و سیاسییەکان خۆیانەوە نووسراون.

بایەخی زمانەوانی و رێنووس و زمانی ستانداری کوردی، کە لە نووسینە کوردییەکانی گۆڤارەکەدا بەرچاو دەکەوێ، دەشێ بۆ توێژەری کورد، بە پلەی سێیەم دابنرێ. لێکۆڵینەوە لە رێنووس، زمانی ستاندار، زاراوە جۆراوجۆرەکانی لە نووسراوە کوردییەکاندا بەکارهاتوون؛ هەروەها بەراوردکردنیان لەگەڵ رێنووس و زمانی ستانداری کوردیی بڵاوکراوەکانی پێش ساڵانی (١٩١٩): سرووشتی ژیانی زمانەکەمان و (قۆناغی پەرەسەندنەکەی) پیشان دەدا لەو سەردەمەدا؛ هەروەها پەیوەندیی ئاستە جۆراوجۆرەکانی زمانەکەمان بە زمانی ستانداری کەلە دراوسێکانمانەوە.

جگەلەمانەش، لەم گۆڤارەدا- وەک لە بیبلۆگرافیاکەدا دەردەکەوێ- زیاتر لە (٦) وتار بە زمانی تورکی لەبارەی گیروگرفتەکانی زمانی نووسینی کوردی و لەبارەی دیالێکتە جۆراوجۆرە کوردییەکانەوە بڵاو کراونەتەوە، کە بە لێکۆڵینەوەی زمانەوانی و "بەراوردکاریی" زۆر دانسقە دەژمێردرێن.

بایەخی ئەدەبی گۆڤاری کوردستان (١٩١٩-١٩٢٠)، بۆ نموونە لەچاو بایەخی گۆڤاری ژین (١٩١٨-١٩١٩) دەشێ کەمتر بێ: نەک تەنیا لەبەرئەوەی گۆڤاری «کوردستان» لەرووی چەندێتییەوە بابەتی ئەدەبیی کەمتر تێدایە، بەڵکو لەبەرئەوەش کە ئەم گۆڤارە، بەشێوەیەکی بنچینەیی، زیاتر پابەندی بڵاوکردنەوەی ئەدەبیاتی کلاسیک، بەتایبەتیش "شیعری کلاسیک" بووە. لەکاتێکدا کە گۆڤاری (ژین) بایەخێکی فراوان و تایبەتی و ئارەزووومەندانەی قووڵی بە (داهێنانی تازە)، بە ئەدەبیاتی تازە داوە؛ ویستوویەتی بەهرە و توانا تازەکان بتەقێنێتەوە، شێوازی تازە و رەگەزی ئەدەبیی تازە بێنێتە ئاراوە؛ ئەدەبیاتێکی تازە بگەشێنێتەوە.

راستییەکەشی، گۆڤاری کوردستان (١٩١٩-١٩٢٠)، وەک خۆشیان لە ژمارە (٦) بەولاوە لەسەر بەرگی گۆڤارەکە پێشانیان داوە، زیاتر گۆڤارێکی سیاسی، ئیجتیماعی..." بووە. بەڵام لەگەڵ ئەوەش، لێرەدا پێویستە پەنجەنومای هەندێ راستی و دیاردەی ئەدەبیی گرنگ بکەین، کە لە گۆڤارەکەدا خۆیان دەنوێنن:

١- لەسەر لاپەرەکانی گۆڤاری «کوردستان» دا، بۆ یەکەمین جار لە مێژووی ئەدەبیاتی کوردی دا، پارچە شیعرێک بۆ منالان نووسراوە و لە ژمارە (٦) ی لاپەرە (٧٠-٧١) دا بڵاو کراوەتەوە.

هێندەی ئاگامان لێ بێ، لە گۆڤار و بڵاوکراوەکانی پێش ئەم گۆڤارەدا، بەرهەمی نوسراو بۆ منالان بڵاو نەکراوەتەوە، بۆیە دەکرێ ئەم پارچە شیعرەی مندالان، کە بە قەڵەمی «زینۆ» ناوێکەوە نووسراوە، بە یەکەم بەرهەمی نووسراو بۆ مندالان لە قەڵەم بدرێ لە مێژووی ئەدەبیاتی کوردیدا.

ئەم پارچە شیعرە کە بە ناونیشانی (دەلالیا زارۆکان) بڵاو کراوەتەوە، بە شێوە و تەکنیکی تازە نووسراوە: لەسەر شێوەی (چوارپارەیی) لە چوار کۆپلەدا. قافیەکانی هەر کۆپلەیەک سەربەخۆن، لە قافیەکانی کۆپلەی پێش خۆیان و پاش

بدرێنەوە. بۆ ئەم مەبەستەش، لەبارەی ئەم ژمارانەی کە لەلای ئێمەدا هەن (ژمارە ٢، ٣، ٤، ٥، ٦) هەر رۆشنبیرێک، دەزگایەک، توێژەرێک بیەوێ کاریان لەسەر بکا یا بیەوێ لە چاپیان بداتەوە، تکا دەکەین با بە ئادرێسی گۆڤاری (هیوا) پەیوەندیمان پێوە بکات، بۆئەوەی بە خۆشحاڵیەوە فۆتۆکۆپیی هەموو ئەو ژمارانەی بۆ بنێرین (٧).

بایەخی گۆڤاری «کوردستان»

دەشی بایەخی هەرە لەپێشەوەی گۆڤاری کوردستان (١٩١٩-١٩٢٠) بایەخە مێژووییەکەی بێ. وەک دەرکەوتووە ئەم گۆڤارە، یەکسەر دووای کۆتایی هاتنی جەنگی جیهانیی یەکەم بڵاوکراوەتەوە. ئەو سەردەمەش (١٩١٩-١٩٢٣)، کە بە سەردەمی دابەشکردنی تازەی کوردستان، بە سەردەمی پلانە گڵاوەکانی دەوڵەتە داگیرکەرەکانی کوردستان دەناسرێتەوە. کوردستان - لەو سەردەمەدا - بە ژیانێکی هەژێند و پڕ لە کارەساتی جۆراوجۆری ئەوتۆدا رەت دەبوو، کە هەر هەفتەیەکی ژیانی: راپەڕینێک بوو، هەر مانگێکی ژیانی: لاپەڕەیەکی درەوشاوەی مێژوویی تازە بوو، گۆڕانکارییەک بوو، هەنگاوێکی شێرانە و سەرازایانەی تازە بوو. هەموو ئەم رووداوانەش - لە تورکیا، عێراق، ئێران، سووریە، میسر.. بە شێوەیەکی ورد و فراوان، ئاوێنەئاسا لەم گۆڤارەدا باس کراون و تۆمار کراون؛ هەر لە دەنگوباسی کۆمەڵە رۆشنبیری و سیاسییە کوردستانییەکانەوە بگرە- لە (ئەستەمبوڵ) و (دیاربەکر) تا دەگاتە باروودۆخە کۆمەلایەتی و شۆرشخوازییەکەی خەڵکی کورد لە کوردستان دا هەروەها دەنگوباسی هەوڵ و تەقەلاکانی (شەریف پاشا) بۆ سەربەخۆیی کوردستان، لە کۆنفرانسی ئاشتی- لە پاریس دا (٨).

بەم شێوەیە، گۆڤاری کوردستان (١٩١٩-١٩٢٠)، بە یەکێک لە گەورەترین و گرنگترین ئەو دۆکیوومەنت و بەڵگەنامە مێژووییانە لە قەڵەم دەدرێ، کە مێژوونووسی کورد بیەوێ لە ژیانی کۆمەلایەتی و مێژوویی و سیاسیی ئەو قۆناغە گرنگەی گەلی کورد بکۆڵێتەوە.

یەکێک لە بایەخە گرنگەکانی دیکەی گۆڤاری «کوردستان» : بایەخە فیکری/ رۆشنبیرییەکەیەتی. توێژەر، لەرێگای خوێندنەوەی ناوەرۆک و وتارە جۆراوجۆرەکانی ئەم گۆڤارەوە، بە ئاسانی بۆی دەردەکەوێ کە شێوازی بیرکردنەوەی سیاسەتمەدارانی کورد، ناوەرۆکی بیری نەتەوەخوازی "ناسیۆنالیستی"ی رووناکبیرانی کورد، یان وەک مارکسیستەکان پێیان خۆشە بڵێن "وردە بۆرژوای کورد" لەو سەردەمەدا چۆن بووە؟ چی بووە؟ رادەی خەملین و پێشکەوتنی، هەروەها پەیوەندیی بە جەماوەر و گەلەوە، بە خەباتی رزگاریخوازیی کوردستانەوە، لە چ ئاستێکدا بووە؟! ئەو توێژە رووناکبیر و نووسەر و سیاسەتمەدارە کوردەی ئەو سەردەمە، کێ بوون؟! کۆمەڵە و رێکخراوە رۆشنبیری و نیمچە سیاسییەکانیان !؟ سەر بە کام چینی کۆمەڵ و چ رێبازێکی فیکری بوونە !؟ وەلامی دەیان پرسیاری دیکەی فیکری و سیاسی و کۆمەلایەتی و... هتد، تەنیا بە خوێندنەوەی وردبینانەی ئەم

دەزانین: پێشچاوخستنی چەند زانیاری و تێبینییەکی بنەڕەتین، کە لەم بارەیەشەوە پشتمان بە دوو سەرچاوەی باوەڕپێکراو بەستووە:
یەکەم: گۆڤارەکە خۆی "واتە ئەو ژمارانەی لەبەردەستی ئێمەدان"، دووەم: ئەو نووسەرانەی تاک و تووک ژمارەکانی ئەم گۆڤارەیان لەلا هەیە یا دیویانە.
١- گۆڤاری «کوردستان» سەرنووسەرەکەی : محەمەد شەفیق ئەرواسی زادە، خاوەنی ئیمتیاز: محەمەد میهری، هەفتەی جارێک بڵاو دەکرێتەوە- بە زمانی تورکی و کوردی و عەرەبی و فارسی. نوسخەی بە پێنج قرووشە.(ئەم زانیارانەی سەرەوە، لەسەر بەرگی هەموو ژمارەکانی ٢/٣/٤/٥/٦ هەروەها ژمارەکانی ٨ و ٩ بەڕوونییەوە تۆمار کراون و دووپات دەبنەوە) (١).
ژمارەی یەکەمی ئەم گۆڤارە بەپێی بۆچوونی د. کەمال مەزهەر- کە گوایە ژمارەی یەکەمی ئەم گۆڤارەی دیوە - لە ڕۆژی ٢٨ی ربیع الاخری ١٣٣٧، واتە لە ڕۆژی ١٩١٩/١/٣١ بڵاو بۆتەوە (٢). لەبارەی شوێنی دەرچوونی گۆڤارەکەشەوە، ئەوا تەبای بەشی هەرە زۆری گۆڤار و بڵاوکراوەکانی دیکەی ئەوکات، هەروەها بەپێی چەند زانیاری و ناوبردنی هەندێ ئادرێسی دیاریکراو، بەپێی پڕوپاگەندە و بابەتەکانی دیکەی ناو گۆڤارەکە، ساغ دەبێتەوە کە ژمارە ناوبراوەکانی ئەم گۆڤارە لە شاری ئەستەمبوڵ لە تورکیا بڵاو کراونەتەوە. لە لاپەڕەی کۆتاییی هەر ژمارەیەکی گۆڤارەکەش دا نووسراوە، کە لە چاپخانەی «نجم استقبال» دا چاپ کراوە. بەداخەوە جارێ تاکو ئێستا، بۆمان ساغ نەکراوەتەوە داخوا ئەم چاپخانەیەی «نجم استقبال» ـە هی چ کەسێک و چ کۆمەڵەیەک بووە!؟ (٣)
٢- لە ژمارە (٦) بەولاوەی سەربەرگی گۆڤارەکەدا، بە تورکی نووسراوە: "گۆڤارێکی سیاسی، کۆمەلایەتی، ئەدەبی، زانستییە..." ئەمەش، وا تێ دەگەین - بەراستی: پێناسەیەکی پڕبەپێستی گوڤارەکەیە. لەبارەی ئەوەشەوە کە ئەم گۆڤارە بە هەمووی داخوا چەند ژمارەی لێ بڵاو کراوەتەوە، بیروڕای جیاواز هەیە: مامۆستا عەلائەدین سجادی و کاک جەمال خەزنەدار لەسەر ئەو باوەڕەن کە ئەم گوڤارە «٣٧» ژمارەی لێ بڵاو کراوەتەوە، بەلام بە بێ ئەوەی کە خۆیان تەنانەت لاپەڕەیەکیشیان بۆ بەڕاست نیشاندانی ئەم قسەیەیان لەبەردەست بووبێ. مامۆستا کەمال مەزهەریش، دەڵێ: (دوا ژمارەی کە من دیومە ژمارە ١٩ی ساڵی دووەمی لەسەر نووسراوە، کە ڕۆژی ٧ی رەجەبی ١٣٣٨ (١٩٢٠) ی لەسەر نووسراوە) (٤).
٣- جێی سەرنجە کە د. مارف خەزنەداریش لە ساڵی ١٩٧٧ دوو ژمارەی (٨) و (٩)ی ئەم گۆڤارەی دۆزیبۆوە و هەمان ساڵ لە گۆڤاری "ڕۆژی کوردستان" دا بڵاوی کردبوونەوە (٥). هەروەها مامۆستا "مەحموود لەوەندی" ش، لە کتێبە بەنرخەکەی خۆی دا دوو ژمارەی دیکەی (٩) و (١٣) ی خستۆتە سەر هەموو ئەم ژمارانەوە، کە لەوە دەچێ ئەم دوو ژمارەیەشی دیبێ یا هەبێ(٦).
سەرەنجام: بەپێی ئەو هەوڵ و کۆششانەی کە تا ئێستا بۆ دۆزینەوەی ژمارەکانی ئەم گۆڤارە لەلایەن ڕۆشنبیرانی کوردەوە دراون، دەگەینە ئەو ئەنجامەی کە ئەمڕۆ نزیکەی نیوەی ژمارەکانی ئەم گۆڤارە لەبەردەستن و دۆزراونەتەوە: هەر ژمارەیەک، دوو ژمارەیەک، یا کۆمەڵە ژمارەیەک لەلای کەسێک و لە وڵاتێکن. هیواداریین لە داهاتوودا هەموو ئەم ژمارانە لە یەک بەرگ دا کۆ بکرێنەوە و سەرلەنوێ لە چاپ

پێنج ژمارەی گۆڤاری «کوردستان» ١٩١٩ - ١٩٢٠

فەرهاد پیرباڵ

گۆڤاری «کوردستان» ١٩١٩-١٩٢٠ یەکێکە لەو گۆڤارە هەرە دانسقە و بایەخدارانەی کە لە سەرەتای ئەم سەدەیەدا، لەگەڵ کاروانی "کوردە لاوەکان" دا لە تورکیا بڵاو کراوەتەوە. نوسخەکانی ئەم گۆڤارە، وەکو هەر بڵاوکراوەیەکی دیکەی ئەو سەردەمە، کاتی خۆی کەوتوونەتە بەر زەبروزەنگ و شاڵاوی پۆلیسە تورکەکانی «ئەتاتورک»، سەرتاپا لە خەڵکی قەدەغە کراون، یانیش بوونەتە خۆراکی ئاگر؛ ئەمڕۆ چنگ خوێنەرانی کورد ناکەون. خۆشبەختانە لە کتێبخانەی زمانە ڕۆژهەڵاتیەکانی پاریسدا Bibliotheque interuniversitaire des Langues Orientales کە بە کتێبخانەی «لانگزۆ» ناسراوە پێنج ژمارەی ئەو گۆڤارەمان دۆزیوەتەوە. وا لێرەدا ناوەڕۆکەکەی، وێڕای کورتە پێشەکیەک، دەکەینە چەپکە گوڵێک و پێشکەش بە خوێنەران و توێژەرانی کوردی دەکەین.

چەند وشەیەکی پێویست:

بەپێی ئاگاداریمان و دوای چاوخشاندنێکی خێرا بە سەرچاوەکاندا، بۆمان دەرکەوت کە کۆمەڵێک کوردناسی فەرەنسی و هەروەها هەموو ئەو نووسەرە کوردانەی کە خۆیان بە مێژووی ڕۆژنامەگەریی کوردیەوە خەریک کردووە، کەم یا زۆر، ڕاست یا چەوت، «بەشی هەرە زۆریشیان بێ ئەوەی چاویان بە هیچ ژمارەیەکی گۆڤارەکەش کەوتبێ» باسی ئەم گۆڤارەیان کردووە. ئێمە لێرەدا بە کارێکی بێهوودەی دەزانین کە وەختی خوێنەران بە گێڕانەوەی بیروبۆچوونی ڕاست یا هەڵەی، جۆراوجۆری ئەو نووسەرانەوە داگیر بکەین. چونکە ڕاستکردنەوەی ئەو هەموو بیروڕا چەوت و چەوێڵ و بێ بەڵگانەی کە لەبارەی ئەم گۆڤارەوە خراونەتە ڕوو، لەوانەیە پازدە لاپەڕەی پێشەکیەکی درێژمان پێ ڕەش بکەنەوە. بۆیە لێرەدا ئەوەی بە لەپێشتر و گرنگتری

بەشی کرمانجی ژوورو

- مرنا حەجیێ جندی، ت. رەشید- ن. جەواری 7
-کوردێن نەژبیر کرنێ، نوورەدین زازا 19
- هەڤپەیڤینەک ب عوسمان سەبری رە، فرات جەوەری 23
- شاعیرێ بەرگریێ [شێرکۆ بێکەس]، هونەر سەلیم 33
- هەڤپەیڤینەک ب شاهینێ ب. سۆرەکلی رە، محەمەد ئوزون 38
- ترێن، کوردۆ حوسێن (کورتە چیرۆک)........................ 49
٧ – هنری ئارمسترۆنگ چوو جەنگێ، شاهینێ ب. سورەکلی 65 53
٨ – رەش گریدان، رزا چولپان 65
٩ – بیرانینێن نووری دێرسیمی 68
١٠ – چەند گلی لسەر بالێ نازێ و پەرتووکا "هێسر و باران"، ئەمویێ ئیۆ 72
١١ – دکتور عەبدوڵلا جەودەت [١٨٦٩-١٩٣٢]، محەمەد ئوزون 75

بەشی دوملی

١ – زازاکی چەبەخچوور و پالی را سۆنیک، فیستۆنیک، مەسەلە و دەییری، هاروون........................ 81
٢ – رندان هەمینی میان د، حەیران خانما دونبولی 95
٣ – فەس مستەفا و زەینەب خانمی، وداد قەیماخ 96
٤ – د لاوکێ دێرسمی، فرات 102
٥ – قەدەرێ کەینەر دا پادشای، کۆیۆ بەرز........................ 105
٦ – بیبلیۆگرافیادوملی، مالمیسانژ 111

ناوەڕۆک

بەشی کرمانجی خواروو

- پێنج ژمارەی گۆڤاری کوردستان [١٩١٩ - ١٩٢٠)، .فەرهاد پیرباڵ ٧
- بەڵگەنامەی ئارشیڤی بەریتانی: بزووتنەوەی کورد، .وەرگێڕانی لە ئینگلیزییەوە : ئەزمەند بەگی خانی..٢٣
- نەریتگەری یان ناسیۆنالیزم: وەڵامی کوردەکان بۆ ڕژێمی کەمالیست، حەمید بۆزئارسلان
.وەرگێڕانی لە فەرەنسییەوە : گۆڤاری هیوا ٣٨
- ه.س. نوییەری لە کوردستان، سیگرید نوییەری کاڵە وەرگێڕانی لە سویدییەوە : ئەمجەد شاکەلی.. ٥٥
- پاشەکشەی بارزانییەکان لە ئێران [٢]، ئەبو حەسەنی تەفرەشیان وەرگێڕانی : حەسەنی سەیف... ٦٧
- ناوی مانگە کوردییەکان، ئەحمەدی شەریفی ٧٤
- دامەزراندنی دەوڵەتی سوری و کێشەی کورد لە سوریا، ڕێناس، وەرگێڕانی لە فەرەنسییەوە:
خانی شەرەفکەندی ٧٩
- تاڤگەی زندان، شعر، شێرکۆ بێکەس.. ٨٣
- زەنگی گومان، شعر، فەرهاد شاکەلی.. ٨٧
- چاپەمەنییە تازەکانی ئەنستیتو.. ٨٨

خوێنـەرانی هێژا،

پاش درەنگکەوتنێکی زۆر گۆڤارەکەتان *هیوا* جارێکی دی دەردەکەوێت . هیواداریین کە لە ١٩٩١ ەوە ساڵی دوو ژمارە لە کاتی خۆیدا بڵاوبکرێتەوە و *هیوا* بە هاریکاری نووسەران و روناکبیرانی کوردی هەموو پارچەکانی کوردستان ، لە ژیانی فەرهەنگی و ئەدەبی کوردیدا ، رۆڵێکی سەرەکی بگێڕێ .

کرمـــانـج د دەولـەتـا دنـــێـدا
ئایا ب چ وەجهی مانە مەحروم ؟
بیلجملە ژبۆ چ بوونە مەحکووم ؟

ئەحمەدی خانی
(سەدەی حەڤدەیەم)

Enstîtuya Kurdî

Enstîtuya Kurdî malbendeke çandiya serbixwe ye. Di sebata 1983 bi destê ronakbîrine kurd ên ji her aliyên Kurdistanê, hatiye danîn. Amanca wê beşdarbûna şerê ji bo parastin û pêşvebirina çanda gelê kurd e.

Civandina gencîneyên çanda kurdî, çêkirina ferheng û rêzimanên kurdî, lêgerînên li ser edebiyat, pîşe û dîroka kurdî, çapkirina kovar û kitêbên kurdî, pêkanîna kaset, sêlik û fîlmên kurdî şaxên bingehiyên xebata wê ne. Karekî wê yi serekeyê din jî nasandina çanda kurdî bi gelên cihanê ye.

Enstîtu dixwaze bibe cîgehekî xebatê ji bo hemû zimannas, nivîskar, dîroknas, hinermend, pîşekar û ronakbîrên kurd û dostên gelê me. Ew ji bo jiyan û pêşveçûna xwe, hewcê alîkarî û tevkariya her Kurdê welatparêz e.

Hîmdarên Enstîtuya Kurdî : CEGERXWÎN, Ordîxanê CELÎL; Heciyê CINDÎ, Yilmaz GÜNEY, HEJAR, KENDAL, Qanatê KURDO, REMZÎ, Osman SEBRÎ, Îsmet Şerîf VANLÎ, Tewfîq WEHBÎ, Nûredîn ZAZA.

ئـەنسـتيـووى كـورد

ئەنستيتووى كورد مەلبەنديكى كولتوورى سەربەخۆيە. لە مانگى فيڤرييەى ١٩٨٣ بە كۆششى چەندان رووناكبيرى كوردى هەموو بەشەكانى كوردستان دامەزرا. ئامانجى بەشداربوونە لە خەبات بۆ پاراستن و پەرەپيدانى كولتوورى گەلى كورد.

كۆكردنەوەى گەنجينەى كولتوورى كورد، نووسينى فەرهەنگ و ريزمانى كوردى، ليكۆلينەوە دەربارەى ئەدەب و هونەر و ميژووى كورد، چاپكردنى گۆڤار و كتيبى كوردى، ئامادە كردنى كاسيت و قەوان و فلمى كوردى، ئەمانە بنچينەى چالاكييەكانى ئەنستيتوون.

ئەنسستيتوو دەيەوێ ببێ بە جيگاى كاركردن بۆ هەموو زمانناس، نووسەر، ميژووناس، هونەرمەند و رووناكبيرى كورد و دۆستى كورد.

بو مانەوەى ئەنستيتوو و پەرەسەندنى، پيويستى بە هاوكارى و بەشداربوونى هەموو كورديكى نيشتمان پەروەر هەيە.

هیوا

گۆڤارێکی رووناکبیریی گشتییە

ژمارە ٧ / پایز ١٩٩٠